# DÎROKA KURDISTANÊ

**AMADEKAR: Medyar**
**Ji Weşanên SZK-Efrîn 2014**
**Pirtûka Peymangeha Şehîd Viyan Amara**
**Sala Xwendinê 2014-2015**

**DÎROKA KURDISTANÊ**
**AMADEKAR: Medyar**
**Redekte Û Alîkar: SZK-Efrîn**
**Wênesazî: Selahedîn Yûsiv**
**Ji Weşanên SZK-Efrîn 2014**
**Hejmar 23**
**Pirtûka Peymangeha Şehîd Viyan Amara**
**Sala Xwendinê 2014-2015**

# NAVEROK


| H | WANE | RÛPEL |
|---|---|---|
| 1. | PÊŞGOTIN | 7 |
| 2. | UNÎTE 1. | 9 |
| 3. | WANE 1. | 10 |
| 4. | 1-CIVAKA XWEZAYÎ | |
| 5. | 2-TAYBETMENDIYÊN  CIVAKA XWEZAYÎ | |
| 6. | WANE 2. | 12 |
| 7. | 3-CIHÊ KU GERDÛN BÛ MIROV | |
| 8. | 4-MIROVÊN YEKEM | |
| 9. | 5-CÛRE MIROVÊN DÛYEM | |
| 10. | 6-HOMO SAPÎENS (MIROVÊN DIHZIRIN Û ZANA NE) | |
| 11. | WANE 3. | 14 |
| 12. | 7-PÊŞKETINA ZIMAN | |
| 13. | 8-SERDEMA PALEOLÎTÎK (Serdema Kevirê Kevin) û Civakîbûn! | |
| 14. | 9-NASNAMEYA KLANÊ-TOTEMÎZM | |
| 15. | 10-SERDEMA MEZOLÎTÎK (DEMA KEVIRÊ NAVÎN) | |
| 16. | WANE 4. | 17 |
| 17. | 11-SERDEMA NEOLÎTÎK (DEMA KEVIRÊ NÛ)=ŞOREŞA ÇANDINIYÊ | |
| 18. | VEDÎTINÊN SERDEMA NEOLÎTÎKÊ | |
| 19. | ÇANDA TIL-XELEF | |
| 20. | VEDÎTINÊN ÇANDA TIL-XELEF ÊN GIRÎNG | |
| 21. | PÊKHATINA RÛH- ZÎHNIYETÊ | |
| 22. | BAJAROKÊN DESTPÊKÊ KU AVABÛNE | |
| 23. | UNÎTEYA 2. | 21 |
| 24. | WENE 5. | 23 |
| 25. | DESTPÊKA DERKETINA HIYARERŞÎK | |
| 26. | WANE 6. | 25 |
| 27. | PÊŞKETINA BAJAR Û DEWLETÊ | |
| 28. | TÊKILIYA KURD Û SÛMERAN | |
| 29. | WANE 7. | 29 |
| 30. | A -DI DEMA ŞARISTANIYÊ DE KURD | |
| 31. | WANE 8. | 31 |
| 32. | DI DÎROKÊ DE NASÎNA  KURDAN | |
| 33. | 1-Hûrî | |
| 34. | 2-Gûtî | |
| 35. | 3-Lûlû (Lûlûbûn) | |
| 36. | 4-QASÎTÎ ( GELÊN KARKER) | |
| 37. | 5-MÎTANÎ (1800 – 1250 ) | |
| 38. | 6-NAÎRÎ (1302 – 900 ) | |
| 39. | 7-ÛRARTÛ ( 900 – 606) KHALDÎ (XALDÎ) | |
| 40. | WANE 9. | 37 |
| 41. | 8-MED | |
| 42. | 9-DESTANA KAWAYÊ HÊSINKAR | |
| 43. | 10-OLA ZERDEŞT | |
| 44. | WANE 10 | 42 |

| | | |
|---|---|---|
| 45. | 11-DAMEZIRANDIN Û TÊKÇÛNA ÎMPARATORIYA PERSAN (B.Z. 549-330) | |
| 46. | WANE 11. | 44 |
| 47. | TÊKILIYÊN ERMENÎ, SÛRYANÎ, YAHÛDÎ Û KURDAN | |
| 48. | WANE 12. | 46 |
| 49. | MANÎZM | |
| 50. | KOMAGENE | |
| 51. | WANE 13. | 49 |
| 52. | ÎSLAMIYET Û KURD | |
| 53. | DI DEMA ÎSLAMÊ DE XANEDANIYÊN KURDAN | |
| 54. | WANE 14. | 53 |
| 55. | XANEDANIYÊN KU HATINE AVAKIRIN | |
| 56. | WANE 15. | 56 |
| 57. | 1-DAMEZRANDINA DEWLETA MERWANIYAN | |
| 58. | 2-Lewazbûn û Hilweşîna Dewleta Merwanî | |
| 59. | WANE 16. | 59 |
| 60. | DI SERDEMA HARZEM Û MOXOLAN DE KURD | |
| 61. | WANE 17. | 64 |
| 62. | DI SERDEMA SEFAWÎ Û OSMANIYAN DE TÊKILIYÊN KURDAN (1501-1737) | |
| 63. | WANE 18. | 68 |
| 64. | 1- Di Pêvajoya Osmaniyan de Rewşa Xweser ya Mîrîtiyên Kurd | |
| 65. | JI SEDSALA 15'AN VE TÊKILIYA DI NAVBERA KURD Û ÎRANIYAN DE | |
| 66. | WANE 19. | 71 |
| 67. | PEYMANA QESRA ŞÊRÎN Û PARVEKIRINA KURDISTANÊ | |
| 68. | DI SEDSALA 19'AN DE REWŞA KURDISTANÊ Û SERHILDANÊN KURDAN | |
| 69. | UNÎTE 3. | 73 |
| 70. | WANE 20. | 74 |
| 71. | 1-SERHILDANA BABANZADE EVDREHMAN PAŞA (1806-1808) | |
| 72. | WANE 21. | 77 |
| 73. | 2-SERHILDANA EHMED PAŞA-(1812) | |
| 74. | 3-SERHILDANÊN GUNDIYAN A DI NAVBERA 1815 Û 1829'AN DE | |
| 75. | WANE 22. | 79 |
| 76. | 4-SERHILDANÊN GUNDIYAN YÊN DI NAVBERA 1840 Û 1842 AN DE | |
| 77. | 5-SERHILDANÊN KURDÊN EZDAYÎ (1826-1839) | |
| 78. | 6-SERHILDANA SEÎD BEG (1833-1838) | |
| 79. | WANE 23. | 81 |
| 80. | 7-SERHILDANA REWANDOZÊ (1830-1837) | |
| 81. | 8-TEVGERA ÎSMAÎL BEGÊ BEHDÎNAN | |
| 82. | WANE 24 . | 85 |
| 83. | 9-SERHILDANA BEDIRXAN BEG (1842-1847) | |
| 84. | WANE 25. | 89 |
| 85. | 1- Hewildana Osman Û Hisên Kenan Beg | |
| 86. | 2- Hewildana Emîn Elî û Mîthad Beg | |
| 87. | 10-SERHILDANA ÎZEDÎN YEZDANŞÊR (1854-1855) | |
| 88. | WANE 26. | 93 |
| 89. | JI 1850'Î ŞÛNDE PERGALA CÎHANÊ Û ROJHILATA NAVÎN | |
| 90. | WANE 27. | 96 |
| 91. | 9-SERHILDANA ŞÊX ÛBEYDÛLLAHÎ (1880-1882) | |

| | | |
|---|---|---|
| 92. | WANE 28. | 100 |
| 93. | SERHILDANA ŞÊX ÛBEYDÛLLAH -2 | |
| 94. | SERHILDANA ŞÊX ÛBEYDÛLLAH-3. | |
| 95. | Şêx Ûbeydûllah Gihîşt Stenbolê | |
| 96. | UNÎTE 4. | 106 |
| 97. | WANE 29. | 107 |
| 98. | PIŞTÎ SERHILDANA ŞÊX ÛBEYDÛLLAH HEWLDANÊN KURDAN | |
| 99. | WANE 30. | 111 |
| 100. | POLÎTÎKAYÊN OSMANIYAN ÊN ERMENIYAN Û XIRABÛNA TÊKILIYÊN ERMENÎ Û KURDAN | |
| 101. | WANE 31. | 113 |
| 102. | DI DESTPÊKA 19OO'Î DE KURD | |
| 103. | WANE 32. | 116 |
| 104. | DI SEDSALA 20. DE REWŞA KURDISTANÊ Û SERHILDANÊN GELÊ KURD YÊN LI DIJÎ DAGIRKERAN | |
| 105. | WANE 33. | 119 |
| 106. | SERHILDANA DÊRSIMÊ (1907-1908-1909) | |
| 107. | ÎTTÎHAT TERAKKÎ Û PÊVAJOYA MEŞRÛTIYETÊ YA 2. | |
| 108. | WANE 34. | 124 |
| 109. | SERHILDANA HEMAWENDÊ (1908 | |
| 110. | SERHILDANA ÎBRAHÎM PAŞAYÊ MILANÎ (1908-1909) | |
| 111. | SERHILDANA MILAN 1908'AN DESTPÊDIKE | |
| 112. | WANE 35. | 128 |
| 113. | SERDEMA ÎTÎHAT TERAKÎ Û SERHILDAN | |
| 114. | SERHILDANA ŞÊX ABDÛSELAM BARZANÎ YA 2. (1913) | |
| 115. | SERHILDANA BEDLÎSÊ (XÎZAN) (1913_1914) | |
| 116. | WANE 36. | 131 |
| 117. | A- DI ŞERÊ CÎHANÊ YÊ YEKEMÎN DE KURD | |
| 118. | B- Piştî Şerê Cîhanê Yê Yekemîn Rewşa Kurdistanê | |
| 119. | PEYMANA SYKES- PICOT | |
| 120. | SERHILDANA ŞÊX MEHMÛDÊ BERZENCÎ | |
| 121. | Hewildana Şêx Mehmûdê Berzencî Ya Dûwemîn | |
| 122. | WANE 37. | 137 |
| 123. | 2- SERHILDANA ÎSMAÎL AXA (SIMKOYÊ ŞIKAKÎ) | |
| 124. | WANE 38. | 140 |
| 125. | 3- SERHILDANA KOÇGIRÎ | |
| 126. | WANE 39. | 144 |
| 127. | PEYMANA SEWRÊ (10'Ê TEBAXA 1920) | |
| 128. | PEYMANA QAHÎRE | |
| 129. | PEYMANA LOZAN (24'Ê TÎRMEHA 1923) | |
| 130. | WANE 40. | 148 |
| 131. | 4- SERHILDANA ŞÊX SEÎD | |
| 132. | WANE 41. | 153 |
| 133. | 5- Serhildana Agirî | |
| 134. | A- DAMEZRANDINA XOYBÛN Û SERHILDANA AGIRÎ YA 1927'AN | |
| 135. | UNÎTE 5. | 157 |
| 136. | WANE 42. | 158 |
| 137. | 5-SERHILDANA DÊRSIMÊ | |
| 138. | B- TÊKÇÛNA SERHILDANA DÊRSIMÊ | |

| | | |
|---|---|---|
| 139. | C- ENCAMÊN GIŞTÎ YÊN SERHILDANÊN SEDSALA 20. AN DE | |
| 140. | SEDEMÊN SERNEKETINÊN SERHILDANÊN GELÊ KURD | |
| 141. | WANE 43. | 162 |
| 142. | BÛYERA 33 GULEYAN | |
| 143. | WANE 44. | 165 |
| 144. | DI PÊVAJOYA ŞERÊ CÎHANÊ YÊ DÛYEMÎN Û PIŞTÎ ŞER PIRSGIRÊKA KURD | |
| 145. | B-BAŞÛRÊ KURDISTANÊ | |
| 146. | 1- SERHILDANA MELE MISTEFA BARZANÎ | |
| 147. | WANE 45. | 167 |
| 148. | B- KOMARA MEHABAD (22.01.1946 – 17.12.1946) | |
| 149. | WANE 46. | 170 |
| 150. | A-DI SALA 1960 Û NÎVÊ DESTPÊKÊ YÊ 1970’AN DE TÊKOŞÎNA RIZGARIYA NETEWEYA KURD | |
| 151. | WANE 47. | 174 |
| 152. | 3-PEYMANA CEZAYÎR | |
| 153. | 4-Piştî Têkçûna Komara Mehabad Li Rojhilatê Kurdistanê Tevgera Kurd | |
| 154. | WANE 48. | 176 |
| 155. | 5-LI BAŞÛRÊ ROJAVAYÊ KURDISTANÊ TEVGERA KURD | |
| 156. | KEMBERA ERABAN | |
| 157. | UNÎTE 6. | 179 |
| 158. | WANE 49. | 180 |
| 159. | DÎROKA KURDEN KAFKASYA Û KURDÎSTANA SOR | |
| 160. | WANE 50. | 183 |
| 161. | DERBASBÛNA RÊBER APO YA ROJAVAYÊ KURDISTANÊ | |
| 162. | PKK Û MEYÎLA AZADIYA GEL | |
| 163. | WANE 51. | 187 |
| 164. | TAYBETMENDIYA  KU TEVGERA PKK’ ê JI HEMÛ TEVGERÊN DIN CUDA KIR | |
| 165. | NÊZÎKATIYA JI JINÊ RE YE | |
| 166. | WANE 52. | 190 |
| 167. | DI KURDAN  DE TÊGEHA TARÎQET Û MEZHEB | |
| 168. | WANE 53. | 192 |
| 169. | DERKETINA BINGEHA FELSEFEYA TARÎQETAN. | |
| 170. | Qonaxên Nakşîbêndiyan | |
| 171. | Di Nakşibendî De Nasnameyek Nû; Xalidî | |
| 172. | WANE 54. | 195 |
| 173. | DI SEDSALA 20. DE LI SER JIYANA KURDAN  A SIYASÎ DESTWERDANA | |
| 174. | NAKŞÎBENDIYAN Û PDK'Ê | |
| 175. | Di Hemeza  Haham de  Nakşîbendî. | |
| 176. | NAVÊ BAJARA Û NAVÇEYAN BI KURDÎ Û TIRKÎ | 197 |
| 177. | ÇAVKANIYÊN PIRTÛKÊ | 199 |

## PÊŞGOTIN

## DÎROK ÇI YE

**Dîrokeke şaş rast nayê jiyan kirin. Ên ku dîroka xwe ya azadiyê rast nenivîsînin, nikarin rast jî jiyan bikin.**

Dîrok, di wateya giştî de zanisteke ku rabirdûya mirovahiyê û avabûna gerdûnê heta hatina roja me ya îro bi me dide nasîn e. Ji beşê zanistê yê bûyer û pêşveçûnên di navbera komên mirov û civakan de çêbûyî, bi diyarkirina cih û dem û peywendiyên sedem, encam, çêbûn û avabûnan lêgerîn û lêkolîn dike re "dîrok" tê gotin. A. Ocalan dibêje: "Fêmkirina rojê fêmkirina dîrokê ye. Dîrok di roja me de, em jî di destpêka dîrokê de veşartîne." Di wateyeke din de dîrok pevçûnên di navbera gûhartin û berdewamiya jiyanê de ye. Dîrok ji dûh ber bi îro ve, ji îro ve jî ber bi sibê ve diherike.

## GIRÎNGIYA FÊRKIRINA DÎROKÊ

"Heqîqat evîn e, evîn jiyaneke azad e" lêgerîna jiyaneke azad di xwezaya mirov de heye, bê dawiye û bêbirang e. Encax di vir de ji bo encam bi destxistinê diyarker rêbaz e. Lewre bi rêbazeke şaş mirov nagihêje encameke rast. Encax bi rêbazeke rast mirov dikare encameke rast bidest bixe.

Dîrok; di navbera dema borî û dema niha û dema bê de weke pirekê gîrêdanê çêdike. Veqetandina dîrokê ji hevdû çênabe. Heke mirovek an jî civakek dîroka xwe nizanibe ango zanîna xwe ya dîrokî nebe, ji nirxên mirovahiyê bêpar dimine. An jî mejiyê xwe windakiriye. Di heman demê de civakîbûna xwe winda dike. Di cîhana me ya îro de û di demên li pêşiya me de em neçarin bûyeran bi çavê dîrokzanekê/î bigirin dest û binirxînin. Em çiqasî rabirdûya xwe bizanibin em ê ewqasî xwe, neteweya xwe û cîhana ku em tê de ne û gerdûnê jî baş bizanibin. Civaka ku dîroka xwe nezanibe, dişibe mirovên hişê xwe winda kirî. Ew kes jixwebûyînê derketiye, bûye tiştekî din. Ji ber ku dîrok heqîqeta mirov e.

Dîrok ne bi tenê dîroka netew û dewlatan e, di heman demê de jî dîroka çanda avakirina civakê ye. Dîroka fermî hertim berjewendiyên desthilatdaran bingeh girtiye û li gorî daxwazê wan hatiye nivîsandin. Mirov dikare bibeje dîroka fermî, dîroka ji 5000 salî vir de ye, bi awayekî din dîroka avabûna şaristaniyê ye. Lê dîroka mirovahiyê bi sed hêzar salan e. Dîroka civaka demokratîk an nehatiye nivîsandin, ger hatibe nivîsandin jî ser hatiye reşkirin. Ku em ê dîroka di wateya naskirina civakê de şîrove bikin, dîroka herî demdirêj dîroka klanan e. Dîrok ji ber ku weke Dîroka dewlet û netaweyan hatiye dest girtin zêde cihê Kurdan tê de tine ye. Kurd hîn zêdetir civakeke çandiniyê ne. Ji dewlet avakirinê pirtir weke çanda qabîle jiyan kirine. Qebîle jî di rastiyê de teşeya avakirina civakê ya bingehîn in. Ger qebîle tûne bên dîtin, wê demê netew jî tûne ne. Ji ber ku netew ji qebîleyan hatine avakirin. Berî her tiştî ji bo ku mirov dîrokê rast şîrove bike, pêwîste ku mirov li gorî zanebûna wê demê şîrove bike.

Ti nirxandinên dîrokî ji sedî sed mîsoger nînin, her tîm Divêtiyên (îhtîmalên) ku dîrok were gûhartin heye, ji ber ku dîrok li gorî bidestxistina belgeyan dema borî tê nivîsandin an jî şîrove kirin. Di encamên bidestxistina belgeyên nû de dibe sedem ku dîrok bê gûhartin. Dîrokeke teqez encama zanista pozîtîfe, an jî zîhniyeta dîroka xeta rastgir e, ew jî rastiya wê tûne ye. Ji bo wê Rêber Apo dibêje; vegotina mîtîlojîk ji dîroka niha pirtir nezî heqîqetê ye. Dîroka ku mirovahiyê bingeh negre, ew dîrok ji rastiyê dûr e. Ji ber ku mirov kombûna dîrokê ye. Mirov dema ku xwe nasbike, tê wateya naskirina hemû gerdûnê.

Dîrok; ne tenê ji bo civaka mirovan ji bo hemû gerdûnê risteke mayinde dilîze.

## PÊWÎSTIYA FÊRKIRINA DÎROKA KURDISTANÊ

Çawa ku dîrok ji bo hemû gelan û gerdûnê ristekê dilîze, dîroka Kurdistanê jî ji bo gelê Kurd risteke wisa dilîze. Di pêvajoyên borî de hêzên dagirker dîroka gelê Kurd inkar kirin û tûne hesibandin. Ji ber vê jî di pirtûkên xwe yên dîrokê de cih nedidan Kurdan . Kurd an beşeke Ereb, an beşeke Faris an jî beşeke Tirk didîtin. Di heman demê de hêzên dagirker ji bo tûnekirina vî gelê herî kevin ê dîroka mirovahiyê, welatê me kirin çar parçe. Lê belê gelê Kurd bi têkoşîna xwe ya bîrdozî, siyasî û leşkerî ev siyaset vala derxistin. Di encama lêkolînên hatine kirin de, her çiqas bi giştî nebe jî, beşeke girîng a dîroka gelê Kurd û pêngavên ji bo mirovahiyê hatin avêtin û beşekî baş ji dîroka mirovahiyê ronîkirin e. Em ji lêkolînên hatine kirin têdigihêjin ku pêşiyên me li Rojhilata Navîn bi hezaran sal ji beriya niha, ji bo jiyaneke azad li dijî zordaran têkoşînên bêhempa dayîne. Ji bo ku em îro têkoşîneke rast bidin, divê em li dîroka xwe vegerin. Divê em serkeftin, binkeftinên pêşiyên xwe, sedem, encamên wan baş bizanibin û bi rewşa xwe ya îro re bînin hember hev. Divê weke endameke/î yê vê civakê em jî di derbarê dîroka xwe de bikevin nava lêkolîn û lêgerînan û erkê ku dikeve ser milê me bêdûdilî bi cihbînin. Kesa/ê ku heqîqeta xwe winda kiribe, wê/wî rastiya mirovahiya xwe winda kiriye. Ji ber ku wan kesan rastiya xwe winda kiriye. Ew kes jixwebûyîne derketiye.

Mifteya Dîroka Kurdan  di civaka neolîtîkê de ye. Heta ku dîroka serdema neolîtîkê bi tevahiya nepeniyên xwe bi zelalî neyê fêmkirin girêka dîroka Kurdan  nayê vekirin. Di mirov de ramanan li vir dest pê kiriye, zanistê li vir dest pê kiriye, rêvebirinê li vir dest pê kiriye, civakbûyînê li vir dest pê kiriye, têgeha xweda-xwedavendiyê û mîtoljiya wê ji vir derketiye, ramanên bîrdozî li vir destpê kirine, di pêşengiya van zanînan de pêşveçûnên herî mezin li vir çêbûne. Di bingeha pêşveçûna civak û pêşketina ramanan de ev destpêk hene. Lewre ji bo ku zihniyeta mirovahiyê ya îro bê fêmkirin pêwîst e ku zihniyeta civaka xwezayî baş bê şirovekirin û fêmkirin.

Dîroka civaka demokratîk an nehatiye nivîsandin an jî hatibe nivîsandin jî, hatiye berovajîkirin.

# UNÎTEYA 1.

**WANE 1.**

**1-CIVAKA XWEZAYÎ**
**2-TAYBETMENDIYÊN CIVAKA XWEZAYÎ**

**WANE 2.**

**3-CIHÊ KU GERDÛN BÛ MIROV**
**4-MIROVÊN YEKEM**
**5-CÛRE MIROVÊN DÛYEM**
**6-HOMO SAPÎENS (MIROVÊN DIHZIRIN Û ZANA NE)**

**WANE 3.**

**7-PÊŞKETINA ZIMAN**
**8-SERDEMA PALEOLÎTÎK (Serdema Kevirê Kevin) û Civakîbûn!**
**9-NASNAMEYA KLANÊ-TOTEMÎZM**
**10-SERDEMA MEZOLÎTÎK (DEMA KEVIRÊ NAVÎN)**

**WANE 4.**

**11-SERDEMA NEOLÎTÎK (DEMA KEVIRÊ NÛ)=ŞOREŞA ÇANDINIYÊ**
**VEDÎTINÊN SERDEMA NEOLÎTÎKÊ**
**ÇANDA TIL-XELEF;**
**VEDÎTINÊN ÇANDA TIL-XELEF ÊN GIRÎNG**
**PÊKHATINA RÛH- ZÎHNIYETÊ**
**BAJAROKÊN DESTPÊKÊ KU AVABÛNE EV IN:**

## WANE 1.

**Pirsên Amadekariyê**

1- Hûn ji gotina civaka xwezayî çi têdigihêjin?
2- Gerdûn çawa çêbû?
3- 5 taybetmendiyên bingehîn ên çêbûna cîhanê bêje.

### 1-CIVAKA XWEZAYÎ

**Civaka Xwezayî:** Pergala civakan a ku ji dema veqetandina prîmatan dest pê dike û heta civaka hiyararşîk didome ye.

### 2-TAYBETMENDIYÊN CIVAKA XWEZAYÎ

Azadî, wekhevî û kolektîvîzim û bi xwezayê re jiyaneke bi hevsengî esas e. Teşeya jiyanê ya bingehîn bi klanên ku ji 20-30 kesan pêk tê dest pê dike û bi jiyana gundîtî digêhêje asta herî jor. Ev serdem di hundirê xwe de serdema Mezeolîtîk, paleolîtîk û neolîtîkê jî dihewîne. Di serî de bi nêçîrvaniyê û komkirinê, bidestxistina pêwîstiyan û bi wan pêwîstiyan xwedî dibûn. Di serdema Neolîtîkê de hilberîn û kedîkirina sewalan dest pê dike. Ji hêlan ramanê ve wekhevî bingehe, hemû xweza zîndî tê dîtin, nezîkatiya ji xwezayê re bi hestyarî ye. Sentezkirina civaka yekem û dûyemîn e. Olên serdemê jî parastina xwezayê dikin. Felsefeya wê serdemê jî li gorî wê hatiye avakirin. Ku mirov mînakekê bide; Ola Zerdeşt yek ji wan e. Di cihê bajaran de perstgeh hene, ev perstgeh rola bazarê û têkîliyên fireh ên civakê digre. Bingeha civakeke mezintir avadike. Di vê bazarê de qezenç ne esas e, tiştê esas pekanîna pêwîstiyên civakê ne. Amûrên ku li gundan peyda nabin, cihê pêkanîna wan e. Di vê derê de civak û xweza ji hev perçe dikin. Endezyariya civakê tine ye.



### 1-DEMA GERDÛNÊ YA BÊMIROV

Çêbûna gerdûne, li gorî teoriya zanistî bi **Big-Bêngê (teqandina mezin)** re dest pê kiriye, ango bi teqandineke mezin çêbûna gerdûnê dest pê kiriye. Ev teorî di sedsala 20. de dane pêş. Dema dixwazin vê teoriyê îspat bikin, têkiliya made û enerjiyê jî vedikin. Beriya ku gerdûn çêbibe mîna serê derziyê madeyek heye. Ev made diteqe û gaza ewran a germahiya xwe bi milyar C çêdibe. Ev ewrên gazê bi demê re dicemide û gerdûnê çêdike. Ev teqandin 14-20 mîlyar sal berê çêbûye. Piştî teqandinê 3sn. dest pê kê cemidandineke bilez dest pê dike, germahî di nava 3sn. de bi mîlyonan dadikeve û ev cemidandin didome, lê hîn hêdî didome. Di nava vê pêvajoyê de gerokstêrk, galaksî, stêrk, heyv û sîstema rojê çêdibin.

## 2-ÇÊBÛNA CÎHANÊ

Tê texmînkirin ku cîhan nêzî 5-6 mîlyar sal berê çêbûye. Dema yekem  çêdibe weke gogeke agire. Di nava vê gogaka êgir de metalên giran hêdî hêdî diçin xwarê, metalên sivik û gaz jî ber bi jor ve tevdigerin. Ango bi bilindbûna van ve çîniya hewayê çêdibe. Cîhan hêdî hêdî dicemide û şiklê xwe digre. Germahiya bilind di heman demê de hîdrojen û oksîjenê jî derdixe holê. Dema ku dû atomên hîdrojen û atomeke oksîjenê  digihên hev hilma avê çêdibe. Bi demê re ev hilm dicemide û weke baranê dibare. Lê belê ji ber ku ser rûyê cîhanê zêde germe, ev baran bêyî ku bighê erdê dîsa dibe hilm û bi hewa dikeve. Ev demeke dirêj wiha didome. Ser rûyê erdê her dicemide baran hêdî hêdî dighêje erdê. Oksîjena zêde ya ku ji avê diqetin bilind dibin û çîniya ozonê çêdikin. Ozon ji oksîjena giran ango ji sê atomên oksîjenê çêdibe. Çîniya ozonê, cîhanê ji tirêjên bizirar a bi navê ûltraviyole dibarêze. Ev parastin dihêle ji bo zindiyan şertên gûncav çêbibin. Avhewa pişt re çêdibe.

Gazên weke Azot, karbondîoksît, oksîjen, hîdrojen, amonyak di avhewayê de dest bi kombûnê dikin. Her ku germahî kêm dibe barana dighê ser rûyê erdê jî zêde dibe. Bi vî awayî cihên kur tije dibin û gol, derya û çem çêdibin. Cihan ji %70 ava ji %30 jî bejayî ye. Piştî ku çîniya ozonê çêdibe tirêjên bizirar a bi navê ûltraviyole ku ji rojê tên, digre û bi vî awayî di cîhanê de rewşa jiyanê çêdibe. Yekem şertên jiyanê di binê deryayan de çêdibe. 3,5 mîlyar sal berê yekem zindî bi navê amîp çêdibe. Ev zindî yek şaneye-hûcre ye.  Di vê demê de hewa standina bi oksîjen nîne. Hewa standina bêoksîjen heye. Ev jî demeke dirêj didome. Ji ber vê sedemê jî tam di binê deryayan de yekem zindî çêdibin û li vê derê cûreyên zindiyan zêde dibin. Ji ber ku her çiqasî çîniya ozonê çêbûbe jî, hê jî tîrêjên bizirar xwe dighênin ser rûyê erdê û heta dighên kuraniyeke diyar a deryayan. Ji ber vê sedemê li van deran zindî jiyan nakin. Oksîjena di av û deryayan de serbeste ango bi tû elementan re nebûye yek. Ji ber vê sedemê di zindiyan de hê jî kezeb çênebûye. Di roja me de jî kezeba spî ya gelek lawiran nîne û li cihên vê tûrikên hewayê çêbûne.

Pişt re ji yek hûcreyê derbasbûna zindiyên pir hûcreyî çêdibe. Kurmê xelekî hêdî hêdî çêdibe.   Ji yek hûcreyê derbasbûna zindiyên pir hûcreyî nêzî mîlyarek sal didome. Nêzî 500 mîlyon sal berê yekem zindî ji deryayê derdikeve hem li deryayê hem jî li bejahiyê dest bi jiyanê dike. Ji van re  “amfîbiyan” tê gotin. Yekem car beq derdikevin bejahiyê. Pişt re lawirên ku xwe dixişiqînin çêdibin. Di navbera 400 û 350 mîlyon salî de cûreyên masiyan çêdibe. Pişt re kêzik û lawirên bi bask çêdibin. Di navbera 225-65 mîlyon salan de lawirên weke  gimgûmok, dînazor, timsah gelek zêde çêdibin. Pişt re li bejahiyê kêzik û lawirên bi bask derdikevin holê.

Di dawiya sala 65 mîlyonî de ji ber gûharîna demsala ji nişka ve gelek lawir û nebat tûne dibin. Di vê demê de dînazor jî tûne dibin. Ev dihêle ku di salên 60 mîlyonî de hejmara lawirên bigûhan zêde dibin. Ev jî primat, meymûn, çileçilê (pîrçemok), yûnûs in. 33 cûreyên bigûhan hene. Ya herî nêzî mirov prîmat in. Prîmata bi navê “promîsiyen” li ser darê jiyan dike. Bi demê re ev ji darê dadikeve û pêşketina homînîdan (mirovan) pêk tîne. Temenê gerdûnê 14-20 mîlyar sal, temenê cîhanê 5 mîlyar sal, temenê mirov jî 7 mîlyon sal tê pejirandin. Ev tê wê wateyê: ji bo mirov bibe mirov bi mîlyar sal derbas bûne û heke pêşiya mirov nebûna, mirov jî weke kombûna wan çênedibû.



**WANE 2.**

**Pirsên Amadekariyê**

1- Çima zindî û mirovên destpê li Efrîqa çêbûn?
2- Şert û mercên kîşwerî yên Rojhilatê Efrîqa çawa bûn?
3- Çima geliyê rîfa Efrîqa hilweşî?

## 3-CIHÊ KU GERDÛN BÛ MIROV:

### ROJHILATÊ EFRÎQAYÊ

Cihê ku yekem gerdûn dibe jiyan, Rojhilatê Efrîqayê ye. Ev cih di navbera Kenya, Tanzanya û Etiyopyayê de ye. Piramîtên destpêkê ji vê derê belavî hemû cîhanê bûne. Di vê pêşketinê de çawaniya vê erdnîgariyê û gûhartinên jiyan kirine jî risteke diyarker lîstiye.
Li gorî vedîtinên zanista jeolojîk beriya 8-10 mîlyon sal berê di Rojhilatê Efrîqayê de werimandin û bi vê ve girêdayî qelişandin çêdibe. Di encama vê de çalên girîng çêdibin. Ev jî dihêle ku çem û gol çêbibin. Golan Victoria, Kioga, Rûdolf û çemen Omo û Havvas di vê demê de çêdibin. Di encama vê cûdabûnê de ber bi milê bakurê rojhilat-başûrê rojava ve xeteke herî dirêj a rîftê (qelişandin) çêdibe. Ev jî li ser cûreyên nebat û lawiran bandor dike. Heta wê demê ew der bigiranî daristanin. Piştî vê ew vedigûhere giyayê bilind ku jê re savana tê gotin. Destpêkê prîmata ku li ser darê jiyan dikir hêdî hêdî li gorî vî giyayî jiyan dike. 60 Milyon sal berê destpêka çêbûna meymûn e (prîmatên hoveber). Di navbera mirov û prîmatan de xeleka herî dawî Aûstralopitechûs e. Kapasiteya mejiyê wan weke 400-500 cm3 tê hesibandin. Ji bo ku ev cûre xwe li gorî hawira savana xwe biparêze û xwarina xwe peyda bike, her diçe li ser dû lingên xwe disekine. 20 Milyon sal berê rabûna ser lingan û bi rêva çûyin û bikaranîna alav e. Di vir de hominid (mirovî) ku Aûstralopitechûs e, hê jî nebûye homo ango mirov. Aûstralopitechûs, di navbera mirov û mirovî de dapîr û bapîrê dawiyê ye. Êdî piştî vê cûreyê mirov derdikeve holê.

## 4-MIROVÊN YEKEM:

### HOMO HABILIS (MIROVÊN KÊRHATÎ)

Civakîbûn şertê mirovbûnê ye. Mirova/ê bê civak nîne. Mirovbûn û civakîbûn bi hev re pêkhatine. Li cihê ku mirov hebe, li wir civak jî heye. Dîroka mirov di heman demê de dîroka civakê ye jî.
Hacme mêjiyê Homo Habilis 650 cm3. Kevirekî li kevir dixe û ji wan kevirên ku tiştan jêdike an jî hûr dike, bi dest dixe. Nêzikî 10 amûran ji kevir çêdike. Lê hê jî nikare li ser lingên xwe bisekine. Fîzîka xwe di navbera mirov û prîmat de ye. 3- 2,5 milyon sal berê ji bakurê Efrîqayê ji herêma **KOOBIFORO** ji geliyê Rîfê destpêka belavbûnê ber bi deryaya sor û deryaya spî dikevin rê û tên.

## 5-CÛRE MIROVÊN DÛYEM:


### HOMO ERECTÛS (Mirovên Li Ser Lingan Disekine)

Nêzî 1,5-2 mîlyon sal berê ji Homo Habilis ber bi Homo Erectûs peresan çêbûye. Êdî ew dikare li ser lingên xwe bisekine. Hacmê mêjiyên wan 900 cm3 e. Nêzî 60 amûran bikartîne. Nêzî 500 hezar

sal beriya vê agir xistiya bin kontrola xwe û bikaraniye. Heta Homo Erectûs ti mirov li cihanê belav nebûye. Fosîlên Homo Habilis tenê li Rojhilatê Efrîqayê di navbera Kenya, Tanzanya û Etiyopyayê hatine dîtin. 1- 1,5 milyon sal berê meşa ber bi Hîlala Zêrîn ve destpêkiriye.
Di dema Homo Erectûs de hem koçî herêmên din ên Efrîqayê hem jî koçî parzemînên din jî hatine kirin. Ev belavbûn esas li ser Sûveyş û Rojhilatê deryaya Spî ber bi Toros û Zagrosan ve hatiye kirin. Sahraya mezin û çolên Erebistanê negûncav bûn û derfetên jiyanê nedidan. Rêya din jî li ser Başûrê deryaya Spî û neqeba Cebelûtarik ber bi Ewrûpayê ve ye. Lê belê ev rê ji ber hem mercên hewayî hem jî pirsgirêka xwarinê zêde ye weke Rojhilatê Deryaya Spî biberhem nebû. Ji ber vê jî rêya ji Mezepotamyayê derbas dibû, ji aliyên çavkaniyên xwarin û vexwarinê, derfetên stargehan, demsalan ve derfetên xwe zêde bûn.
Erdên Mezepotamyayê ji Homo Erectûs-mirovan gûncave û mirovan dihewîne. Ev jî tê wê wateyê ku ji milyon salan ve li Hîlala Zêrîn mirov jiyan dikin. Sedema vê herî bingehîn Erdnîgarî gûncav e. **Gûncawiya Erdnîgariya (coğrafyayê) Kurdistanê bi taybetî jî a Hîlala Zêrîn,** dewlemendiya Riweka (nebat)**,** pirbûna sewalan, gûncawiya demsalan, pirbûna Çavkaniyên avê, Erdê bi bereket hwd jiyan li ser vê axê hêsan û dewlemend kir**.**

## 6-HOMO SAPÎENS (MIROVÊN DIHZIRIN Û ZANA NE)

Di herikandina peresanê de ji Home Erectûs derbasbûna Homo Sapiens nêzî dû sed hezarî salan pêkhatiye. Hacmê mejî 1400 cm3 e. Homo Spiens dibin dû beş. Ya yekê Homo Spiens Neandertal ya diwem jî Homo Spiens Spiens (Mirovê dihizire û zane ye).
Fosîlên yekem ên Homo Spiens Neandertal li newala Neander ku li Elmanyayê ye, hatine dîtin. Navê Neandertal jî ji vir digre. 20 hezar sal berê ji holê rabûne. Dîsa hin fosîlên van li şikefta Şanîdar ku li Başûrê Kurdistanê ye jî hatine dîtin. Li gorî mirovên roja me hîn topikî, masûlkên xwe zêde, kurt, eniya wan daketî û hestiyê hinarekê derketî bûn. Bi mercên dema qeşayê re dikare bijî. Ji kevir mertal û tîr çêkiriye. Bi vî awayî di nêçîrvanî de pispor bûye. Heta niha sedema wan a ji holê rabûnê tam nayê zanîn. Homo Spiens Spiens jî êdî ji aliyên biyolojîk ve weke mirovên roja me ne. Di dema Home Erectûs de belav bûn bi sinore lê Homo Spiens li her cihên cîhanê belav dibe. Sih hezar sal berê li bakurê cîhanê qeşaya ku stûrbûna xwe 2-3 km ye, heye. Di vê demê de Bakurê Ewrûpa û Bakurê Emerîkayê qeşa girtiye. Di encama vê de derya 130 metreyan daketiye. Ji ber vê jî kendava Basra, deryaya Ege û neqeba Berîng bejahî ne. Bîst hezar sal berê mirov derbasî parzemîna Emerîkayê bûne. Mirov li ser parzemîna Asyayê û bi rêya neqeba Berîngê derbasî Bakurê Emerîkayê bûne. Pişt re ber bi başûr ve belav bûne. Di heman demê de ji Asyayê ber bi Awûstralyayê jî di vê demê de belavbûn çêbûye.
Peresana mirov nêzî 7 Mîlyon sal temam bûye. 100 hezar salên dawî biyolojiya mirov weke mirovên roja me tê pejirandin. Sedemên vê jî; civakîbûn pêşdikeve, zekaya analîtîk zêde tê bikaranîn û bi vî awayî bikaranîna fîzîk kêm dibe. Dema ku bikaranîna fîzîk kêm dibe di biyolojiya mirov de peresan nabe an jî gelek giran çêdibe. Niha mirov ji aliyê biyolojî de gûhartineke cidî jiyan nake. Lê belê ji aliyên çandî ve gûhartin û vegûhartineke mezin jiyan dike. Mirov di wateya xwe ya îro de ji bo bibe mirov hem ji aliyê biyolojî hem jî ji aliyê çandî ve gelek zehmetiyên mezin jiyan kirine.



**WANE 3.**

**Pirsên Amadekariyê**

1- Şêwazê çêbûna zimanê destpêkê û girêdana wê bi pêşketina civakê re çi ye?
2- Taybetmendiyên nasnameya qilanê totemîzim çi ne?
3- Taybetmendiyên dema mezolotîk û peleolotîk çi ne?

## 7-PÊŞKETINA ZIMAN

Destpêkê di mirovan de zimanê bedenê pêşdikeve. Ango mirov bi nîşanan-îşaretan ji hevdû fêm dikin. Ev demeke dirêj berdewam dike. Weke me gotî zimanê destpêkê yê ji hev têgihiştinê zimanê nîşanan-îşaretan e. Lê belê bi demê re her ku di laşê mirov de gûherîn û perasan çêdibin. Di zimanê civakê yê hevpar de jî gûherîn çêdibin.
Bi civakîbûnê re zimanê mirov jî her diçe pêşdikeve. Dema mirov ji zimanê nîşaneyan derbasî zimanê sembolan ango zimanê ku niha em pê diaxivin, dibe şoreşa herî mezin di jiyana mirovan de çêdibe. Bi zimanê sembolan wate dayîn û navlêkirin pêşdikeve. Mirov nav li her vedîtin û amûrên nû dike. Bi vî awayî di ziman de pêşketinên diyar çêdibin. Pêşketina di ziman de dihêle di hizir û mejiyê mirov de jî pêşketin çêbibin. Di vê wateyê de raman jî li ser ziman bandoreke erênî çêdike. Ango pêşketina ziman û ramanê ya mirovan li ser hev bandor dike.
Di pêşketina ziman de şêwazê şekilgirtina têlên qirikê risteke girîng dilîze. Bi perasana mirov re her ku çû di laşê mirov de jî gûhertin çêbûn. Bi demê re qirika mirovan şekilê xwe yê bingehîn digire. Ev şekil girtin bi zengelora mirov tê pênasekirin. Dema girêka zengelora mirov li jor be, mirov nikare pir dengan derxîne. Lê dema ku girêka zengelorê hinekî dadikeve jêr êdî têlên qirika mirov ji bo pir dengan derxistinê gûnav dibe. Ev jî rê li ber şoreşa yekemîn a mirovahiyê ya ku em jê re dibêjin şoreşa zimane re vedike.

## 8-SERDEMA PALEOLÎTÎK (Serdema Kevirê Kevin) û Civakîbûn!

Li gorî texmînan serdema paleolîtîk beriya 2 mîlyon salan dest pê kiriye. Yekem civakîbûna mirovan bi klanan dest pê dike. Niha di xwezayê de zindiyên herî lewaz mirov e. Ji ber vê jî ji bo karibe jiyan bike, pêwîstiya xwe bi civakîbûnê dibînin. Di heman demê de şert û mercên demsalan jî dihişt ku mirov bi awayê klan bijî. Li derveyî klanan mirov nikarîbûn bi tenê jiyan kiribûna. Hejmara klanan 20-30 kes bûn. Hafizaya yekem a civakê bi klanan dest pê dike.
Di vê demê de yekem ramana mirov, anîmîzm e, her tiştî bi rih û zindî dîtin e. Ango mirovên vê demê xwe weke parçeyekî xwezayê dibînin. Ji ber vê jî her tiştî zindî dibînin. Bo nimûne kevirekî û darekê weke xwe zindî dibîne. Di navbera xweza û mirov de tû nakokî nîne. Mirov xwezayê pîroz dibîne. Ji ber ku bi xwezayê re jiyan dike, xwe têr dike û xwe diparêz e. Her tiştê xwezayê pîroz dibîne. Ji xwezayê qûtbûn ji bo mirovan mirin e.
Di dawiya vê serdemê de amûrên weke bivir, mertal, kab û çakuç ji kevir tên çêkirin. Di vê serdemê de agir jî tê dîtin û dixin bin kontrola xwe. 50 hezar sal berê agir tê dîtin. Dîtina agir û amûran di ramanên mirovan de pêşketineke mezin çêdike. Ev pêşketin heta roja me tê.



Di vê demê de hilberîn nîne. Mirov tenê tiştên li xwezayê dixwe û jiyan dike. Komkirin û nêçîrvanî pêş dikeve. Bi vî awayî karbeşî dest pê dike. Jin komkirinê, zilam jî nêçîrvanî dike. Di vir de hem jin hem zilam nebatan komdikin û lawirên nêçîra wan dikin, ji bo jiyankirina klanê ye. Weke feraset cûdakariya zayendan nîne. Her tişt xwezayî ye. Yên ku xwe li derveyî klanê bibînin, di nava klanê de zêde şansê wan yê jiyanê nîne. Ango ji derveyî klanê tê hiştin. Jixwe kesên ku derveyî klanê bimînin zêde şansê wan ê jiyanê namîne. Di klanê de her tişt wekhev tê parve kirin. Jiyana klanê li derdora jinê pêş dikeve. Jin ji ber ku zarokan dizê, zarokan mezin dike, nebatan diçîne, lawiran kedî dike, hilberîn dike, komdike, zûryeta klanê berdewam dike, têrkirin û parastina klanê pêktîne, pîroz tê dîtin. Di nava klanê de rola jinê diyarker e. Her çiqasî zilam ji aliyê fîzîkî ve bihêz be jî, lê diyarker nîne. Di jiyana klanê de cûdakarî, hiyerarşî û kedxwarî nîne. Hilberîna zêde pêşneketiye. Li gorî pêwîstiyên xwe berheman kom dikin. Prensîba bingehîn alîkariya hev kirine. Heke ev prensîb nebûna, klanê nikarîbû jiyana xwe berdewam kiribûna. Ev prensîb bingeha pêşketina civakîbûnê ye. Têgiha azadiyê nîne ji ber ku mirov azad jiyan dike. Têgiha adaletê nîne ji ber ku di nava xwe de sîstemeke adil heye, bêmafî nîne. Her tişt hevkar, wekhev û xwezayî ye.

## 9-NASNAMEYA KLANÊ-TOTEMÎZM

Totem hem bîrdoziya klanê, hem jî nasnameya klanê ye. Klan bi ola ku bawer dike tê naskirin. Nasnameya klanê li ser anîmîzm û totemîzm pêşdikeve. Anîmîzm rûhperestî ye. Her tiştî weke xwe dibîne. Cûdabûna kirde-bireserê nîne. Mirov her tiştî zindî dibîne. Zekaya hestyarî pir zêde jî nebe, lê kemek ji zeka analetîk zêdetir e. Zekaya hestyarî mirovahiyê avadike, zekaya analetîk jî pêşketinan çêdike. Sedema bingehîn mirov hê jî ji xwezayê qûtnebûye. Bi xwezayê re di nava hev de jiyan dike. Bi xwezayê re di nava hevgirtinekê de ye. Ramana anîmîzm ji vir derdikeve. Bingeha ol tiştê ku mirov sire wê nizane û tiştê ku jê xwedî dibe. Ji wan bawer dike. Bingeha ol pirsgirekên ku li qada madî peyda dibin derbaskirina wan a qada manewî ye. Her olekî cûda tê wateya ramaneke cûda. Her legerek jî bi olek nû re, tê wateya rêveberiyek nû. Çendîn civak navendî bibe, pêwîstî bi olek navendî derdikeve.

Pêşketina zekaya analetîk bi xwe re tecrûbe çêdike. Tecrûbe û zîndî dîtina xwezayê bi xwe re zanisteke nû pêş dixîne. Ev zanist xwe weke sêhrekê bi nav dike. Mirov dikare sêhrkeriyê weke destpêka zanistê bibîne. Bûyerên xwezayî weke erdhej, volkan û bayê li hemberî jiyana xwe xeter dibînin û dihizirin ku dê çawa wan bixin bin kontrola xwe. Sêhrkarî li vê derê dest pê dike. Herî zêde jin û mirovên kal her roj tiştên nû kifş dikin. Ev bi demê re rê li ber komkirina agahiyan vedike. Bi naskirina nebatan re dermanan çêdikin. Bingeha tibbê di vê demê de hatiye avêtin. Dema ku ev giya nexweşan baş dikin, vê bi sêhrê ve girêdidin. Sêhr wê demê weke diyardeyeke tibbê tê dest girtin. Ji ber ku jiyana mirov xilas dike. Ev jî destpêka ku gerdûn xistine bin kontrolê ye.

Mirov her bûyer û diyardeyên li gerdûnê dişopîne û bi nav dike. Çanda madî û manewî jî bi civakîbûnê teşe digre. Di wê demê de mirov gelek tişt kirine. Lê em hê jî bi temamî nizanin. Dibe ku em encax ji %1 ê bizanibin.

Mirov êdî dest bi naskirina xwezayê dike. Bûyerên ku dê zirarê bide wan dizane. Lawirên zirarê bide û lawirên sûdê bide nasdike û ji hev cûda dike. Pişt re di her klanê de lawirek an jî tiştekî din di xwezayê de pîroz dîtin pêş dikeve. Ev dihêle ew tişt bibe nasnameya klanê. Ji vê re jî totem tê gotin.

Totem, di nava klanê de girêdan û civakîbûnekê bi xwe re tîne. Sembola her klanekê çêdibe. Totem dibe sedema civakîbûn û jiyana wan. Klan, di totemê de yekîtî, rêzgirtin û hezkirinê dibîne. Bo nimûne ji bo ku klan bi şîr û goştê çêlekê xwe têr dike, wê pîroz dibîne û ji çêlekê re îbadetkirin derdikeve holê. Pişt re di serdema neolîtîkê de bi giranî di pêşengtiya jin de perestgeh çêdibin. Çiqas ji totemê re rêzgirtin pêşdikeve, ewqas ji xwe re rêzgirtin pêş dikeve. Totem, manewiyata klanê ango her tiştê klanê ye. Ku jiyana civakê 100 sal be, ji wî 100 Salî 98 sal mirovahî bi teşeya klanê jiyan kiriye. Teşeya klanê teşeya civakê ya herî dem direj e.

## 10-SERDEMA MEZOLÎTÎK (DEMA KEVIRÊ NAVÎN)

B.Z. di navbera 20 – 14 hezar sal de weke serdema mezolîtîk tê binav kirin. Ji vê serdemê re serdema qeşayê ya dawî jî tê gotin. Di vê demê de li Mezopotamyayê demsal ji bo jiyanê gûncav in. Serdema mezolîtîk ji bo serdema neolîtîk derbasbûnê teşkîl dike. Ango şoreşa neolîtîkê li ser kombûna mezolîtîkê pêş dikeve. Di vê serdemê de kedîkirina lawiran dest pê kiriye, nebat hatine nas kirin, tov hatiye dîtin û çandiniyê dest pê kiriye. Yekem car se tê kedî kirin. Dîsa di vê demê de ji kevir, hestî û kevirê heste kêr, bivir, mertal…hwd. amûr hatine çêkirin.

**WANE 4.**

**Pirsên Amadekariyê**

1- Şoreşa neolotîk li ser çi bingehî pêşket?
2- Şêwazê rêvebirina civaka neolotîkê çawa bû?
3- Çima em dibêjin dema şoreşa neolotîk pirsgirêkên civakî nebûn?

## 11-SERDEMA NEOLÎTÎK (DEMA KEVIRÊ NÛ)=ŞOREŞA ÇANDINIYÊ

B.Z. di navbera 12-4 hezar sal de weke Serdema Neolîtîkê tê binavkirin. Heta vê demê mirov bi awayê xwecihî jiyan nedikir. Bi awayê koçerî jiyan dikir. Bi şoreşa Neolitîkê re jiyana gund, ango jiyana xwecihî jî pêş dikeve. Girêdayî demsal û hilberîna çandiniyê jiyaneke bi îstîkrar pêşdikeve. Li gorî agahiyên ku katine dest, şoreşa neolîtîke li Mezopotamyayê, qûntarên Zagros-Torosan ango Hîlala Zêrîn pêşdikeve. Hemû dîroknas û arkeolog di vê de hem fikir in. Lê hê jî li vê erdnîgariyê kolanên arkeolojik didomin. Ji ber vê jî her roj tiştên nû tên dîtin.

Têgiha "Şoreşa Neolîtîkê" cara yek di 1930'an de Gordon Childe bikaraniye. Şoreşa Neolîtîkê di jiyana mirovahî û civakî de diyarker bûye. Nirxên ku di pêşengtiya jinê de hatine afirandin, di heman demê de lawirên hatine kedîkirin û pêşketina amûrên hilberînê pêşketina civakê jî derdixe pêş. Ev jî bi xwe re çanda Xwedewendan diafirîne.

Şoreşa Neolîtîkê li Mezopotamyayê tê jiyan kirin. Ev bi xwe re çanda Tel-Xelef avadike. Serêkaniyê navenda vê çandê ye. Yekem sazîbûn di vê çandê de hatiye jiyankirin. Di civaka Neolîtîk de perestgeh di pêşengtiya jinê de tên avakirin. Ev perestgeh rewişteke (karekter) bawerî û rêzgirtinê qezenc dikin. Ev perestgeh hem weke nexweşxane û hem jî weke cihên agahdarkirinê tên bikar anîn. Di Neolîtîkê de jî jin pêşengtiya jiyanê û civakîbûnê dike. Ji ber vê jî çanda xwedawendan pêş dikeve. Bo nimûne bi navê xwedewendên avê, nebat, genim, stêrk, heyv…hwd. pêşdikevin.

- Xwedavenda av û baranê
- Xwedavenda hîvê
- Xwedavenda genim û çandiniyê
- Xwedawenda stêrkan
- Xwedavenda parastinê
- Xwedavenda exlaq
- Xwedavenda xweşkbûnê
- Xwedavenda nebatan û hwd.

Bi pêşketina şoreşa çandiniyê re jiyana xwecihî pêşketiye û jiyana xwecihî jî bi xwe re şoreşa gundvaniyê pêşxistiye. Hem di hilberînê de hem jî di amûrên hilberînê de pêşketin çêdibe. Êdî di erdan de gêsin tê bikaranîn. Lawirên weke ga di cotkirinê de tên bikaranîn. Hilberîn li Hîlala biberhem ango li Mezopotamyayê tê jiyankirin. Ji vê derê re Hîlala Zêrîn jî tê gotin. Li Riha-Göbeklitepe, Erganî-Çayönü, herêma Bradost şikefta Şanîdar, şikefta Zerzî, Rojhilatê Kurdistanê, şikefta Şîrvan, Qamişlo tepê Arî, di navbera Hasekê û Qamişloyê de Tilberek û hema bêje li hemû Kurdistanê çanda Neolîtîk hatiye jiyankirin.

Li Kurdistanê gelek erdkolan hatine kirin. Di encamê de gelek gundên di dema Neolîtikê de hatine dîtin. Di vê demê de gelek tiştên nû hatine vedîtin. Bo nimûne destar, lalîk-sênî, teker…
Di vê serdemê de civak ji klanê derbasî qebîleyê dibe. Jin malbatê diyar dike. Ji ber ku zarok girêdayî jinê ye. Ji xwe hê jî rola zilam di çêbûna zarokan de nayê zanîn. Xwedawendayî di cewhere xwe de kombûna serkeftinên jinê ye. Di vê serdemê de li ser ziman bandora mêtiyê ji bo vê pirtir e. Di çanda xwedawendayî de taybetmendiya ku çinayetî, hiyerarşî û dewletê biafrîne tine ye. Têkîliyên xwedawendan bi civak û xwezayê re wekheve. Di jinê de zekaya hestyarî behtir pêşketiye, ji bo wê jî watedayîna jiyanê tê de bêhtir kur e. Di serdema Neolîtîkê de xwedawenda yekem stare, piştî çanda star, çanda Ninhûrsag, Înanna, Îştar, Hepat, Astarte, Kîbele, Afrodît… û bi wî awayî berdewam dike. Rêgezên Rêveberiya Jinê ji bo bi rêvebirina civakê; peydakirina pêwîstiyên civakê yên heyberî, parastina civakê û zêdekirina nifşê civakê ye. Li gorî van pêwîstiyan vedîtin ava dikirin.

## VEDÎTINÊN SERDEMA NEOLÎTÎKÊ

B.Z. di derdora 8 hezar salî de sewal hatine kedîkirin. Ji bo xebitîna tiştên çandinî û zadan, ekîpmanên wek; aş, conî, hewan û destên wî hatibûn vedîtin. Maden, raçandekerî, dîzik û xilik hatin vedîtin. Kulîng, haletê cot û amûrên kevirê traştî hatin vedîtin. Serdema Neolîtîkê di heman demê de serdema şoreşa ziman e. Di dawiya vê serdemê de cûdabûna zimanan destpêkiriye û komikên zimanan çêbûne. Koma zimanên Arî-Rayanî di vê serdemê de li Kurdistanê derketiye holê. Serdema Neolîtîkê serdema çandeke payebilind e. Di tevahiya çandinî, pîşe, vegûhastinê, warê hewîn, hûnerê, warê rêveberî, qada olî de pêşketinên weke şoreşê hatine jiyîn.

**B.Z. di derdora 9 hezar salî de zadê çandiniyên ku cara yekem hatine dîtin ev in;**

1.Genim
2. Ceh
3. Şilêl.
4. Xamkêşan.
5. Polike.
6. Nîsk.
7. Nefel
8. Tirî hwd..

**B.Z. di derdora 10 hezar salî de sewalên ku cara yekem hatine kedîkirin ev in;**
Bizin, Mih, Beraz, Kuçik (seh)

## ÇANDA TIL-XELEF;

Ji bo çanda Til-Xelef mirov dikare weke çanda serdema Neolîtîkê jî bi nav bike. Bi taybetî pirtir di serdema dayiksalarî de gihîştiye asta xwe ya herî bilind. Çanda Hûriyan jî li gorî vê çandê pêşketiye. Hûrî jî proto Kurd tenê naskirin. Di encamê de mirov dikare bibêje Çanda Til-Xelef çanda ku piranî Kurdan ava kiriye. Serdema çanda TIL-XELEF û li gor demê li cîhanê belavbûn. Til gotineke bi Erebiye, di zimane Kurdî da tê wateya gir: ku mirov mînakekê bide weke navê Orkêş ku navê wî yê esasî girê mozaye. Van giran bi piranî ji Riha bigre, heta Mûsil, Silêmaniyê, Efrîn, Kamişlo, Kerkuk û her hwd. Piranî li wargeh û deştan hatine ava kirin.

B.Z. di derdora 6 hezar salî de li bakurê Afrîka, Misir, başûrê rûbarê Feratê, kendava Basra û li Anatolyayê xûya dike.
B.Z. di derdora 5 hezar salî de li Kafkasya, bakurê Deryaya Reş, Balkan, Îran, Hindîstan, Pencap, Îndûsê xûya dike.
B.Z. di derdora 4 hezar salî de li Çîn û Ewrûpayê xûya dike.
B.Z. di derdora 3 hezar salî de li parzemîna Emerikayê xûya dike.

## VEDÎTINÊN ÇANDA TIL-XELEF ÊN GIRÎNG

1. Dîzik û Xilik
2. Bivir
3. Haletê cot
4. Rêstina hiriyê
5. Raçandekerî
6. Hêrandin
7.Tekelek
8. Mîmariya Gund û Xaniyan
9. Ji kevirên sifirê çêkirina aletên nîv madenî
10. Weke nîşane bikaranîna stêrkan
11.BîrdoziyaXwedawendî



## PÊKHATINA RÛH- ZÎHNIYETÊ

Pêkhatina qalibên ramanî destpêkir.
Zanyarîbûn
Birêvebirin
Pêşketina hişmendiya civakbûyînê
Têgeha xweda
Xwedavend- Jin
Şamanîzm – Mêr
Efsûnkarî – Jin
Rengê reveberî, çanda reveberî bi temamî daykanî ye. Ev çanda daykaniyê heta beriya zayînê 4 hezar salî didome. Di çanda serdema dayîksalarî de rêgezên bi revebirina civakê;
1) pêkanîna pêwîstiya civakê yên jiyanî
2) parastina civakê.
3) zedekirina nifşê xwe.
**NÎŞE:** Di pişt çanda Til-Xelefê re dû çandên din jî di dû qonaxan hatin jiyîn.

## 2-) ÇANDA EL- OBEYD (B.Z. 4200-3200)

Ev çand li derdora herêma bajêrê Erîdû û Ûrê pêşketiye. Bi bandor û kêmasiyên çanda Til-Xelefê pêşketiye. Hîmên bajêr û bajarokan li vir tê avêtin. Mirov dikare bêje bi destpêka avabûna Sûmeran re çêbûye. Di çanda wan de herî zêde bandora baviksalarî heye. Çendîn, bi granî bandora baviksalarî hebe jî lê xwe bi çanda Til-Xelef xwedî dike.

## 3-QANAXA ÇANDA ÛRÛK (B.Z. 3500-3000)

Derketina vê çandê ji bajêrê Ûrûk dest pê dike. Li ser dewlemendî û kêmasiyên çanda Til-Xelef û çanda El Obeydê pêş dikeve û xwe xûrt dike. Di vê serdemê de xûrtbûn û bihezbûna bajêr û dewletbûyînê pêş dikeve. Ev serdem di warê çawaniyê de xwe digihîjîne asteke jortir.

## BAJAROKÊN DESTPÊKÊ KU AVABÛNE EV IN:

**1-Di Kurdistana Rojava de:**
Orkêş (Girê Moza), Serêkaniyê.
**2-Di Kurdistana Bakur de**
1.Çayönü Erxanî 2. Oylûm Höyük 3. Titriş
**3-Di Kurdistana Başûr de:**
Jarmo Tepêgewrê (Gırgewre- Silêmanî)
**3-Di Rojhilata Kurdistana Başûr de (nêzê Basrayê):**
Ganj Dara û Giyan (hêjmara nifûsa wan di navbera 1000-1500 de ye.)



# UNÎTEYA 2.

**WENE 5.**

**DESTPÊKA DERKETINA HIYARERŞÎK**

**WANE 6.**

**PÊŞKETINA BAJAR Û DEWLETÊ**

**TÊKILIYA KURD Û SÛMERAN**

**WANE 7.**

**A -DI DEMA ŞARISTANIYÊ DE KURD**

**WANE 8.**

**DI DÎROKÊ DE NASÎNA KURDAN**

**1-Hûrî**

**2-Gûtî**

**3-Lûlû (Lûlûbûn)**

**4-QASÎTÎ ( GELÊN KARKER)**

**5-MÎTANÎ (1800 – 1250 )**

**6-NAÎRÎ (1302 – 900 )**

**7-ÛRARTÛ ( 900 – 606) KHALDÎ (XALDÎ)**

**WANE 9.**

**8-MED**

**9-DESTANA KAWAYÊ HÊSINKAR**

**10-OLA ZERDEŞT**

**WANE 10**

**11-DAMEZIRANDIN Û TÊKÇÛNA ÎMPARATORIYA PERSAN (B.Z. 549-330)**

**WANE 11.**

**TÊKILIYÊN ERMENÎ, SÛRYANÎ, YAHÛDÎ Û KURDAN**

**WANE 12.**

**MANÎZM;**

**KOMAGENE**

**WANE 13.**

**ÎSLAMIYET Û KURD**

**DI DEMA ÎSLAMÊ DE XANEDANIYÊN KURDAN**

**WANE 14.**

**XANEDANIYÊN KU HATINE AVAKIRIN**

**WANE 15.**

**1-DAMEZRANDINA DEWLETA MERWANIYAN**

**2-Lewazbûn û Hilweşîna Dewleta Merwanî**

**WANE 16.**

**DI SERDEMA HARZEM Û MOXOLAN DE KURD**

**WANE 17.**

**DI SERDEMA SEFAWÎ Û OSMANIYAN DE TÊKILIYÊN KURDAN (1501-1737)**

**WANE 18.**

**1- Di Pêvajoya Osmaniyan de Rewşa Xweser ya Mîrîtiyên Kurd**

**JI SEDSALA 15'AN VE TÊKILIYA DI NAVBERA KURD Û ÎRANIYAN DE**

**WANE 19.**

**PEYMANA QESRA ŞÊRÎN Û PARVEKIRINA KURDISTANÊ**


**DI SEDSALA 19'AN DE REWŞA KURDISTANÊ Û SERHILDANÊN KURDAN**

WANE 5.

**Pirsên Amadekariyê**

1- Sê taybetmendiyên hiyareşiyê û sedemên derketina wê vebêje.?
2- Çavkaniya ziman û çanda Aryen ji kû tê?
3- Çima em dibêjin ziman û çanda Aryen çavkaniya hemû ziman û çanda ne?

## DESTPÊKA DERKETINA HIYARERŞÎK



B.Z. di 4000-2500'an de derbasbûna hiyarerşiyê çêbûye. Di serdema Neolîtîkê de civak li dora jina dayik mezin dibe û nasnameya xwe xûrt dike. Di serdema Neolîtîkê de çandinî û lawir kedîkirin pêşketîbûn, vê jî hilberîna zêde pêşxistibû. Ya girîngtir jin-dayik pergala malbatiyê pêş de dibe. Di vê pergalê de xwarin, lixwekirin, alav û amûrên din tîne cem hevdû. Jin bi çavdêrî û rola xwe di sihir-efsûnkariyê de zana dibe. Li gorî belgeyên di dest de, pergaleke berfireh a olî ya xwedawendan, di ziman de nîşaneyên mêbûnê, verotin û niqrandinên li ser asaran, hêza jin-dayikê pir eşkere nîşan didin. Bi awayekî xwezayî, piraniya mêran dûrî vê pergalê ne. Jin-dayik kesên bêkêr ji derveyî sîstema xwe dibîne û piranî zilamên temen mezin ji derveyî vê pergalê dimînin. Ev rê li ber hesûdiya zilamên temen mezin vedike. Di destpêkê de ev nakokiya biçûk her ku diçe mezin dibe. Bi pêşketina nêçîrê re hêza zilam a şer derdikeve pêş û bi vê re zanebûna zilam jî zêde dibe. zilamên li derve têne hîştin jî li ser vî hîmî, ber bi bîrdoziyeke serwer a mêran ve diçin. Bi şamanîzmê zilam dikare pergaleke dijber a malbatê ava bike.



Pîremêrên bi ezmûn ên li der ve mane û şaman li hev dikin. Ev hevgirtina her dû aliyan pêşketineke neyînî ya girîng e. Hin xortan jî digirin nava xwe û bi serweriya bîrdozî, serweriyê li ser wan dikin. Bi vî awayî di nav komê de rewşa xwe bi hêz dikin. Hêzbûna zilam her ku diçe bi qîmet dibe. Hem nêçîrê dike, hem jî klanê li dijî xeterên ji der ve werin diparêze. Li dijî çanda jin-dayikê, serweriya çandeke din, dest pê dike, pêş dikeve. Ev pêşketina hiyarerşî û otorîtê beriya civaka bi çîn, di dîrokê de destpêka qonax û werçerxeke nû ya neyîniye. Naverok û rengê xwe ji çanda jin-dayikê cûda ye.

Di çanda jin-dayikê de bi piranî berhevkirina gihayayan û paşê çandinî, xebateke hewceyî bi şer nabîne ye. Lê nêçîr ku bi piranî bi destê zilaman hatiye kirin, çandeke otorîter û dijwar a şer e. Di encamê de otorîteya bavikanî rehên xwe berdidin. ***Di encama zilamê xwedî tecrûbe – asker- rahip hatina wan a gelhev destpêkirina revebiriyê ji destê jinê derxistinê dest pê dike.*** Şerê di navbera zilam û jinê de dest pê dike. Di destana Gilgamiş de şerê Înanna û Enkî , şerê di navbera zilam û jinê de ye. Daxwaza Înanna ya 104 **me**yan destkeftiyên jinê yên serdema dayîksalarî ne. Serdema Neolîtîkê bi xwe re dû pirsgirêk anîn.  Çanda El Obeyd û Çanda bajarvaniya Ûrûkê ye.

## 13-ÇAND Û ZIMANÊ ARYEN:



Wateya peyva “Aryen” ev e: Kesên xwedî zevî û xwedî erd. Di Kurdî de “Arî” di wateya ax, cih û zevî de tê bikaranîn. Aryenî yên ku destpêkê Hîlala Zêrîn ji cotkariyê re vekirine. Mirov dikare wan weke afirînerên cotkariyê bi nav bike. Di vê pêşketinê de, av, ba, hewa, erdên bi bereket, cûreyên heywanan û nebatên cûrbecûr rol lîstine. Zeviyên Hîlala Zêrîn ji bo çandiniyê gelekî baş bûn. Li vir zeytûn, bindeq, çilo, hevrist, rez, qût û zad baş digihiştin. Dîsa gelek heywanên tên kedîkirin di serî de mîna mihên kovî, bizin, dewar, beraz, kuçik û pisîk li vê derê kom bi kom digerin. Li banî û zozanên çiyê daristanên mezin hene. Çar demsal bi temamî têne dîtin. Baran mîna ku bi rêkupêk av bide dibare. Kevî û devên gelek çem û rûbaran ji bo avakirinê xweş bûn.

Bi vî awayî zimanekî berfireh “Koma Zimanê Aryen” derkete holê. Ev koma ziman weke çand ji Hindistanê heta peravên Ewrûpayê belav bûye.Weke dibêjin û bawerdikin ku koka koma zimanê Aryen ji hînd-ewrûpaye, neraste û ev nêrîneke desthilatdar e ya înkarê ye. Hindistan û herêma (Bakurê Derya Reş, kepirên Rûsya, zozanên Îranê) di navbera herdûyan re derbas dibe. Koka wê ji devera kakil a Kevana Bi Bereket e. (Hîlala Bi Bereket). Hem analîza gotinê (Aryen) ya etîmolojîk, hem jî têkiliya rengê gotinên bingehîn ên etnîk ên di nava tevahiya komên ziman ên Hind-Ewrûpa de têne bikaranîn vê rastiyê piştrast dikin. Ya hîna girîngtir ew e ku devera em behsa wê dikin ji bo çandê herêma kakil û dendike. Ji lewra bi awayekî pir xwezayî pêkhatina ziman û gotinan jî divê li vir çêbibe. Avahiyên çandî yên etnîk ên hîna jî hene û delîlên dîrokî yên din vê rastiyê bi zêdeyî îspat dikin.

## 14-ÇAND Û ZIMANÊ SEMÎTÎK:

Semîtîk weke qebîleyên şivantî pêş dikevin. Li derdora kendavê pêş dikeve, di navbera 6000 û 4000 an de li vê derê daristan û şînkayî pêşketiye ev rewşa erdnîgarî ji bo jiyankirina mirovan dest dide. Ev çand bi giranî li Erebistanê pêş dikeve. Li gorî agahiyên ku bi dest ketine ev erdnîgarî xwedî daristanên dewlemendin. Ji ber ji cotkariyê re negûncav e û zêdeyî li vir lawir peyda dibin, şivantî pêş dikeve. Di nav semîtîkan de bavkanî (baviksalarî) serwer e. Hin qebîleyên semîtîkan ji çanda Aryenan bandor dibin û dest bi cotkariyê dikin. Ev ziman ji hêla civaka Ereb û Yahûdiyan ve tê bi kar anîn.

### *ÇAND Û ZIMANÊ YAQÛTÎSTAN:*

Em dikarin bibêjin ku çîniyên din ên berê bi tevahî di nava van herdû komên çand û ziman ên sereke de heliyane. Tenê wexta heman serdema qeşayî bi dawî bû, piştî wê li keviyên başûrê Sibîryayê (Yaqûtîstan û hwd.) koma çand û zimanekî sêyemîn çêbû. Ev çanda ku neh hezar sal berî niha ber bi başûr ve belav bû, heya ku welatê wê yê esasî Çîn be. Mirov dikare bibêje; ji vê çanda ku seriyê wê yê başûr digihîje heta Fîniyan di serî de Tirk, Moxol, Tatar, Koreyî, Viyetnamî û Japonî weke nifşê sêyemîn ê Bakur çêbûn. Li parzemîna Emerîkayê çanda bi koka xwe ya Çermesoran jî di ser Tengava Beringê re di encama belavbûna heman demê de pêk hatiye û di vî warî de em xwedî delîlên xûrt ên arkeolojîk, etîmolojîk û etnolojîk in. Em Eskîmoyan jî dikarin bixin nava vê komê. Gelek çandên Efrîkayê yên hîn hene, tevî ku taybetmendiyên xwe yên hezaran salî diparêzin jî bandorên xûrt ên koma Semîtîk li ser wan hene. Nemaze yên di nav koma zimanê Sahilî de cih digirin welê ne. Di nava kurahiya daristan, çiya û çolan de jî gengaz e mirov li klanên weke berî mîlyonan salan dijîn rast bê.


## WANE 6.

### Pirsên Amadekariyê

1- 5 taybetmendiyên dewletê û çanda bajarvaniya dewletê şîrove bike.?
2- Bandora çand û zimanê kurdan a li ser civaka sûmerî çi ne?
*3*- Wateya gotina raperînê çi ye?

## PÊŞKETINA BAJAR Û DEWLETÊ

Li gorî lêkolînên heyî bingeha bajarvaniyê ji mezapotamya jorîn derbazî mezepotamya jêrîn dibe. Civakbûyîna destpêkê li derdora perestgehan dest pê dike. Perestgeha yekem jî li Mezapotamya jor li gundê Göbeklî tepe (girê bizik) ava dibe. Destpêka bajarvaniyê li ser bingeha pêdiviyên pêkanîna gundan çêdibe. Perestgeh di heman demê de cihê bazara gundan e jî. Gûhartinên tiştan li ve derê tê kirin. Li derdora perestgehan hûner, wêje, hizrandinek hevbeş û felsefe pêşdikeve. Ev jî jiyanek hevbeş ava dike. Bazar, bazirganan avadike, bazirganî jî bajarvanî avakiriye. Bazara yekem û bazirganên yekem li perestgeha Göbeklî tepe pêşdikeve. Lê ne bazara wê demê li ser bingehê bazirganiyê ye, li ser bingehê taqasê ye. Taqes sîstema bazirganî ya dema civaka Neolîtîkê ye. Şêwazê gûhertina pêwîstiyan ya bi hev dû ye. Cihê tiştan bi hev gûhertinê ye. Lê bajarvaniya mezin li Mezepotamya jêrîn dest pêdike. Bajarê mezin ê yekem bajarê Ûrûk B.Z. 3500'an li Mezepotamya Jêrîn ji aliyê Sûmeran ve tê avakirin. Sûmerî hem Semîtîk hem jî Aryen in. Ev bajar li ser esasê çanda El Obeyd tên avakirin. Çanda El Obeyd jî li ser esasê çanda Til-Xelef tê avakirin. Piştî bajarê Ûrûkê bajarên weke Ûr, Kîş, Erîdû, Nîppûr û Lagaş hatin avakirin. Sûmerî di van bajaran de bi riya rahîban perestgehên bi navê **zîgûrat** avadikin. Ev zîgûrat çar kat bûn. Kata herî jor cihê xwedayan bû. Kata navîn cihê rahîban bû. Qata dûyem cihê bazirganan. Kata jêrîn jî cihê koleyan bûye. Ev zîgûrat pergala bingeha dewletbûyînê ava dikin. Ev bajar hêdî hêdî dibin dewlet. Di destpêkê de van dewletên bajar, rahîp birêvedibin. Pişt re Xanedan rêveberiya vê dikin. Ew xwe weke qiral-xweda didin diyar kirin. Li gorî dîroka bi nêrîna desthilatdar hatî nivîsandin dêrokê ji sûmeran destpêkiriye. Û Weke çemê bingehîn bi milên din ve belavî hemû cîhanê dibe. Bi vî awayî dîroka 7 milyon sal ya civaka xwezayî tê înkarkirin. Ev jî bi navê dîrokê derweke mezine û rastiyan berovajî dike. Em ê di mijarên pit vê re li ser vê şaşîtiya mezin rastin.






## TÊKILIYA KURD Û SÛMERAN

Ji bo zelalkirina dîroka Kurdistanê gîrîng e, Şaristaniya Sûmeran ku li başûrê Mezopotamyayê pêşket, zarokê çanda Neolîtîk a bakurê Mezopotamya yê naskirin şert e. Rûbarê Dîcle û Feradê her sal di demsala biharê de ji çiyayên Kurdistana bakur herikîne û bereket bi xwe re birine Mezopotamyaya başûr. Dewlemendiya rûbarên Dîcle û Ferad, amûrên hilberînan û pêkhatina zîhniyeta manewî ya çanda Neolîtîkê şaristaniya Sûmeran a maddî

çêkiriye.
Ev Pêşengî ji çiyayên Toros û Zagrosan ên ku Dîcle û Ferad jê dizên rasterast derbasî kendava Basrayê dibe. Ango pêşengî ji erdîngariya Hîlala Zêrîn a Kurdistanê derbasî xwediyê van bajêrên navdar; Ûr, Ûrûk, Lagaş, Erîdû, Nîpûr a welatê Sûmeran dibe. Ev pêvajoya civakbûyînê ji bakurê Kurdistanê derbasî başûrê Mezopotamyayê dibe û ev di dîrokê de weke "berbanga dîrokê" tê dîtin.
Beriya her tiştî di dîrokê de weke belgeya nivîskî ya yekemîn destana Gilgamêş tê dîtin. Di vê belgeyê de cih girtina Sûmer û Kurdan a bi hev re ne rasthatiniyeke. Têkîliyên li vê derê tên jiyankirin, têkiliyên bi hev re meşîna çanda Neolîtîk û çanda şaristaniya Sûmeran derdixe holê. Ji ber bihêzbûna çanda Neolîtîk ku li derûdora kurdan hatiye avakirin. Lewre sûmerî neçarin bi kurdan re di nava dan û standinê de bin.
Şerê di navbera Înanna û xwedaqiralan de şerê di navbera sîstema dayîkselarî û bavikselarî de ye.




Di destana Gilgamiş de Hûmbaba nûneriya zilamê Kurd dike. Ev dîrok jî bi me dide zanîn ku, beriya şaristaniyê di welatê Sûmeran de wextê ku mirov di holikan de jiyan dikir, di welatê Hûriyan de mirov di jiyeneke gelek pêşketî de bûye. Di heman serdemê de li welatê Hûriyan çandinî, gundîtî, ajokarî, sewal xwedîkirin, bazirganî gelek pêşketî bûye.
B.Z. di navbera 6 û 4 hezar salî de bi saya çanda Til-Xelefê sazîbûna civakê mayinde dibe. Pêkhatina civakên etnîkî jî destpêdike. Nasnameya Kurdan a etnîkî jî, di vê serdemê de derdikeve pêş. Vedîtinên esasî yên şaristaniyê yên vê serdemê bingeha şaristaniya dewletê ya ku bi navê Sûmeran derdikeve ser dikê çêdibe. Sûmer zêdebûnekê li ser çanda Til-Xelefê çênake. Bi temamî bi erdîngariya Kurdistanê xwedî dibe. Çanda Erdîngariya Kurdistanê ye. Ev çand di encamê keda kurdan de avadibe. Ango em dikarin bêjin ku ew ked û hilberîna proto kurdan e.
Dayika ku şaristaniya Sûmer avadike, şoreşa Neolîtîk a li Kurdistanê ye. Têkiliya di navbera Hûrî û Sûmeran de mirov dikare di wêje, ziman, hûner û gelek qadan de gelek rêçên wê bibîne. Di vî warî de Rêberê Gelê Kurd birêz Ocalan dibêje; "Mirov wextê ku li ziman û çanda Sûmeran dinêhêre mirov dibîne ku tevahiya bingeha xwe ya teknîk ji bakurê Mezopotamyayê, ji afîrenêriya serdema Neolîtîkê, ji Horiyan girtine."

| **Sûmerî** | **Kurdî** | **Sûmerî** | **Kurdî** | **Sûmerî** | **Kurdî** | **Sûmerî** | **Kurdî** |
|---|---|---|---|---|---|---|---|
| Tî | Tîr | Gûr | Gor | Go,gûd | Ga | Dar | Dar |
| Tî | Tîr,Tîre | Gal | Kal | Şû | Şû | Bar | Par |
| Kur | Kur,Ko,Koh,Gır | Av | Av | Eşar | Veşar | Kîsik | Qizik,keçîk |
| Kur | Kur | Mê | Mê | Tarî | Tarî | Da | Dest |

| | | | |
|---|---|---|---|
| Mûş | Mêş | Kake | Kak,Kek |

Ji bo Sûmeran bi israr em bêjin anerebin an kurdin şaş e. Mirov bibêje ji herdû gelan pêk hatiye, wê hîn zêde rasteqîn be. Mirov koka Sûmeran bigihîjîne koka Aryenan-Horîiyan û koka Samiyan jî bigihîne Amorîtan wê hîn nêzikayeke rast be.
Girîngiyeke têkiliyên di navbera Sûmer û Kurdan de yek jî şer û pevçûnên di navbera şaristaniya navêndî ya koledar û êlên (eşîr) azad de ye. Ev şer û pevçûn bingeha têkoşînên azad û demokrasiyê ne. Bingeha şer û pevçûnên Rojhilat û Rojava di vir de ye.

Demekê di avakirina çand û şaristaniya nû de rola dayik û bapîrên Kurdan gelekî girîng e. Civakbûyîna ku li Kurdistanê ava dibe di serî de tê welatê Sûmeran li wir bi şoreşa bajarvanî û ku weke şaristaniya dewleta koledar şekil digre û dîsa vedigere Kurdistanê û dû re jî li cîhanê bela dibe. Hilberînên dema sûmeran ev ev in. Em dikarin wan wiha xal bi xal binivîsînin.



1.Vedîtina nivîsa mîxî.
2.Bikaranîna bîrkarî û salnameyê.
3.Mîtolojî û Teolojî.
4.Çêbûna çînan û bîrdoziya dewletê
5. Zagon û Hûqûqa nivîskî.
6. Bajarvanî, perestgeh, bazirganî û zanaatkarî
7. Mûlkiyeta taybet.
8.Malbat û Xanedanî.
9.Wêjeya Nivîskî, Destan.
10.Çêbûna koloniyan û Emperyalîzmê.

## TÊGEHA RAPERÎN Û PÊŞKETINA WÊ

Gotina serhildanê ya di roja me de bi wateyeke fereh tê bikaranîn. Çalekiya ku li hemberî tiştên kes, kom an jî civak jê nerazî be, di bin rêbazên cuda, cuda de dijbertî kirine. Mirov dikare vê di tevahî têkîliyên jiyanê de bide diyarkirin. Ji ne erêkirina kesan bigre, heta ne erêkirina desthilatdariyê. Lê em ê ji destpêkirina çînan bigrin dest. Raperîn di heman demê de giredayî zanebûna wê demê ne jî. Raperîn li hemberî derketina tiştekî ku ji hêla kesan an jî ji hêla civakan ve nayê pejirandine.
Têkoşîna mirov a yekemîn têkoşîna ji bo xweparastinê û jiyankirinê ye. Mirov dikare yekbûna mirov a pişt wê re weke hevgirtin û raperîneke nepejirandina sîstema nû ya bavikselarî pênase bike. Têkoşîna li beramberî çînparêzî û zordariyê ye.
Mirov di serdemên Qilan, qebîle û êl (eşîr) an de raperînan nabîne. Ji ber ku hê çînbûyîn çênebûye. Têkiliya hilberînên ku tê çêkirin, ji pêwîstiyan zêdetir nîne. Dîsa li pêşberî derve, xwe parastin di heman demê de bi yekîtiya navxweyî ve ava dibe. Ji vê girîngtir ji bo hilberîneke baş pêwîste civak bi hevdû re tevbigere. Ji vê jî tê famkirin ku civakeke di navbera wan de cûdabûyîn tûne be, li wê derê bingeha raperînan jî çênabe.

Raperînan bi destpêkirina çînan re dest pêkiriye. Zêdebûna hîlberînê bûye sedem ku çavberdana hilberînê zêde çêbibe. Di destekî de kombûna hilberînê bi xwe re pergala serdestî û koledariyê aniye. Çinayetiyê jî bi xwe re di nav koman û kesan de newekheviyek avakiriye. Di encamê de newekhevî nepejrandin di navbera kesan û koman de derketiye. Ev jî bûye sedem ku raperîn bêne çêkirin. Raperîn di serî de hilberîn, lê jidervayî hilberînê weke cûdabûna mezheban û hwd, jî bûne sedemên raperînan. Koletî di serî de li ser civakên bi çandîniyê jiyana xwe di domînin de bandora xwe kiriye, di civakên koçber de çîneyatî kêmtir e. Bi pêşketinên bajaran re, di navbera bajar û qebîleyan de pevçûnên dijwar çebûne. Ji ber ku bajaran pirtir xwestine hilberînên zêde bi dest bixînin, ji bo vê çevberdana hilberînên di destê Qebîleyan de çêbûye. Qebîleyan jî li hemberî van destwerdanan serhildan pêşxistine. Li berxwedane Kurtiyan (Gelên Çiyayî) ji bo rewşa raperînan mînakeke herî bibandor in. Koledarî bi tênê xwe bi zorê li ser koleyan nade pejirandin, di heman demê de xwe bi hinek formên bîrdozî re dide rewa kirin; ev ji bo ku zêde li dijberî wan raperîn pêşnekevin. Zîgûratên Sûmeran bi piranî ev erk girtibûn ser xwe. Bi rêka zîgûratan koletî di hizrê mirovan de dihat bicih kirin. Ev jî rêbazeke pêşî lêgirtina rapêrînan bû.

Raperînên li hemberî koledaran bi xwe re di hilberînê de gûhartin anîn. Raperînên li dijberî koladaran jî bi xwe re pergala feodalî anîn. Koleyên din bûbûn serf (kesên ku li ba kesê ku kar dike mafê wî yê bidestxistina hinek erdan jî heye). Di pergala koledarî de kole bêdil kar dikir, hilberîn her ku diçû kêmtir dibû, lê di serfbûyînê de ji ber ku kêmek şirîkbûna karker ji hilberînê re hebû, hilberîn pirtir dihate çêkirin. Dema ku koleyan ev rewşa didîtin ji bo ku ber bi serfbûyînê ve biçin li gelek cihan li hemberî koledaran, serhildan çêdikirin. Pirsgirêka ku koleyan li hemberî koledaran radikirin, di heman demê de ji bo serfan jî derbas dibû. Di bingeha serhildanan de lêgerîn bêadalet û newekhevî heye.

Her çendî serdestî û desthilatdarî reng bgûhêre jî, lê di bingeha tevahiyan de nebûna bêedaletê û newekhevî heye. Çendîn kapîtalîzim pêş bikeve jî, lê dîsa jî newekhevî û bê adaletbûyîn xwe berdewam dike. Ev rewş jî dihele herdem li pêşberî desthilatdariyê serhildan pêşbikevin. Di serî de serhildan çendîn bê rêxisitin û jixweber bin jî, lê her ku dem diçê rewşa serhildanan jî li gorî demê gûhartinan çêdike. Ev rewş ji bo serhildanên Kurdan jî derbas dibe. Çendîn di destpêkê de weke dijbertiyeke bêrêxistin be jî, lê her ku diçe xwe dizîvirîne formeke xwedî pergal û bîrdozîyeke hevbeş. Serhildanên karkeran li hemberî bûrjûvaziyan mînakeke ji vê yek re. Her çendîn di destpêkê de hinek raperînan ji xweber jî destpêkirin, lê bi pêşketina formên civakî re her çû xwe pirtir birêxistin kirin û bûn xwedî bernameyekê. Dema ku nepejirandin pir bûn û di bin hizrekê de xwe bi rêxistinkirin, serhildanên xwedî pergal hatin pêşxistin.

Encamên raperînên di civaka çînî de ji nepejirandina rewşa ku tê de ne tê. Nepejirandina kes û civakên hatine çewsandin ku li hemberî dagirkeriyê derdikevin e. Ev ji destpêkê heta roja me hatiye û bi şêwazên cûda, cûda pêşketiye. Ev serhildan di roja me de jî bingeha tevgerên sosyalîst (civakî) avakiriye. Raperînên destpêkê xwezayî çêbûn, lê di roja me de zîvirîn şêwazekî zanebûnê. Di roja me de serhildanên kedkaran, civakên bindest, her çendîn xwe weke mezheban jî bi nav bikin, lê sedemên serhildanan bi tevahî yek in. Bingeha hemûyan ji newekhevî, bê-edaletî û cûdabûyîna madî û neteweyî tê.



## Di Dema Sûmeran De Kurdan Jî Elfabeya Sûmerî Ya Mîxî Bikar Anîne.

***Di dema sûmeran de kurdan weke zimanê nivîsê elfabeya mîxî bikar nanîne. Ev elfaba ji 36 tîpan pêk tê. Kurdan 6 tîpên din jî lê zêde kirine û li gorî xwe bikaranîne. Ev elfabe ji çepê ber bi rastê ve tê nivîsandin.***

## WANE 7.

**Pirsên Amadekariyê**

1- ***Di dîrokê de çend nav li Kurdan hatine kirin?***
2- ***Erdnîgariya Kurdistanê ji kû heya kû derê ye.***
3- ***Wateya temolojiya navê çemên Dîcle û Feratê çi ye?***

## A -DI DEMA ŞARISTANIYÊ DE KURD

### *Wateya navê Kurd*

Ji bo civaka Kurd navên cûr bi cûr hatine bikaranîn. Gundwana, Horît, Hûrî, Gûtî, Kasîtî, Kur, Kurî, Kurtî, Kardonyaş, Kardaka û Kardoxî hinek ji van navan e. Di bingeha navê Kurdistanê de peyva "kur" cih digire. Di zimanê Sûmeriyan de "kur" di wateya çiyê de tê bikaranîn. Pêveka "tî" girêdanê diyar dike. Bi vî awayî peyva "kurtî" tê wateya gelên çiyayî. Dîsa civaka Lûvî yek ji civakên cîranên Kurdan bûn, ji bo civaka Kurd peyva "Gundwana" bikaranîne. Ev jî di wateya "welatê gundan" de hatiye bikaranîn. Asûriyan jî navê "Naîrî" bikaranîne. Ango gelê "rûbaran"

### *KURDISTAN*

Kurdistan perçeyek ji erdîngariya Rojhilata Navîn e, mezinbûna wê derdora 550.000 kîlometre ya çargoşe ye. Çawa ku navê Ereban bi Îslamiyetê re derketiye, navê Kurd û Kurdistanê cara yekem bi Îslamiyetê re hatiye ziman. Selçûkiyan ji wê erdingariya ku Kurd lê jiyan dikin re gotina Kurdistan bikaranîne. Kesê navdar ê navê Kurdistanê bikaraniye. Marco Polo 1294 e.

Kurdistan; di 1639'an de bi peymana Kasrî Şîrîn bûye dû perçe, di 1923'an de bi peymana Lozanê bûye çar perçe. Çar dewletên ku li Kurdistanê deshilatdarin ev in; Tirkiye,Sûrya,Irak û Îranê. Ji ber Kurdistan di cihekî gelek stratejîk de cih digre. Di Sêgoşê sê parzemînan de cih digre. Ev parzemîn Asya, Afrîka û Awrûpa ne. Cihê ku her sê parzemîn digehêjin hev Kurdistan e. Ji ber cihê wê yê stratejîk kê xwestibe li van her sê parzemînan bihêz bibe û pêşkeve di serî de xwestiye ku Kurdistanê bixe bin destên xwe an jî piştgiriya Kurdistaniyan bigire. Loma hergav bûye qada şer û pevçûnan. Ev rewşa wê ya taybet îro jî negûheriye.

### ETÎMOLOJIYA NAVÊ RÛBARÊ DÎCLE YÊ:

Di zimanê Kurdî de ji peyva "tîj" û "tîr" pêk tê. Ji ber ku rûbara Dîcleyê gelek tîj diherike weke tîra ku ji kevanê derkeve diçe û tevahiya bêndavan hildiweşîne.

Ji gûherîna peyva Tîj- Dij- Dîjle- Dîcle pêkhatiye.

Di lîteratûra cîhanê de navê Dîcle wek "Tîgrîs" tê nasîn. Ev nav ji Yewnanan derbasî lîteratûra cîhanê bûye. Di alfabeya Yewnanan de tîpa "j" tûneye dewsa wê de "g" cîh digre.

Her wek : Tîj- Tîr= Tîg-Tîr- Tîgrîs pêkhatiye.

### NAVÊ RÛBARÊ FERADÊ


Navê rûbarê Feradê di lîteratûra rojava ango Ewrûpa de Eûphrates tê zanîn. Ji zimanê Yewnanan derbasî lîteratûra rojava ango Ewrûpa bûye.

Navê Feradê ji peyvên zimanê Kurdî "Fere-Re" û "Hat" pêktê.

Di zimanê Kurdî de wextê kon av lê tê kirin li gor şiklê wê tê kirin. Ji ber ku ava Feradê fire diherike jê re gotine “fire-tê” an “fire-hat” Ferehat. Niha di zimanê kurdî de firat têgotin.
**Ferehat- Eûphrate- Ferad-firat.**

## *ERDNÎGARIYA KURDISTANÊ YA KU JI HÊLA DERDORAN VE TÊ PEJIRANDIN EV E.*

Di bakur de ji herêma Sêwasê ji ava sor dest pê dike, bajêrên Erzingan û Erzerûm jî tê de heta bajêrê Qersê diçe.
Ji bakurê rojava de Koçgirî, Sûşehrî, *Îmranî*, Hafik, Zara, Divrîğî, Kangal û ji Koçhisarê dighêje Siwasê. Li herêma Kayseriyê ji Sarîzê dest pê dike Mereş, Dîlok, Kilîs, Efrîn û Kobanî jî tê de heta Çiyayê Kurdan diçe. Ji wê derê jî heta bakurê rojavayê Helebê diçe.
Ji Rihayê dest pê dike li Cizîrê dighêje Dîcle yê . Sîncar, Mûsûl, Hewlêr, Silêmaniyê, Kerkuk, Xanekînê Mendelidenê û herêma Loristanê jî di nav xwe de dihewîne. Li herêma Îranê, ji Makoyê dest pê dike, rojavayê gola Ûrmiyê, herêma Soma û Bradost jî tê de; bi hewandina Mergever, Mahabad, Sine, Bokan, Sakiz, Bane, Serdeşt, Mêrîwan, Hewreman, Kirmanşah û Kasrişîrîn derbasî bakurê Kendava Basrayê dibe û di dawiya herêma Lor de bi dawî dibe.



## WANE 8.

### Pirsên Amadekariyê

1- Kurdên Hûrî xwedî dîrokeke çawan e?
2- Kurdên Mîtanî bi çî xwe navdar in?
3- Navê xwedawend û xwedayekî Hûriyan bêjin?

## DI DÎROKÊ DE NASÎNA KURDAN

### 1-Hûrî

Pêşiyên Kurdan di dîrokê de cara destpêkê bi navê Hûrî B.Z. di 6000'an de derketîne holê. Di destpêka dîrokê de ku piştî qebîleyên ku weke aşîret hatine bi nav kirin Hûrî ne. Lê belê herî zêdetir B.Z. 3000 behsa Hûriyan tê kirin. Hûrî ji ber çanda çandiniyê, bandoreke gelekî xûrt li ser jiyana herêmê dikin. Li gorî lêkolînên dîrokî Hûriyan cara destpêkê li derûdora Mêrdinê jiyan kirine. B.Z. di 2500'an û pê de jî belavî herêmên berfireh yên weke bakurê Sûriye, Kîzzîwatna (çûqûrova), deştên Amîkê û navênda Qiraliyeta Hîtîta Kevin Anatoliyê dibin. Qiralê Hûriyan ê destpêkê navê wî Alî-Şan e. Hûriyan bi Lûwî, Îyonî, Pers û Hîtîtiyan re danûstandin çêkirine. Hûrî, weke perwerdevanên hespan hatine pejirandin û cara yekem erebeyên cengê bi karanîne. Bajarên girîng yên Hûriyan; Arafa (Kerkuk), Nûzî, Kargamêş, Orkêş (Amûdê) û li deşta Mêrdinê bajarekî bi navê Taîte bûn. Weke din herêmên wan yên bi navê Amedannû (Amed), Xanîgalbat, Pûlûrûmzî, Alzî û Îşûwa jî hebûn.


## HIN QIRAL Û PRENSÊN HÛRIYAN:


Kummûhû, Melîdî, Gûrgûm, Ûngî/Ûnqî, Kaman, Kaska, Naîrî, Şûprîa, Orkêş, Mûşku, Ûrartû, Namar, Sûbarû, Mard, Lûlûbî, Kardû, Zamûa, Elîppî, Manna û Gûtî. Hwd.

**Şaristaniya Hûriyan;** Bi taybetî di mîtolojî, ol û qada nivîskariyê de gelek pêşketinên girîng bi destxistin e.

**Nivîsa Hûriyan:** Nivîsa bizmar bi kar anîne, nivîsa bizmar a Hûriyan û Hîtîtan gelek dişibe hevdû.

**Zimanê Hûriyan:** Li Rojhilata Navîn ji yek zimanên balkêş ango herî balkeş jî zimanê Hûriyan e. Zimanê Hûriyan zimanê proto Kurdan (Kurdên destpêkê) ye û niha tûnebûye. Zimanê Ûrartiyan domkirina zimanê Hûriyan e. Zimanê Mîtaniyan, jî ji zimanê Hûrî ya proto-Kurdan û ji Kurdiya Aryen pêktê. Nivîsara herî girîng a dema Hûriyan hatiye nivîsandin, nameya ku Qiral Tûşata B.Z. di navbera 1380 û 1350 de ji qiralê Misirê re rêkiriye ye.





## XWEDA Û XWEDAWENDÊN HÛRIYAN

Xwedayên Hûriyan ji hêla Hîtîtan ve hatinê pejirandin.
Xwedawenda Hûriyan“**Hepat”**pişt re bi şîroveyeke cûda dibe **Hawa.**
Di Hîtîtan de dibe: Kupapa, di Firîgan de dibe: Kîbela, Di Ereban de dibe: Kîble, Di Sûmeran de dibe: Îştar-Înnana, li Misirê dibe:Îsîs, di Yewnaniyan de dibe: Afrodît, li Romayê dibe : Venûs, di ola Îsa de dibe Meryem.
**XWEDA:** Teşûp, xwedayê bahozê ye; xwedawend Hepat; Şîmegî xwedawedaya Rojê ye; Kuşûh xwedawendaya heyv û stêrkan. Şaûşka xwedayê çiyê ye. Namnî û Hazzî xwedayên ku ji Hûriyan hatine standin. Xwedayê Hîtîtan Înra, Mîtra, Warîna jî dişibin hev.

## MÎTOLOJÎ:

Mîtolojiya Hûriyan bandoreke mezin li Hîtît, Fenikî û Helenan kiriye.
Efsaneya Gilgamêş yê ku li Hatûşaşê belgeyên wê hatine dîtin bi zimanê Akadî, Hûrî û Hîtîtî hatine nivîsandin. Nivîsa Hûriyan nivîseke nû û şîroveyeke taybet e.
Xwedayê Hûriyan ê herî mezin efsaneya Kumarbî ye. Wergera vê efsaneyê ya ji zimanê Hûriyan derbasî zimanê Hîtîtan li Hatûşaşê hatiye dîtin. Ji Hîtîtan derbasî Fenîkiyan û derbasî Helenan dibe. Bandoreke mezin li berhemên Homeros û Hesîodos kiriye.
**OL;** Di Hûriyan de hîmên ol, gelek saxlem in. Ol ji hêla rahîbên gelekî bi hêz û pêşketî ve dihat bi rêxistinkirin. Ji ber vê ola Hûriyan heta welatê Hîtîtan jî belav bûye.
- Di warê Mîmarî, wênesazî, çêkirina vazo, bikaranîna moran de... hwd. pêşketinên gelekî hêja pêşkêşî mirovahiyê kirine.

## XWEDAYÊN HÛRÎ Û SÛMERAN

| | HÛRÎ | SÛMER |
|---|---|---|
| **Xwedayê esman** | **Annû** | **En** |
| **Xwedayê erdê** | **Kumbarî** | **Enkî** |
| **Xwedawend** | **Teşûpba- Hepat** | **Înana** |

**NÎŞE:** Derketina xweda a ramanî û hişmendiya wî, destpêkê di Hûriyan de pêş dikeve, piştre derbasî Sûmeran dibe.
Di Grekan de: Zeûs, Apollon û Afrodît e
Di Romayê de: Venûs û Jûpîter e

## 2-Gûtî

Wateya Gûtî; Xwedanê dewarane. Navê Gûtî cara yekem di belgeyên qiralê Akadiyan Naremsî de hatiye dîtin. **Gûtî;** Erdingariya Gûtiyan ji derdora başûrê Gola Ûrmiyê destpêdike heta kendava başûrê Îranê diçe. Çiyayên Zagrosan jî di nav vê erdnigariyê de ne. Ji Zapa biçûk heta Diyalayê jiyane. B.Z. di 2700’an de derdikevin pêş û di xakên bi berhem yên Mezopotamyayê de bi cih dibin. Zimanê wan û yên Hûriyan yeke. Lê, Gûtiyan di xebatên fermî de zimanê Akad û nivîsên wan bikaranîne. Nivîsa wan nivîsa bizmariye. Konfederasyona Gûtiyan ji hêla **Qiral Qarnassî** ve B.Z. di 2700 salî de hate avakirin. Paytexta wan bajarê Kerkuk e. Gûtî, di welatê Sûmer û Akadê de ji B.Z. 2250’an heya 2113’an di pêşengtiya Gûdea de dibin desthilatdar.
Konfederasyona Gûtiyan ji gelek êlên (eşîr) Hûriyan ve pêkdihatin. Dewleta Gûtiyan pêkhatineke Konfederal bû, serokê her êlekê (eşîr) hebû, serokê konfederalê ji bo 3 salan ji wan serokê eşiran yek dihat hilbijartin. Ji ber vê jî 21 Qiralên Gûtiyan ên ku tên zanîn hene. Navê wan ev in; Înkîşûş, Sarlagap, Şûlme, Elûlûmeş, Înimabakes, Îgeşaûş, Îarlagab, Îbat,

Kurûm, Habîl-kîn, La-Erebûm, Îrarûm, Îbranûm, Hablûm, Pûzûr Sîn, Îarlaganda, Yarlagan, Lasîrab, Warlagaba, Tîrîgan. Qiralê ku dewleta Gûtiyan ava dike navê wî Qarnassî ye. Ji demekê şûn de hêzên ku di nav konfederalê de cih digrin, ji wan hêzan Lûlû, Sûsa, Kîmaş û Ûrbela dest bi hewldaneke cûda dikin. Tevgera wan a ji konfederalê cûda ya bi serê xwe dibe sedema qelsbûna konfederala Gûtiyan. Di vê qelsbûnê de dewleta Ûr êrîş dibe ser konfederala Gûtiyan û B.Z. 2120'an de Gûtiyan têk dibin. Qiralê Gûtiyan ê dawî Qiral Tîgran piştî vê têkçûnê, dîsa xelasî di çiyan de dibîne û xwe vedikşîne çiyayên Zagrosan. Gûtî di çiyayên zagrosan de bi navê konfederala Gûtiyên Anzan heta Konfederala Medan hebûna xwe diparêzin.

## 3-Lûlû (Lûlûbûn)

Di sala 2800'an de jiyan dikin. Di pêvajoya desthilatdariya Gûtiyan ve, hêzeke din ya bi wan re xwediyê heman ziman û çandê ku ji wan re Lûlû dihat gotin jî jiyan dikirin. Lûlûyiyan di qadeke berfireh ya ji başûrê Gola Ûrmiye destpêdike û heya Gola Wanê dirêj dibe de, bi Gûtiyan re jiyana xwe derbaz dikirin. Lûlûyî, di aliyê vê herêmê yê ber bi rojava dirêj dibû de, Gûtiyan jî, li herêmên bakurê rojhilat jiyana xwe didomandin. Lûlûyî, yek ji civakên Zagrosan bûn û li herêma Silêmaniyê niştecih bûn. Navê Qiralên Lûlûyan ê yekem Anûbanînî ye.

Qiralê Akada Naramsîn B.Z. di 2190'an de êrîşekê dibe ser Lûlûyan. Li hemberî vê êrîşê tifaqa Lûlûyan û Gûtiyan çêbû. Bi vê îtîfaqê bi şerekî dijwar Akadan têkdibin. Ev şer di navbera Gevara Karadaxê de li ser zinarekî bi nivîskî hatiye vegotin. Ev konfederal hergav bi Qiraliyeta Ûr re di nava şer û pevçûnê de bûye. Di dema qiraliyeta dewleta Ûr a 3. de Qiral ŞÛLGÛ careke din êrîş bir ser Lûlûyan, di vê êrîşê de Lûlûyan têkdibin. Lûlûyî herdem bi êrîşa Asûra re jî rû bi rû diman.

Qiralê Lûlûyan Anûbanînî di neqeba Gawîriya de li ser zinarekî bi awayekî nivîsekî serweriya Lûlûyan a li ser herêma Hîlwan û jiyana wan a hevpar a bi Gûtiyan re tîne ziman. Di vê vegotinê de dibêje ku me bi saya xwedawend Înanna qiralê Akada Naramsî têkbir. Ev nîşan dide ku çanda jinê çanda xwedawendiyê hê jî li Kurdistanê serdeste.

Lûlûyî ji bo ku bikaribin xwe li hemberê van êrîşan biparêzin tevlî konfederesyona Gûtiyan dibin. Piştî hilweşandina konfederesyona Gûtiyan Lûlûyî li derdora Zagrosan hebûna xwe heta konfederesyona Medan diparêzin.

## 4-QASÎTÎ ( GELÊN KARKER)

Di navbera sala B.Z 1900-1207'an de hegomaniyaya xwe dane meşandin. Di dîrokê de bi navên Qasîtî yan jî Qasayî hatine nasandin. Civakeke Çiyayên Zagrosan bûn. Cara destpêkê li herêma Kermanşanê hatine dîtin. Li herêma Lor jî jiyan kirine. Êrîşî Babîlan dikin. Dema ku bajêr dikin destên xwe li wî bajarî bi navê ÎŞTAR perestgeheke gelek mezin çêdikin. Navê xwedawenda Hîvê SÎN-ZÎN lê dikin. Qasîtî weke hemû civakên Zagrosan xwecihên herêmê yên resen in. Akadiyan ew weke “Kaseşî” bi nav kirine. Di dîroka Rojhilata Navîn a Kevin de B.Z. 1980'î û şûn de behsa Qasîtiyan tê kirin. Qiralê Qasîtiyan ê yekemîn Qiral Gendaş e. Navê xwe ji xwedayê xwe Kaşû yê digre. Navê qiralê Qasîtiyan Kastîlyasê yekemîn bû. Bi destxistina Babîlê navê konfederesyona xwe jî dike **KARDÛNAJ.** Qasîtî piştî bidestxistina Babîlê, Babîlê 440 sal di dest xwe de digirin. Di belgeyeke dîrokî de hate dîtin ku Qiralê Qasîtîan ê bi navê Qiral **Agûmê 2.** xwe weke Qiralê **Elam, Babîl** û **Akadan** bi nav dike.

Qiralê Asûr **Tîkultî û Nînûrta** B.Z. di navbera 1244-1208'an de êrîşan dibe ser Qasîtiyan û herêma Gûtiyan digre bin kontrola xwe û Qasîtiyan têk dibe. Qiralê Qasîtiyan **Qiral Kastilyas** dîl dikeve dest wan. B.Z. di 1157'an de **Qasîtî** dikevin bin serweriya **Elaman**.
Qasîtî di xwedîkirina hespan de û di karkeriya metalê de pisporbûn. Qasîtî her gav bi nûnerê zilm, zor û talanê yên Babîl û Asûran re pirsgirêk jiyane. Her çiqas konfederesyona Qasîtiyan têkdiçe jî Qasîtî hebûna xwe heta konfederesyona Medan diparêzin. Herî dawî jî bi konfederesyona Medan re bi hevkarî êrîş dibin ser Asûran û Asûran têkdibin.

### *XWEDAWENDÊN QASÎTIYAN:*

**Mîrîaş,** xwedawenda Roj ye.
**Sûrîaş,** xwedawenda Bahoz ye.
**Ûbrûaş,** xwedawenda Çiya ye.

## 5-MÎTANÎ (1800 – 1250 )

Qiralyeta Mîtanî, B.Z. Di navbera 1800-1250'an de jiyan kirine. Mîtanî weke çengekî yê Hûriyan li bakurê rojavayê Kurdistanê hatine damezrandin. Dewleta Mîtaniyan B.Z 1500'î di serdema xwe ya herî bihêz de bû. Di belgeyên Hîtîtiyan de bi navê “Xanîgalbat” hatine bi nav kirin. Qiraliyeta Mîtanî ji bajarê Qargamêş ê li peravên Çemê Feradê dest pê dikir, Xabûr û Belih dorpêçdikir, heya Nisêbînê, li rojhilatê bajarên Bedlîs, li bakur Xerpût û Meletî, li aliyê başûr jî bajarên Aleppo (Helep) û Kerkuk (Nûzî) digirt nava xwe. Li bakur û rojavayê wan a Xattî, li başûrê wan Asûrî û li rojhilatê wan jî qiraliyên biçûk yên ji aliyên qabileyên Hûrî ve hatin damezrandin cih digirtin. Paytexta qiraliyeta Mîtaniyan “Waşşûkanî” (Serêkanî) bû. Konfederasyona Mîtaniyan ji gelek êl(eşîr)ên Kurdan pêkdihat. Ev konfederasyon cara yek bi împaratoriyê tê binavkirin û heta wê demê di warê erdnîgariyê de Konfederasyona Mîtaniyan pêkhatineke herî mezîn e. Mîtanî ji 7 milan (heft êl (eşîr) an pêkdihat. Ji van her heft milan, her milek li herêma xwe êl (eşîr) ên din di bin kontrola xwe de bi rêxistin dikirin. Ji ber vê her milek jî di nav xwe de konfederal bû. Ev mil nîvkoçber dijiyan û her milek mîrekî wan hebû. Ev mîr bi şet-şah-qiral dihatin binavkirin. Taybetiya wan, her yek ji xanedana Mîtaniyan bû û ji malbata Kurdiyan bûn. Rêvebirên Mîtaniyan bi hilbijartinan derdiketin. Heft Mîran dengê xwe bidana kê ew kes dibû Mîrê –Mîran, dibû Şahê- Şahan. Mîtanî xizmên Hîtîtî û Lûviyan e. Navê Mîtaniyan yê din jî Maranî (Mêrxas) ye.

Di encama konfederasyonek demokratîk de, dewleta Mîtanî ji 250 salan zêdetir hebûna xwe domandiye. Mîtanî bandora xwe li ser herêmê dikin. Bi taybetî bi riya zewacê têkiliya xwe çêdikin. Çend qiralên Mîtaniyan bi keçên fîrewûnên Misrê re zewicîbûn. Qiralîçeya Misrê ya navdar Nefertîtî û Nefertarî ji Mîtaniyan bûn. Heman pêywendî bi Hîtîtiyan re jî hatibûn sazkirin. Misiriyan ji bo Mîtaniyan navê **Nahrîn** bikar dianîn, Asûriyan jî ji herêma Bakurê gola Wanê re digotin **Naîrî.**

B.Z. Di salên 1596'an de bi Qiral Xattiya Mûrşît re peymanekê çêdikin û di encama vê yekîtiyê de dewleta Babîliyan têk dibin. Mîtanî hata sala 1250'an B.Z. ji Kerkukê heta derya Spî bandora xwe didin meşandin. Serdema 14 qiralan derbas kirine. Qiralê wan ê yekem Shûltarma û qiralên wan ê dawî Sahattûara ye. B.Z. di 1445'an de qiralê Misiriyan **qiral Tûtme yê sêyemîn** seferekê tîne ser Mîtaniyan û Sûriya û Fîlîstînê careke din ji destê Mîtaniyan derdixe. Bi tifaka **Asûr û Hîtîtan** B.Z. di derdora 1273'an de Mîtanî têk diçin û dikevin bin serweriya Asûriyan. Mîtanî piştî têkçûnê tevlî Naîriyan dibin. Êl (eşîr) ên îro bî navê Sîndî û Metîniyan tên nasîn domandina Mîtaniyan e.

## 6-NAÎRÎ (1302 – 900 )

Di derbarê vê civakê û rola wê ya dîrokî de belgeyên ji Asûriyan mayîn agahiyan didin. B.Z. di 1302’an de li derdora Zagrosan hatine dîtin. Asûriyan, di wateya welatê “Av” an jî “Rûbaran” de peyva “Naîrî” ji bo wan bikaranîne. Weke berdewama Hûriyan têne pejirandin. Piştî dewleta Mîtanî tê rûxandin, ev civak girîngiyê qezenc dike. Weke konfederasyon êdî di dîrokê de cih girtiye. Ev Konfederasyon ji 24 êl (eşîr) ên Kurdan pêkdihat. Konfederasyona Naîriyan ji dû rêveberên milên xûrt ve hîmê wê tê avêtin. Ev rêveber **Lûtîprî û Arame** ne. Erdnigariya navbera Cizîrê û Şemzînanê weke navenda Naîriyan bû. Li gor nivîsên Asûriyan welatê Naîriyan ji Erbîl heta Meletî bû. Ev qad ji hêla metalên weke hesin, sifir û hwd. cûreyên sewalan, bereketa çandiniyê ve gelekî dewlemend bû.

Di navbera Asûrî û Naîriyan de her tim şer û pevçûn hebû ye. Naîrî êrîşekê dibin ser Asûriyan û ji Zagrosan heta Dersim, Amed, Xarpût û Bedlîsê fereh dibe.
Naîrî ji hemûû milan ve dewlemend bûn. Ev dewlemendî her gavê bala Asûriyan dikşand ser xwe û ev jî bûye sedema erîşên Asûriyan. Êrîşa yekemîn bi destê qiralê Asûriyan **Qiral Adad Nîrarî** B.Z. di 1304-1273 de pêk tê. Asûrî gelek êrîşan dibin ser Naîriyan, lê bisernakevin. Jin û mêrên Naîriyan bi hev re şer dikirin. Di şer de serkeftî bûn. Jinên wan jî bi qasî mêran şervan bûn.
Qiralê Asûriyan **Tîglîatî Pîleser** B.Z. di nivîsa xwe ya 1110'an de behsa şer a xwe û 23 qiralên Naîriyan dike.
Qiralê Asûriyan **Qiral Tûkultî** 25 belgeyên ku B.Z. di **1249-1208** de nivîsîne di wan de behsa êrişên xwe yên ser Naîriyan dike. Qiral di nivîseke xwe da behsa têkbirina Gûtî, Hûrî-Sûbarûyan dike. Behsa têkbirina 40 qiralên Naîriyan dike.
Armanca Asûriyan bidesxistina amûrên madenî, hesin, sifir, pêşketinên çandinî û talankirina dewlemendiya welatê Naîriyan bû. Sewalên Naîriyan ên ku bidestxistine bi zinditî birine berî çiyayên xwe dane. B.Z. di salan 900'an de bi êrîşeke Asûriyan ve rûbirû dimînin, di encama vê êrîşê de Naîrî têkdiçin.

Naîriyan di serî de bi Xaldiyan re hevkarî kirine û bi hev re tevgeriyane. Şaristaniya Ûrartûyan bi hev re afirandine. Piştî têkçûna Ûrartûyan jî bi Medan re dibin yek. Silsilê Yewnan û Grekan ji welatê Naîriyan re gotin e **Kardûne**.

## 7-ÛRARTÛ ( 900 – 606) KHALDÎ (XALDÎ)




Piştî şikandina bandora Naîriyan, di welatê me de hêzekî nû yê bi navê Ûrartû derdikeve qada dîrokê (B.Z. sedsala X). Ûrartû, berdewama Naîriyan e. Zimanê wan zimanê Hûriye ye. Dema desthilatdariya Naîriyan têk diçe, di herêmê de begitiyên biçûk û serbixwe derdikevin holê. Ev begitiyên biçûk yên di bingeha xwe de digihên Hûriyan, bi civakên cûda yên di demên cûr be cûr de hatin herêmê û bi niştecihbûnê re tevlîhev dibin û bi demê re civaka bi navê Ûrartû pêktînin. Sînorê Ûrartûyan ji ber ava Feradê dest pê dike, heta Ermenîstan, Zagros û Torosan dirêj dibe. Dewleta Ûrartûyan di salan 875'an B. Z. de ji hêla **Sardûr** ve tê avakirin. Paytexta wan Tûşap (Wan) e. Bajarekî ji keleyê pêk tê. Li qeraxa gola wanê li ser zinarekÎ ji hêla qiral Sardûrê yekemîn ve hatiye avakirin. Kevirên vê keleyê tev ji ser avê ji

Ercişê hatine anîn. Ev kevirên ku ewqas ji dûr ve hatine anîn di nav wan de ên ku giraniya wan 30-40 ton in hene. Hinek bajarên ku ji hêla Ûrartûyan ve hatine avakirin ev in:
**Sardûrîhînîlî;** ji navenda Wanê 23 km dûr e ango pişt re ye. Bajar keleyeke navdare.
**Tîtûmînîa;** li derdora Ercişê ye.
**Argîşthînlî;** li bakurê rûbarê Arasê nêzî Êrîwanê ye.
**Teîşebaînî;** nêzî Êrîwanê, derdora bajêr keleyeke ji kevir heye.
**Îrpûnî;** li bakurê welat di erdnigariya Ermenistanê de cih digre.
**Tarûî,Tarmakîşa,Ûlhî;** ev her sê bajêr jî li deşta Tebrîzê ne.
**Ardînî;** li derdora Mahabad û di neqeba Geliyê Şîn de avakirine.
**Rûsahînîlî;** nêzî bajêrê Wanê di serdema qiralê Ûrartûyan ê navdar Rûsayaya dûyemîn de hatiye avakirin û bûye paytexta dûyemîn.
Li wî welatî dewlemendiya hesin, tûnç, zêr û zîv zede ye. Ji ber ku dewlemendiya hesin li ve derê heye, çendîn Asûrî êrîş dibin ser jî lê nikarın wê têk bibin. Li bakur Qiralê Maletye tek dibin û li başûr jî heta Helebê diçin. Li gor serdema xwe şaristaniyeke gelekî pêşketî derdikeve holê. Ev pêşketin xwe, di çêkirina rê, bêndav û cokên avê de nîşan dide.
Pergala rêyên bejayî yekemîn bi destê Ûrartûyan ve hatine çêkirin. Her deverê welat bi rêyên bejayî bi paytext Tûşabayê ve hatiye girêdan.

B.Z. di 650’an û şûn de dema Keyaksar dibe Qiralê Med’an êrîşên wî yên li ser Ûrartûyan jî dest pê dikin. Di encama van êrîşên berdewam de B.Z di 606’an de dewleta Ûrartû tê rûxandin.

## WANE 9.

### Pirsên Amadekariyê

1- Împeretoriya Medan kengî û li hemberî kê hatiye damezirandin?
2- Destana Kawayê Hesinkar bi awayekî çîrokî vebêjin?
3- Li Kurdistanê û Rojhilata Navîn wateya roja Newrozê çi ye?
4- Baweriya medan ya wê demê çibû?
5- Hûn felsefe û baweriya zerdûşt çawa şîrove dikin?

## 7-MED

B.Z. di 1000'an de Asûrî li herêmê hatibûn asta xwe ya herî bilind. Asûriyan li derdora xwe bandoriyeke herî mezin dikirin. Li ser hemû gelê herêmê zilmeke pir mezin didan meşandin. Li herêma Mezepotamaya li hemberî Asûriyan têkoşîna Medan dest pê dike. Li gorî dîroknasê Yewnanî Heredot hêjmara qiralên Medan çar in û navên wan ev in: ***Diyako, Firortîş, Keyaksar û Astiyag***.




Diyako (Keykubat): Weke damezrênerê yekemîn yê Dewleta Medan tê naskirin. B.Z. di destpêka sedsala 8'an de, dibe qiral. Di pêvajoya vî qiralî de Welatê Medan weke hêzeke nû derdikeve pêş. Med û êl (eşîr) ên din yên pêşiyên Kurdan li derdora wî kom dibin. Diyako, rêveberiyeke baş dimeşîne. Ji bo parastina welatê xwe keleyan dide avakirin. Li dijî êrîşên Asûriyan radiweste. Di dema desthilatdariya Diyako de civaka wî di gelek aliyan de pêşketinên berbiçav bidest dixe. Diyako, zêdetir kariye di nava civakê de yekîtiyekê sazbike. Bajarê Ekbatanê (Hemedan) dike paytexta dewleta xwe.
Diyako, 53ê salan bi awayekî serkeftî desthilatdariya dewleta Medan dike. Piştî mirina wî kurê wî yê bi navê Firortîş dibe qiralê dewleta Medan (B.Z. 655).
Firortîş: Qiral Firortîş hinek qebîleyên Arî yên ji aliyê rojhilat hatin herêmê xistin bin desthilatdariya xwe. Civaka Pers jî bi heman awayî bi xwe ve da girêdan. Bi van pêşketinan re dewleta Medan bi hêz û mezintir bû. Firortîş, xwest ji vê rewşa erênî ya derketî holê sûdê werbigire û îlankir ku tû caran wê bandor û gefên Asûriyan yên li ser welatê xwe nepejirîne. Li aliyê din, pêşveçûnên di welatê Medan de çêbûyîn, bala Asûriyan jî dikişand ser xwe. Rewşa derketî holê ji bo Asûriyan metirsî diafirand. Asûriyan li ser vê çenda derketî, ji holê bidin rakirin li ser welatê Medan êrîş dan destpêkirin. Di vê cenga qewîmî de Firortîş û piraniya serok êl (eşîr) ên pê re ji aliyê Asûriyan ve hatin kuştin (B.Z. 633).

Piştî qiral Firortîş ji aliyê Asûriyan ve tê kuştin, birayê wî yê biçûk yê bi navê Keyaksar dikeve şûna wî. Weke xebata yekem dest bi ji nû ve rêxistinkirina artêşa Medan dike. Artêşa xwe weke siwar û peya belavî dû beşan dike.
Piştî temamkirina leşkerî û sazûmankirina artêşê, li hember Asûriyan dest bi xebatên hevkariyê dike. Bi qiralê Babîlê yê wê demê Nabopolasar re peymaneke hevkariyê tomar dike. Bi heman awayî bi Îskîtiyan re jî peymanekê tomar dike.



B.Z. di 1'ê Çileya 615'an de bi artêşeke mezin dikeve rê. Bi artêşa xwe ve ket nava welatê Asûriyan. Di demeke kin de bajarê Erebxa (Kerkuk) dagirkir û ji bo tevgera xwe ev bajar kir navend.
Piştî bajarê Kerkuk kir deste xwe, ev der kire navenda amadekariyên êrîşên ser Asûriyan. Artêşa Medan di bin rêveberiya Keyaksar de B.Z. di sala 614'an de berê xwe da paytexta dewleta Asûriyan, Nînowayê. Bajarê Arbeziyê yê ku di rêya wan de bû dagirkir û pişt re bi leşkerên Babîlê re peywendiyê sazbike, berê xwe da aliyê başûr û bajarê Asûr ku navendeke pir kevin ya dewleta Asûr bû bi destxist û talan û wêran kir.

Piştî ku ev bajarê girîng hat dagirkirin, qiralê Babîlê di derbarê yekîtiya li hember Asûriyan de û parvekirina sînorên Asûriyan yên piştî şer de, bi Keyaksar re li levhatinek pêkanî. Keyaksar jî, ji bo xûrtkirina vê peywendiya siyasî, neviya xwe ya keça Astiyag ku navê wê Emîtîs bû da Nebûqetnezarê kurê qiralê Babîlê. Di heman demê de pêwendiyên yêkitiyê, bi rêveberên Îskîtiyan re jî hatin pêkanîn.

Dû sal piştî dagirkirina bajarê Asûr (Şirgat) ango B.Z. di 612’an de hêzên Med, Babîl û Îskîtan, di eniyeke berfireh de ji sê milan ve êrîşeke mezin birin ser paytexta dewleta Asûr ya bi navê Nînowayê. Li gorî lêkolînan, bajarê Nînowayê piştî dorpeçeke sê meha û şerekî pir dijwar, B.Z. di 21'ê Adara 612’an de hatiye dagirkirin. Bajarê Nînowa di demeke pir kurt de ji aliyê hêzên hevkar ve hatibû talankirin û şewitandin. Qiralê Asûr yê wê demê Sîn-Şar-Îşkum, dema têdigehe ku bajar ji destê wî derdikeve, bi mal û malbata xwe ve xwe davêjin nav agir û xwe dişewitînin.
Beşek ji Asûriyan yên ji kuştinê filitîn jî, bi rêveberê xwe yên bi navê Asûr Obalît re diçin Haranê û li wir ji nû ve dewletekê dadimezrînin.
Piştî vê serkeftina dîrokî, qiral Keyaksar û artêşa Medan vegeriyan welatê xwe. Lê, sala piştî wê (B.Z. 611) li ser daxwaza Nabopolasarê Qiralê Babîl, berê artêşa xwe da paytêxta Asûriyan ya nû bajarê Haranê. Bi leşkerê Babîlê re ev bajar jî dagir kir û careke din paş ve vegeriya.



***ASTIYAG:*** Piştî mirina Keyaksar kurê wî yê bi navê Astiyag bû qiralê dewleta Medan.
Bi desthilatdariya Astiyag re, pêşveçûnên ku di demên nêzik de pêkhatin, rawestiyan. Ji ber ku Astiyag mirovekî aştîxwaz bû. Di pêvajoya desthilatdariya wî de aştî û azadî di asteke bilind de dihate jiyankirin. Di welatê Medan de pêşketina aştî û azadiyan, bi xwe re di aliyê leşkerî de lewazbûn û ji hêzketina împeretoriyê dianî. Di encamê de bandora Astiyag ya di nava civaka wî de kêm bibû û bi wî re, împeretoriya Medan jî ket pêvajoya lewazbûnê û hêdî hêdî bandora xwe winda dikir.
Ev rewş di rêveberiyê de lewazîbûyîn derxiste holê, derfetên xwe bi rêxistinkirina xanedanekê ya Persa ku heya wê demê tû bandora wan di nava împeretoriyê de nebû, dabû afirandin. Kîros, serokê Persan û neviyê Qiral Astiyag bû, bi awayekî neyînî di nava dewletê de roj bi roj xwe bi rêxistin dikir. Hinek ji rêberên civakên Arî û xûyayiyên Medan jî di nava vê tevgera li dijî Astiyag de cihên xwe girtibûn. Berpirsek Medan ê leşkerî bi navê Harbakos jî bi Kîros re alikarî dikirin. Di dawiyê de Kîros li dijî Qiral Astiyag serhildan da

destpêkirin. Hêzên Astiyag û yên Kîros hatin hemberî hev û di navbera wan de cengeke giran pêkhat.. Di dawiya cengê de artêşa Astiyag têk çû û ew bi xwe jî dîl ket destê Persan .
Bi vê bûyerê re împeretoriya Medan ku di pêvajoya pêşketinê de bû, ji holê hat rakirin û di şûna wê de pêvajoya desthilatdariya Kîros ku ji xanedana Axameniyan bû destpêkir (B.Z. 550).
Piştî ku Keyaksar tek diçe ji bo Harbakos wiha dibêje; "Mirovê xirab û bê rûmet! Madem çavê te li desthilatdariyê hebû, çima te bi xwe nekir. Ji ber çi te xwe spart hêzên biyanî? Bi vê helwesta xwe ya qirêj te dahatû û ewlekariya civaka Medan jî xist nava metirsiyê de".
Piştî ku desthilatdarî di keve destên Persan, Persî ber bi Anatolyayê ve diçin. Li vê derê êrîş dibin ser Lîdiyayiyan û di encamp dê wan têk dibin.
Med ji desthilatdariya Persan ne rehatin û rahîbên max dibin serokatiya rahîp Goman de xwe bi rexistin dikin. Dema ku qiralên Persan Daryos derdikeve sefera Misrê, Rahîbê Maxan Goman di sala 521'an de serhildanekê didin destpêkirin û ji nû de dewleta Medan didin avakirin. Lê Daryos sefera xwe dide seknandin û tê hemû êl (eşîr) ên Persan kom dike, êrîşekê dibe ser wan. Di encama vê êrîşê de Goman û hemû hevalbêndên wî tên kuştin. Heta wê demê zimanê dewletê Kurdî ye, li piştî vê serhildanê zimanê Kurdî tê qedexe kirin, zimanê dewletê resmî dibe zimanê Farisî.

## 8-DESTANA KAWAYÊ HÊSINKAR

Kurd berî ku Dewleta Medan damezrînin bi awayekî belave, weke qebîle û êl (eşîr) dijiyan. Di navbera wan de yekîtiyek tûnebû. Di bin zordariya hêzên din yên herêmê de jiyan dikirin. Împaratoriya Asûr wê demê gelekî bi hêz bû. Êrîşî Kurdan û civakên din yên li herêmê dikirin. Zordariya wan êdî bêsînor bibû. Qiralê Asûr Dehaq, ewqas hov bibû ku xwe bi mejiyê zarok û ciwanan xwedî dikir. Rojane dû ji wan ciwanan dikuştin û mejiyê wan ji Dehaq re dibirin.
Gel, ji vê rewşê pir bêzar bibû, lê bê serok û bê rêxistinbûn. Nedikarîn bi serê xwe tiştekî jî bikin. Zarokên xwe dişandin çiya û vedişartin. Lê, ev helwest ne çareseriya bingehîn bû.
Li hemberî vê zordariya Dehaq, Kawayê Hêsinkar gelekî dihizirî. Heft kurên Kawa hebûn. Dû ji wan jî ji bo Dehaq biribûn. Kawa, êdî nedikarî vê rewşa giran bipejirîne. Li dijî Dehaq, planekê çêdike û li bênda qesabên wî dimîne. Dema ku qesab tên da ku kurê wî yê sêyemîn jê bistînin Kawa dibêje:



Ez jî dixwazim bi we re bêm û kurê xwe bi destê xwe radestî qiralê qiralan bikim. Ez bawerim wê baştir bê pejirandin. Yek ji qesabên mirovan dibêje:
Temam, tû bi xwazî bi me re were.
Kawa û kurê xwe bi qesabên mirovan re diçin qesra zordariyê ya ku Dehaqê xwînxwar lê dima. Dema ku digihin qesra Dehaq agahdar dikin û dibêjin:
Zilamekî belengaz û bêkes bi qûrbanê îro (kurê xwe yê seyemîn) re hatiye û dixwaze ew bi xwe qûrbanê bi destê xwe pêşkêşî we bike. Dehaq dibêje:
Baş e, bila were.
Dema ku Kawayê Hêsinkar ji bo dest maçkirin û silavkirinê nêzikî Qiral Dehaq dibe, bi destê xwe yê din çakuçê xwe derdixe û bi hemû hêz, kîn û bêzarbûna xwe, bitevayî êş û kedara dilê xwe û ya gelê xwe li serê serkêşê zor û zordariyê dide. Xwîn diherike, qêrîn li qesrê dikeve, kesên di qesrê de xizmet dikirin jî, bi gelê li pêşiya qesrê kombûyî re tevlî tililiyên pîrozkirinê dibin. Kawayê Hêsinkar dibêje:
"Min bi lawê xwe re, lawên we jî rizgarkirin. Bi kulên xwe re kulên

we jî derman kirin û bi azadkirina xwe re hûn jî azadkirin. Ji vir şûn de xwedî li azadiyê derkevin, rûmetê bidinê û jê re rêz bigirin". Mizgîniya vê çalekiya serkeftî, li serê çiyayên bilind pêxistina agir ji bo gelê Kurd û gelên din tê ragihandin.



Di gelek serdeman de dîrok bi şêwazekî mîtolojîk tê ziman. Cewherê vê mîtolojiyê jî dana femkirina zilma Asûrane. Asûr di Rojhilata navîn de dewleta herî zilimkar e. Ne bitenê li Kurdan , li hemû gelan zordarî dike. Ji ber vî awayî têkçûna vê dewleta zilimkar hemû gelên Rojhilata Navîn têkildar dike û têkçûna wî hemû gelan kefxweş dike. 21'ê Adarê ketina Paytexta Asûriyan ya Nînowayê ye. Ev jî di wateya giştî de tê wateya azadiya gelên Rojhilata Navîn.

## NEWROZ

Dema Dewleta Asûrî B.Z. di 21'ê Adara 612'an de tê hilweşandin, êdî gelê Rojhilata Navîn ji vê rojê re dibêjin roja nû. Newroz di zaravayê zazakî de roj weke roz tê bi lev kirin. Ev weke roja azadiyê ye. Vê rojê ne tenê gelê Kurd, hemû gelê Rojhilata Navîn pîroz dikin. Ev pîrozbahî bitaybetî ji aliyê gelê Kurd ve her diçe bi girseyên mezin tên pîroz kirin. Sembola wê jî pêxistina agir e.

## BI TÊKÇÛNA MEDAN ENCAMÊN GIRÎNG ÊN KU DERKETIN HOLÊ:

## NÎŞEYEK GIRÎNG:

Bi destê Persan pergala koledar a başûr li rojhilat belav bû. Li Çînê împaratoriyeke xanedanî pêkhat. Li Hîndîstanê Împaratoriya Marya pêkhat, li Asyaya Navîn împaratoriya Hûn û Metehan hwd. pêkhatin.

B.Z. di **538 an de** Cûhî di dema Konfederasyona Med û Persan de derfet dibînin ku bizivîrin welatê xwe.

Ji kevneşopiya **Zerdeşt û Îbrahîm ÎSA** çêbûye.

Ji kevneşopiya **Med û Persan** serdemeke nû ya **Greko-Romen** dest pê dike.

B.Z. **Grek-Romen** dibin bandora **Mısır û Babiliyan de ne.**

**Pîsagor** û **Tales** li **Babîlê** perwerde dibînin.

Ji hêla konfederasyona Med – Persan ve bidestxistina Babîlê têkiliya bi rojava re hêsantir dike. Bi pêşketinên van têkiliyan di serî de herêma qeraxa deryaya Egeyê pişt re jî Ethena pêşdikeve.

Çavkaniya Mîtolojiya Grekan Hûri-Hîtît e.

Babîl û Misir ji aliyekî ve; Hûrî, Lûvî, Firîgya, Lîdya, Med-Pers ji aliyekî ve bandora xwe li çanda Grek- Romayê dikin û pêşve dibin.

Ronakbiriya Zerdeşt, erdnîgariya Rojava di bin bandora xwe de dihêle. Netzche bi hevoka "**Zerdeşt wisa ferman da**" vê bandorê herî xweş tîne ziman.

## 10-OLA ZERDEŞT

Di dîrokê de mirov dikare bibêje; di wateya felsefîk de olê yekem e. Cara yekem baş û xirab ji hev tê cûda kirin û hemû jiyan ji didûyan avadibe, ji lewre ji vê felsefe û baweriyê re dûalîzm tê gotin. Li gorî zanista îro ya herî pêşketî hemû jiyan ji tiştên ne wekhev ava dibe.



Enerjî û made bi hev ve giredayî ne. Tarîbûn ronahiyê bi wate dike hwd. Li gorî belgeyan sê serdemên zerdeşt hene, lê ya herî bi bandor B.Z di 1000'an de bûye. Rahîbên **Maxan** li Zagrosan jiyan dikirin û her dem di nava nîqaşekê de bûne, îhtîmaleke mezin ji van rahîbên maxan yê herî bi hêz navê xwe zerdeşt bûye. Zerdeşt ji navekî pirtir weke pêşenavekî hatiye bikaranîn. Cara yekem xerabî û başî ji hevd cûda bûye. Weke xwedayê başî û xirabiyê hatine bi nav kirin. **Ahûra Mazda û Ehrîman.**

**Ahûra-Mazda:** Li gor vê baweriyê û fesefeyê Ahûra Mazda xwedayê gerdûnê bû. Armanca wî tûnekirina xirabî û derewan bû. Yê sazûmana heyberî û rewanî di gerdûnê de afirandî û zagon danî Ahûra-Mazda bû. Li aliyê din, jêdera tevayê xirabî û neqenciyan jî Ehrîman bû.

Di felsefeya Zerdeşt de Sê tiştên pîroz ku jiyan jê çêdibe hene.



1- Ax
2- Av
3- Agir

Sê tiştên pîroz ku jiyanê avadikin hene;

**1-Baş bihizre**
**2- Baş biaxive**
**3- Baş kar bike**

Jiyan ji ax, av û agir (germahî) çêdibe. Yek ji wan tine be jiyan çênabe. Lê ya ku jiyanê avadike hizrandina mirovan e. Ya ku civakê avadike têkiliya di navbera civakê de ye. Ya ku jiyanê dide domandin û xweşik dike karê ku tê kirine. Ava kirin xwe li ser hizrandinê çêdike. Karekî baş encama hizrandineke baş e.

Li gori ola Zerdeşt xweza bi tevayî zindî ye. Ji bo wê pêwîste bi rebazeke nebaş nezîkatî ji xwezayê re neyê kirin. Pêwîste hemû tiştên zîndi bêne parastin. Jêkirina hemû tiştên kesk ne baş e, kuştin û serijêkirina lawiran ne baş e. Ola Zerdeştî oleke milê wê yê axlaqî li pêş e. Başî û nebaşî di dilê mirov de ye. Ji bo wê dil pakbûyînê bingeh digre. Dibêje; Pêwîste tû nebaşiyê di agirê dilê xwe de bi şewtinî û di nefesa xwe de bi fetisînî, wê demê tû dibî miroveke/î pak. Di ola Zerdeştî da cûdabûyîna cînsan tûne ye. Di nava civakê de tabakebûyîn tine ye. Ji hemû tiştan re rêzgirtin bingehe.

Zerdeşt, xwekuştinê weke dijminahiya Ahûra-Mazda dibîne û gûnehekî mezin dipejirîne. Di heman demê de kuştina leşkerên civakê diparêzin jî, weke dijminahî û serîhildana li hemberî Ahûra-Mazda dibîne û qedexe dike.

Di baweriya ola Zerdeşt de xweda, jin û mêr bi hev re û ji bo hevkariyê afirandin e. Di vê baweriyê de jin û mêr di her alî de wekhevin û tû cûdabûn di navbera wan de nîne. Di herêmên ku ola Zerdeşt tê de pêşketî de pirpevjînî kêmbûye û yek pevjînî zêdebûye. Jin, weke dayîka zarokên xwe ji perwerdekirina zarokan û bi awayekî niştîmanperwer mezinkirina wan erkdar bû. Li gorî Zerdeşt, pêwîst bû dayîk başî û qenciyê nîşanî zarokên xwe bide. Rawestana li hember dijminên xirap, parastina can, mal, namûs û welatî jî di nava erkên mêran de dihatin hilbijartin.

Pirtûka Zerdeşt ZEND AVESTA ye. Bi zimanê kurmanciya hatiye nivisandin. Avesta, di pêvajoya Qiralê Sasaniyan Şapûrê 1. de (309-308) hatiye berhevkirin.

**WANE 10.**

**Pirsên Amadekariyê**

1- Sedema hilweşandina Îperetoriya Medan çi bû?
2- Dema Îskenderê Mekdûnî dikeve kurdistanê 20 hezar keçên kurd bi askerê xwe re dizewicîne, wateya vê çi ye?
3- Têkiliya kurd û Rama çawa pêşket?

## 11-DAMEZIRANDIN Û TÊKÇÛNA ÎMPARATORIYA PERSAN (B.Z. 549-330)

Konfederasyona ku B.Z. ji 612 heta 550 dibin rêberiya Medan de dimeşiya, B.Z. di 549’an de bi plangeriyekê (kompoloyê) , konfederasyona Medan ketibû destê Farisan û navê wê gûhartibûn.



B.Z. ji 549’an şûn de di împararoriya konfederal de di bin rêbertiya Dariûs de Faris pêşdikevin. Êdî rola yekemîn di destê Farisan de ye. Kurd bi temamî ji rêvebertiya konfederesyonê nayên dûrxistin. Di rêbertî, kar û barên konfederesyonê de Kurd hene, cih digrin, lê her gav di rola dûyemîn de ne.

Împaratoriya Farisan B.Z. di 330'an de ji hêla Îskenderê Mezin ve tê hilweşandin. Ekbatan (Hemedan) bi dest dixin û dikin paytexta xwe. Tevahiya herêmê heta Afganîstanê dikeve bin kontrola Helenan.
Îskenderê Mekedûnî dema ku dikeve Kurdistanê 20 hezar keçên Kurd bi leşkerên xwe re dide zewicandin û dixwaze ji wan nifşek nû çêbike. Dixwaze zanebûna Mekdûniyan û mêrxasiya Kurdan bike yek.
Dema ku Daryûs dikeve, Yûnan pirtûkxaneya herî mezin dişewitînin. Dema ku Îskenderê Mekedûnî jî dikeve welatê persan pirtûkxaneya herî mezin a Persepolîsê dişewitîne. Lê belê pişt re gelekî poşman dibe. Dîsa ji çand û mimariya Rojhilata Navîn gelekî bi bandor dibe û li gorî xwe sentezekê ava dike. Li ser navê xwe bajarê Îskenderiyê ava dike. Bajare Îskenderiyê senteza çanda Rojhilat û çanda Îyonan e.

Îskenderê mezin B.Z. di 323'an de dimre. Di nav serleşkerên wî de şerê desthilatdariyê dest pê dike. Împaratoriya Îskender parve dikin. Kurdistan, Îran û Mezopotamya para SELEFKOS dikeve. Li Rojhilata Navîn serdema Selefkosa dest pê dike.

## TÊKILIYA ROMA Û KURDAN

Bi destê Grekan, ji Rojhilata Deryaya Spî û Hîndîstanê riyên bazirganiyê tev bi Romayê ve hatibûn girêdan. Girêdaniya van riyan bi xwe re zayîna çandeke nû jî anî. Têkiliyên bazirganiyê di dewlemendî û pêşketina çanda Romayê de roleke gelekî girîng dilîze.
Bajar û dewleta Romayê B.Z. di navbera 500 û 300 salî de bajarên derdor û tevahiya Îtalyayê digre bin serweriya xwe. Roma di serî de bi Yewnanan re pişt re jî bi Qartacayê re

dikeve nav şerê desthilatdariyê û erdnîgariya xwe fireh dike. Bajarên Yewnanan ên nêzî Îtalyayê tev dikevin bin dehilatdariya wan. B.Z. di 218'an de Qiralê Qartacayê Hanîbal êrîşekê dibe ser Romayê. 50 hezar leşkerên Romayê tê tûnekirin. Romayî li hemberî Qartacayê êrîşekê didin destpêkirin û bi ser Qartacayan ve diçin. Hanîbal neçar dibe ku paşve bizivire. Êrîşa ku B.Z. di 205'an de destpêkiribû di 202'an de bi teslîmbûyina Qartacayê bi dawî dibe. Bi teslîmbûyina Qartaacayê bajarê Yewnanan û peravên deryayê yên herêma Egeyê dikevin destê Romayê. Makedonya jî bi Romayê ve tê girêdan. Hêza Romayê û firebûna erdnîgariya Romayê heta rojhilatê deryaya spî diçe û dighêje erdnîgariya Seleskofa. B.Z. di 190'î de êrîşan dibin ser Seleskofa û erdnîgariya Sûryê ji destê wan derdixe. P.Z. di derdora 72'an de gelek Qiralyetên herêmê teslîmî Romayê dibin.
Ji bo ku azadiya xwe biparêzin Partî û gelên Arî yên din B.Z. ji 65'an heta P.Z. 226'an li hemberî Romayê bênavber li berxwe didin. Lê di vî şerê berxwedanê de qada şer erdnîgariya Kurdistanê ye. Ev şerê ku bi sed salan didome Kurdistanê wêran dike û di civaka Kurdan  de di warê afirenêrî û di civakbûyinê de pêşî li pêşketinan digre.

## *DI SERDEMA ROMA DE ZELANIY*

1. Zeleniyên Komagenê (Kummûhû)
**2. Zeleniyên Kapadokyayê**
**3. Zeleniyên Pontûsê**

**Zelaniy;** Kurdên ku ji milên êl (eşîr) ên Kurdan ên Milan û Zîlanan pêktên. Ji beriya Medan ve hebûna xwe diparastin. Ev êl (eşîr) di pêşketina Medan ên rojava de roleke erênî ya girîng lîstî bûn. Di serdema Persên Ahamenîta de jî xweseriya xwe bi navê qiraliyetên xwe yên piçûk parastin. Dîroknas Îzadî di pirtûka xwe de Komagene-Kowa weke koma ku ji klana Kurdan  tê, binav dike.
Zelaniyên Potnûsê B.Z. di 47'an de ji hêla Jûlyo Sezar ve ji holê têne rakirin. B.Z. di sedsala yekemîn de qiralyeta Erbîlê (Arbela) derbasî cûhîtiyê dibe. Heman qiralyet P.Z. di sedsala 4. de derbasî ola Îsa dibin.
**NÎŞE: Şerên ku di navbera Roma û Persan de 100 salî didomin Kurdên Rojavayê Kurdistanê perîşan dike. Herî zêde jî Kurdên ku ji Neolîtîkê vir ve li çiyayên Amanosan bi cih bibûn ew zirarê dibînin.**

**WANE 11.**

**Pirsên Amadekariyê**

1-Bingeha têkiliyên di navbera Kurd, Ermenî, Asûrî û Yahûdiyan xwe dispêre çi?
2- Armanca êrîşên Sasaniyan ên li ser Kurdistan û Amadê çi ne? 3-çima Sesaniyan felsefeya Hz. Zerdeşt pêjirandin, lê ew tinekirin?

## 5- TÊKILIYÊN ERMENÎ, SÛRYANÎ, YAHÛDÎ Û KURDAN

Di serdema navîn de û di rastiya Kurdan de Xirîstiyan, Ermenî, Asûrî û Yahûdi jî ji hevdû bi bandor bûne. Dema ku Xirîstiyantî nû derdikeve holê serdestiya Roma li herêmê gelekî bi bandor bû. Ermenî, Asûrî, Helenî û kêmek be jî li ser Kurd û Areban desthilatdariyek dida meşandin. Ola nû herî pirtir li ser Ermenî, Asûrî û Heleniyan bandora xwe kir. Di sedsala sisiyan de ev her sê gel jî bi piranî ola Îsavîtî pejirandine. Xirîstiyanbûyîn di wateyeke din de ji koledariya Romayê cûdabûyînek bû. Erka çêbûyîna netewperestiyê lîst. Ev rewş jî di perçebûyîna Romayê de erkek mezin lîst. Di çêbûna Romaya Rojhilat de bandoriyek mezin kir. Paşê di demeke kurt de Romaya Rojava jî bû Xirîstiyan. Ermenî, Sûryanî û Keldanî jî di demeke kurt de mezhebên xwe avakirin. Vê jî bi xwe re perçebûyînek di nav wan de çêkir.
Van gelan hem ji hêla madî, hem jî ji hêla zanabûnê de jî, ji gelên din ên Ereb û Kurdan pêşketîtirin. Her sê gel jî gelê herêmê yê herî kevinare û bajarvaniyê ne. Bajarvanî ji hêla çandê ve pêşketinê tîne. Li jorî wan gelên Kurd, li jêra wan jî gelê Ereb cih digirt. Xwedî derketina Bîzansiyan li Helenên ortadoksî, Sasanî jî li Ermenî û Sûryaniyan ew cûdabûyîna di navbera wan de pirtir zêde kir. Di sedsala 7'an de pêşketina Îslamiyetê cûdabûyînê zêdetir kir.Yahûdiyan weke her tim vê cûdabûyînê xûrtir dikir.

Bi derketina Îslamiyetê re erdingariya Kurdistanê bi navê Kurdînî hate binavkirin. Her ku çû erdingariya Kurdistanê di nav dewlet û netewan de bû qada şer.
Li bakurê Kurdistanê Ermenî, li başûr Sûryanî, li rojava Rûm û li rojhiletê wan Farisî cîh digirtin. Gelên Kurd bi van gelan û bajaran re her tim di nav têkiliyan de bûn. Kurd piranî karên şivantî û çandinî dikirin, Ermenî û Sûryani jî karên pîşekarî (zanatkarî) dikirin. Parvekirineke kar xwezayî hatibû çêkirin. Têkilî ji peymanek pirtir xwezayî pêşketibûn.Yahûdî jî ji kevin de bi erdingariya Kurdan re di nav têkiliyan de bûn.
Di vê serdemê de Kurd piranî ji ola Zerdeştî bûn. Lê belê kêmek ji Kurdan jî bibûn Yahûdî û Xirîstiyan. Piştî Îslamiyet kete herêmê ew rewşa ku hebû ji binî ve hate gûhartin. Li hemberî desthilatdariya Yahûdî û Roma, Îslamiyet li Iraq û Sûriyê pêşketibû.
Li Misrê li hemberî Xirîstiyanan jî heman rewş hatibû jiyan kirin. Tirkan li Anatoliya navîn li hemberî Rûm û Ermeniyan serdestî ava kiribûn. Li Kurdistanê, Kurd li hemberî ermenî û süryaniyan serdest bûn. Ev rewş ji bo serdestên Kurdan derbaz di be. Gel her tim bi hev dû re weke hev jiyan dikirin. Kurd, Ermenî, Asûrî û Sûryanî bi hev re weke dostan jiyan kirine. Têkiliyên di navbera wan de hertim baş bûn. Cûdabûyîna olî ti caran di navbera wan de nebûye sedemên pevçûnan û nexweşiyan. Rûxmê ku di navbera mîr û began de hertim şerê desthilatdarî hebû jî, lê di navbera gelan de her tim dostanî, wekhevî û yekitiya çandî hebûye.

Demê ku di Rojhilata navîn de ber bi dawiya serdema navîn hat, tekiliyên Îslamiyetê û Kurd bandoriya girîng kiribû. Hem ji milen erênî, hem jî ji mile neyînî de gelek tişt çebûn. Ziman û çanda Erebî li ser Kurdî gelek bandor kir. Çîna Kurdî ya serdest bi Îslamiyetê re bûn yek û bûn nokerê Îslamiyetê. Çîna din jî her ku diçû pirtir bindest dibûn. Di serdema sedsala 16'an de têkiliyên Kurd û Tirkan zêdetir pêşketin, lê di serdema sedsala 18 û 19'an de têkîliyên Kurd û Osmaniyan hatin gûhartin. Li ser Kurdan serdestî, çewsandin û helandineke çandî hate meşandin. Ev jî di têkiliyan de rewşeke neyînî avakir. Kurdên ku Îslamiyetê ne pejirandin, xwe weke Ezdayî û Elewî tevger kirin. Elewî nekaribûn rasterast Îslamiyetê red bikin û di navbera Îslamiyetê û Zerdeştî de mezhebek ji bo xwe avakirin. Ezdayî hertim dijber man hata roja me.

## QIRALIYETA ERMENIYAN

B.Z.190-P.Z.428

Ermenî B.Z. di sedsala 6. de hatine herêmê. Li gor hinek şîroveyan ji Anatolyaya navîn û Anatolyaya rojava hatine. Di dema Persan de weke herêm-Eyalet bi Persan ve girêdayî jiyîne. B.Z. di sedsala dûyemîn de dikevin bin serweriya Partan.

Pêkhatina Qiraliyeta Ermeniyan di bin rêbertiya **Qiral Arteshes** de B.Z. di 190'î de qewimî. Paytexta wan bajarê **Artaşhat** bû. B.Z. di 95'an de Qiral TIGRANÊ Mezin tê ser text û dewleta xwe pêşve dibe û xûrt dike. Bi xûrtbûnê erdnîgariya xwe fireh dike. Ji başûrê Wanê heta Erbîlê, ji Kafkasyayê heta deryaya spî Antakyayê dike bin serweriya xwe. Di vê demê de hergav êrişên Sasanî û Romayiyan jî li hemberî Ermeniyan hene. Bi van êrîşan yekî, Romayî B.Z. di 66'an de Ermeniyan têk dibin û dikin bin serweriya xwe.

## DI SERDEMA SASANIYAN DE KURD


B.Z. 224 – P.Z. 651 Qiralê Sasaniyan Ardeşer e. Paytexta yekemîn Fîrûzabad, paytexta dûyemîn Medaîn e. Ardeşer desthilatdariya xwe ji Îranê û Medanyê heta Afganîstanê û heta Hîndîstanê fireh kir. Di dema kurê wî Şapûr de ev firehtirbû û gihîşt heta Semerkantê. Li rojhilat êrîş birin ser Sûryayê û bi Bizansê dikevin nav şer. Piştî Zayînê di 244'an de Romayê têk dibin. Mezopotamya û Kurdistan dikevin bin serweriya Sasaniyan. Lê wexta ku Roma xwe bi hêz dibîne careke din li ser erdnîgariya Kurdistanê êrîşan dibe ser Sasaniyan. Şer û êrîşên di navbera Sasanî û Romayiyan de Kurdistanê tarûmar dike û erdnîgariya wê bê mirov dike. Ji bo erdnîgariya Kurdistan û Ermenîstanê bi dest bixin, Roma û Sasanî gelek caran êrîş birin ser hev û ketin nav şer. Di sala 502'an de Sasanî 73 rojan Amedê dorpêç dikin û bi dest dixin. 80 hezar kesî bi şûr qetil dikin. Carekê jî Romayî êrîş dibin ser Amedê û bi fermana serfermandarê Roma ji 12 salî berjortir herkes tê qetilkirin. Di 260'î de li hemberî Qiralê Sasaniyan Şapûr, qiralê Roma Fîlîp bi zirareke gelekî mezin têk diçe.
Desthilatdariya Sasaniyan 400 salan dom kiriye. Di dema Sasaniyan de Felsefeya Zerdeşt weke ol tê pejirandin û pêşdikeve. Di dema Şapûrê dûyemîn de pirtûka Zend di vê serdemê de careke din tê nivîsandin. Di dema Qiral Deryayam de **MANÎ** bi felsefeya xwe derdikeve pêş. Di sala 272'an P.Z. de dixwaze felsefeya xwe belav bike. Ji hêla gel ve tê pejirandin, lê bi cezayê îdamê re rû bi rû dimîne.
Romayî Manîzmê qedexe dikin, lê Tirkên Ûygûr Manîzmê dipejirînin û di 700'î de wek ol derbasî Manîzmê dibin. Manîzm; sentezeke Xirîstyanî, Bûdîzm û Zerdeştiyê ye. Yekîtiya olan û hezkirinê esas digre. P.Z. Di dema qiralê Roma KOSTANTÎN, sala 322'an de Xirîstyanî dibe ola fermî ya împaratoriya Romayê.

## WANE 12.

**Pirsên Amadekariyê**

1- **Naveroka felsefe û baweriya Manî çi ye?**
2- **Manî bi çi sedeman û ji aliyê kê ve tê kuştin?**
3- **Sê taybetmendiyên çanda Komagen bibêjin?**

## MANÎZM;



Felsefeya Manîzmê di sedsala 3'emîn de ji hêla Manî ve tê afirandin. Heta wê demê wek senteza tevahiya ola tê dîtin. Manîzm di navêroka xwe de Dûalîzma Zerdeşt, Folklora Babîlonyayê, rêgezên exlaqî yên Bûdîstê û hinekî jî nirxên xirîstyaniyê dihewîn e. Di vê pêkhatinê de rêgezên herî berbiçav şerê di navbera başî û xirabiyê de ye. Ji ber vê yekê hinek dîroknas Manîzmê wek oleke dûalîst dibînin. Ev felsefe him li rojhilat him jî li rojava gelekî bilez belav dibe. Heta bakurê Afrîka, Îspanya, Firansa, Îtalya û balkanan diçe. Lê herî pêşketinên mezin li erdnîgariya xwe li Mezopotamyayê bidest dixe. Li Tirkîstan, Hîndîstan, Çîn û Tîbetê jî belav dibe.
Manî navekî taybet nîne, navnîşaneke rêzgirtinê ye. Koka peyva Manî di zimanê aramiyan de ji "Mana" yê (wateya wê ronahiye) tê. Wateya "Manî" weke ronîdanê hatiye şîrove kirin. Navê Manî yê rastî nayê zanîn. Lê malbata wî diyar e. Bavê wî Fatak Babak e, dayika wî ji xanedana Arsaka Marmarjam e. Manî di 14 Nîsana 216'an de li bajarê Mêrdîn ji dayik dibe. Manî di ciwaniya xwe de bi bavê xwe re dikeve nav tarîqata "Manakkede". Bi perwerdeya olî re fêrî nîqaşê jî dibe.
Manî cara yekemîn di 20'ê Adara 242'an de di merasima derketina ser text yê Şapûrê 1. de derdikeve ser dikê, felsefa xwe diyar dike û bi girseyê dide nasîn.
Manî demeke dirêj welat bi welat digere û felsefeya xwe dide nasîn. Di dema van geran de ji bo ku felsefeya xwe bi hêz bike gelek nameyên dirêj dinivîse. Di dema Şapûrê 1. de tê girtin û dixin girtîgehê. Piştî mirina Şapûrê 1. azad dibe.
Cîgirê **Şapûrê 1.** kurê wî **Hûrmûz**ê 1. dema ku tê ser text piştgiriyê dide Manî. Lê mixabin desthilatdariya Hûrmûz tenê salekê didome. Di 274'an de Kurê Şapûr ê bi navê Deryayam birê xwe Hûrmûz ji text dûrdixe û tê ser text. Ev gûhertin dawiya Manî jî tîne. Şahê nû ji ber ku bi **Mazdeîzmê** ve girêdayî ye ji felsefeya din re neyîniye hişk e. Şah **Deryayamê** yekemîn di 276-277'an de Manî bi sê darê ve girê dide. Ji bo ku bandorê li rêhevalên wî bike, wan hetikîne-bicerisîne; çermê wî dipişt re, hûndirê wî tije ka dike û bi ketina bajêr ve dadilaqînin.

## KOMAGENE

Di dîroka Kurdan de yek ji pêkhatinên Kurdan ên balkêş û girîng şaristaniya Komagena ye. Ne tenê ji bo Kurdan ji bo mirovahiyê jî mînakek gelekî balkeş û gelekî bi rûmet e.
Împaratoriya Med- Persan ji hêla Îskenderê Mezin ve têkçû bû. Li ser vê kevneşopiyê Qiraliyeta Komagene pêşket. Qiraliyeta Komagene di dîroka Kurdan de ji hêla çandî ve xwedî cihekî taybet e. Minakeke gelekî hêja û bi rûmet e. Lê mixabin heta niha ji hêla dîroknasan ve ev taybetî û giringiya wê zêde nehatiyê dîtin. "kom" û "gen" peyvên Kurdî ne. Lê Helenan li gor diyalektika xwe şirove kirine û wek "Komagenes" bi nav kirine û li

çanda wê jî xwedî derketine. Ev bûye sedema ku çand û dîroka Komagene di nav dîroka Kurdan de neyê dîtin. Ev perçeyek siyaseta reşkirin û tarîkirina dîroka Kurdan ya aliyê desthilatdaran ve ye.

Qiralyeta Komagene; Li ser çiyayê Torosê ku ji hêla dewlemendiya daristanên xwe ve bi taybetî jî bi darê sedir navdare ava dibe. Cihê ku lê avabûye cihekî stratejîk e. Ji Hatayê heta Pinarbaşî ya Kayseriyê, bakurê Toros, bakurê Dîcle û Feradê destpê dike, bajarê Semsûr, Meletî , Xarpît, Dîlok, Mereş û Rûhayê tê de ji ernigariyeke fireh û dewlemend pêktê. Navenda Qiralyetê Samsat e. Her çiqas B.Z. ji 162'an heta P.Z. 72'an nêzî 230 salî serbixwe jiyabe jî lê şaristaniya Komagene ji beriya avabûna Komagene û pişt têkçûna Komagene demeke gelek dirêj jiyana xwe didomine û bandor li derdora xwe dike. Qiralyeta Komagene di navenda çarçetela çar riyan de cih digre. Rêya ku diçe rojava, rêya ku di ser Sûryê re ber bi şaristaniya Misirê ve diçe, rêya ku ber bi dewlemendiya rojhilat ve heta Hîndîstanê diçe û li wir dighêjin hev.
Em navê Komagene B.Z. di sala 850'an de di rûpelên dîrokê de dibînin. Di wê serdemê de navê Komagene wek Qiralyeta “Kummû” an jî “Kummûh” derbas dibe û di bin serweriya Asûryan de ye. Di nivîsên Qiralê Asûran de tê nivîsandin ku Komagena zêr, zîv û textên ku ji darê Sedir pêk tên weke bac dane Qiralê Asûran. B.Z. di derdora sedsala 7. de qiralekî Komagene li hemberî Asûran serî radike, lê têk diçe.
Bi hevkariya Med û Babîlan Asûr têk diçin. Di pişt têkçûna Asûran, sedsala 6. de herêma Komagene dikeve bin kontrola Babîlan. Împaratoriya Med- Persan B.Z. di 500'î de êrîşekê dibin ser Babîlan û wan têk dibin. Gelê Komagene jî ji vê salê û şûnde di bin kotrola Med-Persan de jiyana xwe didomînin. Ev jiyan heta B.Z. 330'an têkçûna Med-Persan didome. Piştî ku Îskenderê Mezin imparatoriya Med-Persan têk dibe ev herêm ji hêla arteşa wî ve tê dagirkirin û dikeve bin kontrola Helenan. B.Z. di 160'î de Qiralyeta Komagene dawî li desthilatdariya Helenan tîne û dibe weke qiraliyeteke serbixwe.
Tê îdakirin ku ev gel ji milekî eşirê Zelanî yê Kurd pêk tê. Di analizkirina etimolojiya peyva “komagene” de jî Kurdîtî tê dîtinin. Di zimanê Kurdî de peyva “kom” wateya “kombûyînê” an jî wateya “gundê biçûk” dide. “Gen” û “gel” ji wateyên ced û gel didin. Wextê ku “Kom” û “gen” biheve weke “komagene” bên ziman wateya “kombûyina eşiretan” an jî wateya “gelê cotkar-şivan” derdikeve holê. Ev nav jî ji bo civaka ku ji pir çand û zimanî pêk tê dide.

Qiraliyeta Komagene her çiqas bi pêşengî û rêbertiya Kurdan ava bûye jî lê, di nav xwe de Ermenî, Lûwî, Asûrî û Helenan jî dihewîne. Komagene şaristaniyeke ku di nav xwe de gelê rojava û gelê rojhilat bihev re dihewine û li ser çandekê dike yek. Herdû çanda digihîne hev. Esas girîngiya wê jî di vir de ye. Girîngiya wê ji pir çand, ziman û netewiyeyên wê tê. Erdnigariya Komagene wek e hêlina çandan e. Weke baxçê gûlan e, her gûlek bi rengê xwe dibiriqe. Ev cûreyên çandan weke konfederasyonekê bi hev re di nav aştiyê de dijîn. Qiraliyeta Komagene di dîrokê de cara yekemîn sentezekê ji çanda rojava û rojhilat diafirîne.

Şaristaniya Komagene ne tenê di warê çand û hûnerê de pêşketin bidestnexist bûn, heman pêşketin di warê bazirganiyê de jî bidestxistibûn. Komagene navenda bazirganiya Mezoptamya, Misir, Anatolya, Qafqasya û Makedonyayê bû. Ji bo qiralyeta Komagene hatina bazirganiyê dewlemendiyeke hêja bû. Nakokiyên di navbera Roma û Partan de bazirganiya di navbera rojhilat û rojava de asteng dikir. Di navbera van herdû hêzan de tenê Komagene serbixwe mabû û tenê bazirganên Komagene dikaribûn birihetî bi van herdû

hêzan re bazirganiyê bikin. Bazirganên Komagene ji bo bazirganiyê heta Hîndîstan û Çînê diçûn. Di şaristaniya Komagene de di warê bazirganî û zanaatkariyê de êl (eşîr) ên Ermenî, di çandînî , sewalkarî û leşkeriyê de êl (eşîr) ên Kurdan xwediyê roleke sereke û girîng bûn.

Qiralyeta Komagene qiralyeteke biçûk bû. Li dijberî herdû hêzên sûper Part û Roma ger ku demeke dirêj karibûye serbxwe bijî, ev tenê ne serkeftina leşkeriyê ye ev di heman demê de serkeftina pêşketin û dewlemendiya çand û saxlembûyina pêkhatina nav wê ye. Qiralyeta Komagene; dewlemendî, kevnarî û xûrtbûyina çanda Kurdan çespandiye. Ger Kurdan bi hezaran salan li hemberî polîtîkayên tûnekirin û pişaftinan heta îro wek netew hebûna xwe parastiye, deyndarê vê çandê ye. Di dema Îskenderê Mezin de Helenî di cîhanê de di warê leşkeriyê de xwediyê hêzeke herî mezin împaratoriya Med-Persan têk dibin. Ji gelê Anatolyayê ên wek,Troya, Frîgya, Lîdya, Lûwiyan di nav çanda xwe de dihelînin û tûne dikin. Ev pişaftinên çandî em di şexsê Komagene de jî dibînin ku wexta ku digêhêje sînorê Kurdan sist dibe û tû encam nagire. Ji ber ku rehên çanda Kurdan bi neolîtîkê ve girêdayîne û xwediyê çanda neolîtîkê ye, li dijberî çandên din bi rihetî li berxwe dide.

## WANE 13.

### Pirsên Amadekariyê

1- Beriya îslamê Kurd xwedî baweriyeke çawa bûn?
2- Kurdan bi hatina îslamê re çi winda kir?
3- Girêdana çanda îslamê û zayendîparêziya li kurdistanê bi hev re dahûrînin.?
4- Çima dema îslamyet dikeve Kurdistanê ji 20 hezar zêdetir jin-keçên kurd dibin çolên ereban û ji xwe re dikin heremiye?
5- Girêdana xiyaneta li Kurdistanê bi îslamîbûyînê ve çi ye?

### ÎSLAMIYET Û KURD

Mirov dikare bibêje derketina ola Îslamiyetê li ser çand û şaristaniya Rojhilata Navîn bandoreke mezin kiriye. Ji aliyekî ve qebîleyên Ereban ên belav û di nav xwe de gelek pirsgirekên mezin jiyan dikin, di bin navê ûmetê de wan tîne gel hev, ji derve jî pirsgirekên ku împaratoriya Bîzans û Sasanî jiyan dikin, dijbertiya ku di nav wan de hebû bi navê Îslamiyete derbasî serdemeke nû dike. Îslamiyet hem ji bo pirsgirekên Ereban, hem jî ji bo pirsgirekên ku ji Sasanî û Bizansiyan çêdibûn ji wan re bû weke dermanekî.

Di derketina Îslamiyetê de milê wê yê demokratîk û milê wê yê desthilatdarî jî heye. Arîstokratên qebîleya Kureyşan dibin rêvebertiya Mûaviye de çîna desthilatdar ava kirin, dibin rêvebertiya Hz.Elî de jî rêka navîn pêşxistin. Lê rêvebertiya Osman, Emer û Ebûbekir rê nedan rêvebertiya Hz Elî. Her çendî di navbera wan de şerekî dijwar pêşketibe jî, ên ku di bingeh de nûneriya civaka bindest dikirin Harîcî bûn. Van her sê xetan bi şêwazên cûda heta roja me, xwe dane berdewam kirin. Ev her tim bûye sedemên şer di nav civaka îslamî de û ev şer heta roja me didome.
Çanda Kurdan jî bi şêwazekî mezin bi derketina Îslamiyetê bandor bûye. Xanedaniya Emewiyan di serdemek pir kurt de hemû Kurd kirin bin serdestiya xwe. Bi Taybet kesen weke serleşkerê wan bi navê Haccac qirkirinek pir mezin li ser Kurdan da meşandin. Kurdên ku destên wan şûr digre piranî kuştin û jinên Kurd jî ji leşekerên xwe re birin, dest danîn ser zarokên wan. Di dîrokê de çawa di serdema Gilgamiş de Enkîdo hevkariya Gilgamiş çibe û çawa bi destê Gilgamiş Hûmbaba têk bir, çîna Kurdên serdest jî bûn hevkarê Îslamiyetê û di rêka wan de çanda Îslamiyet di nav Kurdan da xwe bi cih kir. Wan desthilatdarên Kurdan her ku çû bi Xanedaniya Emewiyan re bûn yek û bi dil tevlî bişaftina çanda Kurdan bûn. Heta wê demê di nav Kurdan de ti çîn tine bûn, lê bi pêşketina Îslamiyetê re ji bo berjewendiyên xwe hevkariya Îslamiyetê kirin. Ev jî di nav Kurdan de çîn çêkirin. Kurdên serdest ji Ereban zewac pêşxistin, çand û zimanê Erebî kirin cihe zimanê xwe. Di rêkan xwe re ev tişt li ser civakê jî ferz kirin. Heta wê demê di Rojhilata navîn de zimanê bibandor, zimanê Akad, Sûryanî û Aramî bû. Lê bi pêşketina Îslamiyetê re, zimanê bibandor bû zimanê Erebî. Ziman û çanda Erebî di hemû Rojhilata Navîn de belav bû.
Ji bo berjewendiyên xwe ên ku hevkariya Îslamiyetê dikin bi mezhebe sûnî ve girêdayîne. Ji ber ku di nava Îslamiyetê de nûneriya çîna serdest mezheba sûni dike. Ev çinên serdest weke nakorên Îslamiyetê di nav Kurdan de erk girtine, bişaftina li ser çand û zimanê Kurdî di rêkan van de pêşketiye.

Pêşwazîkirina Îslamiyetê di nav Kurdan de newekhev e. Bêşên berjewendîparêz ku hevkariyek kiribe jî, beşekî ji wan jî radest nebûne û li pêşberî wan berxwedan pêşxistine. Dîsa rewşa Kurdên çiya û Kurdên deştan newekhev e. Kurdên çiyan bitaybet ên ku xwedî kevneşopiyek êl(eşîr)an e zû bi zû Îslamiyet nepejrandine û vekişiyane çiyayan û berxwedan pêşxistine, an jî pir bi sînor dipejrînîn, weke Elewiyan. Zerdeştî ji rebazekî êlî zêdetir bi rebazeke olî dijbertiyê dikin û xwe bi navê Êzdî bi nav dikin. Ev xeta dijber ji Kurdên sûnî zêdetir taybetmendiya Kurdînî di nav xwe de diparezin.

Îslamiyetê di serî de pergala êl û qebîle derbaz kir, pergala gel û mîlet pêşxist. Di serî de ji bo Ereb, Faris, Tirkan, lê pir hindik jî ji bo Kurdan gelbûyîn an jî mîletbûyîn anî.

Derbaz kirina Kurdan a pergalên êl û qebileyên ber bi gelbûyînê ve çûnê ji wan re dibêjin kurmanc. Kurmanc; Kurdên ku ji êl(eşîr)an, qebîleyan qûtbûn û li derdora bajaran kombûn ava kirin re tê gortin.
Çîna Kurdan a berjewendîparêz û hevkarê desthilatdariyê, xwe bi rêbazên tarîqetan birêxistin kirin. Weke tarîqeta Geylanî û Nexşîbêndî. Her dem bi serdestan re bûn yek û daxwazên serdestan li ser civaka Kurd dan ferz kirin. Ji roja ku dest bi hevkariyê kirine, heta roja me ya îro weke nokerekî serdestan di nav Kurdan de kar dikin û di rêka wan de desthilatdarî li ser Kurdan tê meşandin. Hevkariya wan û ya desthilatdaran zilm û zorê li ser gel û civakên mûxalîf ên Kurd jî tê de li ser civakên Rojhilata Navîn zêde dike. Heta carna ev hevkarî weke hevkariya Siltanê Osmaniyan Abdûlhemît û rêberên Kurdan bi navê Alayên Hamîdiye dibe sedema qirkirina gelan jî. Weke tê zanîn ku di qirkirina Ermeniyan de rola Alayên Hamîdiye gelekî girîng e. Di serdema navîn de, çêbûna çîna arîstokratên hevkar de roleke wan ya gelekî girîng heye. Ev çîna hevkar dibe bingeha îxanetên ku weke ewrê tarî li ser Kurdistanê rûdinê û heta îro tê. Xanedana Kurdên ku tên asta dewletbûyinê jî, ji bo zimanê Kurdî tû afirandineke wan çênabe. Di vê serdemê de rêbertiya êlê, axatiya gund û şêxîtiya terîqatan weke çandekê di nav Kurdan de bi xûrtî tê rûniştandin.

Di vê serdemê de şer di navbera Sasanî û Bîzansiyan de berdewam dikir. Di sala 637'an de artêşa Îslamiyetê di bin fermana **Saad Bîn Wakas de** li Kadîşê dawî li împaratoriya Sasaniyan tîne û li Kurdistanê tevkujiyeke mezin pêktîne. Artêşa Îslamiyetê piştî ku bi ser dikeve, Kurdan di qirkirinekê re derbas dike û 20.000 jinên Kurd bi leşkerê xwe re dizewcîne, zarokên Kurdan jî weke dîlan bi xwe re dibin. Li milê din li Yermokê arteşa Îslamiyetê Bîzansiyan têkdibe û heta Sûriyê dike bin destê xwe. Di 639'an de bi navê **Îlyad Bîn Ganem** dikeve Kurdistanê. Nisêbîn, Cîzirê, Hesekê, Rûha, Farqîn, Bedlîs, Xelatê dike bin destên xwe û di bin navê ganîmetê de Kurdistanê talan dike. **Xalid Bin Welîd** jî dikeve Amedê, arteşa Îslamiyetê herî dawî di sala 653'an de heta Meletiyayê dixe bin destê xwe, di vê rewşê de Kurdistan bi tavahî dikeve bin bandora Îslamiyetê.
**Helbesteke ku di dema sefera Şarezor û Silêmaniyê de hatiye nivîsandin û li ser çermekî hatiye dîtin. Rewşa ku Kurdan di wê serdemê de jiyankirine bi rêbazeke gelekî balkêş tîne ser ziman;**

Hûrmûzgeh wêran bûn, agir tefiyan
Mezin mezinan xwe veşartin,
Erebên sîtemkar her der wêran kirin
Jin û keç dîl birin,
Mêrên çeleng di xwînê de hiştin
Ayîna Zerdeşt bê xwedî ma
Hûrmûzî bi kesî re alîkarî nekir

## HINEK GELÊN KU LI HEMBERÎ ÎSLAMIYETÊ DERKETINE.

Harîcî
Îsmaîlî
Babek Hûremî
Hesen Sabah
Ebû Mislimê Xoresanî
Karamîtî

## HARÎCÎ

Li Îranê ku di bin bandoriya mesîhîda ma bûn û Îslamiyetê ne pejrandin û li hemberî Îslamiyetê li berxwedidan, ji bo wan di gotin Harîcî. Harîcî şerê ku di navberî hz. Elî û Mûaviyê de derketibû, wê demê ew jî derketin holê.

## ÎSMAÎLÎ

Ew alîgirê hz. Elî ne. Ên ku ji fermana Sûniyan xilasbûne û dijberî Îslamiyetê ne. Oleke di navbera Manîzm û Hûrtemenîzmê de oleke nû dixwestin pêşbixînin. Ev mezhebê Îsmaîlê kurê Cafer ava kiriye. Rêgezê wan a bingehîn 7 kat erde û 7 kat asîmane. Ji bo wê hejmara 7 di wan de pîroz e.

Şaxên Îsmaîliyan
Mûstalî
Silêmanî Bûhra
Dawîdî Bûhra
Elewî Bûhra
Dûrzî
Nizarî

## BABEK HÛREMÎ

Hûremî olake batînî ye. Li derdora Azarbeycanê derdikeve holê, di 816'an de dibin revebertiya Babekî da pêşdikeve. Di 750'î de Mislim Xorasanî êrîşî Abasiyan dike, di encam da weke Xelîfeyê Abasiyan tê dest nîşankirin. Xelîfe Ebû Mensûr ji ber ku jê ditirse wî bi xapandinekê di 755'an de dide kuştin. Piştî wê dibin fermandariya Babekî de Kurd û Azerî bi hev re li hemberî artêşa Îslamiyetê şer dikin. Ji bo wê Îslam û Bizansî li hevdû dikin, êrîşeke mezin dibin ser Babek. Di 837'an de Abasî serfermandarekî ku bi eslê xwe Tirk e û navê wî Afşîne dişîne ser Babek û Babek têk dibe. Babek li bajarê Bexda li Samarayê dikujin. Berxwedana Babek 22 salan berdewam dike.

## HESEN SABAH

Hesen Sabah rêveberekî ji Elewiya ye. Perwerdeya 12 îmaman dibîne. Sê salan li Misrê perwerde dibîne. Sala 1081'an da tê Îsfahanê û têkoşînê dide meşandinê. Bi giştî li hemberî zilme şer dike. Di demeke pir kurt de alîgirên wî pir dibin. 1090 li kelha Alamûtê xwe bi rexistin dike. Ti kes di êrîşa vê kelê de bi ser neketiye. Li hemberî Abasî û Selçûkiyan sûîkasta pêşdixe. Hesen Sabah di sala 1124'an de dimire.

## EBÛ MISLIM XORESANÎ

Di 742'an de li hemberî Abasî û Emewiyan şer dike. Ebû Mislim Xorasanî piştî ku li hemberî Emewiyan bi ser dikeve erkê wî mezin dibe, lê Abasî ji vê rewşa wî ditirsin û bi lîstokekê wî didin kuştin.

## KARAMETÎ

Karametî di felsefa xwe de berdewama Îsmaîliyan e. Navê xwe ji rêberê xwe Hamat Keremetî girtine. Jiyaneke komîn dipejirînin û piranî ji Mazdeîzmê bibandor bûne. Di 874'an de derdikevin holê. Di demeke kurt de heta Bexdayê tên û hemû rêgezên Îslamiyetê ji nîkaşan re vedikin. Bi navê Fatimiyan li Misirê dewletekê ava dikin. Meclîsa ji 7'an çêdibe ava dikin. Hê jî hinek ji wan li Iraq û Sûriyê jiyan dikin.

## DI DEMA ÎSLAMÊ DE XANEDANIYÊN KURDAN

01-) Xanedaniya Bawandî (665-1349)
02-) Xanedaniya Xezbanî(906-1000)
03-) Xanedaniya Kengarî (916-1090)
04-) Xanedaniya Ziyarî (927-1090)
05-)Xanedaniya Kurdên bûweyhî (933-1062)
06-) Xanedaniya Kurdên Şeddadî (951-1174)
07-) Xanedaniya Rewadî (970-1071)
08-) Xanedaniya Hesnewî (Hesenewî) ( 959-1015)
09-) Xanedaniya Merwaniyan →Dostikî ( 983-1085)
10-) Xanedaniya Bedirxaniyan (983-1847)
11-) Xanedaniya Kakuyiyan (1008-119)
14-) Xanedaniya Eyûbiyan (1169-1400, kêmzêde)
15-) Xanedaniya Zend (1750-1797)
16-)Xanedaniya Hemdaniyan (929-1050)
17-)Xanedaniya Fedlawiyan (913-1424)

## WANE 14.

**Pirsên Amadekariyê**

1- Taybetmendiyên xenedaniyên Kurdan di dema îslamyetê de avakirine çi ne?
2- Çima xenedaniyên Kurdan her dem bi hev re jî şer kirine sedem?
3- Xenedaniya temenê wê herî dirêj kîjan e û çima dawiyê xwe ji rûxandinê xilas nekiriye?

## XANEDANIYÊN KU HATINE AVAKIRIN

### 1) XANEDANIYA BAWENDIYAN

Piştî helweşîna Sasaniyan di 665'an û şûn de derketin holê. Avakarê Xanedaniyê Bav e. Sê milên Bawendiyan hene. Milê yekemîn ji mîrên xwe re weke wateya serfermandar digotin îspehbed. Ev mil heta 1028'an jiyana xwe domandiye. Milê dûyemîn bi navê Mûlûk el-Cîbal dihat nasîn. Di 1210' an de ji hêla Herzemşahan ve dawî lê hat. Bi pêşveçûna Moxolan a rojava de milê sêyemîn derket holê. Ji van re digotin "Kîndhariye". Kîndhariye hebûna xwe heta 1349'an parast. Piştî herêma Bawandiyan ket bin serweriya Îslamiyan, li hemberî Îslamê jî gelek serhildanên wan çêbûn. Lê di tevahî serhildanan de têk çûn.

### 02) XANEDANIYA XEZBANÎ (906-1000)

Xanedaniya xwe di navbera Ûrmiye, Hewlêr û Mûsûl de avakirine. Ên ku Xanedaniya Xezbaniyan ava kiriye, Mihamed e. Weke nîvkoçerî jiyan dikirin. Nêzîkî sedsalî Xanedaniya wan jiyan dike.

### 03) XANEDANIYA KENGARÎ (916-1090)

Kengarî li rojavayê Îranê û Azerbaycanê desthilatdarî kirine.

### 04) XANEDANIYA ZIYARÎ (927-1090)

Ziyarî an jî Zeyarî ji hêla Ziyarva hatiye ava kirin. Meandan, Cûrcan, Tebrîstan li herêma Hazarê di 927 – 935'an de hatiye avakirin. Li başûrê Ziyarî ya deryaya Hazarê, dewletên ku cîranê wê bûn; Kurên Bûeveyiyan, Herzem Şah, Samanî, Azarbeycan. Ji hêla mîmarî ve gelek pêşketî bûn. Mîmariyên wan ên herî xweşik li bajarê Gûnbed-î Kavûs anit kule ye.
Di serdema Kabûs Kunbetî de zanisteke gelekî pêşketiye. Zanista weke El-Bîrûn ji hêla Hikumdar Kabûs ve hatiye domkirin. El-Bîrûn gelekî lêkolîn kiriye. Bi Taybetî jî di vê serdemê de di derbarê girtina hîvê de gelek encam bi dest xistiye. Kumbeta kabûs jî berî Îslamiyetê hatiye çêkirin û heta roja me ya îro jî li ser lingan e.

**Navên Xanedanên Ziyariyan**

- Mardavîc 928-934
- Vûşmgîr Ziyar 934-967
- Behsatûn 967-976
- Şemsû'l-Meâlî Kabûs bin Vûşmgîr 976-1012
- Feleku'l-Meâlî Kabûs bin Menûeçehr 1012-1031
- Anûşirvan Menûçehr 1031-1043

## 05) XANEDANIYA KURÊN BÛWEYHÎ (933-1062)

Ebû Şûcayê ku ji nesla melîkê Sasanî yê berê **Deryayam Gorî** tê, serekê êla Kurd a bi navê **Bercenkîawer**ê ku li çiyayên **Bûweyh Deylemê** dimanbû. Kurê Ebû Sûcayî pêşî bû waliyê bajarê Kerçê ku diketin başûrê Hemedanê. Pişt re gelek bajarên li başûr û yên derdora bi xwe ve girêdan. (di salan 932-933'an de)
Eliyê ku hêzdar bû bi alîkariya birayên xwe Hesen û Ehmedî bajarên Karzû û Şîrazê jî girtin.
**Xelîfeyê Bexdayê Kahir Bîlalî ji neçariyê xanedaniya ku van her sê biran danîbû qebûl kir.**
Bajarên Ahwaz û Hûzîstanê jî di sala 940'an de hatin girtin.
Xelîfeyê Ebbasî Mûtekfî Bîllah, ji hêla mîrekî xwe ve tê tengavkirin û ji kurên Bûweyhiyan alîkarî dixwaze û alîkariya wî tê kirin, mîrê ku navê wî derbas dibe Şerzad bêtesîr tê hiştin.
Xelîfe weke xelat nîşaneya Îmaddûdewleyê dide Eliyê ji Kurên Bûweyhan.
Mezheba xwe şîî bûn.
Di wextekî de navbera wan û Hemdaniyan xerabû û şer kirin, lê encam negirtin.
Di sala 1029'an de Ebû Talib Rûstem, ji hêla Gazneyiyan ve hat têkbirin û axa ku di herêma Farsê de ye ji Kurênbûweyhiyan hat standin.
Kurênbûweyhiyan ji ber şerên textê lawaz ketin. Tûgrûl Begê Siltanê Selçûkiyan ku Xorasanê bidest xistibû li DANDANAKANê bi wan re şer kir. Di vî şerî de navpişta wî şikiya. Pişt re di sala 1041'an de cardin şerkir û ew têk bir.
Tûgrûl di 1055'an de çû ser **Bexdayê.** Kurênbûweyhiyan ku Xelîfeyî ji text bi dûr xistibûn li Bexdayê jî têk birin û Xelîfeyê ku xwe parastibû Merwaniyan paşve anî û li ser textê darûniştandin. Xwîşka xwe bi Xelîfeyî re da zewicandin.
**Qonaxa dawî:** Di 1062'an de Ebû Nasir Xûsrev Fîrozê ku ji Kurênbûweyhiyanê ku li Mûsilê ne ye, girêdana xwe ya ji Tûgrûlî re dazanîn û ket bin serweriya wan. Bi vî awayî dawiya Kurênbûweyhiyan hat.

## 06) XANEDANIYA KURDÊN ŞEDDADÎ (951-1174)

Ji hejmarek mîrîtiyên di pêvajoya deshilatdariya Ebbasiyan de hatî damezrandin, yek jê mîrîtiya Şeddadiyane. Ev dewlet, di nava dewleta Kurd a Ziyar de hatiye damezrandin. Ji êl (eşîr) a Rewandî Mihemed Şeddadî yê kurê Kurdo di sala 951'an de, vê mîrîtiyê dadimezrîne. Selehedînê Eyûbî jî endamek ji yê êl (eşîr) a Rewandî bû.
Şeddadiyan, biqasî sed salan welatê xwe bi serkeftî birêvebirin. Bermayên dîrokî yên ji vê demê mayîn pêşketin û dewlemendiya vê mîrîtiya Kurd dest nîşan dike. Rêveberên Şeddadiyan girîngiyeke mezin didan hozanvan, nivîskar û mirovên zana. Bermayeke dîrokî ya bi navê Kabûsname de ev hatiye dest nîşan kirin.
Mîrîtiya Şeddadiyan jî piştî demeke din weke mîrîtiyên din yên Kurdistanê rastî êrişên Selçûqiyan hatin. Di sala 1064'an de Sûltanê Selçûqiyan Melikşah êrişî welatê Şeddadiyan dike û dawî li deshilatdariya wan tîne. Lê wisa xûyaye ku heya demeke din girêdayî Selçûqiyan di welatê xwe de rêveberî meşandine.

## 07) XANEDANIYA REWADÎ (893-1070)

Rewadî baskekî êla Hazbînî ye. Xanedaniya Rewadî dibin serokatiya Mihemed Rewadî sala 893'an de li Tebrîz û derdora wê hate damezrandin. Di 1070'î de ji aliyê Seçûqiyan ve hate têk birin.

## 08) XANEDANIYA HESNEWÎ (HESENWEY) (959- 1089)

Ev dewlet nêzîkî 171 salan berdewam kir. Ev dewlet di salên 959 ji hela serokê êla Barzikan- Barûnî ku kesê bi navê Hasan Bin Hüseyin ve hate avakirin. Ji Sehrezor, heta Dinavêr, Hamedan û herama Nihavend dibin destê wan da bû. Paytexta Hesnewiyan bajarê Sermace bû. Di salên 979 de Hasanweyî çû ser dilovaniya xwû û kurê wî Bedir ketê cihê wî. Di serdema bedîr de sînorê dewletê ji Ahvaz, heta Hûristan, Berûcerd û Esadabadînê fereh bû. Ji hêla Xelîfê abasiyan ve  Bedir bi navanîşana "Nasrûdîn" hate bi navkirin. Piştî ku Bedir di salên 1015 hate kuştin, kurê wî Xelîl kete cihê wî. Dema ku Xelîl jî mir kurê wî Tahîr derbasî cihê wî bû. Xanedaniya Hesnewî pîştî ku Tahîr mir heza xwe ya xûrt winda kir.  Piştî mirina kralê dawî Ebûl Mansûr dewlet di hûndirde gelek lewaz bû û ji ber vê yekê di salên 1121 da ji xweber belav bû.

## 9) XANEDANIYA MERWANÎ →DOSTIKÎ ( 983-1085)

### A. Pêvajoya Merwaniyan

Rayedarên Ebbasiyan yên di Kurdistanê de nûnertiya Îslamê dikirin, bi gelek awayan gelê Kurd neçarî dayîna bacên giran kiribûn. Vê nêzîkatiyê rê li ber nerazîbûnê vekir. Nerazîbûnên li dijî talana aborî çêdibûn, dibû sedema êrişên Ereban yên li ser herêmê. Ji derveyî talana aborî û li dijî vê nerazîbûna civaka Kurd, bi navê Îslamê dagirkeriya li ser welatê Kurdan  dihat pêkanîn jî, ji DIê gelê Kurd ve nedihat pejirandin. Gelê Kurd nerazîbûna xwe ya li dijî sazûmaniya Îslamê, bi cih girtina di nava terîqet û mezheban de dida diyarkirin. Şer û pevçûnên li ser vî bingehî rûdayîn, bû sedema lewazbûna deshilatdariya Ereban ya di Kurdistanê de.


Gelê Kurd ji sedsala X'an û pê de li her aliyê Kurdistanê dest bi serhildanê kir. Di encama van serhildanan de dewlet û mîrîtiyên serbixwe derketin holê. Yek ji wan dewletên serbixwe yên di Kurdistanê de hatin damezrandin dewleta Merwaniyan e.

**WANE 15.**

## Pirsên Amadekariyê

1- Dewleta Merwaniyan xwedî taybetmendiyên çawa bû?
2- Çima bi hatina îslamê re ziman û çanda kurdan hate qedexekirin û zimanê erebî çanda ereban hate sepandin?
**3-** Sedema hilweşandina dewleta merwaniyan çi bû?

## 1-DAMEZRANDINA DEWLETA MERWANIYAN




Damezrenerê dewleta Merwaniyan Bazê kurê Dostik e. Baz li dijî deshilatdariya Hemdaniyan ya ku beşeke girîng ji bakurê Kurdistanê di destê xwe de digirtin, serhildan dan despêkirin. Di vê serhildanê de gelê Kurd yê li herêma Amed û Meyafarqînê herî zêde li rex Baz cih girtin. Bi vî awayî bajarê Meyafarqînê ku navendeke girîng a dewleta Hemdaniyanbû, ji wan hat standin. Piştî girtina bajarê Meyafarqînê artêşên ji Helebê ji bo sezakirina Baz, ji aliyê rêveberên Hemdaniyan ve hatin şandin serneketin. Têkçûna Hemdaniyan bû sedema ji dest çûyîna bajarê Amedê jî. Bi vî awayî her ku çû deshilatdariya Baz belavî herêmê bû.

Di sala 985’an de Baz serxwebûna xwe da diyarkirin. Weke navênda dewletê jî, bajarê Meyafarqîn hat pejirandin. Baz, xebatên berfirehkirina sînorên dewleta xwe ji vir da meşandin. Bandora Hemdaniyan her ku çû lewazbû. Di demekê kin de herêmên Rûha, Amed, Xerpût heya Cizîr û Nisêbînê di nava sînorên dewleta Merwaniyan de cih girtin.
Berdewamiya deshilatdariyê û parastina sînorên dewletê, girêdayî rêveberiyekê xûrt û artêşekê bi disîplînbû. Bi vê boneyê Baz, girîngiyeke mezin dida xebatên rêveberiyê û artêşê. Birayê xwe weke parêzgerê Meyafarqînê dabû diyarkirin. Wî bi xwe jî bi artêşa xwe ve ji bo destxistina herêmên din têkoşîn dimeşandin.
Serkeftinên Baz, rêveberiya Hemdaniyan û xelîfeyê Bexda jî ditirsand. Ji ber vê sedemê hêzên Ebbasî û Hemdaniyan bi hev re êrişî welatê Baz kirin. Baz ji bo parastina welatê xwe berxwedaneke bi nirx da nîşan dan. Her di vî şerî de jiyana xwe ji dest da.

Dema Baz hat kuştin, xwarziyê wî yê mezin Hesenê Kurê Merwan gelê Kurd li derdora xwe da komkirin. Dijminê xwe şopand û piraniya wan kuştin. Piştî vê bûyerê çû Hesenkeyfê, ji vir jî berê xwe da Meyafarqînê. Li vê derê di sala 991'an de rêveberiya xwe da diyarkirin. Bi vî awayî rêveberî ket destê Merwaniyan.

Di vê pêvajoyê de Bîzansiyan leşker şandin li derdora Xelat, Melezgir û Ercîşê. Hesenê bavê Elî êrîşî wan kir û ew têkbirin. Bîzansiyan aşitî xwestin li ser vê çendê di navbera wan de Peymana Aşitiyê hat imze kirin. Bi berterefkirina metirsiya Bîzansiyan re, di welatê wan de aramî pêkhat.

## 2-Lewazbûn û Hilweşîna Dewleta Merwanî

Di Rojhilata Navîn de bi pêşketina deshilatdariya Selçûqiyan re, ji bo Merwaniyan jî metirsiyeke mezin derketibû holê.
Selçûqî, bi navê Îslamê tevdigeriyan. Wan hemû hêza xwe ji bo talan û wêran kirina civakan bikartanîn. Îslamê ji bo wan derfetên pir mezin afirandibûn. Kevneşopiya talanker ya Selçûqiyan û bîrdoziya Îslamê dema dibû yek, ji bo civakên Rojhilata Navîn metirsî derdiket asteke herî jor.

Dewlemendî û jiyana pêşketî ya dewleta Merwaniyan bala rêveberên Selçûqî pir zû kişa ser xwe. Ji bo dagirkirina herêmên di bin destê Merwaniyan de Wezîrê Împeretoriya Selçûqiyan Nizamûlmûlk ketibû tevgerê. Jixwe êrişên Selçûqiyan hêj di pêvajoya Tûxrûlê Selçûqî de despêkiribûn. Di sala 1043’an de dû fermandarên Tûxrûlê Selçûqî êrişî Amed û Meyafarqînê kiribûn. Her dû bajar hatibûn dorpêçkirin. Pişt re Selçûqî rastî êrişên Merwaniyan hatin. Di encamê de têkçûn û ber bi Bexda ve ketin rê. Ev serkeftin di pêvajoya rêveberê Merwaniyan Nasirûddewle de çêbibû. Nasirûddewle, welatê xwe qasê 53'ê salan bi serkeftî rêvebiribû.



Piştî mirina Nasirûddewle, birayê wî Nizamedîn ketibû şûna wî. Di vê pêvajoyê de (1064) hêzên Selçûqiyan careke din xwestin Meyafarqînê dagir bikin, lê biserneketin û paş de zivirîn.

Dewleta Merwaniyan ji vir û pêde jî demeke dirêj dibin gefên Selçûqiyan de ma. Carnan bi şer, carnan jî bi dayîna bacan welatê xwe ji êrişên wan parastin. Lê êrişên wan bi hişkbûneke mezin bê navber berdewam dikirin. Dewleta Merwaniyan di sala 1086’an de bi êrişeke mezin a Selçûqiyan re rû be rû man. Di vê salê de Amed û Meyafarqîn hatin dorpêçkirin. Dorpêça wan her dû bajaran salekê berdewam kir. Di sala 1087’an de li derdora Amedê şerekî mezin pêkhat. Di encama vî şerî de bajarê Amedê ket destê Selçûqiyan de. Bi heman awayî şerê li ser navenda Merwaniyan jî pir dijwar derbasbû. Li hember êrişên hovane yên Selçûqiyan bajêr hew karî xwe biparêze û ket destê wan de. Bi ketina Amedê re, bajarên din yên Merwaniyan jî yek bi yek ketin destê Selçûqiyan de. Rêveberê Merwaniyan Mensûr, li bakurê Bexda gundekî bi navê Herbe hat bicih kirin. Dewleta Merwaniyan biqasê sed salan jiyan kirî, bi vî awayî ji holê hatibû rakirin.

Piştî mirina Melikşah 1092'an Mensûr carekê din zivirî herêmê û ji Meyafarqînê welatê xwe rêvebir. Dema nûnerê Selçûqiyan hat herêmê, dawî li deshilatdariya Mensûr hat. Di sala 1096’an de gelê Amedê li dijî rêveberiya Selçûqiyan serîhilda. Lê ev serhildan jî bitûndî hat tepeserkirin.

Di demên cûr be cûr de di pirsgirêkên nav Selçûqiyan de jî bûn navbeynkar. Yek ji van di 1049'an de çêbû. Qarîs ku birayê Qiralê Bîzansiyan Constantîn bû ji aliyê fermandarê Selçûqiyan Îbrahîm Înan ve tê dîl girtin. Qarîs ji aliyê Merwaniyan ve tê rizgarkirin. Constantîn ji serokê Merwaniyan Nesrûldewlê dixwaze ji bo rizgarkirina birayê wî bibe navbeynkar. Nesrûldewle vê serkeftî pêktîne û qiralê Bîzans gelek diyariyan ji bo wî dişîne. Di navbera Stenbol û Meyafarqîn de gelek çûn û hatinên dîplomatîk hebûn. Têkiliya Merwaniyan bi Fatîmiyan re berfireh bû.

Merwanî li ser Meyafarqîn, Heskîfê, Melezgirt, Xelat, Ercîş û bakurê rojhilatê Wanê dibin serweriya Merwaniyan de bû.

Ji ber ku Merwanî li ernîgariyeke berfireh belav dibin, gelek cîdî tên girtin. Di demên wan yên herî nebaş de jî nikarîbûn wan bitevahî bikin hedef. Qiralê Bîzans Basilê dûyemîn dema di 1000'î de Meletî, Xarpût û çiyayên Karer de derbas dibe û tê Erezê diçe gel serokê Merwaniyan Mûhahîd Ad Daoûla Ebû Mençûr Saîd û girêdana xwe dide diyarkirin.

## B-DI ZIMAN Û WÊJEYA KURDÎ DE PÊŞKETINÊN ÇÊBÛYÎN

Bi deshilatdariya Ereban ya li Kurdistanê re, ziman û çanda Erebî jî roj bi roj bandora xwe zêde dikir. Bi taybetî di pêvajoya deshilatdariya malbata Emewiyan ya di nava Îslamê de, ziman û çandên civakên herêmê, derfetên xwe pêşxistinê winda dikirin. Zimanê Erebî bûbû zimanê fermî. Ji derveyî vê rewşê fêrbûna vî zimanî, bûbû neçarî jî. Netewperestiya Emewiyan ev çend ferz dikir. Çîna jor ya civaka Kurd, ji bo parastina berjewendiyên xwe, bi dilxwazî dibûn amûra siyaseta Ereban û dibûn Ereb. Çîna jêr jî rastî siyaseta tûnd dihat û dihate perçiqandin.

Her çiqas siyaseta Ebbasiyan li gorî ya Emewiyan hinekî din nermtir jî be, bandora ziman û çanda Erebî di vê pêvajoyê de jî berdewam kir. Ebbasiyan jî weke Emewiyan, derfetên xwe pêşxistinê ne-

didan ziman û çandên cûda. Di pêvajoya deshilatdariya Ebbasiyan de dewleta Merwaniyan hat damezrandin. Vê dewletê bi qasî sed salan hebûna xwe berdewam kir. Bi vê re li Kurdistanê rewşeke nû ya siyasî û civakî derketibû holê. Bi vê pêvajoya dewletbûyînê re, bandora ziman û çanda Erebî ya li ser civaka Kurd rolekê gelekî xirab leyîstî, hêdî hêdî lewaz bû. Di şûna wê de ziman û çanda Kurdî, derfetên pêşketinê bi dest xist û pêşket. Ji vê demê û pêde, zanayên Kurd ku heya wê demê bandora dagirkeriyê jiyan dikirin, êdî bi zimanê Kurdî berhem derxistin holê. Baba Tahirê Hemedanî, Melayê Bateyî, Feqiyê Teyran, Melayê Cizirî û bi taybet jî Ehmedê Xanî bi Kurdî berhemên pir girîng yên ku heya roja me bandora wan berdewam dike, derxistin holê.

## 10) XANEDANIYA BEDIRXANÎ (983-1847)

## 11) Xanedaniya Kakuyî (1008-119)

## 12) Xanedaniya Gor (1030-1215)

Ev Xanedanî li herêma Xoresanê hatiye avakirin. Dema **Sasaniyan** bi Hûniyan re şer kirin di sedsala 6. de êl(eşîr)a Goran ku li başûrê Hezarê dijiyan, ji bo sînorê xwe biparêzin bi zorê koçî Xorasanê hatin kirin. Damezrênerê yekem Eliyê kurê Sûrrî ye.
Di 1215'an de ji hêla Harzemşahan ve hate xirakirin û ketin bin venêrîna wan.

## WANE 16.

### Pirsên Amadekariyê

1- Çima selhedîn Eyûbî Împeretorî bi navê Kurda avanekir bi navê ereban û îslamyetê avakir.
2- Ger selhedînê Eyûbî ev xenedanî bi navê Kurda avakiribûna wê encamên çawa bi xwe re anîbûna?
3- Vê xenedaniya Eyûbî tiştek bi Kurdan da qezenckirin an na?

## 13-) XANEDANIYA KURÊN XÛRŞÎD (LORÎ) (1156- 1534)

Heta sala 1156 gelek êl(eşîr)ên Kurdan raste rast bi xelife ve girêdayîbûn. Ji bo herêma Kurdan , rêveber ji hêla xelife ve tev ji ereban dihatin pêwirdarkirin.
Di dema Hûsamedîn Şûhlû yê ku dibin serweriya Selçûqiyan de bû dû kurên Xûrşîd ên ku ji Eşîra Kurdan e Cengrevî bûn li heremê bandora xwe xûrt kirin û herêm xistin bin serweriya xwe.
Piştî ku Kurên Xûrşîd herêm xistin bin serweriya xwe gelek begitiyên Tirkan êriş birin ser herêmê. Herî dawî begekî tirk Hûsamedîn Xelîl Kurên Xûrşîd têk dibe û herêmê digre bin desthilatiya xwe. Di sala 1243' an de serdarê Bexdayê Şah Silêman bi alikariya xelîfe êrişekê dibe ser Hûsamedîn Xelîl û wî têk dibe. Serweriya herêmê carek din dihêlin ji Kurên Xûrşîd re.
Di 1258'an de bi êrişên Moxolan desthilatdariya xanedaniya Kurên Xûrşîd careke din dest gûherî. Şer û pevçûnên nav xanedaniyê hergav dibûn sedema gûherîna desthilatdariyê. Di 1335'an û şûn de serweriya Moxolan a li ser Kurdistan û Îranê bi dawî bû. Di navbera 1336 û 1405' an de Tîmûrleng ji Îranê heta Afganîstanê herêm tev girt bin serweriya xwe. Li vê herêmê di navbera 1405 û 1458'an de Karakoyûnî pêşdikevin. Ji 1458'an û şûnde jî Akkoyûnî pêşdikevin.
Di 1317'an de serdarê xanedaniya Kurên Xûrşîd Izedîn Mihammed wexta ku wefat dike hevsera wî Dewlet Xatûn dibe qiralîçe. Pişt re rêveberiya Xanedaniyê dihêle ji birayê xwe Îzedîn Hisên re.
Di 1534'an de ji ber êrişên derdor neçar ma ku bikeve bin serweriya Sefawiyan. Di bin serweriya Sefawiyan de weke xanedaniyekê hebûna xwe parast. Serweriya Sefawiyan heta 1736'an dom kir.

**NÎŞE 1:** Herêma Lor a biçûk heta dagirkeriya Moxolan bi girêdayî xelîfeyên Bexdayê bû. Pişt re demekê Moxol û Tîmûrleng ve girêdayî dimînin. Di pişt van re jî di bin serweriya Karakoyûn û Akkoyûnan de hebûna xwe diparêzin.

**NÎŞE 2:**Taybetiya vê xanedaniya herî mezin şer û pevçûnên deshilatdariyên navxweyî ne û bi vê ve girêdayî bi dek û dolap û bi komployan gelek gûherînên desthilatdariyê ne. ji van şer û pevçûnan welat wêran bûye û ne bûne xwediyê hêzeke pêşketî. Ji ber vê jî hergavê rêveberên xanedaniyê an jî yên ku bixwazin bibin rêveber bi hêzên derdor re ketine nav têkiliyên hevkar.
**Baba Tahirê Akbatanî** helbestvanekî vê serdemê yê herî girîng e.

## 14) XANEDANIYA EYÛBÎ (1169-1400, KÊM-ZÊDE)

Damezrênerê Xanedena Eyûbiyan Selehedîn di sala 1138'an de li Tikrîtê ji dayîkbûye. Ji ber ku navê bavê wî Eyûb bû, Împeretoriya damezrandin jî weke Împeretoriya Eyûbiyan tê bi nav kirin.

Malbata Selehedîn, ji beriya ku bên Rojhilata Navîn li Azerbeycanê li derdora Dîwînê bi awayekî koçer jiyana xwe berdewam dike. Eyûbî, endamên êl(eşîr)a Rewadî bûn. Rewadî jî girêdayî eşira di herêmê de bi hêz Hezbaniyan jiyana xwe didomandin. Herêma ku malbata Eyûbiyan tê de jiyan dikirin, dibin deshilatdariya Şedadiyan de bû. Bapîrê Selehedîn Şadiyê kurê Merwan jî di xizmeta Şedadiyan de kar dikir. Dema Şedadiyan xaka xwe windakirin, Şadiyê kurê Merwan bi malbata xwe re derbasî Iraqê bû û ket xizmeta Selçûqiyan de. Ji vir jî derbasî Tikrîtê bû. Selehedîn li vê derê jidayîk dibe.

Bavê Selehedîn û mamê wî Şêrgûh ji ber bûyerekê ji Tikrîtê derdikevin û li ser daxwaza Atabegê Mûsilê Nûredîn Zengî derbasî Sûryê dibin. Bavê Selehedîn Eyûb dibe parêzgerê Şamê. Malbata Eyûbiyan ji vir û şûnde girêdayî Nûredîn Zengî, jiyana xwe berdewam dikin. Selehedîn li Şamê di temenê 14 salî de tevlî artêşê dibe. Di pêşkeftina wî ya karên leşkerî de, bandorekê mezin ya mamê wî heye.

Di vê pêvajoyê de bajarê Qûdûsê dibin deshilatdariya Xaçperestên Ewrûpî de bû. Rojhilata Navîn bi pirsgirêkên siyasî û civakî re rû be rû mabû. Dewleta Selçûqiyan hatibû rûxandin, xaka wan ji aliyê Atabegan ve dihate rêvebirin. Xelîfeyên Ebasiyan tenê xwediyê berjengên Xelîfetiyê bûn. Li Misrê Dewleta Fatimiyan deshilatdariya xwe didomandin. Lê ew jî bê bandor bûbû û bi Xaçperestan re di nava hevkariyê de bû. Ji ber vê sedemê hêzeke ku bikaribe Ewrûpiyan ji herêmê biqewitîne tûne bû.

Di vê rewşê de Atabegê Mûsilê Nûredîn Zengî, ji tevlîheviyên di nava Fatimiyên Misrê de heyîn, sûd wergirt û dibin fermandariya mamê Selehedîn Şêrgûh de artêşek şand Misrê. Deshilatdarên Fatimiyan nekarîn li hember vê artêşê derbikevin, berevajî Şêrgûh kirin wezîrê dewletê. Hêj demeke dirêj derbas nebûyî, Şêrgûh jiyana xwe ji dest da. Li şûna wî biraziyê wî Selehedîn bû wezîr. Selehedîn, weke karê xwe yê destpêkê, dawî li deshilatdariya Fatimiyan anî (1171). Heya demekê Misrê li ser navê Nûredîn Zengî rêve dibe. Bi mirina wî re jî serbixwebûna xwe dide diyarkirin (1174).

Selehedînê Eyûbî, ji bo rizgarkirina bajarê Qûdûsê xebateke mezin dimeşîne. Bi artêşeke mezin ya ji Kurd, Ereb, Tirk û Farisan pêkhatî êrişî Xaçperestan dike. Di şerê Hîtînê de Xaçperestan têkdibe û bajarê Qûdûsê rizgar dike.

Rizgarkirina Qûdûsê ji destê Xaçperestan, di nava Cîhana Îslamê de dengek gelekî mezin veda. Civaka Kurd di vê têkoşînê de cihekî girîng digre. Rûmeta Îslamê ji aliyê rêberekî Kurd ve hatibû bilind kirin.

Piştî rizgarkirina Qûdûsê nav û dengê Selehedîn li herêmeke berfireh belav bûbû. Ji derveyî Misrê, Sûrye, Hîcaz, Yemen û Iraq ketin bin deshilatdariya wî. Dawî li deshilatdariya Atabegên Tirkmen yên herêmê anî. Xelîfeyê Bexda jî rêveberiya wî pejirand. Bi vî awayî Împeretoriyeke mezin a Eyûbiyan derketibû qada dîrokê.

Selahedîn ji Sînorê Îranê heta Heskîfê, ji Crablûs heta Misirê İmparatoriyeke mezin ava kir. Selahedînê Eyûbî  wexta ku di 4'ê Adara 1193'an de li Şamê mir pereyên wî  yên pê bihata definkirin jî tûne bûn. Tirba Selahedîn niha li Şamê di mizgefta Eyûb de ye. Piştî mirina Selehedîn di heman salê de împaratoriya Eyûbiyan a Kurd bi navê xanedaniyan ji hev perçe perçe bû. Herî dawî di 1517'an de bi helwîşina begîtiya Heskîfê dawî li xanedaniya Eyûbiyan jî hat.

## Xanedaniyên ku di bin banê împaratoriya Eyûbiyan de cih digirtin ev in

- Xanedaniya Eyûbiyan a Hûmisê (1178-1262) Memlûkiyan dawî lê anî.
- Xanedaniya Hema ( 1178-1341) Memlûkiyan dawî lê anî.
- Xanedaniya Baalbek (1178-1270) Moxolan dawî lê anî.
- Xanedaniya Kerek (1193-1260) tevlî Memlûkiyan bû. Xanedaniya Kerek a li derdora gola Lût ava bûbû.
- Xanedaniya Şamê (1193-1260) Moxolan dawî lê anî.
- Xanedaniya Halebê (1193-1260) Moxolan dawî lê anî.
- Xanedaniya Meyafarkînê (1200-1260) Moxolan dawî lê anî.
- Xanedaniya Yemenê (1174-1229) ji hêla Siltan Mesûd ve dawî lê hat.
- Xanedaniya Heskîfê (1232-1524) Osmaniyan dawî lê anî.
- Piştî mirina Selahedînê Eyûbî ev xanedanî tev bi serê xwe tevgeriyan û bûn sedema perçebûna Împaratoriya Eyûbiyan.

## 15-) XANEDANIYA ZEND (1750-1797)

Zendî êleke Kurd e. Ev êl(eşîr) ji dû milan Lor û Lekan pêk dihat. Ji hêla hêzên desthilatdar ve di dema Nadîr Şah de ji herêma Loristanê mişextî Horesanê bûbûn. Piştî mirina Nadîr Şah (1747) Di tevlihevî û aloziya li Îranê de bi rêberiya **Kerîm Xan** derketin pêş û 1750'an de bi rêbertiya Kerîm Xan desthilatdariya xwe li Îranê diyar kirin. Paytexta dewleta xwe bajarê Şîrazê diyarkirin. Di demeke kin de tevahiya Îranê girt bin desthilatdariya xwe. Kerîm Xan Kurdistan ji talan û wêrankirinê xelas kir. Di dema Kerîm Xan de Aştî û wekhevî li erdnigariya Kurdistanê serdest dibû. Kerîm Xan weke kesekî xêrker, dûrûst, naîf û efûker dihat nasîn. Dişibiya xizmê xwe Selahedinê Eyûbî. Rêberê Kurd Kerîm Xan tû caran navê Qiral bikar ne anî. Xwe weke “wekîlê gel” bi nav dikir. Ev kevneşopî ji bapîrên Kurdan Mîtaniyan dihat. Rêberê Mîtaniyan jî xwe weke “wekilê gel” binav dikirin. Rengdêrên weke Qiral hwd. Bikarnedianîn. Ev çand ji Mîtaniyan derbasî Medan, ji Medan derbasî Zelenan, ji Zelenan derbasî Eyûbiyan bûbû. Kerîm Xan ev kevneşopî dişopand. Zendiyan jî weke bapîrên xwe jin digirtin artêşa xwe ya leşkeriyê. (Niha ev çand di têkoşîna Kurdan de di PKK ê de didome.) Dewlet û artêşa Zendan ji tevahiya ol û baweriyê din re rêzgirtî bû. Bi taybetî jî arkeolokê Denmarkî Niûbûrh vê rewşê tîne ziman.

Di piştî mirina Kerîm Xan (1779) re dewleta Zendan ket valahî û aloziyê. Kurê wî Ebû el-Feth bû rêberê Zendan lê mixabin bi nezaniya xwe bû sedema qelsî û aloziyan. Ên ku pişt re jî hatin rêbertiyê, tû kes ji polîtikayên Kerîm Xan re nebû bersîv û serneketin.

Dewleta Zendan erdê ku di dema Safewiyan de ketibûn destê Osmaniyan ji destê Osmaniyan derxistibûn û erdnîgariya xwe fireh kirin. Xanedaniya Zendan her çiqas di demeke kin de jiya be jî di di warê hûnerê de gelek berhemên hêja derxistin holê. Di warê hûnerê de erêniyeke baş li cîranê Kaçara kirine.

Di 1789'an de biraziyê Kerîm Xan **Lûtf Elî Xan** bû rêberê dewleta Zendan. Neyarê Zendan yê domdar Kaçar bûn. Lûtf Elî Xan heta dawiya temenê xwe neçar ma ku bi Kaçara re şer bike. Di 1794'an de keleha Bemê de dîl ket destê Kaçaran û hat kuştin. Bi kuştina Lûtf Elî Xan 1794'an de dawî li Xanedaniya Zendan hat.

Berhemên Hûnerî yên Dîrokî ku di dema Kerîm Xan de hatine çêkirin ji wan çend ev in; Kelha wekîl a Şirazê, Bazara welîk û gelek Camî û bexçe ne. Qesra Tehranê jî ji hêla Kerîm Xan ve hatiye çêkirin. Wexta ku Kaçar dibin serdestê Îranê Tehran dikin paytext û vê qesra Kerîm Xan bikar tînin.

## Rêberên Zenda û Dema Rêbertiya Wan

**Kerîm Xan 1750 – 1779**
**Ebûl Fatîh Xan 1779**
**Elî Mûrad Xan 1779**
**Mihemed Elî Xan 1779**
**Sadik Xan 1779 – 1782**
**Cafer Xan 1785 – 1789**
**Lûtf Elî Xan 1789 – 1794**

## 16) XANEDANIYA HEMDANÎ (929-1050)

Bakurê rojavayê Kurdistanê bûbû qada şerê di navbera **Ebasî û Bîzansiyan de.** Kurd di 839'an de dibin rêbertiya Mîr Hesen de li hemberî xelîfe serhildanekê pêk tînin, lê bisernakevin. Di 890'an de ji Cûlemêrgê ji Mûsûlê heta Meletiyê li hemberî zilm û zora Ebasiyan careke din serhildanek dest pê dike û tê gotin ku di vê serhildanê de 500 hezar Kurd hatinê qirkirin. Êl(eşîr)a Kurd Hemdanî di 892'an de li hemberî Ebasiyan bi hevkariya êl(eşîr)a Ereb "**Bedewî Qlab"** serhildaneke din destpêdikin. Herdû êl(eşîr) jî bisernakevin. Di 896'an de Kurdên Xaricî yên Cezîrê de serhildanekê didin destpêkirin. Ji ber ku Kurdên Hemdanî yên Îslamiyet qebûl kirin bû di vê serhildanê de bûn aligirên xelîfe, di çavên xelîfeyan de bûn xwediyê qedir û rûmetê. (niha jî di çavê serdestan de qedir û kiymeta Kurdan girêdayî îxaneta li hemberî qewmê wan e.)

Ji ber ku herêma Hemdaniyan hergav qada şer e. Di 906'an de bi qasî 5000 Hemdanî koçî herêma Cûlemerg û Şirnexê dikin. Di navbera 912 û 932'an de Hemdanî herêma Sûrya û Bakurê Mezopotamyayê dikin bin serweriya xwe. Di 936'an de herêma Heleb**, Bedlîs û Xelatê** digrin bin serweriya xanedaniya xwe. Demekê Hemdanî Bexdayê digrin dest, lê xanedaniyan **Kurên Bûweyhî** li Bexdayê serdestî û serweriyê digrin destê xwe, Hemdanî neçar dimînin ku paşve bizîvirin sinorên xwe yên berê. Di 973'an de Mûsûl derbasî destê **Kurên Bûweyhi**yan dibe. Di 985'an de Meyafarqîn dikeve bin serweriya Hemdaniyan, lê di heman salê de cardin ji bin serweriya wan derdikeve.

Nakokiyên navbera Hemdaniyan dibe sedema şerê desthilatdariyê. Di navbera Hemdaniyên Mûsil û Hemdaniyên Helebê de şerên desthilatdariyê didomin. Di 1050'an de Hemdanî di şerê Selçûqiyan de têkdiçin. Hemdaniyên Helebê di 1039'an ji hêla dewleta **Ereb Ûkay** ve ji holê tê rakirin.

## 17)XANEDANIYA FEDLAWÎ (LOR) 913-1424

Herêma Lorîstanê dibin rêvebertiya herdû bira **Bedir û Mansûr** de dihat birêvebirin. Bi hatina koça eşirên Kurdan ên ku ji çiyayê Şimakê Şamê yên herêmê hîn zêde bi hêz bûn. Di derdora 1248'an û beriya wê bi taybetî jî di dema **Hezer Esef** de gelek bi hêz dibin û ji xelîfeyê wê demê gelek xelatan digrin. Di 1258'an de Hûlagû Xan Bexdayê digre bin serweriya xwe. Bi xanedaniya Fedlawiyan re dikeve nav şer û serokê wan **Tekle**yê dikuje. Xanedaniyê bi xwe ve girê dide. Di 1393'an de Tîmûr tê herêmê û tevahiya herêmê dike bin serweriya xwe. Xanedanî di serweriya Tîmûr de jiyana xwe didomine. Ev xanedanî heta 1424'an jiyana xwe didomîne. Di 1424'an de nebûyê Timûr **Mîrza Îbrahim** tevahiya Loristanê bi temamî dike bin serweriya xwe û dawî li xanedaniyê tîne.

## DI SERDEMA HARZEM Û MOXOLAN DE KURD

Harzemî di sedsala 12. de Tirkîstan, Rojhilata Navîna Îranê xistin bin serweriya xwe. Di sala 1217'an de êrîşek birin ser Bexdayê. Êrîşek birin ser Kurdên Zagrosan. Li hemberî Kurdan biserneketin û têk çûn. Bi hatina Moxolan ya herêmê, Harzemî têk çûn. Harzemiyan di sala 1226' an de êrîş birin ser herêma Mûş û Xelatê û ev herêm tarûmar kirin. Zirareke gelekî mezin dan Mûş û Xelatê.
Di sala 1230'an de Eyûbî û Selçûqî bi hevkarî êrîşek birin ser Harzemşaha û ew têk birin. Piştî vê têkçûnê Harzemşahî belawela bûn. Yên ku man dû re neçar man xwe vekşînin Azerbeycanê.

## MOXOLÎ -1247-?




Moxoliyan artêşa Harzemşahiyan dişopandin. Bi sedema vê şopandinê hatin ketin Herêma Amed, Mêrdîn û Wanê. Ev bajar talan kirin. Xwestin bikevin herêma Dêrsim û Hewlêrê jî. Lê berxwedaniya gel destûr neda bikevin van bajaran.(1247)
Moxolan di 1257'an de dibin serfermandariya Hûlagû de êrîşek birin ser Hemedan û Kirmanşahê. Li herêma Hewler û Mûsilê di navbera Moxol û Kurdan de şerên gelekî dijwar qewimîn. Pişt re êrîşek birin ser Bexdayê û Bexda bi destxistin. Bi destxistina Bexdayê dawî li xelîfetiya Ebasiyan anîn.

Moxoliyan berê xwe dan herêma Şehrezorê. Xelkê vê derê ji ber qirkirina Moxolan koçberî Sûryê, Misir û Cezayirê bûn. Piştî Şehrezorê Moxol di ser herêma Cûlemêrgê ve çûn. Lê li vir dijberî berxwedaniya gel serneketin.
Di 1259'an de Moxolan êrîş birin ser Cizîr, Mêrdîn, Meyafarqîn û Amedê. Ev bajar xistin bin kontrola xwe.
Êrîş û barbariya Moxolan li herêmê jiyan xetere kiribû. Herêm talan û wêran bûbû. Ev êrîş û barbariya Moxolan-Memlûkiyan bi serfermandariya Baybars dan sekinandin.
Di vê serdemê de gelek êl(eşîr)ên Moxol û Selçûqî hatin li Kurdistanê bi cih bûn.






## WANE 17.

### Pirsên Amadekariyê

1- Di dîrokê de têkiliyên kurd û tirkan li ser kîjan bingehan pêşdiketin û di van têkiliyan çima her dem aliyê kurd winda dikir?
2- *Peymana di navbera Yawûz Selîm û Mîrên Kurd de hatî Îmze Kirin li ser çi bingehan bû?*
3- *Di dema şerê çaldiranê de xiyaneta Îdrîsê Bedlîsî risteke çawa di xapandina kurdan de lîst?*

## DI SERDEMA SEFAWÎ Û OSMANIYAN DE TÊKILIYÊN KURDAN (1501-1737)




Dewleta Sefawiyan di 1501'an de ji hêla kurê Şex Heyder Şah Îsmaîl ve hate damezirandin. Şêx Heyder kurê şêx Cûneyd e. Ji ziryeta Seyfedûn tên. Li gor dîroknûs Ethem Xemgîn Koka wan ji êl(eşîr)ek Kurdan tê. Sefawiyan bi alîkariya Tirkmenan di 1503'an de Azerbeycan girtin bin kontrola xwe. Di 1507'an de jî bajarê Amedê girtin bin kontrola xwe. Pişt re jî Riha, Mêrdîn, Heleb û heta Mûsil ev herêm tev girtin bin kontrola xwe. Di 1508'an de dawî li desthilatdariya Akkoyûnan jî anîn.

## E- BI HATINA TIRKAN YA ANATOLIYÊ RE PÊŞKETINA PEYWENDIYÊN KURD Û TIRKAN

1. Şerê Melezgirê û Hevkariya Kurd û Tirkan Ya Pêşketî

Bi hatina Tirkan ya Rojhilata Navîn re, di herêmê de rewşeke aloz dest pê kiribû. Tirkan bi talankirina civakên herêmê jiyana xwe didomandin. Tirkan ji bo ku karibin di Rojhilata Navîn de cih bigirin Îslamiyet pejirandibûn. Milê Îslamiyetê wê yê siyasî pejirandi bûn. Ev ji bo wan derfetek mezinbû. Bi navê Îslamê heyînên civakên herêmê ji destên wan dertêxistin. Vê jî rê li ber hejariya mirovan vekir. Lê, hem misilman bûyîna civakên herêmê, hem jî xûrt bûyîna ziman û çanda wan, pêşî li daxwazên Tirkan yên talanker didan girtin. Ji ber vê sedemê berê xwe dan herêmên di destê Bîzansiyan de.

Siltanê Selçûqiyan Alpaslan di sala 1070'an de li ser navê Xelîfeyên Îslamê ji bo dagirkirina herêmên di destê Bîzansiyan de ji Xoresanê ket rê. Tirkmenên Azerbeycanê û Kurdên herêma Hemedanê jî tevlî artêşa wî bûn. Bi artêşeke mezin di bakurê Gola Wanê re derbazbû û hat hemberî Melezgirê. Piştî bajarên nêzîk dagirkirin, hat Meyafarqîn û Amedê. Li vê derê bi serokê Merwaniyan Nasirûddewlê re li dijî Bîzansiyan peymanek imze kir. Li ser wê peymanê, artêşek ya Merwaniyan tevlî artêşa Selçûqiyan bû. Merwaniyan herêma Bîzansiyan baş nas dikirin. Vê jî di dagirkirina xaka Bîzansiyan de rolekê girîng leyîst. Sedemên ku Kurdan bi Selçûkiyan re alîkarî kirin Selçûkî ji bo xwe dijminek ne didîtin û Bîzansiyan jî car, caran ji jor ve Kurd nerihet dikirin.

Di vê navê de Împeretorê Bîzansiyan Romen Diyojen daku derbazî Azerbeycanê dibe, berbi Serhadê ve ketibû rê. Alpaslan jî, ji bo pêşwazîkirina Bîzansiyan li ser Amedê, ber bi Xelatê ve tevger kir. Artêşên Selçûqî û Bîzansiyan li geliyê Zohd yê dikeve navbera Melezgir û Xelatê de hatin hember hev. Di vê navê de hejmarek mezin ji Tirkên Oxûz û Peçenek ji artêşa Romen Diyojen veqetiyan û tevlî Selçûqiyan bûn. Vê rewşê bandoreke neyînî li ser Bîzansiyan çêkir.

Şerê ku di vê rewşê de destpêkirî, bi serkeftina Selçûqiyan bi encam bû. Romen Diyojen bi birîndarî kete destê Selçûqiyan û artêşa wî belavbû (1071).

Ev şerê ku bi alîkariya Kurdan hate serxistin, di peywendiyên her dû civakan de, dibe gava yekem. Ji vî şerî û pê de deriyên Anatoliyê ji bo Tirkan vedibe. Kom bi kom Tirk derbasî Anatoliyê dibin û ev herêm dibe welatê wan.

Ji şerê Melezgirê heya sedsala XIV'an herikîna Tirkan ya vê herêmê berdewam kir. Ji beriya êrşên Moxoliyan û piştî wê ji Tirkistan, Xarezm û Xoresanê Tirkên direviyan, hatin Anatoliyê li wê derê nîştecihbûn.

## PIŞTÎ ŞERÊ MELEZGIRÊ REWŞA KURDAN

Alpaslanê Selçûqî, ji ber alîkariya wan ya di serkeftina şerê Melezgirê de herêma Kurdistanê Amed, Mêrdîn, Xerpût û derdora wan dabûn fermandarê xwe yê bi navê Artûq Beg. Erzirûm û derdora wê jî dabû fermandarekî din yê bi navê Saltûq Beg.

Bi vi awayî di Kurdistanê de mîrîtiyên Tirkmen derketin holê. Van mîrîtiyan li gel mîrên Kurdan jiyana xwe berdewam kirine.

Ev mîrîtiyên dabaşa gotinê, piştî demeke din ji aliyê Selehedînê Eyûbî ve ji holê hatin rakirin (1185).

## F-Di Kurdistanê De Pêvajoya Mîspî Û Mîreşan

### 1-Mîspiyan

Êl(eşîr)eke Tirkmenan ya weke Mîspiyan dihatin binavkirin hebû, "Ji ber ku Miha Spî (Peza spî) weke sembola wê êl(eşîr)ê dihat pejirandin, ji wan re Mîspiyan dihat gotin." Di dawiya sedsala 13'an de, di pêvajoya rêveberiya Argon Xanê Moxolî (1248 - 1291) de ji Xoresanê derbasî Azerbeycanê bûn. Piştî demeke din hatin derdora Xarpût û Amedê û li vê derê jiyaneke koçerî meşandin. Bandora wan her ku çû pêşket û ketin rewşa dewletê.

Damezrênerê dewleta Mîspiyan Osman Begê Reşbû.

Di seferên Tîmûrleng yên Rojhilata Navîn de, (1398) Mîspiyan alîkariya wî kirin. Bi taybet şerê di navbera wan û Osmaniyan de, Mîspiyan li gel Tîmûrleng cih girtin û di serkeftina artêşên Tîmûrleng de rol leyîstin (1402). Ji ber vê alîkariyê Tîmûr Amed û derdora wê da Osman Begê Reş. Osman Beg, heya sala 1435'an girêdayî Tîmûr û kurên wî mîrîtiya xwe da jiyankirin.

Neviyê Osman Begê Reş, Hesenê Dirêj di şerê deshilatdariyê yê bi Şehzadeyên din re serkeftî derket û di sala 1452'an de bû serokê Mîrîtiya Mîspiyan. Navenda vê Mîrîtiyê bajarê Amedê bû. Pêvajoya herî xûrt ya Mîspiyan, pêvajoya Hesen Begê Dirêjbû. Beşek mezin ji xaka Kurdistanê dibin deshilatdariya wan de cih digirt.

Di sala 1467'an de, serokê Mîreşan Cîhanşah di şerekî de ji aliyê Hesen Begê Dirêj ve hat kuştin. Bi vê bûyerê re xakên vê mîrîtiyê jî bi xaka Mîspiyan ve hat girêdan. Ji vir û pê de sînorê wan ji Xoresanê heya Çemê Ferad û ji Qafqasan heya deryaya Ûmman fireh bibû. Mîspiyan, yek ji Împeretoriya herî mezin ya dema xwe damezrandîbû. Paytexta Împeretoriyê jî, ji Amedê derbasî Tebrîzê kirin.

Piştî mirina Hesen Begê Dirêj, di navbera zarokên wî de şerê deshilatdariyê derkete holê (1478). Vê jî Împeretorî lewaz dixist. Împeretoriya Mîspiyan ji aliyê Şah Îsmaîlê Safewî ve ji holê hat rakirin (1503).

### 2-PÊVAJOYA MÎREŞAN

Yek ji dewletên piştî parçebûn û belavbûna Împeretoriya Moxol li Kurdistanê hatî damezrandin, dewleta Mîreşan bû. Ev dewleta ku reveberên wê Tirkmen bûn, di sala 1366'an de li derdora Wan û Ercîşê hat damezrandin. Damezrênerê wê dewletê Bayram Xoce bû. Di pêvajoya deshilatdariya Bayram Xoce de ji derveyî Mûsil û Şengalê, li rojavayê Azerbeycanê bajarên Xoy û Nahcîwan jî hatin dagirkirin. Dema Bayram Xoce jiyana xwe ji dest dide, di şûna wî de kurê wî Mihemedê Reş dibe rêveber. Ev kes bi Tîmûr re şerên dijwar dike û di derbazbûn û talankirina Kurdistanê de dibe asteng.

Piştî Mihemedê Reş jiyana xwe ji dest dide,  di şûna wî de Îsivê Reş dibe rêveber. Di pêvajoya Îsivê Reş de Kurdistan ji aliyê artêşên Tîmûrleng ve tê dagirkirin û li ser Kurdistanê  komkujî  û talan tên pêkanîn. Bandora zerer û ziyana di encama êrişên Tîmûr de li Kurdistanê pêkhatin, demeke pir dirêj berdewam kirin. Tîmûr kurê xwe Mîranşah, li Kurdistanê hişt û paşve kişiya. Lê kurê wî, ji bavê xwe zêdetir tûndî pêkanî. Rêveberê Erdebîlê Ezedîn Kurdî li hemberî zordariya Mîranşah serîhildan. Li ser vê serhildana ku di 1401'an de pêkhatî, Tîmûr careke din vegeriya Kurdistanê û tevkujiyeke hêj mezintir pêkanî.

Dema di sala 1405'an de Tîmûr jiyana xwe ji dest dide, Îsivê Reş bi alîkariya Mîrê Bedlîsê Şerefxan di sala 1408'an de careke din dewleta xwe damezrand.
Piştî mirina Îsivê Reş, neviyê wî Cîhanşah bû serokê Mîreşan. Cîhanşah alîgirê terîqeta Şêx Safiyûdîn bû. Ji ber vê çendê xebatên terîqetê di nava dewleta wî de eşker dihatin meşandin. Di nava vê terîqeta Şîa de hejmareke pir mezin Kurd hebûn. Ji ber ku bi awayekî serbest xebat dihatin meşandin, hejmara alîgirên terîqetê di nava deweletê de her roja diçû zêdetir dibû.
Di nava terîqetê de bandora neviyê Şêx Safiyûddîn yê bi navê Cûneyt roj bi roj pêşdiket. Piştî demeke din bi alîkariya Mîspiyan Cûneyt bû rêveberê Mîreşan. Di şerê pêkhatî de Cîhanşah hat kuştin. Bi vî awayî dewleta Mîreşan hat parçe kirin (1469).

## G- Di Şerê Çaldiranê De Peymana Di Navbera Yawûz Selîm û Mîrên Kurd de Hatî Îmze Kirin



Bi parçebûna dewleta Mîreşan re, li Îranê ji aliyê Şah Îsmaîl ve dewleta Safewiyan hat damezrandin (1502). Şah Îsmaîl, di demeke nêzîk de Azerbeycan dagirkir. Pişt re Amed xist nava sînorên dewleta xwe. Li sala 1508'an de dawî li dewleta Mîspiyan anî. Bedlîs, Heskîf û Cizîr ketin bin deshilatdariya Safewiyan. Bi vî awayî li bakurê Kurdistanê jî deshilatdariya xwe saz kirin.
Ji ber serkeftina Şah Îsmaîl ya di Kurdistanê de hejmarek mîr û begên Kurd yên wê demê, xwe nêzîkî Şah Îsmaîl kirin. Bi vê boneyê mîrên Heskîf, Bedlîs, Xîzan, Sason û hejmareke din kes da ku girêdanên xwe bidin diyarkirin û bi Şah Îsmaîl re hevdîtinekê pêkbînin, çûn Tebrîzê.  Di vê çûnê de Şah Îsmaîl ji ber hinek sedeman ev mîr û begên Kurd xistin zindanê. Ev kesên dabaşa gotinê, di demên cûda de ji zindanê reviyan û hatin welatê xwe.

Di vê navberê de li herêmê, piştî serkeftina Osmaniyan ya li dijî Bîzansiyan û dagirkirina paytexta wan Stenbol (1453), mêzîna hêzê hatibû gûhartin. Pêşkeftina Osmaniyan di herêmê de berdewam dikir.
Osmaniyan di herêmê de nûnertiya Îslama Sûnnî dikirin. Safewiyan jî nûnertiya îslama Şîa dikirin. Di nava sînorên Osmaniyan de girseyên Elewî hebûn, Elewî alîgirên Şah Îsmaîlbûn. Elewiyan, li dijî deshilatdariya Osmaniyan gelek caran serhildan li dardixistin. Ji ber vê çendê di navbera her dû hêzan de nakokî derketin holê. Ji vir û pêde di navbera wan de şerê deshilatdariyê destpêkirin.
Peymana Amasya ku di navbera Kurd û Osmaniyan de hatiye imzekirin.
Kurd di sedsala 16'an de di yekîtî û  rêbazekê de nedihatin meşandin. Bi rengekî xweser nezîkî 90 begîtî xwe birêve dibirin. Ji van begîtiyan hinek biçûk hinek jî mezin bûn. Ên ku di herêmê de desthilatdar bûn begîtiyên Kurdan  bûn. Peymana Amasya di navbera siltanê Osmanî Yawûz Selîm û bîst begên Kurdan  de hatiye imze kirin û heta serdema sedsala 18'an Osmanî û Kurdan  li ser rêgezên vê peymanê bê pirsgirêk bi hev re jiyan kirine. Piştî derketina fermana tanzîmatê û meşrûtiyetê; di demên Mahmûdê didûyan û siltan Abdûlmecîd de têkîliyên Kurdan  û Osmaniyan hatin gûhartin.

## H-Rola Îdrîsê Bedlîsî û Şerê Çaldiranê

Helwesta Şah Îsmaîl a li dijî mîrên Kurd, ji bo Osmaniyan rewşeke erênî derxiste holê. Ji ber ku mîrên Kurd yên ji Safewiyan rizgarbûyîn, xwe nêzîkî Osmaniyan kirin. Di vê nêzîkbûnê de Îdrîsê Bedlîsî roleke mezin dileyîze. Îdrîsê Bedlîsî li ser daxwaza Yawûz Selîm, di nava mîrên Kurd de dest bi xebatê dike. Alîkariya wan ji bo Osmaniyan bi dest dixe. Alîkariya mîrên Kurd di encama peymanekê de pêk tê. Ji vir û pêde Osmanî amadekariya şerên bi Safewiyan re dikin. Yawûz Selîm ji Stembol heya Kurdistanê li dijî Elewiyan tevkujiyeke mezin pêktîne. Hêzên Osmanî û Safewiyan di sala 1514'an de li deşta Çaldiranê tên hemberî hev. Di vî şerî de Osmanî biserdikevin. Osmaniyan paytexta Safewiyan Tebrîz dagirkirin û paş de zivirîn.

Piştî şerê Çaldiranê, di Rojhilata Navîn de bandora Osmaniyan roj bi roj zêdebû. Di encama şerên Mercîdabik (1516) û Ridaniyê (1517) de dawî li deshilatdariya Memlûkiyên Misrê anîn. Bi vî awayî deshilatdariya wan li herêmeke berfireh belavbû.

Her çiqas Safewiyan di şerê Çaldiranê de derbeyeke giran xwaribe jî lê heyîna xwe domandin. Şerê Osmanî û Safewiyan di navbera kurt û dirêj de berdewam kirin. Di dawî de bi Peymana Qesra Şirîn şerê her dû aliyan bi dawîbû. Bi vê peymanê re xaka Kurdistanê di navbera her dû hêzan de bû dû parçe (1639).

Peymana Bi Mîrên Kurd re Hatî Imze kirin, di pêvajoya dewletên Tirkmenan di Kurdistanê de, mîrên Kurd xwediyê hêzên mezinbûn. Lê ji ber ku hêza wan belavbû û nedikarîn di navendekê de kom bikin, girêdayî hêzên navendî di qadên xwe de jiyana xwe domandin. Ger bikarîbûna hêzên xwe bikin yek û li dijî dijminê xwe biketibûna tevgerê hêzên biyanî nedikarîn di welatê wan de bicih bibe. Ev rewşa wan ya parçebûyî her carê diket xizmeta dagirkeran.

Di şerê Çaldiranê de jî Mîrên Kurd mabûn di navbera Osmanî û Safewiyan de. Beşek li rex Osmaniyan, beşa din jî li rex Safewiyan cih girtîbû.

Ji beriya şerê Çaldiranê Yawûz Selîm bi riya Îdrîsê Bedlîsî dixwaze ku di navbera xwe de mîrekî hilbijêrin, lê wan nekarîbûn nûnerekî dest nîşa bikin. Hilbijartina vî nûnerî jî bi hêviya Yawûz Selîm ve hiştîbûn. Wî jî fermandarekî xwe yê bi navê Biyikli Mihemed Paşa weke nûnerê mîrên Kurd dabû diyarkirin.

Di vê rewşê de bi hevkariya mîrên Kurd şerê Çaldiranê hatibû qezenckirin û herêmeke berfireh ketibû destê Osmaniyan. Li ser wê çendê Yawûz Selîm bi mîrên Kurd re peymanek îmzekiribû. Bendên peymanê ev in:

1-Girêdayî rêveberiya Osmaniyan xweseriya Mîrên Kurd wê bihatiba parastin.
2- Di mîrîtiyên Kurd de rêveberî wê ji bav derbasî kurî bibûya.
3- Wê Kurdan di şeran de alîkariya Tirkan bikiriba.
4- Wê Tirkan jî li hember êrişên ji derve Kurd biparastana.
5- Wê Kurdan her cûrên bacan yên pêwîst bidabana Osmaniyan.

**WANE 18.**

**Pirsên Amadekariyê**

1- Di dema Osmaniyan de rewşa Mîrekiyên Kurdan çawa bû?
2- Têkiliyên di navbera Kurd û Îraniyan de li ser çi bingehan bûn?
3- Sedema şikestina serhildana Kelha Dimdimê çi bû?

## 1- Di Pêvajoya Osmaniyan de Rewşa Xweser ya Mîrîtiyên Kurd

Welatê Kurdistanê xwediyê xakeke berfireh û asê ye. Mirovên wê şervan û berxwedêr in. Ji ber van taybetmendiyan tû caran seranser û bi temamî nehatiye dagirkirin. Tevayî Împeretoriyên mezin hatine Rojhilata Navîn û di Kurdistanê re derbazbûne. Tevî van Împeretoriyan jî dem bi dem rastî berxwedanên gelê Kurd hatine. Di gelek jêderên dîrokî re ev rastî hatine dest nîşan kirin.

Ji ber taybetmendiya xaka Kurdistanê û gelê Kurd ya li jor hatî diyarkirin, dewlet û Împeretoriyên hatin Kurdistanê, rêbazên xirab bikaranîne. Ji ber ku nekarîne di encama şeran de dagir bikin, di navbera mîrên Kurd de bi gelek rêbazan neyartî pêşxistine. Bi vî awayî ew parçekirin û li hember hev bikaranîne. Parçebûna wan bi rêvebirina wan jî hêsanî dikir.

Kurd bi vê rewşa parçebûyî beşdarî şerê Çaldiranê bûbûn. Ji ber vê çendê jî ji aliyê her dû aliyan ve hat bikaranîn. Di encama şer de serkeftina Osmaniyan di Kurdistanê de rewşeke nû ya siyasî derxist holê. Bi vê bûyerê re bandorên Mîspî, Mîreşan û Safewiyan ku di Kurdistanê de xirabiyên wan gelek bûn, ji holê rabûbû.

Osmanî, bi peymana ku piştî şer bi mîrên Kurd re imzekirî ve girêdayî dimîne.

Şêx Îdrîsê Bedlîsî, li ser fermana Yawûz Selîm xaka Kurdistanê ya berfireh belavî herêman dike û di her herêmekê de mîrekî dike deshilatdar. Ev rêbaza parvekirina Kurdistanê ji aliyê Yawûz Selîm ve jî tê erêkirin. Ji vir û şûnde mîrên Kurd di herêmên xwe de bi awayekî serbixwe jiyana xwe domînin. Ev awayê serbixwetiya Mîrên Kurd heya sedsala 19'an berdewam dike.

## SERHILDANA KELEHA DIMDIMÊ (1608-1610)

Serhildana Kêleha Dimdimê destaneke Kurdan e ku di navbera 1608 û 1610' an de hatiye jiyîn. Di dewet û şahiyên Kurdan de weke stranekê hergav tê gotin.

Ev serhildan ji hêla êl(eşîr)a Dostkî ve di kêleha dimdimê de tê jiyîn. Keleha dimdimê nêzîkî bajarê Ûrmiyê ye. Qehremanê vê destana xwediyê milê zêrîn Emîr Xane. Emîr Xan di şerekî de ji ber ku alîkariya begê Soranê dike milekî wî ji hêla serdestan ve tê jêkirin. Di dema Şah Ebas de jê re milekî zêrîn tê çêkirin û berpirsiyariya herêma Mîrgever, Ûrmiye, Şîno û derdora wan didine wî. Demekê şûnde wexta ku nakokî di navbera wî û Îraniyan de derdikevin, dest bi şer dikin. Di keleha dimdimê de weke qehremanekî salekê liberxwe dide. Wexta ku êrîşkar bi xiyaneteke Kurd, hînî cihê qanala avê dibin ava kelehê qût dikin. Di kelehê de ji destê bê aviyê gelek tengezariyan dikêşînin. Lê disa jî heta şehadeta şervanê dawî li berxwe didin û tev şehîd dibin.

Taybetmendiya vê serhildanê ew e ku di vê kelehê de yê ku destê wî çek digre û dikare şer bike di xeta azadiyê de bi biryareke xûrt heta dawiyê tevî berxwedanê dibin û tev jî şehîd dikevin. Wexta ku tevahiya şervanan şehîd dibin pîr, jin û zarokên ku nikaribûn di şer de cih

bigrin ji ber nekevin destê neyaran kelehê tevî xwe dişewitînin û xwe tûne dikin. Ev xaleke gelek girîng e.

## Di Serdema Osmaniyan De Mîrîtiyên Kurdan Ku Hatine Avakirin.

1-Begîtiya Erdelanê
2-Begîtiya Çolemêrgê
3-Begîtiya Îmadiyê
4-Begîtiya Cizîrê
5-Begîtiya Bedlîsê
6-Begîtiya Mirdasî
7-Begîtiya Pale
8-Begîtiya Çermîkê
9-Begîtiya Sasonê
10-Begîtiya Xîzanê
11-Begîtiya Kilîsê
12- Begîtiya Çemîşgezekê
13- Begîtiya Şîrwanê
14- Begîtiya Zîrkanê
15- Begîtiya Sividî
16- Begîtiya Silêmanî
17- Begîtiya Baban
18- Begîtiya Mekrî
19- Begîtiya Biradostan
20- Begîtiya Mehmûdî
21- Begîtiya Dimbilî
22- Begîtiya Kelhorî
23- Begîtiya Banê
24- Begîtiya Zengî
25- Begîtiya Pazûkî




## *JI SEDSALA 15'AN VE TÊKILIYA DI NAVBERA KURD Û ÎRANIYAN DE*

Di heman deman de li Rojhilata Navîn dû împaratorî bilind dibûn; Osmanî û Safewî.
Hikumdarê Safewiyan Şah Îsmaîl, gelek qadên ku Akkoyûniyan lê hikum dikir, desteser kirin. Sînorên xwe heta Erzirûm, Erzîncan, Elezîz û Rihayê dorfireh kirin. Begîtiya Zûlkadir a ku navenda xwe Elbîstanê bû ji holê rakir û hema hema hemû Kurdistan desteser kir.
Şah Îsmaîl di sala 1507'an de Şîîtî weke ola dewletê îlan kir û dest pê kir ku vê ferasetê li ser Kurdistanê bide sepandin. Ji ber ku piraniya Kurdan Sûnnî bûn, pirsgirêkên ciddî derketin. Hem ji aliyê olî ve hem jî daxwaza ku li herêma xwe hakimiyetê bikin, Kurd û Şah anîn hemberî hev û din. Li ser vê yekê Şah Îsmaîl li Cizîr û derdora wê Ermenî, Ezdayî û Kurdan di qirkirinên komî re derbas dikin, bi deh hezaran Kurd û ermenî hatin kuştin.
Di beşa mezin a Kurdistanê ya ku di bin serweriya Osmaniyan de bû, weke awayên ku berê jî hatibûn diyarkirin, dîsa heman awa li ser parçeyê Kurdistanê yê ku di bin serweriya Îraniyan de bû hat pêkanîn. Safewiyan hem Kurd ji aliyê qismî ve bê xweserî hiştin hem jî di herêmên cûda yên împaratoriyê de di " parastina sînoran" de bikar anîn.
Weke mînak: Êl(eşîr)ên weke Şadî, Zeferanî, Keyûwanî yên ku milên bin Êl(eşîr)a Çemîşgezek in û Êl(eşîr)a Çeknî ya li Kurdistana Îranê, ji bo ku sînorê Rojhilatê Bakur a Safewiyan biparêzin ew şandin Horosan û Gûşanê. Ji bo li hember êrîşên Ozbekan ên ku ji

Rojhilatê Bakur ve bên, herêmeke tampon a ku van êl(eşîr)an pêk anîbû hatibû sazkirin. Şah Abbas di sala 1600'î de Şêx Elî Xan ( Serekê êl(eşîr)a Çemîşgezekê) ji bo herêmê weke mîr tayîn kir.

Pêkhatinên Kurdan ên xweser ên li Îranê, ji aliyê rêvebirên ku dê Kurd jî wan qebûl bikin û ji aliyê Şah ve hatibûn tayînkirin ve bajar dihat parastin. Ji wan re "Îlxan" dihat gotin. Li gorî ku Ewliya Çelebî diyar kiriye; navên hikumetên Kurd ên girêdayî Qesra Îranê ev in: **Kotûr, Pirdevzî, Cewlanî, Dimdimî û Denbûlî.**
Begîtiyên li Îranê, weke begîtiyên ku bi Osmaniyan ve girêdayî bûn, ne bê vîn bûn.
Di nav safewiyên şîî û Kurdên ku piraniya wan sûnnî bûn de her tim bê ewlehî hebû. Ji ber vê yekê jî bi ewlehiyê ve girêdayî asteke têkiliyê ya Osmanî – Kurdan tûnebû. Lê dîsa jî Kurdan di erdnîgariya xwe de xweseriya xwe ya qismî parastibû. Li Îranê jî serhildanên Kurdan ên li hember Safewiyan di dîrokeke zû de dest pê kir.

Qelsbûna navenda rêvebirinê, zordayîna begîtiyên ku otorîteya wan a herêmî bi hêz dikir, rê li ber serhildanan vekir. Êl(eşîr)ên Bradostê di sala 1608'an de li hember Safewiyan serî rakir. Kurdên di rêbertiya Emîrxan Bradostî de li Dimdimê, li hember Şah Abbas serhildaneke bêhempa nîşan dan. Tevî ku êl(eşîr)ên Mûkrî alîkarî kirin jî serhildan bi serkeftinê dawî nebû. Kelha Dimdimê bi efsane û kevneşopiya xwe ya devkî û nivîskî ya Kurdan , hatiye jiyîn û heta roja me hatiye. Dewleta Îranê ya Safewiyan li gorî Dewleta Osmaniyan lawaztir bû û pirsgirêkên wê zêdetir bûn. Ji ber vê yekê jî Kurdên Îranê zêdetir li hember pirsgirêkan mane.

Di sedsala 18. de bi giştî grîngiya Rojhilata Navîn a stratejîk qels bibû. Neteweyên ku ji bo pêşveçûna kapîtalîzmê rêberî kirine, (Îngilîztan, Fransa, Hollanda, Îspanya) ji bo ku li ser okyanûsan hakîmiyetê damezirînin, bi hev re ketibûn nav şer. Ji ber vê yekê jî nikaribûn ber bi Osmaniyan ve biçin. Ji aliyê din ve Dewleta Safewî ji holê rabûbû û di cihê wê de Xanedaniya Îran Katarê hatibû damezirandin. (1779-1925)

Her wiha ji rojhilat ve jî êdî hêzeke ku Osmaniyan tehdît bike nemabû. Awistûrya û Rûsya jî êdî hêdî hêdî giraniya xwe dabûn ser siyaseta cîhanê. Kurdên li Îranê ji serê sedsala 18. û bi wir ve bi Safewiyan re dest bi pevçûnê kiribûn. Di sala 1790'an, di şerê Afgan-Îranê de Îran gelekî qels bûbû û Kurdan dest bi tevgerê kiribû û erdên ku karîbûn desteser bikin car din hemû ji Safewiyan girtibûn.


Di sala 1719'an de Hamedan fetih kiribûn û çûbûn heta Îsfahanê. Safewî jî piştî vê pêvajoyê ketibûn pêvajoyeke şerekî navxweyî yê şiddet û di dawiyê de jî têk çûn û cihê xwe dan komeke êl(eşîr)ê ya ku Xanedaniya Kajanê bûn.

**WANE 19.**

**Pirsên Amadekariyê**

1- Peymana Qesra Şîrîn di kîjan demê de, li ser çi bingehan, di navbera kê de çêbûye û çima dîsa Kurd bûne mijara bazariyê?
2- Rewş û sedema rabûna serîhildanên sedsala 19. Çi ye?
3- Çima Kurd di van serîhildanan de bibinketine?

## PEYMANA QESRA ŞÊRÎN Û PARVEKIRINA KURDISTANÊ




Piştî şerê Çaldiranê (1514), di navbera Osmanî û Îraniyan de şer li ser Kurdistanê nêzîkî 130 salî dewam kir. Heta ku di sala 1639'an de Osmanî û Sefewî li hev hatin û li bajarê Qesra Şêrîn civiyan peymana Qesra Şêrîn di 1639'an de îmze kirin. Piştî vê peymanê, herêma Erdelan ji Îranê re dima, herêma Mûkrî û Şehrezor (Silêmanî) jî, ket destê Osmaniyan. Herêmên Kurdistanê yên din, weke mîrnîşîna Cizîrê, Ûmadiye, Soran û Baban jî, li ser rewşa xwe ya berê man. Lê şer ji Kurdistanê xilas nebû. Ji aliyekî ve şerê birakujiyê ji aliyekî din ve jî, dagirkeriya Osmanî û Îraniyan. Peymana Qesra Şêrîn bi her rewş û bendên xwe ve heta 1923 di jiyana Kurdan de cih girt û Kurdistan bi tevahî ket bin destê wan û di navbera wan de hate parvekirin û bû dû parçe.

Ji bo Kurd û Kurdistanê wateya peymana Qesra Şêrîn gelekî girîng e. Kurdistan cara yekemîn bi peymana nav dewletan dibe dû perçe. Ji serê Kurdistanê destpê dike, di ser Zagrosan re heta kendava Basrayê xetek tê kişandin. Çiyayên Zagrosan di navbera Osmanî û Safewiyan de dibin xeteke xwezayî. Ev xeta ku çarsed sal berê hatiye kişandin niha jî di navber dewleta Îran –Irak û di navbera dewlata Tirk-Îraniyan de derbasdar e. Ev xeta ku beyî îradeya Kurdan hatiye kişandin û Kurdistan perçe kiriye herdem ji Kurdê azad re bêwate bûye.



**Ehmedê Xanî bandora neyînî ya peymana Qesra Şêrîn a li ser jiyana Kurdan bi vê helbestê dianî ziman;**

Tasek ji vê ava zelal,
Nadim bi hewza Kewserê
Levhatina Qesra Şêrîn
Lê nabînim tû meferê
Piştî roja me bû tarî
Mirin xweş e ji emberê

## DI SEDSALA 19'AN DE REWŞA KURDISTANÊ Û SERHILDANÊN KURDAN

### A- SEDEMÊN SERHILDANAN

Di têkiliyên gelê Kurd û Osmaniyan de Şerê Çaldiranê **(1514)** cihekî gelekê girîng digre. Di vê dîrokê de cara yekeme ku peywendiyên Kurd û Osmaniyan dest pê dikin. Ev dîrok, di heman demê de dibe dîroka deshilatdariya Osmaniyan a li ser Kurdistanê jî.

Di despêka sedsala **16'**an de Kurdistan, di navbera Osmanî û Safewiyan de dibe qada şer. Şer û pevçûnên li ser welatê me di qewimîn de, ji derveyî talan û wêrankirina welatê Kurdan û kuştina hêjmarên mezin kes, tû encam ji şerê van her dû hêzên Rojhilata Navîn, ne dihat girtin. Li vê derê, di serketina Osmaniyan de rol û girîngiya gelê Kurd derdikeve pêş.
Mîrê Bedlîsê, Şêx Îdrîsê Bedlîsî, li ser navê siltanê Osmaniyan Yawûz Siltan Selîm, ji bo bi destxistina hevkariya êl(eşîr)ên Kurdan , dikeve tevgerê. Di encamê de, ji ber ku piraniya Kurdan ji mezheba Sûnnî bûn û Osmanî jî weke nûnerên mezheba Sûnnî dihatin naskirin, êl(eşîr)ên Kurd hevkariya Osmaniyan dipejirînin. Bi vê hevkariyê, Şerê Çaldiranê yê di navbera Osmanî û Safewiyan de çêbûyî, bi serketina Osmaniyan bi encam dibe.
Ji vê dîrokê û şûnde, êl(eşîr)ên Kurdan di nava xwe de weke hêzên otonom-xweser, di têkiliyên ji derve de jî, girêdayî dewleta Osmaniyan jiyana xwe domandine. Di tevaya şerên wan de, her carê cihê xwe bi zêdahî girtine.
Pêwendiyên gelê Kurd û Osmaniyan heya despêka sedsala **19'**an bi vî awayî domane.
Bi şoreşa Franse re **(1789)** cîhana me dikeve rewşeke nû û ji berê cûdatir. Têgihên netewperestî, azadî, demokrasî û mafê mirovan zêdetir tên bikaranîn û bandorê li jiyana civakan dike. Ji despêka sedsala **19'**an **(1804)** û pê de têgehên ku hatin diyarkirin, bi rêya mîsyonerên Ewrûpî, derbasî nava xakên dibin dagirkeriya Osmaniyan de jî dibin. Civakên li herêma Balkan û Erebîstanê, yên Bakurê Efrîqa û xirîstyanên Ermenî û Asûrî, zûtir ji vê rewşa nû bandor dibin. Lê, kêm jî be gelê Kurd jî para xwe ji pêşketinên nû digre.
Li dijî deshelatdariya Osmaniyan, serhildanên ji bo azadiyê yên li van herêman çêdibûn û xakên ji destê Osmaniyan derdiketin, Osmanî neçarî girtina hinek biryarên nû dikirin.
Di piraniya şerên di vê sedsalê de pêkhatin, bi taybet şerên li hember Rûsya bi têkçûna hêzên Osmaniyan bi encam dibûn. Bi vê re bandor û hûkmraniya Osmaniyan a li ser herêma Kurdan jî lewaz dibû. Êdî Kurdan weke berê, di leşker dayîn û bac dayînê de xwe neçar nedidît. Mîrên Kurdan zêdetir derfetên xwe bi rêxistinkirinê bi dest dixistin.
Dewleta Osmanî ji tirsa ku wê tevahî xakên dagir kirin ji destê wan derkeve, sala 1810'an biryara navendîbûnê girtibû. Di herêma Kurdistanê de, bi bandora sazûmaniya rêveberiyê ya Franse, di xwestin Kurdistanê belavî eyaletan bikin û li van eyaletan jî, nûnerên xwe bi cih bikin.
Li aliyekî xwesteka navendîbûna mîrên Kurdan ku ew demeke dirêj bû weke nîvserbixwe dijiyan, li aliyê din biryara Osmaniyan ya di welatê Kurdan de careke din bûyîna deshilatdar, dibû sedemên êrîş û serhildanan.
Serhildanên mîran yên di vê sedsala 19'an de çêbûyîn, zêdetirîn ne bi hestên welatparêziyê, lê bi armanca parastina deshilatdariyên xwe yên li ser herêmên xwe pêkhatine.
Di sedsala **19'**an de serhildana yekemîn li dijî dehilatdariya Osmaniyan di Kurdistanê de, li herêma Silêmaniyê, ji aliyê Evdirehman Paşayê Baban ve hatiye li darxistin.

**Serhildana Mîrê Baban (Evdirehman Paşa)—1806**
**Serhildana Ehmed paşa-1812**
**Serhildanên gundiyan a di navbera 1815 û 1829'an ( li hember beşa Osmaniyan)**
**Serhildanên gundiyan a navbera 1840 û 1842 an (li hember beşa Îranê)**
**Serhildanên Kurdên Ezdayiyan - (1826-1839)**
**6- Serhildana Seid beg (1833-1838)**
**7- Serhildana Mîr Mihemedê Rewandozî-1830**
**8- Serhildana Îsmaîl Begê Behdînan-1835**
**9-Serhildana Bedirxan Beg-1842**
**10- Serhildana Êzdîn Şêr-1855**
**11-Serhildana Şêx Ûbeydûlahê Nehrî-1880**

# UNÎTE 3.

## WANE 20.

1-SERHILDANA BABANZADE EVDREHMAN PAŞA (1806-1808)

## WANE 21.

2-SERHILDANA EHMED PAŞA-(1812)

3-SERHILDANÊN GUNDIYAN A DI NAVBERA 1815 Û 1829'AN DE (LI HEMBER OSMANIYAN)

## WANE 22.

4-SERHILDANÊN GUNDIYAN YÊN DI NAVBERA 1840 Û 1842 AN DE (LI HEMBERÎ ÎRANÊ)

5-SERHILDANÊN KURDÊN EZDAYÎ (1826-1839)

6-SERHILDANA SEÎD BEG (1833-1838)

## WANE 23.

7-SERHILDANA REWANDOZÊ (1830-1837)

8-TEVGERA ÎSMAÎL BEGÊ BEHDÎNAN

## WANE 24 .

9-SERHILDANA BEDIRXAN BEG (1842-1847)

## WANE 25.

1- Hewildana Osman Û Hisên Kenan Beg

2- Hewildana Emîn Elî û Mîthad Beg

10-SERHILDANA ÎZEDÎN YEZDANŞÊR (1854-1855)

## WANE 26.

JI 1850'Î ŞÛNDE PERGALA CÎHANÊ Û ROJHILATA NAVÎN

## WANE 27.

9-SERHILDANA ŞÊX ÛBEYDÛLLAHÎ (1880-1882)

## WANE 28.

SERHILDANA ŞÊX ÛBEYDÛLLAH -2

SERHILDANA ŞÊX ÛBEYDÛLLAH-3.

Şêx Ûbeydûllah Gihîşt Stenbolê

## WANE 20.

### Pirsên Amadekariyê

1- Begtiya Babanan çawa karî sêsed salî têkiliyên xwe bi Osmaniyan re xira neke?
2- Çima bi kurdan re taybetmendiya meşandina dîplomasiyê lewaz e?
3- Di şikestina serhildanan de herî zêde kîjan taybetmendiya Kurdan ji aliyê dijminê wan ve hatiye bikaranîn?

### 1-SERHILDANA BABANZADE EVDREHMAN PAŞA (1806-1808)

Êla Babanan ji salan 1500' î û heta pêvajoya ku ji hêla Osamaniyan ve têne têkbirin, di dîroka Kurdistanê de xwediyê roleke gelekî girîng in. Mîrên Babanan di dîroka Kurdistanê de risteke girîng lîstine. Di serê sala 1600'î de, ji çend êlên Kurdan ên ku nîşana paşatiyê di dest wan de ye ji wan yek jî êla Babanan e. Êla Babanan nêzîkî sê sed salî girêdana xwe ya bi rêvebiriya Osmaniyan re parastine. Babanan car caran li gor konjoktûra siyasî di hinek rewşan de bi rêvebiriya Îraniyan re jî hinek têkiliyên xwe bi pêş xistinbin jî çarçoveya têkiliya wan a bi Osmaniyan re bi sed salan negûheriye.
Di destpêka sedsala sala 19. de ji Başûrê Kurdistanê beşek mezin di bin serweriya Mîrîtiya Baban de bû. Paytexta wan bajarê Silêmanî bû. Mîrîtiya Babanan bingeha hêza xwe ya leşkerî ji êla Caf û Hemawandan digirtin. Herdû êl jî êlên koçber bûn û bi sed hezaran nifûs û bi deh hezaran jî şervanên wan hebûn. Di rastiyê de konfederasyona êla Caf û Hemawand êlên ji hezeran şervanan pêk dihatin ku her dem ew amade dihîştin û karibûn bixine şer. Mîrên Babanan, di heman demê de damezrînerê bajarê Silêmaniyê ne. Bajarê Silêmaniyê ji hêla Îbrahîm Baban Paşa ve hatiye avakirin. Mîrîtiya Babanan xwe weke dewleteke bi rêxistin kiribû û bi qasî dewleteke gelek sazî ava kiribûn. Xwe bi rêxistinkirinê de û ava kirina saziyên weke leşkerî, aborî û rêvebirinê de dewleta Îran û Osmaniyan jixwe re minak girtinbûn.

Di serê sedsala 19. de rewaşa ku Împaratoriya Osmaniyan di nav de bû, pêwist dikir ku Mîr û began bigrine bin venêrîna xwe. Ji ber her ku diçû Osmanî ber bi qelsbûnî û lewaziyê ve diçû û diket nav fikaran. Ji erk û hêza began ditirsiya. Erk û hêza begiyan ji bo perçebûna imparatoriyê weke xetere didîtin. Ji ber vê jî bi siyaseteke nû xwestin heza wan tûne bikin û hûkumraniya navendî li ser mîr û begîtiyan ferz bikin ku nikaribin bilebitin. Gava yekemîn a vê polîtîkayê jî li hemberî mîrîtiya Babanan hate avêtin.
Wexta ku serokê mîrîtiya Babanan Îbrahîm Paşa mir li gor kevneşopiya sedsalan diviyabû ji malbata wî yek biketa dewsa wî. Li gor vê kevneşopiyê jî diviyabû biraziyê Îbrahîm Paşa, Evdrehman Paşa bûbana serokê mîrîtiya Babanan. Lê rêveberiya Osmaniyan destwerdana vê kevneşopiyê kir û di şûna Evdrehman Paşa de yê ku nêzî wan e û bi wan ve girêdayî ye Xalîd Paşa kirin (waliyê Silêmanî) mîrê Babanan. Osmaniyan bi vê destwerdanê xwest di nav êlê de aloziyan derxe, perçebûnê çêke, şer çêke, yekbûna wan xira bike û êla Babanan ji hêzê bixîn e. Bi sed salan bû li gel ewqas bê derfetî û feqîriyê jî ji bo jiyaneke xweser dîsa Kurdan bac û leşker didan Osmaniyan lê bi vê destwerdanê Kurdan xweseriya xwe jî wenda dikirin. Êdî nikaribûn Mîrê xwe jî diyarbikin û di têkilî danîna nav xwe de û bi derdora xwe re jî ne azad bûn. Kurdan wateya vê destwerdanê baş fêm kiribûn. Di nav êla Babanan de nerazîbûn û acizbûn her ku diçû zêde dibû.

Evdirehman Paşa him weke pêşengê êlê dihat dîtin û him jî niheqiyek lê hatibû kirin. Li hemberî van acizbûnan û niheqiyan bersîvdayîn diket ser milê wî. Evdirehman Paşa di sala 1789'an de bû rêveberê êla Babanan. Evdirehman Paşa li hemberî van polîtîqayên ku bûbûn sedema nerazîbûna êlê neçar ma ku di 1806'an de serhildanê bide destpêkirin. Di serî de waliyê Osmaniyan yê Koysancakê dil girt û ji koysancaqê qewitand. Pişt re jî êrîş bir ser Bajarê Silêmanyê û li hemberî Xalîd Paşa yê ku Osamniyan pêwirdar kiribû şer da destpêkirin. Hinek nivîskarên ku naxwazin rastiya naveroka vê serhildanê bibînin vê serhildanê bêwate bikin sedema serhildanê tenê hesûdiya Evdrehman Paşa nîşan didin. Dibe ku bandora kesayetiya wî jî hebe, lê tenê bi wî ve girêdaybû, ger wisa be wê bixwe re nedîtina rastiya dîrokê jî bi bîne. Ji ber ku serhildana Babanan destpêka pêvajoyê serhiladanane Fêmkirina rasteqîniya wê ji bo fêmkirina rasteqîniya serhildanên din jî gelekî girîng e.

Berî ya her tiştî di wê serdemê de li Kurdistanê xizaniyeke gelekî mezin heye. Sîxûriya gerok û dîplomatan di asta herî jor de didome. Ev sîxûr; xizaniya gel, jiyana gel û dewlemendiyên erdnigariya Kurdistanê yek bi yek di belgeyên xwe de qeyit dikin. Bacên giran li ser gel hatine ferz kirin û jiyan xistiye bin zor û zehmetiyê. Şerên bêdawî û birangên ku Osamanî bi derdorê xwe re dimeşînin weke dojehê leşkeran dadûqûltîne. Ev jî xwesteka leşkeran ya ku ji Kurdan tê kirin her roj zêdetir dike. Ev jî dibû sedema nerazîbûna gel. Mînak; Osmaniyan ji bo fetihkirina Girîtê bi Venedîkan re 25 salan şer kirin. Di vî şerî de sê sed hezar leşker hatin kuştin da ku Fetih kirina Girîtê temam bibe.

Dewleta Osmaniyan ne dewleteke wisa bû ku weke dewleteke roja îro ji gel re xizmetê bike û xwe nû bike. Peywireke dewleta Osamaniyan a weke çêkirina rê, dibistan, xizmeta tenrûstiyê, parastina dorhêlê bike tûne bû. Qet alîkariyek wan a ku ji bo jiyana gel a rojane bike û jiyana gel hêsantir bike tûnebû. Gel xwe ji Osmaniyan zêdetir nêzî mîran hîs dikir. Loma jî di wateya erênî an jî neyînî de nêzîkatiyeke Osmaniyan an dewleteke desthilatdar ji bo mîran çawabûna wan ev nêzîkatî ji bo xwe jî dihesibandin. Jixwe rastiya karektêra civaka feodal jî ev e. Niheqiya ku li Evdrehman Paşa hat kirin, Kurdên herêmê weke ku li wan hatibe kirin hesibandin.

Kurd ji dema Yawûz Selîm û vir ve bi dewleta Osmaniyan re jiyane. Osmanî û Kurdan îtifaqeke dilînî saz kirine û di encama vê îtîfaqê de li gel berjewendiyên hevdû ji Kurdan re statûyeke taybet çêkirine. Kurdan xwe weke hevparên dewletê dîtine. Lê tû carekê jî xwe weke Osmanî û Tirkan nedîtine. Di helbestê de helbestvanê Kurd Ehmedê Xanî, mirov dikare van hest û fikran pir vekirî û baştir bibîne. (1650-1706) Kurdan hergav cûdatiya xwe parastine. Xwe ji hêla ziman, çand û etnîkî ve ji Tirkan cûda dîtine . Jixwe di bingeha sehildanan de bandora vê cûdahiyê û parastina vê cûdahiyê heye.
Sedemên ku hatine diyarkirin ji wan a girîng yek jî polîtîkayên dewleta Osmaniyan a ku dixwest mîrên Kurdan ji holê rake bû. Dewleta Osmaniyan nakokiyên navbera Mîrên Kurdan kur dikirin, alozî di nav wan de derxistin û nedihiştin di navbera wan de yekîtiyek çêbibe. Ji bo Kurd bi Îraniyan re tifaqê çênekin jî nakokiyên Sûnî û Şîî derdixistin pêş. Bi hinek Mîrên Kurdan re têkilî xûrt dikirin, wî bixwe êrîş dibir ser hinek mîrê din û ew diperçiqandin. Ya tûne dikirin a jî qels dikirin û bixwe ve girêdidan. Di serhildana Evdirehman Paşa de bi avêtina hinek gavan ev polîtîka xistin meriyetê, lê esil encamên vê polîtîkayê di serhildana Bedirxaniyan de derdikevin pêşberî me. Mirov dikarê bibêje ku di piraniya serhildanan de lîstokên dewletê hene. Bi lîstok-provaksoyanan serhildanan dide destpêkirin û dike sedema perçiqandin, bêhêzkirin û tûnekirina Kurdan . Serhildana

Babanan jî ji van yek e. Êla Babanan berê me qal kiribû êla herî pêşketî û bihêze. Xwe weke dewletekê birêxistin kiribû. Osmaniyan ev hêza ji bo pêşeroja xwe weke xetere didît. Loma di serî de bi îradeya vê êlê dilîze, wê diperçiqîne û bêhêz dike.

Serhildana ku di van şert û mercan de û ji van sedeman dibin serkêşiya Evdrehman Paşa de destpêkir bi têkilî û kanihkirina Evrehman Paşa ya bi derdor re di demeke kurt de mezin bû. Evdrehman Paşa li derdora Silêmaniyê hinek êlên din jî kanih kirin û ew bi aliyê xwe ve kişandin. Ji aliyekî ve jî bi dewleta Îranê re jî têkilî danîn û kete nava hinek danûstandinan. Ji Îranê jî ji bo serhildanê alikarî xwest. Îranê ev pêşniyar bi erênî bersivand û diyarkir ku dê piştgiriyê bidin serhildanê. (Lê Îran pişt re bi Osmaniyan re li hev dike û tû alikariyê nade Kurdan .)

Osmaniyan çend caran hewlda ku destwerdana vê rewşê bikin. Lê şervanên serhildanê derfetên pêşketinê nedan wan û artêşa Osmaniyan têkbirin. Bi van serkeftinan Evdrehman Paşa her ku diçû bihêz dibû û li ser herêmê hûkumraniya xwe xûrt dikir. Ev pêşketina Evdrehman Paşa di nav Kurdan de dibû sedema kêfxweşiyê. Vê kêfxweşiyê bi xwe re alikarî jî dianî û yekîtiya Kurdan pêşdiket. Wexta ku rewş ji bo Osamniyan ber bi xeterîyê ve çû Osmanî ketin nav hewldanên dek û dolaban. Dest avêtin nakokiyên nav êlan tifaqa nav êlan xerakirin. Hinek êl bi erd, hinek êl bi payewan, hinek êl bi pereyan kanih kirin û ji îtîfaqê kişandin. Livbaziya navbera êlan bû sedema perçebûna îtîfaqa serhildanê. Herî dawî jî li derdora Kifriyê komeke ku biraziyên wî û birayê wî Xalid Paşa jî di nav de tevlî artêşa Osmaniyan bûn û li hemberî hêzên Evdrehman Paşa şerkirin. Bi van xiyanetan re serhildana Evrehman Paşa di 1808'an de têk çû.

Serhildana ku bi hêviyên mezin destpêkiribû û di nav Kurdan de kêfxweşî û yekîtiyek pêşxistibû; lê bi hesabên gelek erzan, ji bo berjewendiyên gelekî biçûk têk çû. Em ê di tevahiya serhildanan de van polîtikayên dewletên qirêj ku li ser Kurdan tên meşandin û xwefiroşiya li ser Kurdan didin ferz kirin bibînin. 1805-1806-1808 serhildana Baban; di navbera salên 1789-1813'an *“şeş şerên mezin pêşketin, ew şer şerên parastina serbixwebûnê bûn”.*

**WANE 21.**

**Pirsên Amadekariyê**

1- Çima ji vê serhildanê re dibêjin, serhildana gundiyan?
2- Şêwazê xwe birêxistinkirina serhildanê çawa bû?
3- Sedema têkçûna vê serhildanê çi ye?

## 2-SERHILDANA EHMED PAŞA-(1812)

Serhildana Evdrehman Paşa piştî nêzêkî sê salan dom kiribû û têk çûbû. Lê pêvajoya serhildanan ya bê dawî destpêkiribû. Yê ku pêşangiya vê pêvjoyê bike, dîsa yekî Baban bûye. Piştî Evdrehman Paşa kurê wî Ehmed Paşa bû serokê Babanan. Ehmed Paşa di 1812'an de li hemberî Osmaniyan careke din serhildan da destpêkirin. Ehmed Paşa ji bo dawî li belavbûna hêzên leşkerên xwe bîne bi rêxistinkirina hêzên leşkerî dest bi kar kir û bi çekên nû leşkerên xwe xemilandin. Bi vê rêxistinkirinê dixwest pêşî li komployan bigre.

Ehmed Paşa artêşa xwe li gor êrişkirina Bexdayê amade dikir ku di serî de Bexdayê bigre bin hakimyeta xwe û serhildanê dorfireh bike. Lê wexta Ehmed Paşa serhildanê dide destpêkirin tiştên ku di hesabên wî de tûne ne derdikevin holê. Ehmed Paşa dixwest bi Îranê re têkiliyan çêke û bi alikariya Îranê Silêmaniyê bike bin hakimyeta xwe. Birayê wî jî bi waliyê Bexdayê re bû alikar û bi ser hêzên Ehmed Paşa de hat. Bi van xiyanetên balkêş Ehmed Paşa zêde pêşneket û serhildana wî bi dawî bû. Bi vê têkçûyinê êla herî bihêz û navdar êla Babanan hat ber tûnebûnê. Mîrê herêma soran Mîr Mihemed lewaziya Babanan ji xwe re weke derfetekê dît û bi alîkariya Osmaniyan 1827'an de êriş bir ser Babanan. Di vê êrişê de Baban têk çûn û ketin bin hakîmyeta Mîr Mihemed. Mîrê Babanan Ehmed Paşa têkçûna Mîr Mihemed û Bedirxaniyan ya 1847'an ji xwe re weke derfet dibîne ku careke din êla xwe rake ser lingan, lê waliyê Bexdayê vê derfetê nade Ehmed Paşa. Êriş dibe ser Babanan û hêviya wan ji binî ve tûne dike.

## 3-SERHILDANÊN GUNDIYAN A DI NAVBERA 1815 Û 1829'AN DE (LI HEMBER OSMANIYAN)

Polîtîkayên Osmaniyan ên li ser beg û mîran teşe girtibûn. Û bi vê armancê Osmanî li hemberî Kurdan diketin nava hinek hewldanan. Lê rûyekî madalyonê yê din jî hebû. Ew jî zordarî û kedxwariya Osmaniyan a li ser gelê Kurd bû.
Ji ber şerên giran ên bê dawî her ku diçû Osmaniyan baca ku ji mîran distandin zêde dikirin. Tenê di destê wan de rûçikandina van mîran ma bû ku pê leşkerên xwe xwedî bikin. Ji bilî standina bacê wekî din bi qada serweriya Mîran û Began re eleqedar nedibûn. Mîr û beg çidikin çawa herêmê birêve dibin, zext û zora wan a li ser gel qet nedidîtin an jî ji nedîtî ve dihatin. Gel jî hiştibûn dibin hêviya wijdanê mîran û began de. Ger ku mîr û beg başbûna xwe ji hêla kedxwarî û di xaleke din de jî dikarîbû hinek xwe ragirta. Ger ku mîr an jî beg bê wijdanbûya dibin serweriya wan de zordariyeke bê sînor dikete rojevê. Di nava sînor û serweriya mîran de Kurdan tenê nedijiya. Weke gelê Ermenî û Asûrî jî hebûn. Di nava

Kurdan de elewî, sûnî, ezdayî komên ji baweriyên cûda hebûn. Loma kedxwarî û zordarî li ser tevahiya gel û komên bawermend dihatine ferzkirin.
Osmaniyan rêveberên ku rêdikirin herêmê mîr û began bi têkiliyên germ û bertîlan bixwe ve girêdidan. Rêveberên Osmaniyan ji ber ku nedixwestin mîr û beg ji wan dûrbikevin û bibin hemberîn wan carnan bi dil carnan jî bê dil ev têkiliyên germ û bi bertîl pêşxwazî dikirin. Dizanibûn ku ger mîr û began bixeyidînin dê li hemberî wan bikevin nava hinek hewldanan û li serê wan bibin bela. Ji ber vê jî çiqas zilma mîr û began li ser gel zêdebûya jî rêveberiya Osmaniyan bêdeng diman. Ev bêdengî jî dibû sedema zilm û zora zêdetir.
Ev zilm, zor û heciqandina ku bi hevkariya dewlet, beg û mîran li ser gel hatibû ferzkirin di 1815'an de li Wan û Bazîdê bû sedema serhildanan. Piştî ku êlên Kurdan yên Êrîvanê û Xoyê jî piştgirî dan van serhildanan ev serhildan weke serhildana gundiyan pêşket. Lê ji ber ku ev serhildan di ser de bêpêşengbûn serkeftina wan nepêkan bû. Osmanî û Îraniyan dîtin ku serhildan hinekî pêşketine, her dû dewletan bi hevkariya hev bi ser van serhildanan de çûn û ev serhildan têkbirin.
Piştî van serhildanan di sala 1818'an de li Kurdistana rojhilat Êla Bîlbasiyan li hemberî zext û zorê dest bi serhildanê kirin. Serhildan li herêmê belav nebû, teng ma. Bîlbasî herçiqas ji êlên derdora xwe alîkarî negrin jî di çiyayan de demeke dirêj li berxwe dan. Lê demekê şûnda ji ber bê alîkariyê nikaribûn zêde liberxwe bidin û serhildan bi dawî bû.
Serhildana Bîlbasiyan a dûyemîn; di serî de hêzên ku êrîş tînin ser wan ji hêla Bîlbasiyan ve têne têkbirin. Kurdên dibin desthilatdariya Paşayên Osmaniyan de li Bazîda Rojhilat û Wanê jiyan dikin serhildan pêşdixin. Kurdên ku li Îranê, êrîvan, Nahçîvan û li Xoyê jiyan dikin jî tevlî van serhildanan dibin. Her ku diçe dizîvire serhildana gundiyan. Bi yekîtiya Osmanî û Îraniyan ve tê têkbirin. Li vê derê jî giredana êlê zêdetir girêdan û tevlîbûneke gelîrî pêşdikeve. Gundiyan li hemberî begên feodal û dewleta desthilatdar serhildan pêşxistine.
Di navbera salên 1820 û 1829'an de Osmanî bi Rûsan re di nav şer de bûn. Kurdan ev rewş ji bo xwe weke derfetekê dît û li Bazîdê di bin pêşengiya Behlûl Beg de , li Mûşê di bin rêbertiya Emîr Paşa de dest bi serhildanan kirin. Behlûl Beg û Emîr Paşa ji bo alîkariyê serî li Rûsan dan lê Rûsan ev xwestek bi erênî pêşwazî nekirin. Ev serhildan jî ji ber bêîtîfaqî û alîkariyê li hemberî êrîşên Osmaniyan zêde nikaribû liberxwe bide û têkçû.
Ev serhildan tev ji hêla êlên Kurdên koçer de hatibûn bipêşxistin. Ji ber ku di jiyana koçerî de ji bo aboriyê rola kesekê/î jî gelekî girîng e. Di aboriya wê civaka koçerî de rola kal û pîran heta zarokan jî heye û girîng e. Lewre girtina ciwanan ya leşkeriya demdirêj zirareke mezin dida aboriya wan êlan. Di heman demê de girtina ciwanan ya leşkeriya demdirêj ji hêla ewlekariyê de jî ev êl dixistin nava xetereyan. Ji bo çûyîn û hatina zozanan ji bo ewlekariyê hewcedariya wan bi sedan hêza leşkerî hebû. Ji ber vê jî êlan nedixwest leşkeran bidin artêşa Osmaniyan. Wexta ku ji bo girtina leşkeran Osmaniyan zext û zor li ser wan êlan zêde kirin wan êlan jî dest bi serhildanan kirin. Di bingeha sedema wan serhildanan de leşkeriya demdirêj, baca giran, rêvebertiya bê edalet û zilm û zora rêveberiyên herêmî hebûn.
Ji bilî van serhildanan gelek serhildanên êlan yên din jî derketin. Pirgirêkên wan êlan jî heman tişt bûn. Leşkeriya dirêj û giran, baca giran, zilm û zextên rêveberiyên herêmî, bertîl û hwd. bûn sedema serhildanên gelek êlan. Sehildanên bi vî rengî li tevahî Kurdistanê belav nebûn û teng man. Lê taybetiyeke wan êlan ya balkêş hebû di wan serhildanan de di nav Kurdan de cûdahiyeke weke şîî-sûnî, Ermenî û Asûriyan de tûnebû. Li dijberî zilmê hemû bi hev re di nav serhildanan de cih digirtin. Lê mixabin ev îtîfaq dorfireh nebûye, teng maye û ev tengbûn bûye sedema têkçûna wan.

**WANE 22.**

**Pirsên Amadekariyê**

1- Kurdên Ezdayî li hemberî çi serîhildabûn?
2- Sedema ku Kurdên îslamî êrîşî Kurdên Ezdayî dikirin çi bû?
3- Serîhildana Kurdên Rojhilatê Kurdistanê ya li beramberî îranê bi çi sedeman bû?

## 4-SERHILDANÊN GUNDIYAN YÊN DI NAVBERA 1840 Û 1842 AN DE (LI HEMBERÎ ÎRANÊ)

Polîtîqayên zext û zorê yên ku ji hêla Osmaniyan ve li ser Kurdan dihatin meşandin, heman polîtikayên zext, zor û çewisandinê ji hêla Îranê ve jî li ser Kurdan dihatin meşandin. Li hemberî van polîtîqayên Îranê jî Kurdan nerazîbûna xwe nîşan da. Di 1840'an de Kurdên gundiyên Rojhilatê Kurdistanê yên weke herêma Tesû, Xoy, Salmas û Genû serîhildan û bajarên vê herêmê girtin bin destê xwe. Sedema vê serhildanê jî weke yên berê zext û zilma rêvebertiya navendî û zext û zora rêvebertiya herêmî ya feodal bû. Lê bandora fesadî û nifaqên dewleta Osmaniyan jî li ser hebû. (Ji ber ku hesabên Osmaniyan li ser herêma Azerbeycanê hebûn dixwestin Îranê bixe nav aloziyan ku xwe bigihîne Azerbeycanê.) Nakokiyên di navbera rêveberiyên Îranê bû sedema firebûna berxwedana Gundiyan û demeke dirêj li berxwe da.

Di 1842'an de rêvebertiya Dewleta Îranê gûherî. Şah Fetîh Elî bû serokê dewleta Îranê. Şah Fetîh Elî ji bo têkbirina serhildanê ket nav hewldanên peydakirin û ceribandina tektîkên nû.Tektîka nû ya ku peyda kir li hemberî Kurdan bikaranîna Asûriyan bû. Di herêma Bet, Moxîne, Somay,Solana,Ganje, Cin Mawana û Ûrmiyê de ji gelên Asûriyan dest bi komkirina leşkeran kir. Ev leşker di nav artêşa Îraniyan de bicih kir û ser Kurdan de rêkir. Bi destê Asûriyan serhildanan Kurdan têkbir.

Piştî têkbirina serhildana Kurdan têkiliya di navbera Şah Fetîh Elî û Asûriyan de germtir bû. Şah Fetîh Elî bi keçikeke Asûrî ya bi navê Parî Farzand Bênyamîn re zewicî. Bi vê zewacê girêdana xwe û Asûriyan gihand asta xiamayatiyê. Wekî din jî Asûriyên ku di têkbirina serhildana Kurdan de roleke girîng leyîstin û alikarî dabûn wî bi payeyên bilind ew xelat kirin. Di nav artêşa xwe de tabûreke taybet ji Asûriyan çêkir û demeke dêrêj li hemberî serhildanên Kurd û Azeriyan ev tîma taybet bikaranî.

Ev serhildanên gundiyan jî weke serhildanên din bêrêxistin, bê sitratejî û bê rêbertiyeke xûrt destpêkiribûn. Bê plansaziyeke xûrt li hemberî dewleteke weke Îranê xwediyê tecrûbeyeke kur û mezin serkeftina wan nepêkan bû. Mixabin ev serhildan jî negihişt tû encamê û têk çû û weke her carê di encamê de bi xwe re hîn zêdetir zext, zor û perçiqandin anîn.

## 5-SERHILDANÊN KURDÊN EZDAYÎ (1826-1839)

Di navbera salên 1826 û 1829 an de di herêmên weke Rewandoz, Çolemêrg, Mîdyad (Tûr Abidîn) û Sîncarê de gelek serhildan pêkhatin. Sedema derketina van serhildanan yek polîtîqayên Osmaniyan bû, a din jî zext û zora rêveberiyên Kurd yên Sûnî bû. Ev serhildan

li hemberî êrîşên derveye weke xweparastinê derketin. Kurdên Ezdayî him di bin êrîşên Osmaniyan de bûn him jî di bin êrîşên Beg û Mîrên Kurdan de bûn. Ezdayiyan di bin vê zilma dû serî de gelek êş û janên mezin dikişandin. Niheqiyên gelekî mezin li wan dihatin kirin. Mînak; di 1833 û 1834'an de mîrê Rewandozê Mîr Mihemed wexta ku êrîşan dibe ser mîrê Botan heta Nisêbînê pêşdikeve, ji wê derê dizivire çiyayê Sîncanê û li wê derê bi hezaran ezdayiyan qetil dike. Di van salan de ji ber ku di navbera ezdayiyan de hevgirtinek xûrt û amadekeriyeke baş tûne bû, li hemberî êrîşên derve nikaribûn zêde liberxwe bidin. Mixabin gelek serhildanên wan jî bi qirkirinan bi dawî bûn.

## 6-SERHILDANA SEÎD BEG (1833-1838)

Her têkçûyîna serhildaneke Kurdan , dibû sedema zext û zorên nû. Her têkçûyînekê bi xwe re encamên girantir dianîn. Her ku diçû tepisandin û perçiqandina li ser Kurdan zêdetir dibû. Bi van perçiqandinan dixwestin Kurdan bê îrade bikin û bi xwe ve girêbidin. Lê van zext û zoran bi xwe re bertekên Kurdan jî zêdetir dikirin. Êlên ku li derdora Sason, Hazro û Amedê dijiyan li hemberî van zext û zoran ketin nav hewldanan û dest bi serhildanan kirin. Di van serhildanan de berxwedaneke hêja nîşan dan. Kurdên ku di tevahiya dîroka xwe de bi xwezayê re aştî jiyane di van serhildanan de baş nasîna û bikaranîna wan ya xwezayê li hemberî Osmaniyan ji bo wan destkeftiyeke herî girîng bû. Bi vê destketiyê darbeyên gelekî mezin li Osmaniyan xistin. Li hemberî van berxwedanan Osmaniyan gundên herêmê dan ber topan. Dest bi qetilkirina sîvilan kirin. Ev bû sedema bêcoşiya şervan û serhildêran. Bi vê bêcoşiyê serhildêran demeke din jî li berxedan, lê demekê şûnde bi dîl girtin û dardekirina serok û rêberên êlan, ev serhildan têk çûn.

Di vê pêvajoyê de serhildana ku pêşdikeve û digêje asteke girîng serhildana Seîd Beg e. Di 1832'an de gelê herêma Behdinan li hemberî zext û zilma Mîr Mihemed li berxweda bû. Mûsa Paşayê ku weke rêveber Mîr Mihemed ji wan re diyar kiribû ji rêvebertiyê dûrxistin û Seîd Beg weke rêveberê xwe diyar kirin.

Herêma Behdinan xwediyê xwezayeke gelekî dijwar e. Ji bo serhildan û têkoşineke çekdarî destkeftiyeeke mezin dida berxwedêrên Seîd Beg. Ji ber ku Mîr Mihemed têk çûbû, êlên derdor jî xwe hêdî hêdî nêzî Seîd Beg didan û alikarî didan wî. Di nav vê alîkariyê de dayina leşkeran jî hebû. Ê ku alîkariya leşkeran dida wî ji wan yek jî Mîrê Botan Bedirxan Beg bû. Her ku diçû Seîd Beg xwe nû dikir û bi hêz dibû. Osmaniyan ev pêşketina Seîd Beg ji xwe re weke xetere didît. Hê nû xetereyeke weke ya Mîr Mihehemed berteraf kiribûn. Nedixwestin hêzeke din bikeve şûna Mir Mihemed. Ji ber van fikaran Osmaniyan bilezginî bi hêzek mezin êrişek birin ser hêzên Seîd Beg. Ji ber ku Seîd Beg hêzên xwe baş birêxistin nekiribûn û di nava bêpergaliyê de bûn nikaribûn demeke dirêj liberxwe bidin. Di demeke kin de berxwedêrên Seîd Beg li hemberî hêzên Osmaniyan têkçûn. Piraniya wan hatin kuştin ên ku man jî reviyan. Piştî têkçûna berxwedêran Seîd Beg dîl ket destê hêzên Osmaniyan. Bi dîlgirtina Seîd Beg ev serhildan jî weke serhildanên din bi trajediyeke mezin bi dawî bû.
Em dibînin ku ev serhildan tev bi herêmeke teng ve girêedayî mane. Ango ji asta herêmî xwe xelas nekirine. Di erdnîgariya Kurdistanê de belavbûyînek an jî yekgirtinek bidest nexistine. Ev jî bûye sedema qels mayîna wan.

**WANE 23.**

**Pirsên Amadekariyê**

1- Serhildana Rewandozê xwedî taybetmendiyeke çawa bû?
2- Sedema ku serhildanên kurdan zû germ dibûn û zû sar dibûn çi ye?
3- Pirsgirêka bingehîn ya di serhildanan de çi bû?

## 7-SERHILDANA REWANDOZÊ (1830-1837)

Ev serhildan jî weke serhildana Babanan li Başûrê Kurdistanê qewimî. Di bin banê împaratoriya Osmaniyan de di erdnîgariya Kurdistanê de cihê herî dûr herêma Babanan bû. Herêma Rewandoz jî li rojavayê bakurê vê herêmeke cîranê vê herêmê bû.
Mirov wexta ku di nexşeyê de li cihê serhildanê dinêre mirov dibîne ku Osmanî gelekî bi tektîkekî balkêş bi ser êlên Kurdan de çûne. Biryara têkbirin û perçiqandina hêza Kurdan gav bi gav hatiye cih. Di serî de bi perçiqandina yên herî dûr û yên herî bi hêz bi êla Babanan dest pê dikin. Wexta ku bi ser Babanan de diçin dilê Bedirxaniyan û dilê Rewandoziyan ji xwe nahêlin, berdilê wan didin û alikariyê ji wan digrin. Ji ber wexta ku êrîş bibin ser Babanan neçarin di ser erdnîgariya Bedirxanî û Rewandoziyan re derbas bibin. Heke beriya Babanan destwerdanî Rewandoz an jî destwerdanî Bedirxaniyan bikin, dê nikaribin bi rihetî bi ser Babanan ve biçin û dibe ku Babanî piştgiriya van bikin an jî dê karibin bi rihetî ji Osmaniyan veqetin. Heta ku yên herî dûr û yên herî bihêz neperçiqînin yên din çiqas di nav hewldanên nebaş de bin jî çavên xwe ji wan re digrin û bêdeng dimînin. Ji ber vê fikarê ye ku Osmaniyan ji yên herî dûr û bi hêz ji Êla Babanan dest pê kiribû.

Mîr Mihammed di 1814'an de bibû serokê begîtiya Soranan. Herêma Soranan ji Rûbarê Zapê destpêdikir heta tixûbê Îranê didomiya. Paytexta wan jî Rewandoz bû. Mîr Mihemmed ji êla herî kevnar, ji êla Rewanda bû. Malbata wî digihîşt malbata Selahedînê Eyûbî. Mîr Mihemed di çavkaniyên dîroka Tirkan de bi navê “Kör Mûhammed Paşa” tê bilêv kirin. Mîr Mihemed Paşa di Medreseyê de di perwerdeyeke gelekî xûrt re derbas dibe. Bi hişmendiya oldariyê têdigihije. Bi rê û rêbazên ol ve gelekî girêdayî ye. Di tevahiya kar û emelê xwe de bi serek û rêberên oldaran re dişêwire û pişt re gav diavêje. Di wê serdemê de bi taybetî jî gelek bandora oldarên yên weke Mele Mihemedê Xatê û Mele Yehyayê Mizorî him li ser Mîr Mihemed û him jî li ser gel hebû.

Mîr Mihemed wexta ku bû serokê herêma Soran bi nûkirina leşkeran dest bikarkir. Him ji bo rêxistinkirinê him jî ji bo xemilandina bi çekên nû û moderin ket nav hewldanan. Ji bo perwerdeya hîndekariya çêkirina çek û topan gelek ciwanên Kurd rêkirin Ewrûpa. Bi lezgînî li Rewandoz fabrîqeyeke çekan da çêkirin û dest bi çêkirina top û gelek cûreyên çekan kir. Her ku diçû desthilatdariya xwe li herêmê xûrtir dikir. desthilatdariya xwe li ser êlên derdora xwe ferz dikir. Rêberê kîjan û êla wî yên ku serweriya wî qebûl nekira êrîş dibirin ser wê êlê. Serok û rêberê êlên dikuştin di şûna wan de zilamê xwe pêwirdar dikirin û wan serokatiya wan êlan dikir.

Di demeke kin de nêzî 30 hezar kesî hêza wî ya leşkerî derket holê. Ev leşkerên xwe jî tev bi çekên nû xemiland bûn. Li herêmê ji bo tekuzkirina serdestiya xwe ji xwe re pergaleke sîxûriyê jî ava kiribû. Ji bo jiyaneke bi rêk û pêk û ji bo tekuzkirina serweriya xwe gelek cezayên giran diyar kiribûn. Bi wan cezayan di tevahiya herêmê de û di tevahiya qada jiyanê de serdestiya xwe dida hîskirin. Piştî ku Mîr Mihemed li herêma Soran serdestiya xwe tekuz kir dest avêt derdora xwe. Hewl da xwe ku êl û begîtiyên Kurdan yên derûdora xwe tevan bigre bin desthilatiya xwe. Hinek bi hevdîtinan û bi lihevkirinan bi xwe ve girêdan, hinek jî bi zext û zorê bi xwe ve girêdan. 1827'an êrişek bir ser herêma êla Babanan û êla Babanan xist bin desthilatiya xwe. Herêma desthilatdariya xwe heta gundên Azerbeycanê fireh kir. Bi firehbûyina herêmê re hêjmara leşkerên wî jî her roj zêde dibûn. Hêjmara leşkeran gihiştibû derûdora 100 hezar kesî. Mîr êdî bixwe bawer bû, hêza xwe têrî diyarkirina azadiyê didît. Mîr Mihemed 1830'an de serbixwetiya xwe diyar kir.

Armanca Mîr Mihemed avakirina Kurdistaneke serbixwe bû. Şert û mercên wê demê jî pêkanbûn. Dewleta Osmanyan li hemberî Rûsan têk çûbû. Sirp û Yewnanan bi serhildanan azadiya xwe bidestxistibûn. Li Misirê Kavalali Mehmet Ali Paşa li hemberî Osmaniyan serî hildabû û li ser serê Osmaniyan bûbû belayeke mezin. Di heman demê de dewleta Îranê jî weke Osmaniyan di rewşeke nebaş de bû. Nakokiyên sedsalan li Îranê didomiyan. Çilvirîna nav rêveberiyan û şerên bi derûdor re dewleta Îranê xistibû nav aloziyan. Ev alozî di nav Kurdan de nerazîbûyineke gelekî mezin pêşxistibû. Ji ber vê jî Kurdên Îranê Mîr Mihemed ji bo xelasbûyina xwe weke qehremanekî didîtin. Mîr Mihemed ji bo serkeftinê ev qewimîn tev ji xwe re weke derfetekê didîtin. Ji bê hêzbûyina herdû dewletan îstîfade dikir û her roj herêma erdnîgariya xwe fireh dikir. Di 1832'an de êrîş bir ser herêma Behdînanê Amediyê, Dûhok û Zaxo jî xistin bin serweriya xwe. Êdî li Kurdisatanê serwerê herî mezin Mîr Mihmed bû. Lê Mîrê Botan Bedirxan Beg serweriya Mîr Mihemed qebûl nedikir. Mîr Mihemed ji bo ku serweriya xwe bi Bedirxan beg bide qebûlkirin êrîş bir ser herêma Botanê. Di herêma Botanê de tenê Kurdên misilman nedijiyan, Kurdên ezdayî, Ermenî û Asûrî jî dijiyan. Lê hêza parastina leşkerî tenê ya Kurdên sûnî hebû. Kurdên sûnî di bin pêşengiya Bedirxan Beg de bi parastinê bersiv dan Mîr Mihemed. Ji çiyayê Sîncar heta Nisêbînê herêm tev bû qada şer. Di vî şerî de hêzên Bedirxan Beg jî gelek hatin kuştin û zirar dîtin, lê zirara mezin Kurdên Ezdayî ,Ermenî û Asûrî dîtin. Ji ber ku hêza parastina van tûne bû. Hişkiya Mîr Mihemed bû sedema qetilkirina bi hezaran kesî ji wan gelan.

Pêşketin û bihêzbûyîna Mîr Mihemed Osmanî dixistin nava fikaran. Êdî Mîr Mihemed ji bo xwe jî weke pirgirêkeke mezin didîtin. Li gor Osmaniyan hewce bû ku pêşî lê bihata girtin. Ji hêla rêvebertiya Osmaniyan ve di 1835'an de waliyê Sîwasê Reşîd Paşa, waliyê Bexdayê Elî Riza Paşa û Waliyê Mûsilê Mihmet Paşa ji bo têkbirina Mîr Mihemed hatin pêwirdar kirin. Ev walî bi hêzeke leşkerî ya mezin ve bi ser hêzên Mîr Mihemed ve çûn. Ji hêla amûr û teknîkê ve hêzên Osmaniyan xwediyê destkftiyên mezin bûn. Mîr dît ku dê nikaribe biserkeve, hêzên xwe vekişandin çiyayên Kurdistanê û xwest bi rêbazên weke gerîlayan li berxwe bidin. Bi vê rêbazê gelek zirarên mezin dan artêşa Osmaniyan. Demekê şûnde hêzên Osmaniyan neçar man paşve vekişin.

Mîr wexta ku vekişîna Osmaniyan dît bi vê manewiyata xwe gelekî bihêz û serketî hesiband û di Cotmeha 1835'an de li heemberî Îranê jî dest bi êrîşan kir. Bi van êrîşan ji hêla stratejî ve şaşiya herî mezin ya dîrokî hatibû kirin. Di heman demê de li hemberî her dû hêzên Rojhilata Navîn yên herî mezin ketibû nava şer. Di demeke kin de herêma Kutûr û Saldûzê ji bin destê Îranê derxist. Hêzên Mîr Mihemed li hemberî hêzên dewleta Îranê her roj

serkeftin bidestdixistin. Ev serkeftina Mîr Mihemed û pêşketina Kurdan Îngilîz jî xistibûn nav fikaran. Îngilizan ev pêşketina Kurdan li hemberî berjewendiyên xwe yên Basrayê heta Hîndîstanê xetere didîtin. Îngilîzan nedixwest dewleteke nû ya dînamîk li hemberî wan derkeve holê. Îngilîzan li hemberî vê dewleta dînamîk parastina herdû dewletên kevin û nexweşên ku girêdayî wî ne parastin ji bo berjewendiyên xwe yên herêmê hîn hêsan didît. Îngilîzan li ser vê polîtîkayê ji bo têkbirina Serhildana Mîr Mihemed sîxûr û siyasetmedarên xwe xistin nav hewldanan.

Bi hewldana dewleta Îngilîzan û bi taybetî jî bi dîplomasiya konsolosa îngilîzan a Tebrîzê xwediyê nakokiyên sedsalan Îran û Osmaniyan li hemberî Kurdan di nav xwe de îtifaqek çêkir. Ji bo perçiqandina serhildana Kurdan di bin rêbertiya serfermandarê Îngilîz Şîl de di 1738'an de plansaziyek hate amadekirin. Hêzên Îran û Osmaniyan ji dû aliyan ve herêma Rewandozê dorpêç kirin. Di vê tengasiyê de Osmanî bi têkiliya “molla Hetî” (di nav gel de weke “Melayê xayîn” tê bi navkirin) bi rêber û pêşengên ol re ketin têkiliyê. Mola Hetî bi xelîfe re di têkiliyê de bû. Osmaniyan piştî ku bi saya Mola Hetî ev oldar qanih kirin bi pêşengiya Mola Hetî fetwayek dan derxistin û dan belav kirin. Di wê fetwayê de digotin “Kî li hemberî artêşa xelîfeyê şer bike ew kafir e. Di navbera misilmanan de hewceye ku aştî pêk were”. Di ser vê fetwayê re gelek êlên Kurdan hêzên xwe ji nav şer vekişandin. Dayîna piştgirîya xwe ji Mîr Mihemed qût kirin. Careke din di nav hêzên Kurdan de belavbûyînekê destpê dikir.

Mîr Mihemed neçar ma ku banga Osmaniyan ya radestbûnê (teslîmbûnê) qebûl bike. Piştî radestbûyînê Mîr Mihemed û malbata xwe û hinek serokê êlan birin Stenbolê. Ji ber ku Mîr li hemberî hêzên xelîfe bêşer radest bibû piştî bi qasê 6 mehan li Stenbolê ma. Siltanê Osmaniyan bi dayina hinek xelat û payeyan Mîr dilşa kir û paşve rêkir. Mîr dê bi keştiyê di ser deryaya reş de bihata welatê xwe Kurdistanê. Li gor hinek çavkaniyan li Sêwasê, li gor hinek çavkaniyan jî li Trabzonê bi komployê Mîr tê qetil kirin.

Rêveberiya Osmaniyan li hemberî Mîr û Begên Kurdan cûre cûre polîtîkayên qirêj dimeşandin. Li gor hêza êlan nêzikî Mîr û Begên wan êlan dibûn. Heke êl bi hêzbûya bi rêzdarî nêzik dibûn, vedixwendin Stenbolê, bi bertîl û payeyan bi xwe ve girêdidan, dikirin neyarê êlên din û paşve rêdikirin. Heke êl bêhêz û qelsbûya û serokê êlê jî di hedê xwe de nesekiniya îradeya êlê bin pêdikirin û serokê êlê jî rasterast dikuştin, an jî digirtin diavêtin zîndanan.

Siltanê Osmaniyan beriya radestbûnê ji zû ve fermana kuştina Mîr dabû. Lê ji ber ku alîgirê Mîr zêde bûn, ji bertekên wan ditirsiyan. Ji ber vê jî ji bo tûnekirina Mîr di bin navê dostaniyê de ev rêbaza komployê bikartanîn û Mîr ji holê rakirin. Piştî mirina Mîr Mihemed birayê wî Resûl Paşa bû serokê begîtiya Soran.

Mîr û begîtiyên Kurdan ên ku Osmaniyan bi sed salan nikaribû îradeya wan bişkîne û radest bigre Mîr Mihemed bi êrîşên xwe ên hovane biriya wan ji holê rakirin an jî gelekî qelskirinê osmanî xûrtdikirin. Mîr Mihemed Gelek zirarên mezin da Mîr û begîtiyên êlên weke Baban, Botan, Bilbasî û Behdînaniyan. Ji ber vê jî mirov dikare bibêje ku Mîr Mihemed bi nezanî gelek xizmet ji dewleta Osmaniyan re kiriye. Tiştê ku Osmaniyan dixwest bikin wî dikir. Osmaniyan ji bo xwe ev xizmet didîtin, loma heta demekê li hemberî Mîr bêdeng man. Heta ku Mîr Mihemed tev perçiqandin û ji bo wan hate asta xetereyê hêja li hemberî Mîr ketin nav hewldanan.

## Weke Encam;

Serhildana Mîr Mihemed ji hêla stratejî, taktîk û dîplomasiyê ve gelekî qels bû. Polîtîkayên emperyalistan yên herêmê bi zanibûneke baş fêm nekiribûn. Nezanî û xedariya Mîr bû sedama zilm û zora wî ya li ser Kurd û gelê herêmê. Mînak; karibûn bi hêzên weke Bedirxaniyan re yekîtiyek –îtifaqekê çêke û hêzeke xûrt derxe hole. Lê wî ev bedîla qenc neceriband û xwest bi êrîşan Bedirxaniyan têk bibe û bike bin desthilatdariya xwe. Hewce bû ku ji bo yekitiya Kurdan hewl bida, lê mixabin wî xwest bi darê zorê yekîtiya Kurdan di bin serweriya xwe de çêke bi vê hewldana xwe ya nebaş ve yekîtiya ku hebû ew jî xerab kir.Tenê bi hêza leşkerên xwe bawer bû. Lê ji ber ku ew hêza leşkerê xwe jî bi zanibûneke baş û taktîkên serkeftî bikar neanî û li hemberî herdû dewletên mezin tû serkeftinek bidest nexist.

## 8-TEVGERA ÎSMAÎL BEGÊ BEHDÎNAN

Piştî serhildana Mîr Mihemedê Rewandozî têkçû, Îsmaîl Beg dest danî ser Amêdiyê. Bajar û gundên nêzikî vî bajarî jî bi xwe ve girêdan. Bi vî awayî bandora xwe li ser herêmê zêde kir û jiyaneke serbixwe domand.
Piştî demekê parêzgerê Mûsilê sala **1835'an** leşker şandin ser hêzên Îsmaîl Beg. Piştî dorpêçeke dirêj, bajar bi destxist. Îsmaîl Beg, bi leşkerên xwe ve ji bajêr derket û xwe gihand Keleya Nêrweyê ya ku diket bakurê rojhilatê Amêdiyê. Di vê navê de rêvebirê Mûsilê, hemû axa, Şêx û mezinên herêmê yên Kurd berhevkirin û kuştin.

Piştî demekê Îsmaîl Beg hejmarek leşker baş berhevkirin û daxwaza Amêdiyê ji rêvebirê Mûsilê kir. Lê wî ev daxwaz bicih neanî. Li ser vê çendê Îsmaîl Beg bi êlên herêmê re peywendî pêkanî, li hevkirin û di sala 1842'an de ket Amêdiyê. Parêzgerê Mûsilê li ser vê pêşketinê leşker da hev û ber bi Amêdiyê ve ket rê. Hêzên herdû aliyan, li gundê Eyntûwayê rastî hev hatin. Piştî şerekî dirêj leşkerên Osmaniyan bêy ku encamekê bidest bêxin ji herêmê vekişiyan.
Piştî vê bûyerê leşkerên Osmaniyan yên dibin fermandariya parêzgerê Bexdayê Reşîd Paşa de çûn ser Amêdiyê û bajar dorpêçkirin. Di encama vê dorpêçkirinê de, bajar teslîmbû. Îsmaîl Beg, ji bo li bajêr rê li ber komkujiyeke mezin veneke, xwe da dest. Ew girtin û li Bexdayê xistin zindanê. Bi vî awayî dewreya mîrîtiya Îsmaîl Begê Behdînan jî bi dawî dibû. Demekê şûnde Akrê û Dihok jî hatin bidestxistin. Rêvebirên wan bajaran li Mûsil û Bexdayê bi zorê dan bicihkirin. Di encamê de li herêma Soran û Behdînan deshilatdariya Osmaniyan dihat rûniştandin.

Di vê herêmê de tenê mîrîtiya Baban mabû. Ew jî ji ber sedemên li hevdû nekirin û dûbêndiya mîrên vê mîrîtiyê ber bi xirabûnê ve diçû.

## WANE 24.

### Pirsên Amadekariyê

1- Mîrekiya Botan çend salan hukum kir?
2- Di dema Mîrekiya Botan de kurd xwedî pergaleke ziman û wêjeya kurdî ya xwendineke çawa bûn?
3- Çima biraziyê Bedirxan Beg Yêzdan êr xiyanet li mîrekiyê kir û serhildan têk bir?

### 9-SERHILDANA BEDIRXAN BEG (1842-1847)



Di destpêka sedsela 18. û şûn ve bi bandora şoreşa Fransayê (1789) û bi dest dirêjiya dewletên Ewrûpî û yên derûdor di imaparatoriya Osmaniyan de pêvajoya perçebûyînê dest pêkiribû. Siltanê Osmaniyan Mehmûdê 2. û Tazmînatparêstan dixwestin pergala dewletê bigûherînin û serdestiya xwe ya navendî ava bikin. Bîrdoziya vê pergalê jî "Osmanîtî" diyar kirin. Dixwestin bi rihê "Osamnîtî" yekîtiyekê di nav civak an jî netewên ku dibin banê împaratoriya Osmaniyan de dijîn çêbikin. Digotin her çiqas em Tirk, Erep, Kurd, Arnawût, Rûm, Ermenî, Cûhî, Bûlxar, Sirp, Hirvat û Boşnak bin jî em xwediyê etnisite û oleke cûdabin jî xala me ya hevpar ew e ku em tev hemwelatiyên dewleta Osmanî ne. Em ê li hemberî herkesî rêzdar bin. Tenê xwesteka me ew e ku hûn li hemberî dewletê serî hilnedin. Pişt re li ser bîrdoziya Osmanî birdoziyên weke "pan-îslamîzim" û "pan –tirkîzim" jî hatin zêdekirin. Bi van hewldanan dixwestin ku dewleta Osmanî ji perçebûyînê ji qelsbûyînê û ji aloziyan xelasbikin. Lê nizanîbûn ku tenê afirandina bîrdoziyan têr nake. Loma bi afirandina bîrdoziyan re, di heman demê de ji bo bi hêz û erkdarkirina navendiyeke xûrt dest avêtin gûhertina pergalê jî. Pergala rêvebertiya berê hate betal kirin. Rêvebertiya navendî û ya bajaran li gor pergala dewletên Ewrûpî ji nû ve hate damezirandin. Ji bo pergala Parlementerîzmê di destpêkê de meclîsên weke bi navê Meclis-î Vala-yi Ahkam-î,Meclis-î Vûkela hatin avakirin. Wezaret hatin damezirandin. Ji 1840 î şûnde jî destwerdana rêveberiya herêman kirin. Gûherînên gelek mezin pêk anîn. Herêm ji nû weke Wîlayet , Lîwa (sancak) , Navçe û bajarok birêxistin kirin. Walî, Mûtasarrîf, Kaymakam û Gerînendên Bajarokan li van deran hatin pêywirdarkirin. Di 1854'an de şaredarî hatin bi rêxistinkirin.

Di avakirina pergala nû de wateya avêtina her gavekê ji bo Kurdan cûda bû. Bi pergala nû gav bi gav mafê jiyana xweser ji destê Kurdan dihat standin. Erkên xwe rêvebirinê ku di destê mîr û began de bûn yek bi yek ji destê wan dihatin standin. Ev dibû sedema nerazîbûyîna mîr û began. Di vê pêvajioyê de piştî têkçûna Baban û Soranan êla herî xûrt û bixwe bawer êla Botiyan (êla Bedirxaniyan) ma bû. Êla Botiyan di nav xweseriyeke nêzî serxwebûnê de dijiyan. Ev pergala Osmaniyan ya nû herî zêde di warê neynî de bandor li vê êlê dikir. Bedirxan beg zêde xwe li hemberî Osmaniyan ranegirt û neçar ma serî hilde.

Bedirxan beg di 1812'an de, di 18 saliya xwe de bû serokê Begîtiya Botan. Dewleta Osmaniyan di nav alozî û rizîbûyineke mezin de dijiya. Ji ber ku dewletên Ewrûpiyan nedixwest ji binî têk here bi alikariya wan jiyana xwe didomand. Li hemberî van alozî û rizîbûyînan Bedirxan Beg hewl dida xwe ku li herêma xwe serweriya xwe xûrt bike û valatiya Osmaniyan bi serweriya xwe dagire. Di serî de jî hewl da xwe ku yekîtiyekê di nav Kurdan de ava bike. Ji bo vê jî bi êl û begên derûdora xwe re kete nava têkilayan. Ji bo îtifaqa nava Kurdan hinekî bi xweşikayî hinek bi zorê qanihkirin. Bi van hewldanan herêma xwe û pê ve girêdayî hêza xwe gelekî mezin kir. Bedirxan beg tenê di nav êlan de têkilî pêşnexist di heman demê de di nav Kurd û gelê din yên weke Ermenî û Asûriyan de ji têkiliyên germ pêşxistin û di herêmê de îtifaqa gelan pêkanî. Di rêveberiya Begîtiyê de û di artêşa begîtiyê de peywir û berpirsyariyên girîng dan van gelan. Hewl da xwe ku di warê zanaat û zanîstiyê de ji van gelan sûd werbigre. Bi van îtifaqan di herêmê de bû hêza yekane.

Sekina Bedirxan Beg li hemberî Begê Kurdan yên di nav aştiyê de bû. Li hemberî wan nekete nava şer. Di herêma ku di bin serweriya wî de bû, li gor baca ku Osmaniyan diyar kiribû jî, wî gelek hindiktir bac distand. Ciwanên ku digirt leşkeriyê maaş dida wan. Ji bo ewlekariya civakê ya navxweyî biryarên gelekî girîng girtin. Di herêma wî de gel di nav aştî û ewlehiyê de dijiya. Nivîskarekî Ewrûpî ev ewlekarî wisa dianî ziman, “mirov destê zarokekê têjî zêr bike ji serê herêma Bedirxaniyan heta serê din rêke yek jê kêm nabe.”

Dewleta Osmaniyan ku digotin tû carî têknaçe di destpêka sedsala 18. û şûn ve li hemberî Rûsan çend caran têk çûbû, Yewnan û Sirpan ji bo azadiya xwe serî hilda bû. Paşayê Misirê Kavalalî Mihemed Alî Paşa serî hildabû Osmanî li hemberî wê jî têkçûbûn. Kavalalî Mihemed Alî Paşa ji bo Osmaniyan bûbû xeteriyeke mezin. Osmaniyan encax bi alikariya Îngilîz, Rûs, Awûstûriya û Prûsyayê ev paşa têkbir.

Ev qewimîn û pêşketin bandorê li Kurdan jî dikir, di serî de li rêberên Kurdan yên weke Bedirxan Beg dikir. Kurdan didîtin ku Osmanî li her derê têk diçin. Ev têkçûyîna Osmaniyan ji bo azadî û serkeftinê hêviyên Kurdan her roj xûrtir dikirin. Bi van hêvî û baweriyan Bedirxan Beg ji herêma Wan û Çolemêrgê bi Mistafa Beg, Derwêş Beg, Mehmûd Xan, Nûrûllah Beg û Fettah Beg re , ji Xîzanê bi Xalit Beg re, ji Mûş û Bedlîsê Bi Şeref Beg re û bi Begîtiyên girîng û mezin yên weke Begîtiya Erdelan re hevdîtin pêkanîn. Di van hevdîtinan de armanca wî ji wan re vegot û ji wan alîkarî xwestin bû. Van mîr û began hemûyan alîkarî qebûl kirin. Di ser vê qebûl kirinê re sond xwarina alikariya têkoşîna azadiya Kurdistanê pêkhat. Êdî Bedirxan Beg pêşengê têkoşîna azadiyê bû. Di vê çarçoveyê de dest bi amadekariyan kir. Li Cizîra Botan dû fabriqeyên çek û amûrên şer çêkirin. Ji bo deryaya Wanê dest bi çêkirina keştiyan kir. Ji bo çêkirina keştiyan û di her warî de zanistê ciwanên Kurd, Ermenî û Asûrî rêkirin Ewrûpayê. Di avakirina hikumetê de ji bo avakirina îrade û rêveberiyeke xûrt pêşengê Asûrî û Ermeniyan jî di nav rêveberiya hikumetê de peywirdar kirin. Ji bo yekitiyê kedeke mezin dida. Nedixwest bikeve nav kêmasiyên Begê Kurdan yên berê. Ji ber vê jî di her warî de amadekariyên xûrt dikirin. Polîtikayên dewletê weke Îngilîz, Fransiz, Rûs û Osmaniyan yên perçekirinê daqûltinê baş didît û li gor wê tevdigeriya. Di xwest têkileyeke ji Asûrî û Ermeniyan germtir bi Ewrûpiyan re deyne û bi awayê yekîtiya begîtiyan xwe biparêze. Bi vê armancê Bedirxan beg qedexebûyîna zewaca Ermenî û Kurdan rakir. Li gor kevneşopiya Îslamiyetê ya wê demê ev biryareke gelekî pêşketî bû. Di heman demê de bi vê biryarê Bedirxan Beg ronakbîriya xwe jî nîşan dida.

Bedirxan Beg gav bi gav dewleta Osmaniyan ji herêma xwe tasfiye dikir. Ji xûrtbûyîna serdestiya Bedirxan Osmanî çiqas aciz dibûn ewqas jî Îngilîz û Fransiz jî aciz dibûn. Berjewendiyên wan di hebûna dewleta Osmaniyan a nexweş de bûn. Ji ber vê jî li hemberî Kurdan ketin nav tifaqê. Polîtîkayên xwe yên li hemberî Kurdan xistin meriyetê. Polîtîkaya wan ya yekemîn jî weke hergavê ji hev perçekirin bû. Bi vê polîtakaya xwe ya qirêj gava yekemîn nifaq xistin nav Kurd, Ermenî û Asûriyan. Yekitî û tifaqa wan xerab kirin. Ya dûyemîn Cizira Botan a ku di dîrokê de hergav bi herêma Amedê ve girêdayî bû 1841'an de ji Amedê veqetandin û ji ber ku Paşayê Mûsilê ji Bedirxan gelek aciz bû bi Mûsilê vê girêdan. Paşayê Mûsilê di derheqê amadekariyên Bedirxan Beg de berê gelek agahî dabûn dewleta xwe ya navêndî û ji bo êrîşan bibin ser Bedirxaniyan sê caran serî li rêveberiya navendî dabû. Lê Osmanî li benda dema xwe ya hêsan sekinî bûn.

Li Çolemêrgê 8 êlên Asûrî û Nastûriyan hebûn. Van êlan bi sedsalan bû bac didan dewleta Osmaniyan an jî baca xwe didan Begîtiyên Kurdan yên ku pê ve girêdayî bûn. Hezên emperyalî di vî warî de bi hestên wan lîstin. Waliyê Mûsilê Mihemed Paşa Patrîkê Nastûriyan Malek Şamûel vexwend mala xwe jêre mazûvanî kir û piştî hevdîtine girîng kirin; ji van hevdîtinan encam derket. Asûrî û Ermeniyan bîryar da ku baca heta niha didan Begên Kurdan dê ji vir şûn ve nedin. Nêzî deh hezaran hêza wan a leşkerî hebû. Ev hêz bi alîkariya Îngilîz û Fransizan bi çekan hatibû xemlandin. Begê Çolemergê Nûrûllah Beg hewilda xwe ku bi hevdîtinan vê şaşiyê sererast bike. Lê Îngilîz, Fransız û Osmanî ketin dewrê nehiştin Nûrûllah Beg encam bigre. Malek Şamûel ji wan piştgirî girt û bersiveke neyînî da Nûrûlah Beg. Begê Çûlemêrgê Nûrûlah Beg neçar ma ku ji Bedirxan Beg alîkariyê bixwaze.

Misyonerên Îngilîz di navbera Çolemêrg û Zaxoyê de ji bo Asûrî û Ermeniyan dibistanek olî vekiribûn. Kurd bi fikar nêzî vê dibistanê dibûn û ji bo pêşeroja xwe xetere didîtin. Ev hewldan weke rêxistinkirina Asûrî û Ermeniyan dijberiya xwe dinirxandin. Di vê pêvajoya hesas de provaksiyonek, bû sedema şerê Kurdan û Ermenî –Asûriyan. Dû pêşengên olî yên ku nêzî Bedirxan Beg bûn li Perwarî gundê Serspiyê ji hêla Nastûriyan ve hatin kuştin û cilên wan ên bi xwîn ji Bedirxan Beg re hatin rêkirin. Bedirxan Beg bi artêşa xwe bi ser Nastûriyan ve çû. Bi hezaran Nastûrî qetil kirin yên ku man jî piraniya wan warê xwe hiştin û revîn. Patrîkê Nestûriyan Malek Şamûel jî revî û çû ket bin stara Îngilîzan.

Xwesteka Îngilîz û Fransizan hatibû cih. Dîplomatên wan hemen ketin dewrê. Bi Osmaniyan re ketin têkiliyê û xwestin Osmanî derhal destwerdana Bedirxanan bikin. Di serî de her çiqas Osmaniyan dil nekir jî bi pêkutiyên Îngilîz û Fransizan neçar man bikeve nav hewldanan. Osmanî bi artêşa ku ji 60 hezarî pêk tê bi ser paytexta Bedirxaniyan Cizîra Botan ve ketin rê. Bedirxan Beg wextê ku bi vê hesiya şer îlan kir û serhildan destpêkir. Artêşa Osmaniyan ku bi ser Cizîrê ve çûbû têkbir û di 1842'an de serxwebûna dewleta xwe diyar kir. Paytexta dewleta xwe jî Cizîr diyar kir. Bedirxan Beg piştî vê serkeftinê serdestiya xwe ya herêma di navbera Wan, Rewandoz, Mûsil û Amedê de hîn fireh û têkuz kir. Herêma Wêranşer û Siweregê jî bi xwe ve girê da. Heta bajarê Ûrmiyê herêma xwe fireh kir. Di sala 1845'an de hema hema temamê Kurdistanê ketibû bin serweriya Bedirxaniyan.

Osmaniyan Mûşîr (Mereşal) Hafiz Paşa peywirdar kir ku bi hevdîtinan serweriya xwe bi Bedirxan Beg bidin qebûl kirin. Lê bi ser neketin. Pişt re heman tişt li hemberî Begê Çolemergê Nûrûlah Beg û Mehmûd Xan jî bikar anîn, lê bi ser neketin. Osmaniyan dît ku xeteriyeke mezine bi alikariya Îngilîz û Fransiz a di bin serfermandariya Osman Paşa de

artêşeke ku ji 100 hezarî pêk tê ji bo perçekirina hêza Bedirxan ji sê milan ve bi ser Bedirxaniyan de çûn. Bedirxan Beg di parastina herêma Wanê de pêşengî dikir. Pêşengiya parastina paytext Cizîrê jî teslîmê biraziyê xwe Yezdanşêr kiribû. (Ji ber ku bavê Yezdanşêr nebûbû serokê Begîtiya Botan , Bedirxan Beg bûbû serok li hemberî Bedirxan Beg hesûdiya wî hebû. Osmaniyan bi vê hesûdiyê zanîbûn.) Osmanî bi Yezdanşêr re ketin têkiliyê. Bi pere, bertiîl, paye û rûtbeyan Yezdanşêr kanih kirin. Yezdanşêr bi hêzên leşkerê xwe ve derbasî milê Osmaniyan bû. Paytex Cizîr radestî Osmaniyan kir. Mixabin îxaneta Kurdan ya li hemberî Kurdan careke din bi ser ketibû. Bedirxan Beg wexta ku pêhesiya vegeriya Cizîrê, lê mixabin vê carê jî hêla Wanê têk çû. Bedirxan Beg neçar ma xwe vekşîne kêleha Dihê. Ji ber ku Osmaniyan dixwest teqez Bedirxan Beg tasfiye bikin, kêleha Dihê dorpêç kirin. Bi qasî 40 rojan bi leşkerên xwe ve di vê kêlehê de li berxwe da. Bedirxan Beg bi dû kurên xwe ve di 20'ê Tîrmeha 1847'an de bi birîndarî dîl ketin destên Osmaniyan. Şervanên wî tev hatin qetil kirin.

Bi dîlgirtina Bedirxan Beg Padîşahê Osmaniyan gelekî kêfxweş bûbû. Potansiyela xeteriya Kurdan ji holê rabûbû. Ji ber ku ev potansiyel rabûbû Bedirxan Beg efû kirin û mişextî grava Girîtê kirin. Bedirxan Beg bi malbatî di grava Girîtê hate bicih kirin.

Siltan Abdûlmecît bi vê serkeftinê gelekî kêfxweş bûbû. Ji ber vê kêfxweşiyê madalyayeke taybet a Kurdistanê da çêkirin û da yên ku di têkbirina serhildana Kurdan de cih girtine. Di hêleke vê madalyayê de tûxreya padîşah, di hêlekê de jî wêneyên çiyayên Kurdistanê heye.

Piştî têkbirina vê serhildanê Osmaniyan li Kurdistanê dest bi avakirina pergaleke nû kirin. Di 1847'an de herêma ku ji Mûş, Çolemerg , Cizîra Botan û Mêrdînê pêktê weke eyaletek bi hev ve girêdan û Esad Mûhlîs Paşa jî wek rêveberê vê herêmê hate peywirdarkirin. Ji bo Kurdistanê jî, ji bo Osmaniyan jî begîtiya Bedlisê gelekî girîng bû. Osmaniyan destwerdana wê Begîtiyê jî kirin û paşayekî xwe jî weke serokê Begîtiyê peywirdar kirin.

Begên ku bi Bedirxan beg re tevdigeriyan ji wan Abdal Xan mişextî grava Rodosê, Mîrê Bedlîsê Şeref Beg mişextî Stenbolê û yên din jî her yek rêkirin cihekî ku nikaribin bi hevdû re bikevin têkiliyê.

Peyva dawî; di serhildana Bedirxan Beg de armanca avakirina Kurdistaneke serbxwe gelek zelal e. Li gor vê armancê qels be jî bîrdoziyekê jî ava dike. Lê mixabin tam di asta serkeftinê de, bi îxaneteke mezin têkçûyîna cihekî stratejîk û paytext cihekî weke Cizirê dibe sedema têkçûna vê serhildanê û di heman demê de sedema têkçûyîna hêviyên Kurdistaneke azad.

## WANE 25.

**Pirsên Amadekariyê**

1- Serhildana her du kurên Bedirxan Beg bi çi şêwazan hate şikandin?
2- Çima yezdanşêr piştî xiyanet li apê xwe dîsa dest bi serhildanê kir?
3- Rêbaza dewletê li hemberî malbata Bedirxaniyan çi bû?

### 1- Hewildana Osman Û Hisên Kenan Beg

Di pêvajoya şerê di navbera Osmanî û Rûsyayê de, Osmaniyan ji Kurdistanê hêjmareke zêde leşker komkirin û fermandariya van hêzan jî dan kurên Berdirxan Beg.
Ji van fermandaran, Osman û Hisên Began xwestin vê derfetê bikarbînin û armanca bavê xwe ya di nîvî de mayî temam bikin. Piştî pêkanîna yekîtiyê di navbera fermandar û mîrên Kurd de, sala **1879'an** bi dizî berê xwe dan Kurdistanê. Li Cizîra Botan rawestiyan û pişt re jî serxwebûna xwe îlankirin. Osmaniyan çend caran leşker şandin ser wan, lê nekarîn serkeftinekê bi dest bêxin. Berovajiyê vê bandora xwe heya Çolemêrg, Zaxo, Amêdiyê, Mêrdîn, Midyad û Nisêbinê belavkirin. Birayê mezin Osman Beg weke mîr hat îlankirin û li ser navê wî xûtbe hat xwendin.
Di Kurdistanê de gavbigav belavbûna bandora Osman Beg û her carê şkestina leşkerên Osmaniyan, Siltan Evdilhemîd neçarî girtina hinek biryaran kir ku siyaseta dewletê li hember Kurd û Kurdistanê û xanedana Bedirxaniyan de bigûhere. Li ser vî bingehî Evdilhemîd hinek kesên ji malbata Bedirxaniyan yên di zindanan de, serbest berdan. Ji vir û şûnde çend kesên taybet şandin cem Osman Beg da ku hew xwîna Misilmanan bê rijandin. Evdilhemîd diyar dikir ku ji bo çareserkirina pirsgirêka Kurdan bi rêyên aştiyê çi tişt pêwîstbûna dê bikiriba. Osman û mîr Hisên careke din bi soz û qewlên Siltanê Osmaniyan bawerkirin û daxwazên wî pejirandin.

Piştî hevdîtinên di navbera wan de despêkirin û pê de, di dîtinê de hinek başkirina rewşa li Kurdistanê heya demeke kin hat dîtin. Lê di rastiyê de ev hemû ji bo nerm kirin û xapandina berpirsyarên Kurd bû.
Di encam de carekê din di bêhna hevdîtinan de bi bêbextî Osman û Mîr Hisên girtin û şandin Stenbol.

### 2- Hewildana Emîn Elî û Mîthad Beg

Ji kurên Bedirxan Beg, Emîn Elî û Mîthad Beg, bi çi halî be jî rojekê ji Stenbolê derketin û xwe gihandin Trabzonê. Ji vir bi mezinên Kurd yên Kurdistanê re peywendî danîn da ku hêzeke ji Kurdan bên vî bajarî û wan derbasî Kurdistanê bikin. Bi vî awayî hêza ku li bêndê bûn hatin û bi hev re ber bi welatê xwe ve ketin rê.
Nûçeya derketina her dû mîran ji Stenbolê û çûna wan ya ber bi Kurdistanê ve gihiştibû rayedarên Osmanî. Osmaniyan bi lez dest bi şandina leşkeran kirin da ku pêşî li wan bigre û wan ber bi Stenbol ve bide zîvirandin.

Di dawî de li nêzikî Baybûrtê ketin navbera dû hêzên Osmanî. Piştî şerekî bi hêzên Tirk re, leşkerên Kurd ên di hêjmara xwe de kêm şkestin û xwe avêtin çiyayên Erxenî û Medenê. Li vir jî heya demekê şer meşandin. Lê di encamê de ji ber ku tû çareya wan nemabû xwe radestî Osmaniyan kirin.

## 10-SERHILDANA ÎZEDÎN YEZDANŞÊR (1854-1855)

Dewleta Osmaniyan sehildana Kurdan ya ku di bin pêşengiya Bedirxan Beg de pêşketibû têkbiribûn. Lê bi vê serkeftinê ji alozî û rizîbûyîna pergala dewleta Osmaniyan re çareseriyek nehate dîtin. Qelsbûyîn û helîna dewleta Osmaniyan berdewam dikir. Li her derê erdnîgariya Osmaniyan de şer, pevçûn serhildan hebûn. Di heman demê de bi dewletên derdora xwe re di nav şer de bûn û her roj di van şeran de têk diçû. Van têkçûyînan bi xwe re alozî û rizîbûyîna pergalê pêşdixist û di heman demê de dibûn sedema têkçûyîna aboriyê jî. Her roj mijara dewleta Osmaniyan nêziktir dibû.

Osmaniyan çareseriya xelasbûyîna xwe ya ji vê pêvajoyê dîsa di şer de didît û her roj biryarên şer dihatin girtin. Her biryareke şer barê ser milê gel girantir dikir. Wateya şer ji bo gel baca giran, leşkeriya giran û perçiqandin bû. Ji bo biryargirtina şer jî her gav ji xwe re sedem ava dikirin. Mînak; di vê pêvajoyê de Derwêş Paşayê Osmaniyan qelsbûyîna Îranê ji xwe re weke derfetek dît û di 1848'an de êrîşek bir ser herêma Kutûr ya Îranê û ev herêma stratejîk xist bin destê xwe. Li piştî vê jî şerê Kirimê yê Rûs û Osmaniyan destpêkir. Rûs li hemberî Osmaniyan hergav bi serdiketin. Osmanî gav bi gav paşve vedikişiyan. Osmanî di 1854'an de li Bazîdê, di 1855'an de li Erzirûmê, Qersê û Wanê li hemberî Rûsan têk çûbûn. Osmanî bi alikarî û piştgiriya Îngilîzan (ji ber ku Îhgilîz ji pêşketina Rûsan ditirsiyan) li serlingan disekiniya.

Dewleta Osmaniyan li Kurdistanê pêvajoya perçiqandina Kurdan û têkûzkirina otoriteya xwe ya ku di destpêka sedsala 19. de bi serhildana Babanan dabû destpêkirin bi têkçûyîna Bedirxan Beg dixwest bi serkeftineke xurt bi dawî bike. Ji hêla leşkerî ve dixwest li her herêma Kurdistanê xwe têkûz bike. Bi polîtikayên nû êl bê bandor dikirin. Bi van polîtîqayan dixwestin venêrîna Kurdistanê bi temamî bigre dest xwe.

Zext û zora ser êlan û bêbandorkirina rêvebertiya êlan, betal kirin û ji holê rakirina mîr û begîtiyên Kurdan û li şûna wan peywirdarkirina paşayên Osmaniyan, giraniya bacan, giraniya leşkeriya bi zor û zehmet û demdirêj (12-15 sal) û rizîbûyîna pergalê di nav gel de, dibûn sedema nerazîbûyîn û bertekan. Ev narazîbûyîn û bertekan bi xwe re ji bo serhildaneke nû derfet diafirandin.

Yezdanşêr kurê Sûdî yê apê Bedirxan Beg e. Di têkçûyîna serhildan Bedirxan Beg de bi xiyaneta xwe roleke gelek girîng lîstibû. Li ser vê xiyanetê jî bi rêvebertiya Sencaxa Cûlemêrgê hatibû xelatkirin. Lê niyet û armanca Yezdanşêr serokatiya mîrîtiya Bedirxaniyan bû, begîtiya Cizêrê bû. Lê niyeta Osmaniyan tûne bû carek din derfeta zindîbûyînê bidin mîrîtiya Cizîrê û rakin ser lingan. Jixwe piştê têkçûn û pelçiqandina serhildanê hewcedariya wan bi Yezdanşêr jî nema bû. Yezdanşêr ji rêvebertiyê dûr xistin û dewsa wî de Paşayekî Osmaniyan peywirdar kirin. Dewleta Osmaniyan ji bo ji holê rakirin û tûne kirina mîr û begîtiyên Kurdan tekuz bike ketibû nav hewldaneke nû.

Bêrûmetiya xayiniyê wek şeqameke dîrokî li rûyê Yezdanşêr keti bû. Di mezgê estiyê xwe êş û poşmaniya xayintiyê hîs dikir. Lê mixabin derengmayî bû. Yezdanşêr ji bo serhildanek nû bide destpêkirin ket nav hewldanan. Şerê Kirimê ya navbera Rûs û Osmaniyan ji bo serhildanê ji xwe re wek derfetek dît. Di heman demê de ji bo di nav gelê herêmê de yekîtî û eniyeke xûrt û dorfireh avakirinê şert û merc gelek pêkan bûn. Gelên herêmê tev (Kurd, Asûrî, Ermenî, misilman, ne misilman) di bin zext û zora Osmaniyan de heciqîbûn. Ji ber vê heciqandinê di nav hemû gelên herêmê de li hemberî Osmaniyan nerazîbûyîneke xûrt pêşketibû. Vê nerazbûyînê karê Yezdanşêr hêsantir dikir. Gelên herêmê amade bûn ku ji bo xelasiya xwe ya ji bin vê zilmê piştgiriya Yezdanşêr bikin.

Yezdanşêr ev şert û merc ji bo serhildaneke nû gelek pêkan didît. Piştî ku ji gelên herêmê Asûrî, Ermenî û hinek êlên Ereban jî ji bo piştgirî û alîkariyê rewş û biryara xwe diyar kirin

Yezdanşêr di Berfanbara 1854'an de dest bi serhildanê kir. Di serî de bi hêza xwe ya ku ji 2 hezar çekdar pêkdihat êrîş bir ser Bedlîsê. Hêzên Osmanî têkbir û Bedlîs bi dest xist.
Waliyê Osmanî yê ku di şûna mîrê Bedlîsê Şeref Beg de ( Şeref Beg ji bo ku alîkarî dabû Bedirxan Beg hatibû mişext kirin) hatibû peywirdar kirin ji peywir girt û qewitand. Di şûna wî de waliyekî Kurd peywirdar kir. Osmanî ji bo destwerdan bikin û Yezdanşêr bidin seknandin ketin nav hewldanan. Arteşek amade kirin û bi ser Bedlîsê ve rêkirin. Lê hêzên Yezdanşêr ji vê re amadebûn. Artêşa Osmaniyan têkbirin.
Yezdanşêr bi vê serkeftinê berbi bajarê Mûsilê ve ket rê. Bê zor û zehmetiyan bi rihetî Mûsil jî bi dest xist. Bi destxistina Mûsilê li vir gelek cepxaneyê artêşa Osmaniyan yê wek tank, Top ,çek û hwd. bidestxist. Bi van pêşketinan hêza leşkerên wî gihîştibû 10 hezaran. Ji Mûsilê Zivirî Sêrtê û Sêrt jî bi rihetî bidest xist. Bajarê Sêrtê ji bo Osmaniyan bajarek gelek stratejîk bû. Bi destxistina vê bajarî Yezdanşêr derbeyek gelek mezin li dewleta Osmaniyan xistibû. Bi van serkeftinan herêma navbera Wan, Amed û Mûsilê xist bin kontrola xwe. Serhildan bi piştgiriya gelên herêmê demeke kin de geş û dorfireh bû. Piştgirî û alikariya gelên herêmê ya vê serhildanê ji ya serhildana Bedirxan Beg pêştir û xûrtir bû. Gelên herêmên Sûryanî, Ermenî û Rûm tev di nav raperinê de bûn û hêz didan serhildana Yezdanşêr. Serhildan di zivistana 1855'an de gihîştibû asta herî xûrt û serkeftî. Hêzên Osmanî yên ku dixwestin ji hêla Bexda û Helebê ve êrîş bînin ser hêzên Yezdanşêr bi rihetî dihatin têkbirin û hêzên Osmanî neçar diman ku xwe paşve bikşînin.
Serhildana ku di berfanbarê de bi hêzeke ji 2 hezarî pêkdihat destpêkiribû di meha Rêbêndanê de bû 30 hezar, di meha Sibatê de 60 hezar û pişt re jî gihişti bû 100 hezar kesî. Di wê serdemê de ev hêzeke gelek hêjayî bû. Di karibû bi wê hêzê xwe gelek cihan bigre bin kontrola xwe. Lê Yezdanşêr ji bo pêşketin û serkeftinan ev hêza xwe bikarneanî. Yezdanşêr firekirina erdnigariya xwe û serkeftina xwe girêdayê tifaqa xwe û yê Rûsan didît. Ji bo wê jî dixwest bi Rûsan re îtîfaqê çêke bi hevkariya wan bikeve nav hewldanan. Bi taybetî jî ji bo bidestxistina bajarê Wan û Erzirûmê ketibû nav hewldanan. Yezdanşêr ji bo bidestxistina van herdû bajaran di xwest bi Rûsan re têkilî deyne û bi wan re bikeve nav hevkariyê. Yezdanşêr ji bo îtîfaq û hevkariya dijberiya dewleta Osmaniyan fikir û ramanên xwe bi nameyekê rêkirin ji serfermandarê Rûs yê Êrîwanê re û demeke dirêj bê tevger ma û li benda bersîva vê nameyê ma. (Name piştî têkçûna serhildanê dighêje navnîşana xwe) Alikariya ku Yezdanşêr li bendê bû ku dê ji Rûsan bihata gelekî dereng ma û zivistan bi ser de hat. Di demsala zivistanê de li erdnîgariya Kurdistanê şer gelekî zehmet bû.
Ji bo amadekariyan û îtîfaqan perçekirina hêza Yezdanşêr ev dema seknê ya bê tevger ji bo dewleta Osmaniyan û dewletên mêtînger firsendeke gelekî baş bû. Di serî de ji bo qûtkirina têkiliyên Kurdan ên polîtik ên bi derdor re ketin nav heweldanan. Pişt re siyaseta xwe ya qirêj a hergava ku nîfaq dixistin nav êlên Kurdan , neyartiya di navbera wan de kur dikirin û li hemberî hev dana şerkirin xistin dewrê. Di vê de hinek bi ser jî ketin. Hinek êlan hêzên xwe yên leşkerî ji nav artêşa Yezdanşêr vekişandin. Alikariya xwe ji Yezdanşêr qût dikirin. Careke din xiyanet ketibû dewrê, carek din dûbare qedera Kurdan a xiyanetê destpêkiribû. Yezdanşêr dît ku dirêjbûyîna wext dê hîn zêde zirarê bide hêza wî, ket nav hewldanan. Ji bo êrişan bibe ser bajêrê Wanê dest bi amadekariyan kir û hêzên xwe yên leşkerî li başûrê Wanê kom kir”.
Çawa konsola Îngilîzan ya Mûsilê Rîsam vê dibihîze, ji bo ku Yezdanşêr bide seknandin dikeve nav hewldanan. Bi Yezdanşêr re hevdîtinekê pêktîne û dibeje ku “dewleta Osmaniyan amadeye bi te re hevdîtinê pêk bîne û peymana aştiyê çêbike. Ji bo vê jî dewleta Osmaniyan heyetek rêkiriye li vir amadeye.” Mixabin Yezdanşêr bi Rîsam dixape û pêşniyara hevdîtinê qebûl dike.

Heke Yezdanşêr bi serketa dê dewleta Osmaniyan perçebûbûya. Ya herî giring jî erdnîgariya Kurdistanê ya gelekî girîng û stratejîk dê biketa bin hûkmê Rûsan. Ji ber vê fikarê Îngilîz û Fransiz bi tevahiya hêzên xwe yên polîtik û leşkerî ve ketin nav hewldanan ku piştgirî bidin Osmaniyan û Yezdanşêr têkbibin.
Dewleta Osmanî jî ji bo pêşî li pêşketina serhildanê bigrin jixwe di nav hewldanan de bû. Çavên dewletên serdest û mêtingeran di parvekirina erdnîgariya dewleta Osmaniyan de bû. Perçebûyîna erdnîgariya Osmaniyan kêrî berjewendiyên wan nedihat. Ji ber vê jî nedixwestin Kurd biserbikevin û bibin xwediyê dewleteke serbixwe. Wexta ku mijar Kurd û azadbûyîna Kurdan be neyarên sed selan yên ku xwînmijiya hevdû kirine dikarin werin cemhev û li hemberî Kurdan bi hev re alikarî û hevkariyê bikin. Înigilîzan ji bo têkbirina serhildanê ji hêla amûr û çekan ve alîkariyeke xûrt dida Osmaniyan. Artêşa Osmaniyan perwerde dikir. Ev alîkarî têr nekir fermandarên xwe di nav artêşa Osmaniyan de ji bo li hemberî Kurdan di artêşa Osmaniyan de fermandariyê bikin bi cih kirin.
Ji hêla din ve jî konsolosa Îngilîzan yê Mûsilê Rîsam ji bo fesadî û nîfaqê dixe nav êlên Kurdan ku xwe ji piştgiriya Yezdanşêr vekşînin, bi kedeke bêhempa dişixûliyan; bi serok û rêberên êlan re yek bi yek hevdîtin pêkdianîn. Di heman demê de jî kedeke mezin dida ku Yezdanşêr qanih bike ku bi Osmaniyan re bikeve nav têkilî û hevdîtinan. Ev xebata xwe bi hayîbûna şêwirmendiya Osmaniyan her roj pêşdixist. Yezdanşêr mirovekî nezan û nepolîtîk bû. Biî sozên vî konsûlî bawerî anî û pê qanix bû. Bi vî kesî tenê bawerî anî û hevdîtina bi Osmaniyan re qebûl kir. Ev hevdîtin defik bû. Bi navê hevdîtinê Yezdanşêr xistin defikê û rêkirin Stenbol û xistin zîndanê. Bi nezanbûna Yezdanşêr ev hêza mezin a ku hêviyên azadiyê di xwe de dihewand bê serok û rêber ma û di demeke kin de ji hev çû.
Bi têkçûnyîna serhildana Yezdanşêr dawî li serdema serhildanên ku di bin rêbertiya mîr û Begên Kurdan de pêşdiketin jî hat. Dewleta Osmaniyan polîtîkaya tûnekirina mîr û Begên Kurdan ya ku di destpêka 1800'an de dabû destpêkirin bi serkeftinê bi dawî kir. Piştî vê pêvajoya ku 50 sal domkir û bi temamî bi serhildan, têkçûyîn û bi zilm û zor derbas bû, li Kurdistanê pêvajoyeke nû destpêdikir. Di vê pêvajoya nû de di warê civakî, çandî, siyasî û aborî de bi hişmendiya Kurdan hate leyistin.
Wexta ku mirov serhildanên vê pêvajoyê yên 50 salan dinirxîne di hemûyan de çend xalên giring derdikevin pêşberî mirov. Mirov dikare van xalan bi kurtahî wisa bîne ziman. Tevahiya serhildanan bi serokatiya êlî destpêdikin û bi wê jî diqedin. Berjewendiyên herêmî gelekî li pêşin. Hêla wan ên netewî jî hene, lê di qada netewî de xwe birêxistin nekirine. Tenê hêla xwe ya leşkerî zêde derxistine pêş. Ji ber vê jî tev bi nakokiyên nav êlî û bi xiyanetên navxweyî têk diçin. Tevahiya mîr û begitiyên Kurdan gelek demên dirêj di herêma xwe de weke azad û serbxwe jiyane. Lê dîsa jî ji xwe re pergaleke civakî ya hêsan ava nekirine. Ji ber vê jî di van serhildanan de hêla wan a civakî û siyasî gelekî qels bû.
Taybetmendiya vê serhildanê ya ku ji serhildanên din cûda ew bû ku cara yekemîn bakurê rojavayê Kurdistanê tev hemêz kiribû. Lê ji ber rêvebertiya qels, bêpolîtîka û bêbîrdozî li hember hêzên serdest têk çû. Di van têkçûyînan de rola hêzên Ewrûpî yên mêtînger sereke bû.
Serhildana Yezdanşêr ji bo fêmkirina trajediya Kurdan minakeke ji serhildanan a girîng e. Ev serhildan nîşan dide ku rêbertiyeke nezan û bi hişmendiya êlî, bêpolîtikayî û bê bîrdoziyeke xûrt û pêşêroj nedîtî û bê yekbûniya Kurdan hergav bedêleke giran bi Kurdan daye dayîn. Ji kêmasî û nezaniya rêbertiyên serhildanan komployên sedsalan yên feodalî bi destê mêtîngeran carek din bi ser dikevin. Gelek balkeşe ku di sala 1850' î de 100 hezar hêzek mirov hebe û mirov baweriya serkeftinê bi wê hêza xwe neyîne û mirov serkeftina xwe bi îtîfaq û alikariyên derve ve girê bide.


## WANE 26.

**Pirsên Amadekariyê**

1- Çima Osmanî bi qeyranê kete sedsala 19.
2- Siyaseta hêzên Rojavayî li ser Rojhilata Navîn di vê serdemê de çi bû?
3- Çima di vê demê de Mîrekiyên Kurdan ji aliyê Osmaniyan ve dihatin rûxandin û tengavkirin?

## JI 1850'Î ŞÛNDE PERGALA CÎHANÊ Û ROJHILATA NAVÎN

Di sala 1850'î şûn ve hêzên bandorker ên siyaset û teşedayina cîhanê diyar bûbûn. Dewletên weke Îngilîstan, Fransa, Yekitiya Emerikayê, Awûstûrya û Îtalya li cîhanê mezinbûyîna xwe erkdariya xwe û bandorkeriya xwe dabûn qebûlkirin. Van dewletan şoreşa xwe ya pîşêsaziyê pêkanîbûn. Artêşên wan ên bihêz û bi teknîk hebûn. Di warê dewletbûyînê de pergala xwe xûrt kiribûn. Li gelek deverên cihanê metingerbûn. Van dewletan ji herêmên metîngeriyê dewlemendiyên ser erd û bin erd tev di herikandin welatê xwe. Û her ku diçû aboriya wan xûrtir dibû. Ji hêleke din ve jî çavê van dewletan tev di dewlemendiya Rojhilata navîn de bû. Rojhilata navîn ji bo hemûyan gelekî girîng bû. Tesbîtkirina dewlemendiya petrola bin erd û taybetmendiyên dîrokî bala van dewletan carek din kişandibû ser Rojhilata Navîn. Ji bo bi destxistina vê dewlemendiyê tev di nav hewldanan de bûn. Ev hewldan carnan dibûn îtîfaq, carnan dibûn şer û pevçûn, carinan jî dibûn plansazî û stratejiyên cûr bi cûr.




Di vê serdemê de li Rojhilata Navîn du hêzên mezin hebûn. Ji van a yekê dewleta Osmaniyan a din jî dewleta Îraniyan bû. Polîtikayên dewletên Emperyalîst herî zêde bandor li van dewletan dikir û zirar dida van dewletan.

Dewleta Osmaniyan bi qeyranên aborî, siyasî û leşkerî dest bi sedsala 19. kiribû. Hewldanên împaratoriyê yên ji bo xelasbûyîna ji van qeyranan tev bê encam mabûn. Şerên di navbera Împaratorî û Rûsan de her diçû împaratorî ber bi qelsî û tûnebûnê ve dibir. Ev qelsbûyîn jî dibû sedema bêbandoriya Osmaniyan a herêma Balkan û Erebîstanê. Serkeftina serhildanên Misir û Yewnenistanê û diyarkirina serxwebûna wan ji gelên din re jî bûbû coş-manewiyat. Li bakurê Efrîqayê û li balkanan gelên din jî ji bo azadiyê ketibûn nava hewldanan. Li Kurdistanê jî 50 sal bû Kurd di nav raperînê de bûn. Asta wan raperînên dewleta Osmaniyan tehdît dikir. Di heman demê de dibûn sedema têkçûna aboriyê. Têkçûna aboriyê jî dibû sedema bac û leşkeriya giran. Vê barêgiran bi xwe re veqetandina gelan zûtirîn dikir.

Ev rewş û pêvajoya qeyranê destwerdana dewletên emperyal a Osmaniyan hêsantir dikir. Dewletên emperyal dixwestin dû bi hêlan ve ji pêvajoya qeyrana Osmaniyan sûdwerbigrin. Ji hêlekê ve dixwestin rêveberiya Osmaniyan bigrin bin kontrola xwe. Ji hêla din ve jî dixwestin dest bavêjin gelên ku dibin metîngeriyên Osmaniyan de ne. Jixwe encamên polîtîqayên wan bi her awayî bi germahiya xwe li bakurê Efrîqayê, li Balkanan û li Kurdistanê derdikeve pêşberî me.

Teşeya rêxistinbûyîna civaka Kurdan êlî bû. Di heman demê de civaka Kurdan civakeke Çandinî bû. Jiyaneke wan a nîv koçerî hebû. Ev êl bi sedselan di bin banê mîrîtî û begîtiyan de xweser jiyane. Têkilî û jiyana wan li gor jiyaneke xweser pêşketibû. Lê niha dewleta Osmaniyan jiyanek nû li ser wan ferz dikir. Mîr û begîtî ji holê rakiribûn û serweriya xwe li ser Kurdan ferz dikir. Lê jiyana Kurdan ya koçerî li pêşiya pêkhatina vê serweriyê astengiya herî mezin bû. Osmanî ji bo ku bikaribin Kurdan bi serweriya xwe ve girê bidin û wan di bin hûkmê xwe de bigrin, destwerdana jiyana Kurdan ya koçerî kirin. Xwestin wan niştecîh bike û wan di nav pergala xwe de bi cih bike. Kurdan bi têkçûna sê serhildanên mezin pergala jiyana xwe ya bi ewlehiya sedsalan winda kiribûn. Bê pêşeng û rêber mabûn. Ji bo pêkhatina yekitiya Kurdan ne rêbereke/î Kurdan a/ê xûrt hebû, ne jî bîrdoziyeke Kurdan a xûrt hebû. Dewleta Osmanî û Îraniyan xwestin ji vê belavbûn û qelsiya Kurdan îstîfade bikin û wan bi her awayî di bin serweriya xwe de di nav pergala xwe de bi cîh bikin û wan bihelînin.



Dewleta Osmaniyan li gor van polîtîqayan gava yekemîn di sala 1856'an de bi derxistina zagona erd avêt. Erdnîgariya dewleta Osmaniyan gelekî fireh bû, lê serjimêriya mirovan hindik bû. Ji ber vê jî ev erdnîgarî bi aweyekî baş nedihat bikaranîn. Bi vê zagonê xwestin erd bi awayekî li gel parve bikin û hîn zêde ji erd hatin bidest bixin. Lê ji bo Kurdan naverok, encam û wateya vê zagonê cûda bû.
Di dema siltan Mehmûd de erdên ku bi navê "Timarê" dihatin bi nav kirin ji xwediyê wan hatin giritin û vegûhûrandin "îltîzam"ê. Pişt re di dema Siltan Abdûlmecît de ji xeynî malê weqfa erdên din tev weke malê dewletê hatin diyarkirin. Pişt re jî ji bo ku êlên koçber bikin niştecih ev erd bi bûhayek erzan bi navê "dûhaliyê" tapûyên wan li êlan belav kirin. Lê tapûyên van erdan weke komînal nedidan tevahiya êlan. Ji bo ku jiyana êlan ya komînal xirab bikin û nakokiyan têkin nav yekîtiya wan û wan perçe bikin ev tapû didan kesan. Ev tapû di serî de weke mafê bikaranîna erd bêbinav kirin jî pişt re zivirî mûlkiyeta taybet.
Derketina vê zagonê erd gelekî bi kiymet kirin. Piraniya êlan li ser van erdên ku bi erzanî bidestxistibûn bi cih bûn û dev ji koçeriyê berdan. Di vê pêvajoyê de kes an jî êlên ku têkiliyên wan bi rêveberiya Osmaniyan re xûrt bûn erdên gelekî mezin bidestxistin. Mînak; êla Dîzgî ya wê demê deşta Hewlêrê tev li ser navê xwe qeyd kirbûn. Dewleta Osmaniyan û Îraniyan ji bo ku Kurdan bi xwe ve girêbidin di belav kirina erd de ketibûn pêşbaziyê. Di ser de jî êrîşa Kurdan ya li hemberî civakên ne Mûsilmanan, destdanîn û xesp kirina erdên civakên ne misilmanan re bêdeng diman. Heta ku hinek caran dihatin teşvîk kirin. her ku diçûn erd zêde dibû. Xwediyê van erdên zêde jî axa û şêx bûn. Kurdên ku bi vê rêbazê bi wan ve nedihatin girêdan ji bo konrol kirina wan rêbazên cûda diceribandin.
Ev jiyana niştecihî ya nû bû sedema têkçûyîn û belavbûna jiyana êlî ya sedsalan. Jiyana komîn a ku ji bo jiyana çanda êlî jênegerbû hêdî hêdî ber bi têkçûnê ve diçû. Di şûna vê jiyana komîn a berjewendiyên takekesî û jiyana takekesî ya ku dewletên serdestan daxwaz dikirin bi pêş diket. Di şûna mîr û begîtiyan de pergala axatiya girêdayî dewletê bi pêşdiket. Jixwe di wexta belav kirina erdan de dewletê mirovên xwe baş tespît kiribûn. Kesên ku erd li wan dihat belavkirin tev ji kesên ku bi dewletê ve girêdayî bûn ji wan dihatin hilbijartin. Kes çiqas bi dewletê ve girêdayî û dilsozên dewletê bûn ewqas erdên mezin didane. Erdnîgariya Kurdistanê li ser çend hevkarên xwe didan tapû kirin. Lê serjimara Kurdan a herî girîng ji vê parvekirinê bêpar mabûn. Dewleta Osmaniyan bi vê rêbaza belav kirina xakê bi pergala civaka Kurdan lîst. Çîneke nû û bi taybet ji axayan afirand. Çîneke din jî bi axayan ve girêdayî derket holê ew jî şirîk, karker û xûlamên axane. Êdî xaka axayan bû. Ev çîna axayan ji bo berjewendiyên xwe yên şexsî bi dewletê ve girêdayîbû û hevkariya

dewletê dikir. Dewleta Osmaniyan jî dixwest bi vê çîna axayan tevahiya civaka Kurdan têxin bin kontrol û hakîmyeta xwe. Loma zext û zora axayan a li ser gel ji nedîtî ve hat. Heta ku pirî caran piştgirî da wan û teşwîk kirin. Gelê Kurd hiştin di bin însafa van axayan de. Êdî li Kurdistanê di şûna Teşeya mîr û begîtiyê de Teşeyek û şêwaza têkiliyeke civakî ya nû derketibû hole. Ew jî têkiliya axa û gelê pê ve girêdayî û têkiliya axa û dewletê bû.
Begîtiyên Kurdan bi destpêka sedsala 16. û vir ve gelek herêmên mezin kontrol dikirin. Carnan ev herêm ji çend bajaran û ji serjimareke gelekî mezin pêkdihat. Nerazîbûna mîr û begekî dibû pirsgirêka herêmeke mezin. Ev jî di pêvajoya qelsiyê de dewleta Osmaniyan dixist nava xeterî û gelekî ditirsand. Armanca derxistina zagona xakê ya herî girîng jî perçekirin û tûnekirina vê pergalê bû. Êdî di şûna mîr û began de axa hebûn. Êdî li hemberî dewletê hêza beg û mîran ya ku carnan ji sed hezaran pêkdihat tûne bû. Di şûna wan de hêza axayan ku tenê ji çend gundan pêkdihat hebû. Axa jî girêdayî dewletê bûn. Heke axa pirsgirêk derxin jî hêza wan ji çend gundan derbas nabe û bi rihetî dê karibin hêza axayan biperçiqînin.
Dewleta Osmaniyan bi gûhertina pergala xakê re pergal, rêxistin û venêrîna dewletê jî ji serî heta binî gûhert. Û pêve pergala civakê, leşkerî û aboriyê jî gûhert. Di bajêran de mekamên walîtiyê û şaredariyê hatin damezirandin. Ji bo wan bi navendê ve girê bidin jî li navendê perpirsiyarên van wezaretan hatin damezirandin. Ji bo leşkeriyê, bacê û hwd. pergalên navendî hatin avakirin. Tenê armanceke van hewldanan hebû, ew jî bê hêz û bê bandorkirina rêvebertiya herêmî bû. Bi van hewldanan hêz û hekîmyeta navendî li tevahiya herêman bandorker kir.
Pêvajoya tasfiyekirina begîtiyên Kurdan a ku di serdema Mehmûdê 2. de destpêkiribû bi encambûyîna wî re li Kurdistanê di warê serweriyê de valahiyek bi xwe re anî. Mîr û Began bi aweyekî di nav civakê de yekîtiyek pêkdianîn. Di herêma xwe de li gor xwe hiqûqek bikardianîn û civak birêve dibirin. Osmaniyan xwest bi hiqûq û serwriya xwe vê valahiyê dagre, lê ji ber ku Kurd tû caran ne bûbûn perçeyek ji pergela dewletê û bi pergala dewletê re aştî nejiyabûn bi serneket. Ev valahî bû sedema zilm û zora axayan, bû sedema şer û pevçûna axayan û di pêşengiya wan de bû sedema şer û pevçûna êlan. Bû sedama zilm, talan û niheqiyên mezin. Di wê serdemê de herêma Kurdistanê de di navbera Kurdan de şer û pevçûn tûnebû. Li her derê di navbera êlan de neyartiyên kur yên ku weke “neyartiya xwînê” dihatin bi navkirin pêşdiketin. Her ku diçû Kurd ji hev dûr diketin û dibûn neyarên hevdû. Tiştên ku dewletên serdest dixwest pêkdihatin. Civaka Kurdan ji xwe di nav xizaniyê de û di nav nexweşiyên belavbûyî de êşeke mezin dikişandin. Vê serûbinbûna civakî jî pêkanî. Vê pêvajoyê ji bo Kurdan xeteryên pir mezin di xwe de dihînin. Tevahiya Kurdan vê hîs dikir. Di dema Began de di şerê di navbera êlan de diketin navbera wan û bi aweyekî ew li hev dianîn. Li kesên ku vê rolê bileyze tûne bû û teqez hewcedarî bi hêzeke wisa hebû.
Ji ber ku êdî mîr û beg tûnebûn şêx ketin nav hewldanan ku vê valatiyê dagrin. Êdî ev peywir diket ser milê şêxan. Ji 1850'î şûn ve em dibînin ku li her devera Kurdistanê şêx wek otorîteyek derdikevin pêşberê me. Êdî li Kurdistanê otoriteyek dû serî hebû seriyekî şêx seriyê din jî axa bûn. Lê ev herdû serî hergav alîkar û piştgiriyê hevdû bûn. Hevdû temam dikirin. Şêxan hergav ji axayan re rola zagonsaziyê dilîstin. Axa jî ji xwe rêvebirbûn. Pirî caran axayan kar û emelên xwe yên qirêj bi şêxan meşrû dikirin û bi gel didan qebûl kirin. Bi piştgiriya axayan jî her ku diçû bandora şêxan li ser gel zêde dibû. Demekê şûnde jî mekama şêxîtiyê li Kurdistanê bû mekama herî paye bilind û li herêmên mezin bûn bandorker. Bi vê pêvajoyê ve girêdayî jî dû teriqatên girîng ên bi navê Qadîrî û Nakşîbêndî li Kurdistanê hatin birêxistinkirin. Ev tarîqat bandoreke mezin li ser civaka Kurdan dikin û hê jî bandorker in.

**WANE 27.**

**Pirsên Amadekariyê**

1- Sedema derketina serhildana Şêx Ûbeydûlah çi bû?
2- Siyaseta şahê Îranê ji bo malbata Şêx Ûbeyîdûlah çi bûn?
3- Çima di van serhildanan de piştî demekê hin kurdan piştgiriya xwe ji serhildanê dikêşandin?

## 9-SERHILDANA ŞÊX ÛBEYDÛLLAHÎ (1880-1882)

Di sala 1836'an de Şahê Îranê, rêvebiriya hêrêma Merkavûrê dabû şêxê Nexşîbendî yê mezin şêx Tahayî. Gelê herêmê xerc û baceya xwe didane şêx û pirsgirêkên xwe yên rêvebirinê an jî yên manewî bi şêx Tahayî re parve dikirin. Li Îranê nifûsa Kurdên herî pir sûnî bûn û weke dethilatî, şêx Tahayî gelekî diecibandin. Şahê Îranê venêrîna Merkavûrê radestî Şêx Tahayî kir û bi vê mabestê dixwest ku Kurdan bixe bin venêrîna xwe. Heger bi şêx Tahayî re têkîliyên hevalbendiyê çêbibe, wê ji Kurdan tû pirsgirêk derneketina. Hesabê şahê Îranê ev bû. Şêx Taha demeke dirêj herêma Merkavûrê di bin serweriya xwe de hişt û ji her du aliyan ve jî pêvajoyeke baş derkete holê. Şêx Taha piştî demekê mir û di dewsa wî de kurê wî yê bi navê şêx Ûbeydûllah hat. Rewşa ji serdema şêx Taha mayî hîn jî dom dikir. Weke desthilatiya olî ya herêmê ya herî mezin şêx Ûbeydûllah, bi heman awayî Merkasûr û derdora wê jî birêvebirina wê domand. Ûsif xan ku hakimê Ûrmiyeyê û Xoyê bû, di 1872'yan de îlan kir ku divê bacên ku berî hingê didane şêx Ûbeydûllah, ji vir û pê de divê ji wan re werin dayîn. Lê Kurdên li herêmê tev de red kirin û dana baceyên xwe yên ku didane şêx Ûbeydûllah domandin. Şahê Îranê ku ev bûyer li hemberî destilatiya xwe weke serhildanekê nirxandin, ji bo baceyên herêmê werin standin û zorê li gelê herêmê bike û serî bitewînin artêşek şande ser Merkavûrê. Artêşa Îranê kete herêmê û çi kete pêşiyê şewitand û wêran kir. Tiştên ku bi kêrî kar dihatin jî weke "baceyê" dest danî serê.

Şêx Ûbeydûllah ji bo van êrîşên ku li ser herêma wî hatin kirin neçar ma ku destwerdan bike. Yekîneyeke ku ji şervanên Kurd pêk hatî şand ser Hakimê Ûrmiye û Xoyê. Ji bilî vê jî serî li Osmaniyan da û xwest ku alîkariya wî bikin. Ku Kurdan li hemberî Îranê serî hildida kêfa Osmaniyan jî dihat. Ji ber vê pêşniyar pejirandin û alîkariya şêx Ûbeydûllah kirin. Dîsa li ser daxwaziya Ûbeydûllah dewleta Osmaniyan dest bi pêkutiyên li ser Îranê kir ku zirara ku dayî Kurdan weke tazmînat bide.

Ji vê hewildana Osmaniyan tû encam derneket, bes vê pêvajoyê bi xwe kir ku pêwendiyên di navbera Ûbeydûllah û Osmaniyan de xûrt bibin. Di sala 1877'an de şer li ber deriyê Osmanî û Rûsan bû. Di meha avrêlê de Evdilhemîdê dûyemîn fermaneke taybet derxistibû û "li hemberî kafiran cîhada pîroz" îlan kiribû. Û ji Kurdan ku gelê misilman yê herî nêzîkî wî bû leşker xwestibûn. Êlên Kurdan hinekan ji wan ev daxwaz red kiribûn, hinek êlên ku gotibûn "erê" di meriyetê de nedixwestin vê xwestekê bînin cîh. Ji aliyê din ve Rûsan jî, ji bo alîgiran di nava Kurdan de bibînin xebat dimeşandin. Ji bo Kurdan bikşînin ji aliyê xwe ve sozên cûrbecûr didan. Rûsan hesab dikir ku Kurdan bikêşînin aliyê xwe. Bi vî awayî dê bi rihetî têkevine heta nava Anatoliyê. Ji bo wê jî girîngî didan ku alîgiran di nava Kurdan

de bibînin. Osmaniyan jî ev xeterî didît û bi hêza wan ya ku heyî li ber xwe didan. Cîhda pîroz (Cîhad-î Mûqaddes) jî ji bo vê hatibû îlankirin.

Mûxatabê vê banga Evdilhemîdê dûyemîn yê li Kurdistanê yê herî mezin Şêx Ûbeydûllah bû. Lewra rêberê herêmê yê derthiltiya olî ya herî girîng û terîqeta Nexşîbêndî bû. Û bi vî cihê xwe, pêwîst didît ku bersiva bangewaziya "Cehdê" bide. Di dawiyê de Şêx Ûbeydûllahê ku bersiva erênî ya alîkarî xwestina Omaniyan da, bangî Kurdên di nava tixûbê Îran û Osmaniyan de kir. Ji wan xwest ku di şerê li hemberî Rûsan de were dayîn de, li ba Osmaniyan cîh bigrin. Wî bixwe jî leşkerên xwe dane kêleka xwe û ber bi bakur ve kete nava tevgerê. Di şerê ku li herêma Bazîd û Qersê hatî dayîn de cihê xwe girtin.

Banga ku Şêx Ûbeydûllah kirî di nava Kurdan de deng veda û gelek êlan li ba artêşa Osmaniyan cihê xwe girtin. Hinek êlên ji Kurdên Îranê, ji tixûb derbas bûn û hatin û girêdana xwe ya bi şêx Ûbeydûllah re nîşan kirin. Li gorî hin çavkaniyan hejmara Kurdên ku tevlî vî şerî bûyîn di derdora 90 hezarî de bûne.

Artêşa Rûsan di payîza 1877'an de, ber bi herêmên ku berî hingî dagir kiribûn ve pêngavek avêt. Li Qersê, li Bazîdê û Erzerûmê artêşa Osmaniyan têk birin û zêdetir dest bi zoriya li ser artêşa Osmaniyan kirin. Lê pirsgirêkên Osmaniyan ne ev tenê bûn. Mehaneyên ku berê hatibûn eşkerekirin ku dê bidine leşkeran nedihatin dayîn. Di artêşê de kêmayiya xwarin û vexwarinan hebû û leşker nedihatin xwedîkirin. Lêşkerên ku birçî diman, gundên li herêmê û gundî aciz dikirin.

Li ser van mercên dijwar ku dihatin jiyîn, pîskolojiya dihate gotin ku Rûsan şer bidest xistiye jî dikete ser, yekîneyên êlên Kurdan , dest bi reva ji yekîneyên ku di nav de bûn kirin.
Bi hezaran Kurdan bi vî awayî artêşa Osmaniyan terk kir. Tenê di tîrmeha 1877'an de hejmara leşkerên Kurd yên ku revîn li derdora 1500 bûn. Di meha sermeweza 1878'an de agirbest çêbû. Pişt re di adara 1878'an de Rûsan di peymana Berlînê ya Sanistîfano de xwestin ku li hemberî herêma Kutûrê ku ji Îranê re were dayîn Bazîd û Şakirdê ji Osmaniyan re hiştin.

Îngîlîzan, di şerê Osmaniyan û Rûsan yê di navbera 1877'an û 1878'an de çêbûyî de alîkariya Osmaniyan kiribûn....
Gelek efserên Îngîlîzan di artêşa Osmaniyan de peywir girtibûn. Piştî şer di hevdîtinên li hemberî hevdû de jî, îngîlîzan alîkariya Osmaniyan kir, li hemberê tevî van hewildanan, Osmaniyan Qibrisê da Îngîlîzan. Di sala 1878'an de, dema ku şer bi dawî bû, êdî aboriya Osmaniyan rûxiyabû. Di rastiya xwe de vê pêvajoyê bi dewra tezmînatê re dest pê kiribû. Şerê Qirimê, Sirbîstan, Bûlgarîstan, Kurdistan û serhildanên Grîtê li pey hev an jî di vê pêvajoyê de derketibûn. Vê jî bandor li ser aboriyê dikir. Aboriya Ewropayê, bilezgînî bazarên Osmaniyan bi dest dixist. Osmaniyan bi mabesta ku aboriya xwe li hev bînin, cara yekemîn di cotkariyê de dest bi deynkirina ji dewletên derve kirin û pişt re jî berdewam kir. Osmanî hatin rewşeke wisa ku êdî nikaribûn faîza deynê xwe jî bidin û di sala 1875'an de aboriya Osmanî bi awayekî fîîlî îflas kir. Ewropiyan, ji bo vê rûxandina aboriya Osmaniyan, kiryarên dayina deynan rawestandin. Lewra difikirîn ku deynê ku bidine Osmaniyan dê bi şûn de nestînin.

Dewleta Osmanî, ji bo ku rêveberiya xwe bidomîne, diviya diravan (pere) peyda bike. Dirav jî bi Ewropiyan re bûn. Di sala 1879'an de dewletên rojava yên mezin û siltanê Osmanî di mijara deynan de peymanek çêkirin. Di sala 1881'an de "îdareya deynan ya dewleta Osmanî" hate damezirandin. (Dûyûn-û Ûmûmiye). Bi rêya vê peymanê, dewletên Ewrûpî yên mezin, deynên ku dane dewleta Osmanî dê wan bi xwe hasil bikirana. Ewrûpiyan bixwe, hatinên dewleta Osmanî xistin bin venêrîna xwe. Wiha hemberiya deynên ku dayîn dikirin bin ewlehiyê de. Bi vî rengî dewleta Osmanî, biawayekî fermî, kete bin serweriya malî ya navneteweyî de. Dewletên weke Almanya, Îngîlîstan, Fransa, Ewûstûrya û Îtalya yên ku deynên wan li Osmaniyan bûn nifûzên girîng bidest xistin. Xezîneya Osmanî vala bûbû. Ne pêkan bû ku bi deynan kar were meşandin. Ji bo ku xezîneya xwe dagre, dîsa çavkaniya ku serî lê were dayîn gel bû. Bi vê mabetsê, bi ser bacên ku ku berê ji gel distandin de hinek bac li wan zêde kirin. Her weke baca milk, baca axê, baca rê, bac derketin dû qatan.

Çiqas ku rizîbûna dewleta Osmanî zêde dibû, berteka gelê di bin împaratoriyê de jî zêde dibû. Serhildana di sala 1825'an de li Bosna-Hersek, li Sirbîstan û li Qeredaxê dest pê kiribû û didomiya. Serhildan gihabû Bûlgarîstanê jî, dîsa li Zeytûnê serhildana Ermeniyan hatibû jiyîn Serhildanên Kurdan yên dem kin li Dêrsim, Cizîrê, Mûşê, Bedlîsê û li Wanê bi pêş ketibûn. Bi ser van tevan de, di sala 1879-1880'yî de dewreke hişkbûniyê hatibû jiyîn. Rojnameya Îngîlîz Times ya dûwazdehê adara 1880'î de digot:" Rewşa li Amedê û Mûsilê heta were gotin bijane, serjimêriya (nifûs) herêma Mûsilê bi tevahî ji çavkaniyên debariyê bêpar bûn. Lê bi hêviya ku dexla were, dê rewşa yên ku di nava bobelatê de ne, hinekî sererast bike, tê jiyîn". Li Çolemêrgê dîzanterî belav bûbû. Hejmara kesên ku ji birçîbûn û nexweşiyê miribûn li Elbakê, Bazîdê, Eleşgirtê Midyadê û li Cizîre bi hezaran dihate bilêv kirin. Di rojnameya Tîflîs MŞAKê de, sefîltiya Kurd û Ermeniyên di bin bandoriya Îran û Osmaniyan de dihate gotin. Di navbera salan 1877-1880'î de, Xoy û Seûbûlad (li herêmê weke Mehabad, Ûrmiye û Sîneyê) yên li Kurdistan Îranê birçîtî bûbû sedema perîşankirin, nexweşî û mirina gel.

Di dewra ku dê serhildana şêx Ûbeydûllah dest pê bike de, rewşa gelemperî bi vî rengî bû. Û serhildan di nava van şert û mercan de pêk hatibû. Bi salan bû ku şêx Ûbeydûllah şahiditiya rêveberiyên Îran û Osmaniyan dikir û pêkutiyên wan yên li ser Kurdan didîtin, rêyên xilasbûyîna ji bin van pêkutiyan weke avakirina" Kurdistaneke serbixwe" didît. Yên li pey mîrê Botan, Bedlîs û Rewandûzê mayî û di şerê ku berî hingî bi Osmaniyan re kirin serweriyên xwe wenda kirin gotin ku dê piştgiriyê bidine şêx Ûbeydûllah. Gundiyên Kurd, yên xizan şêx Ûbeydûllah weke hêviyeke rizgarbûyînê didîtin.

Rêveberiya Osmanî, ku ji hewildana şêx Ûbeydûllah ku dê serhildanê bike agahdar bû, miftiyê Wanê şande cem şêx Ûbeydûllah. Di hevdîtinên ku hatin pêkanîn de, aciziya Kurdan ya ji rêvberiya Osmaniyan hate bilêvkirin û daxwaza rêvberiyeke baştir hate kirin. Heger ku " rêveberiyeke baş" pêk neyê, dê şêx Ûbeydûllah û Kurdê li derdora xwe derbasî "hemwelatîtiya" Îranê bibin " hate bilêv kirin. Piştî hevdîtinên ku şêx Ûbeydûllah û Osmaniyan kirin, di rewşê de tû gûhertin çê nebû. Şêx Ûbeydûllah dîsa kete nava tevgerê û lez da amadekariyên serhildanê. Di Berfenbara sala 1879'an de, balyozê Rûs yên li Îranê Krebel, dinivîsand ku dê şêx Ûbeydûllah di niyeta" Li hemberî desthilatdariya Osmaniyan serhildanê bike; û dê here ser serê dewleta ku li Kurdistanê were avakirin û bajarê Mûsilê weke navend bihilbijêrin."

Şêx Ûbeydûllah; alîgirê pêşxistina pêwendiyên bi Rûsan re bû. Dixwest ku bi navbeyînkariya balyozê Rûs ê Wanê re pêwendiyan çê bike. Şêx Ûbeydûllah, plan dikir ku, "Kurdên di bin desthilatdariya Osmanî û Îranê de, di bin rêvebertiya wî de bibin yek; Ermenî, Asûrî û Ereb di heman demê de raperîn û alîkariya Rûsan serxwebûna Kurdistanê bidest bixe."
Lê balyozê Rûs, ku piştgiriyê bide şêx Ûbeydûllahê ku çend sal berê li hemberî wî şer kirî dê tû tişt bidest nexistina. Di dawiya şerê Osmanî-Rûsan de peymanek çêbû û têkiliyên her dû welatan ketibûn rêya ser rastiyê de. Di rewşeke wiha de, ji dêvla ku alîkariyê bide Kurdan , piştgiriya xiristiyanên hindik ji bo berjewendiyên xwe çêtir didîtin. Dewleta Osmanî di peymana Berlînê de, di mijara şert û mercên jiyana gelê Xirisatiyan (bi taybetî Ermenî) ku xweş bike de soz dabû û tehahût kiribû. Ji bo vê Rûsan alîkariya Xiristiyanên ku hejmara wan hindik bû bikirina dê tû îtîraz nebûna… ji ber kêmayiya vê dê peyman xera nebûna.

Di dawiyê de, bi taybetî, balyozê Rûs û zordariya wezareta karê derve ev hesabên ku li jor hatin bilêvkirin, bûne asteng û dewlata Rûs bilêv kir ku dê alîkariya şêx Ûbeydûllah neke. Hevdîtinên bi rêveberî Asûrî Marşîmûm, şerîfê Mekeyê, Erebên Bexdayê yên bi pêşengiya Ferhan paşa û Hidîvlîg(paşatî)a Misirê û bi Kurdên di nav axa Îran û Osmaniyan de bi erênî encam dan. Van hêzan gişan gotin ku dê piştgiriyê bidine şêx Ûbeydûllah. Dewleta Îngîlîstan û Osmanî geşbûnên li Kurdistanê ji nêz ve dişopandin. Têkîliyên Îngîlîzan yên bi Osmaniyan re piştî peymana Berlînê hê jî zêdetir bibûn. Polîtîkaya Îngîlîzan a bingehîn bandora têxim destên xwe û hikim li artêşa Osmanî û saziyên wê yên siyasî bikin yên ku herî baş ev polîtîka bilêv dikirin dîsa Îngîlîz bûn, peywirdarê Îngîlîz Batîatta dinivîsand… "mabesta hikumeta Îngîlîstanê ew e ku peywirdarên ku hatine şandin her tim li saziyên cûrbicûr de rêvebir bin, wiha polîtîkaya dewleta me ya li vir tam têxin bin ewlehiyê de ".

**WANE 28.**

**Pirsên Amadekariyê**

1- Di dema serhildana Şêx Ûbeydûlehê 2. Û 3. Siyaseta Îngilîsan çi bû?
2- Çima Osmaniyan nedixwestin bi şêx ûbeydûleh re şer bikin?
3- Sedema birina Şêx Ûbeydûlah ya Stebolê çi ye?

## SERHILDANA ŞÊX ÛBEYDÛLLAH -2

Jixwe, ji bo Îngîlîzan tenê bidestxistina saziyan ne bes bû. Dixwestin ku ji bo bi rihetî bigihên qadên mêtîngeriyê, projeya “xeteke tirênê“ ji Îskenderûnê heta Riha, Amed, Bexda û kendava Basrayê çêbikin. Ev proje gelek salan di rojevê de ma. Gelek rê ji bo “ xeta tirênê” hatin diyarkirin. Di hemû projeyan de rê di Kurdistanê de derbas dibû.

Ger ku dewleteke Kurdistana serbixwe bihatibûna damezirandin, dê Îngîlîz negihiştibûna vê armanca xwe. Ji bo bighên armanca xwe dewleta herî li gorî armanca wan dewleta di destan de ya amade dewleta Osmanî bû. Ji bo van sedeman Îngîlîz li hemberî hewildana şêx Ûbeydûllah ya avakirina dewletekê bûn. Bes, ku serhildan destpê bike hesabê Îngîlîzan li ser Serhildana ku derkeve holê hebûn ku li gorî berjewendiyên xwe bikar bînin. Ji bo vê armancê peywirdarên Îngîlîzî, yên ku hatine peywirdarkirin li Elbakê bi nûnerê şêx Ûbeydûllah re hevdîtin çêkirin. Cîgirê balyozê Îngîz ê li Wanê Caytûn, di sala 1879’an de li Çolemêrgê bi şêx Ûbeydûllah re hevdîtin pêk anîn. Her weke vê di pêvajoya pey re de jî gelek hevdîtin pêk hatin. Di heman pêvajoyan de hinek amûrên şer û çek jî dane Kurdan , girînge ku were fêmkirin bê ka çima Îngîlîzan çek dane Kurdan . Aliyan berdidin hev û bêhêz dikin, piştre jî weke ku wan biparêzin bi xwe ve girêdan, polîtîkaya Îngîlîzan a bingehîn e. Bi vê mebestê carinan piştgirî didane Îraniyan, carinan didane Osmaniyan, carinan didane Ermeniyan, carinan didane Kurdan û li hemberî dijminê wan nav li wan didan. Rewşa ku derdiket holê jî li gorî berjewendiyên xwe teşe didanê. Heman rewş dîsa lê bû. Îngîlîzan dê destûr nedabûna ku şêx Ûbeydûllah Kurdistanê damezirîne. Lê ku şêx Ûbeydûllah serhildan bikirina hem Îran hem jî Osmanî lawaz dibûn û herdû dewlet jî zêdetir bi Îngîlîzan ve dihatin girêdan. Sedema ku çek didane Kurdan jî ev bû.

Şêx Ûbeydûllah, dema ku di nava van mercan de, amadekariyên serhildanê didomandin, Osmaniyan yekîneyên artêşê yên li Wanê bi awayî ku Çolemêrgê dorpêç bikin, artêşa çaremîn ya di bin fermandariya Mûşîr Semîd paşa de, li Erzirûm, Erzîncan, Mûsil û Amedê bicih kirin. Dewleta Osmaniyan, ya ku tevdîrên leşkerî girtin di heman demê de bi Şêx Ûbeydûllah re dikete nava têkîliyan û hewil dida ku rewşê bixe bin kontrola xwe.

Ebdûlhemîdê 2. Deryaî begê kurê Bedirxan yê ku yaweriya padîşah dikir, weke balyoz şand cem Şêx Ûbeydûllah û ji şêx Ûbeydûllah xwest ku serîhilnede. Osmaniyan dixwest ku bi şêx Ûbeydûllah re şer nekin. Lewra, şerkirina bi Şêx Ûbeydûllahê ku di nava alema îslamê de xwedî cihekî giran bûhabû, zêde giran bû. Riskekî ji dil, hem ji aliyê olî, hem ji aliyê leşkerî hem jî ji aliyê aborî ve hebû.

Ji hevdîtinên ku Deryayî Beg pêk dianîn tû encam derneket. Deryayî Beg vegeriya Mûfîr Semîr Paşa agahî ji şêx Ûbyedûllah re şand û wî xwest ku hevdîtinan bi şêx Ûbeydûllah re

pêk bîne lê Şêx Ûbeydûllah ev qebûl nekir. Şêx Ûbeydûllahê ku amadekariya destpêkirina serhildanê dikir, ji bo ku hinek êlên ku berî hingê eşkere kiribûn ku dê alîkariyê bikin û alîkarî neşandin, dîroka serhildanê bi paş ve xist. Sedema ku êlan, nêzîkbûneke wiha nîşan da, Îngîlîz bûn. Hinek êl qanih kiribûn pere û erd teklîfî hin êlan kiribûn û nehiştibûn ku alîkariya şêx Ûbeydûllah bikin. Bi heman awayî, yekîtiya di navbera Kurdan û Asûrî, Ermenî û Ereban de hewildanên xerakirinê dikirin. Balyoz Serda Troter, bi şexsê xwe, di van xebatan de cih digirt. Yekîtiya Kurdan ya di navbera wan de û alîkariya wan, ya bi gelê din re tiştekî wisa bû ku îngîlîzan qet nedixwest. Lewra, kar asê digirtin, wisa ku balyozê Îngîlîstanê yê li Erzirûmê diyar kir ku Mûşîr Semîh Paşa ne di ferqa serhildanê de ye. Sîxûrên Îngîlîz, di derbarê pêşketinan de raporên xwe yên dawî agahiyên xwe didane Osmaniyan û hewil didan ku tevdîran bistînin. Heger ku tevdîr neyên standin, dibû ku serhildan bikeve, rewşeke wisa de ku Îngîlîzan nedixwest. Ji bo kontrol neyê wendakirin, dixwestin ku bi rastî jî Osmanî tevdîran bigrin.

Hinek ji êlên Kurdan , ji sozên ku berê dane vegeriyan û biryara alîkarî nekirina Şêx Ûbeydûllah dan, hate fêm kirin ku vê yekîtiya di navbera Kurdan de xiste dijwariyê. Ev pêşketin, ji aliyê Îngîlîzan ve serkeftinek bû. Îngîlîzan, ji bo vê hewildana xwe ya dildarî nîqaş bikin mijar anîne rojeva parlemenê.

Mijara yekîtiya di navbera Kurdan de, ji bo Osmaniyan jî her tim mijareke ku were şopandin bû. Ji aliyê din ve şopandina têkiliyên di navbera Kurdan û Ermeniyan de hîn bêtir girîng bû. Lewra, heke herdû gel bûbane yek, têkbirina wan ne pêkan bû. Ji bo vê polîtîkaya Osmaniyan ya bingehîn ew bû ku hem yekîtiya di navbera êlan de, hem jî yekîtiya Kurdan bi civatên ne misilman re (Ermenî, Asûr, Ezdayî û hwd.) bi her awayî asteng bikin bû. Dewleta Osmanî, ku xetereya hewildanên Şêx Ûbeydûllahî dît, di cîh de kete nava tevgerê. Di dawiyê de, hewildanên Îngîlîz û Osmaniyan encam da û hem yekîtiya di navbera êlan de hem jî yekîtiya di navbera gelan de hate astenkirin.

Marşîmûn ku rêberê Asûrî-Nastûriyan bû, rêberê cemaeta Ermenî ya li Başqaleyê Ognes Vartopet xwe ji şêx Ûbeydûllah dûr kirin û pêşniyarên hevdîtinan ku çend caran hatibûn dûbarekirin red kiribûn. Yên kiribûn ku ev pêşketin çê bibin Îngîlîz bûn. Gotibûn ku dê dewletên Rojava alîkariya wan bikin û xwestibûn ku ew alîkariya serhildana Kurdan nekin. Wan jî daxwaza Îngîlîzan kir û hewildanên balyozê Îngîlîz Troter bê bersiv nehiştin. Di Tîrmeha 1880'î de, Şêx Ûbeydûllah û 220 serokêlên Kurd, yên ku berî hingê ji bo piştgiriya wan, Şêx Ûbeydûllah ji wan re name şandî, li Şemzînanê civiyan. Armanca civîna, "yekîtî" û "amadekariyên serhilanê" bûn. Hinek serokêlên ku tevlî civînê bûbûn, meyla tevlînebûna serhildanê nîşan dan.

Hinekan got ku, xala 61. ya ku di peymana Berlînê de ji bo sererastkirina şert û mercên Ermeniyan û êrîşên li hemberî Ermeniyan di rastiya xwe de li hemberî gelê Kurd e û bi vî awayî dê Ermenî Kurdan têxin bin desthilatdariya xwe, lewra jî xwestin ku hêza ku were çêkirin li hemberî Ermeniyan be. (Ev raman ji bo propagandaya Osmaniyan zêde bûn: Propaganda dihate kirin ku, dewletên mezin dê Ermeniyan biparêzin û piştgirî bikin, dê Ermenî jî ji Osmaniyan veqetin û dê Kurdên ku li ser heman erdê dijîn têxin bin bandora xwe .) Hinek serokêlan jî eşkere kirin ku dê bi şêx Ûbeydûllah re tevbigerin û piştgiriyê bidine serhildanê. Şêx Ûbeydûllahê ku fikirî dê di navbera Kurdan de yekîtî pêk neyê û dê ev jî bandorê li ser serkeftina serhildanê bike plana serhildanê, ya ku berê kiribû gûherand û fikirî ku serhildana li hemberî Îranê dê rastir bibe û biryara serhildana li hemberî Îranê da."

Divê ku derfeta di dest de bizanebûn were bikaranîn; niha Faris li hemberî Tirkan şer dikin û hemû hêzên xwe li hemberî vî şerî bikar anîne. Ji bo vê şerkirina li hemberî Îranê li gorî berjewendiyên me ne. Niha Îran bihêze û heger ku em vî parçayê Kurdistanê û birayên xwe bigihînin azadiyê dê welatekî tije xêr û bereket bikeve destê me. Dê li hemberî Osmaniyan jî ji me re bibe piştgirî" digot.

Heger ku şêx Ûbeydûllah li hemberî Îranê serkeftî be, hesab dikir ku êlên ku îro piştgirî nedidanê jî dê piştgiriyê bidinê. Ji bilî vê hinek sedemên din yên destpêkirina serhildanê ya ji bo Îranê hebûn: Îran, ji aliyê siyasî û aborî ve ji dewleta Osmaniyan ne cûdatir bû. Tam bêhizûriyek hakim bû. Tirkmenan serî hildabû û heta tû bêjî bes, Îran di nava dijwariyê de bû. Têkîliyên di navbera dewleta Osmanî û Îranê de sar bûn. Di sînorê Îranê yê Afganîstanê de bêhizûrî hebû û di navbera Kurdên Sûnî yên li Îranê û Şîiyên Îranî de bi sedsalan bû nakokiyên wan hebûn. Dîsa feracûlaxan, yê ji Kurdên Îranê ji aliyê Îraniyan ve hatibû kuştin. Cezayê kêfî dabûne Ebdûllahxanê Şîno û Îbrahîm Xan.
Bûyerên ku jinên Kurdan dihatin revandin zêde dihate jiyankirin û dewleta Îranê ji xizmên şêx Ûbeydûllah pêncî kes ji bo ku îbret bin kuştibûn.
Şêx Ûbeydûllahê ku ev sedem tev anîne ba hev, biryar da ku ji Îranê dest pê bike. Di tebaxa 1880'î de, ji bo pirsgirêka bacê êla Mangûr serî hilda. Şêx Ûbeydûllah kurê xwe Evdilqadir tevî yekîneyeke ji hezar kesî şande alîkariyê. Êla Berzanî ya ku girêdayîneke wan a mezin bi Ûbeydûllah re hebû, hate alîkariyê. Di nava demeke kin de herêma Mergeber, Şîno û Mangûrlahîcan ketin dest û êlên mezin yên weke êla Pîran dest bi tevlîbûna nav artêşa şêx Ûbeydûllahî kirin. Tenê êla Pîran bi dû hezar peyade û hezar şervanên siwarî tevlî artêşê bûn û êlên weke Mangûrî, Mameşî, Zaro, Mûkrî, Debokrî, Gewrîkî, Şikakî, Caf û Zûdî artêşên ji deh hezaran kes pêk hatî çêkirin û cihê xwe li cem Şêx Ûbeydûllahî çêkirin.

Tevgera bi lezgînî bipêş diket. Di cih de dest pê kir û bandora xwe nîşan dan. Herêmên Serdeşt û Savcbûlak ketine dest. Di 23'ê îlonê de herêma Şûşevan, 27ê Îlonê jî herêma Açtarûk ketin dest. Pişt re Tebrîz hate girtin. Bes, ji vir û pê de zincîra xeletiyan dest pê kir. Kurdên ku difikirîn ku Tebrîz ketiye ji dêvla ku bajêr têxin dest û hakîmiyetê bînin cîh êrîşî gundan kirin û dest bi talakirinê kirin û bi xenîmetan re vegeriyan malên xwe. Şervanên Kurd yekîneyên Îranê yên ku hatibûn pêşewa têk biribûn, lê li hemberî bê serîtiyê têk çûbûn.

Şahê Îranê ji bo ku nedizanî bê ka planên Kurdan çine hejmara leşkerê wan çiqas e, heta bê gotin tirsiya bû. Di wê pêvajoyê de, serî li Rûsyaya ku heta were gotin bi wan re têkîliyeke baş saz kiribûn da û daxwaza alîkariyê kir. Di heman demê de serî li Îngîlîzan jî da. Rûsan, dest bi zordariya li ser dewleta Osmanî kirin ku tevger were çewisandin. Lewra, navenda tevgerê Colemêrg bû û di navbera sînorê Osmanî de bû. Ji bo ku Rûs, di wê pêvajoyê de bi Tirkmenên ku li Qafqasyayê serî hildan re mijûl bû, ji bo destwerdankirinê nedikarî leşkerên xwe bişînin. Derketina Îranê ya ji bin bandora Rûsyayê wendayiya çavkaniyeke herî mezin bû. Ji bo vê Rûsya, dewleta Osmanî heta karîbû da zorê û hewil da ku xeterî ne tenê ji bo Îranê ji bo dewleta Osmanî jî heye.

Bi hinekî din pêşketina pêvajoyê re Osmaniyan dest bi zêdekirina tevdîran kirin. Qanih bûbûn ku Rûsya di nêrînên xwe de mafdar e. Lewra Şêx Ûbeydûllah di nameyên ku ji mîsyonerên Emerîkan, wezareta derve ya Îngîlîstan û waliyê Ûrmiyeyê re nivîsandin de diyar kiribû ku, dê Kurd ji Osmanî û Îranê veqetin û dewleteke Kurdistanê ya serbixwe ava bikin û di vê mijarê de xwedî biryara teqez in. Osmaniyan ku ji aliyekî ve amdekariyên leşkerî dikirin, ji aliyekî ve jî hinek begên Kurd yên ku berî hingî li Stenbolê dest danîn ser

wan yên weke Hisên Paşa û Dîlaweroglû şandin cem Şêx Ûbeydûllah û hewil dida ku hêzên Kurd ji Îranê vekişin lê ev hewildanên Osmanî bê encam man.

Ji aliyê din ve dewleta Îranê jî dest bi amadekiriyan kiribû. Artêşa Îranê ya giştî di bin fermandariya Îtîmat ÛS Siltan de ji bo parastina Tebrîzê li hemberî Kurdan hatibûn şandin. Artêşa I. Ya ku efserê Ewûstûryayî perwerde dikir ya di bin fermandariya Hamza, Mîrza û Heşmet de ji Tahranê hatibû. Dîsa, ji Hemedan û Kazwîn hêzên lêzêdekirinê hatibûn çandin. Bes, Şah bixwe jî dizanibû ku ev amadekarî tev dê têra çewisandina serhildanê nekin. Ji bo vê jî kişandina hinek Kurdan a cem xwe ji bo stratejiya Şah pir girîng bû. Bi hinek serokêlên Kurdan re hevdîtin çêkirin û dest bi lêgera Kurdên xayîn kir. Gelek Kurdan ev pêşniyar qebûl nekirin. Lê Tîmûrxanê ku serokêla Celaliyan ya ku li derdora Mako bicih bûyî, ev pêşniyar qebûl kir û rêça xayîntiyê ya lanetî ya di dîrokê de dûbare kir. Tîmûrxanê ku li herêmê heta were gotin bi bandor bû, bi artêşa xwe ve tevlî artêşa Şah bû. Ji bilî van êlan yên weke Qeredaxî û Şahsebêna, êlên Azerî jî li hemberî Kurdan cihê xwe li cem Şah girtin. Bi vî rengî amadekariyên artêşa Îranê jî temam bûn.

## SERHILDANA ŞÊX ÛBEYDÛLLAH-3.

Kurd, hem di nav sînorên Îranê, him jî di nava sînorên Osmanî de dijiyan û ji destpêkê heta hingê hebûna sînoran ji bo wan tû wate îfade nedikir. Êlên Koçer dikaribûn havînê li aliyekî, zivistanê li aliyekî bimînin. Êlan carinan bi tevahî aliyek ber didan û derbasî aliyê din dibûn. Ji bilî têkîliyên civakî û aborî ji bo têkîliyên siyasî û olî jî heman rewş lê bû. Digel ku Şêx Ûbeydûllah bixwe jî li Çolemêrgê rûdinişt, ji Kurdên Îranê bace distand û rêberê wan yê olî bû. Digel ku sînorên dewleta Îranê û Osmaniyan cûda bûn jî ji bo Kurdan "sînorên welatan" ne pirsgirêk bûn. Wan Xizmên xwe, malbatên nêzîk an cîran û êline li gora sînoran diyar dikir.

Îngîlîz û Rûs'an bi salan bû ku li Kurdistanê lêkolîn dikirin û ev rewşa Kurdan baş dizanibûn. Ji bo vê zor dane dewleta Osmanî ku sînorên li aliyê xwe bixe bin serweriyê. Îranê jî dê li aliyê din sînor têxistina bin serweriya xwe. Bi vî rengî Şêx Ûbeydûllahê ku li wir cih lê hatî tengkirin û Kurd dê mehkumî têkçûnê bûna. Plana Îngîlîz û Rûs'an ev bû. Osmaniyan di sînorê di navbera xwe û Îranê de herêmeke tampon çêkirin, 9 tabûr di van deran de bicîh kirin. Derveyî van li Wan û Erzirûmê hêzeke leşkerî ya mezin ji bo destwerdankirina her rewşa ku derkeve amade kirin.

Artêşa Îranê jî di aliyê xwe de hin pêngav avêtin. Di dawiyê de berê xwe dan bajar û herêmên serhildêran û ew bidest xistin. Pêşî berê xwe ji Ezerbeycanê dane Saûcbûlakê, piştre êrîşî Ûrmiyeyê kirin û hêdî hêdî zor dane ser Şêx Ûbeydûllah. Artêşa Şêx Ûbeydûllah ne dikaribû li hemberî êrîşan derkeve û neçar ma ku, bi şûn de vekişe. Lê piştî wan jî ji aliyê Osmaniyan ve hatibû dorpêçkirin. Di vê rewşê de ji Kurdan re ji bilî vekişîna Çolemêrgê pê ve çare nedima.

Ji cihê ku Şêx Ûbeydûllah vedikişiya, artêşa Îranê di heman demê de dadigirt. Kurê Şêx Ûbeydûllah Şêx Evdilqadir û Hemza Beg bi şerrvanên di bin fermadariya xwe de neçar man ku hêdî hêdî vekişin. Ev rewş dihate wateya ku Şêx Ûbeydûllah têk çûye. Gelek êlên ku berî hingê bi Şêx Ûbeydûllah re tevdigeriyan ku dîtin Şêx Ûbeydûllah têk diçe berê xwe gûherandin û dest bi şerê li hemberî Şêx Ûbeydûllah kirin. Serhildana ku Şêx Ûbeydûllah li hemberî Îranê pêk anî, bi van pêşketinan re, bi têkçûyînê bidawî dibe.

Piştî ku serhildan têk çû, dewleta Îranê li hemberî Kurdan dest bi qirkirinên zêde zêde hovane kir. Bêyî ku bêje zarok, jin, pîr û kal bi hezaran Kurd kuştin. Malê wan talan kirin. Qirkirina Îranê gihîşte rewşeke wisa ku Rûsya destwerdanî Îrana ku mûtefîkê wê bû kir.

Balyozê Rûs yê li Îranê Zeynoff digot ku” Rûsya, dê ji serhildaneke ku ji nû ve li Kurdistanê derkeve zirarê bibîne. Ji bo vê yekê divê Îran dev ji helwesta xwe ya hovane ya li hemberî Kurdan  berde û biterikîne.” Digot ku, hovîtiya Îranê di asteke wisa de ye ku dê rê li ber serhildanên nû veke. Bi heman rengî, rojnameya Vakît  (Osmanî) di dîroka 03/11/1881’ê  de digot ku “Sîpahsalar ferman daye leşkerên xwe ku dilê wan bi Kurdan neşewite gundên wan bişewitînin dexlê wan tûne bikin û gelê wan bê nan bihêlin...”
Gelek Kurdên ku li herêma wan diman ji bilî Kurdên serhildêr jî li hemberî zilma Îranê hatin û cihê xwe terikandin û reviyan. Piştî têkçûyîna serhildanê Şêx Ûbeydûllahê ku hatî Şemzînanê, gelek Kurdên Îranê jî bi xwe re anîn. Li gorî hejmarên Osmaniyan, 60-70 hezar gelê Kurd derbasî sînorên Osmaniyan bûye û li niştecihên dora Şemzînanê hatine belavkirin. Dewleta Îranê, xwest ku Şêx Ûbeydûllah were girtin an jî radestî wê were kirin. Ji ber ku tirsa wê hebû ku şêx Ûbeydûllah ji nû ve serî hilde an jî piştgiriyê bide serhildaneke ku derkeve. Bes, Osmaniyan ev pêşniyara Îranê qebûl nekir. Polîtîkaya Osmaniyan ne afirandina dijminan ya di nava welat de bû. Jixwe, di rewşeke lawaz de bûn. Di vê rewşê de tevlîheviyeke navxweyî an jî çêkirina pevçûna ji bo wan ne karê aqilan bû.
Îran, helwesta Osmaniyan protesto kir. Osmaniyan jî bi heman rengî bersiv da. Nîşeyên protestoyan ku di navbera herdû dewletan de diçûn û dihatin, Şêx Ûbeydûllah ji bo ji nûve serî hilde dest bi amadekariyan kir. Nûnerên xwe şandin Mûşê, Erzirûmê, Bedlîsê, Qersê û Xinisê da ku Kurd li hev bicivin, xwe bi çek bikin û serî hildin. Pêşniyarên xwe şandin. Ji serokêlên Kurdan  re name nivîsandin û xwest ku alîkariya wî bikin. Ji bilî van ji bo Asûrî û Ermeniyan vekişîne ba xwe û têkiliyeke germ bi wan re çêke kete nava hewildanan de.
Îngîlîstan û Rûsyaya ku amadekariyên Şêx Ûbeydûllah ji nêz ve dişopandin dîsa ketin dewrê û xwestin ku Osmanî ji Şêx Ûbeydûllah re bibin asteng. Osmaniyan tevdîrên xwe yên ku bi gelekî berî hingî standin xistin nava tevgerê û Çolemêrg dorpêç kirin û ketin pozîsyona êrîşê. Şêx Ûbeydûllahê ku fikirî ku dê li hemberî êrîşeke Osmaniyan zêde wendahiyan bide ev risk neda ber çavan û daxwaza Siltanê Osmanî ya ku serî hilnede û were Stenbolê pejirand.
Şêx Ûbeydûllah ku li Kurdistana Osmaniyan amadekariyeke bi vî rengî dikir, amadekariyeke ku dirûvê wê bi ser yê wê de diçû li Kurdistana Îranê jî hebû. Piştî ku serhildan bi awayekî serneketî bi encam bû, hêzên Kurd yên çekberdayî, di bin fermandariya Hemza Begê kurê Şêx de lihev civiyan. Li herêma Serdeştê biryargeh damezirandin. Li vê derê artêşa Îranê ya ku bi ser wan de hatî xistin nava têkçûyîneke mezin de û bi paş ve vekişiya. Bi vî awayî di nava Îranê de ji nû ve tevgera zîndîbûyînekê dest pê kir. Lê dewleta Îranê bi salan bû ku ji serî heta binî bibû dewleteke siyasî. Xetereya ku dê Kurd biafirînin hesab kirin û lêxistina noqteya qels çêtir dît: Agahî ji Hemza Beg re şand û got ku Şêx Ûbeydûllah bi Îranê re lihev hatiye û divê ku ew jî were destnîşana xwe biavêje. Yên ku ji bo çûyîna cem Hemza Beg hatin şandin, soza ku jiyana Hemza Beg di bin ewlehiyê de ye, soza şerefê ya rêveberiya Îranê dan. Hemza Begê ku bi vê agahiyê ewle bû çû cihê ku jê re hatiye gotin. Lê ew xistine kemînê û hate kuştin. Bi vî rengî kesê ku rêveberekî serhildanê yê herî girîng bû hate kuştin û amadekariyên serhildanê li Îranê jî derbeyeke mezin xwar.

## Şêx Ûbeydûllah Gihîşt Stenbolê

Di dawiya 1882’an de, Şêx Ûbeydûllah gihîşt Stenbolê. Bi merasîma fermî hate pêşwazîkirin û li qesrê bû “mêvan”. Şêx Ûbeydûllahê ku dizanibû li qesrê ne bi mêvanî bi dilitî dimîne di tîrmeha 1883’an de xwe xiste rengê bazirganekî, reviya û hate Kurdistanê. Bilez û bez kete nav hinek hewildanên dîplomatîk de. Ji Rûsan re teklîfa ku “Kurdistan bi Rûsya ve bê girêdan û hemû Kurd bibin hemwelatiyên Rûsyayê” bir. Ji bo ku vê bikin “ ne li hêviya piştgiriyekê ne, ew bi hêza xwe dikarin vê bikin amanca wan rizgariya ji zilma Îran

û Osmaniyan e û ” xwest ku “Rûs ji wan re nebin asteng. Lê Rûsan, ev raman û pêşniyara Şêx Ûbeydûllah ne pejirand.
Pêdiviya Şêx Ûbeydûllah bi hinek demê hebû lê dem tûne bû. Hem Osmanî hem jî Îran ji bo reva Ûbeydûllah ketibûn nava tirsê û di cih de ketibûn nava tevgerê. Osmaniyan Çolemêrg dorpêç kirin û xwestin ku Ûbeydûllah radestî wan bibe. Ûbeydûllah ev qebûl nekir û dest bi parastina keliha Oremarê kir. Ji bo ku dizanibû ku dê zêde li ber xwe nede, eşkere kir ku dikare li Misûlê bijî. Bi vî rengî Osmaniyan plana Ûbeydûllahê ku hinek dem bidest xist û çûyîna xwe bipaş ve xist dît û dest bi êrîşê kirin. Kurdan nedikarî kelhê biparêzin û kelhe ket. Şêx Ûbeydûllah hate girtin û birine Mûsilê. Kurê wî Evdilqadir ji bo ku bavê xwe rizgar bike kete nava hewildanan. Bavê xwe rizgar kir, lê di rê de li hemberî êrîşa Osmaniyan hat û Ûbeydûllah dîsa hate girtin. Bi fermana Evdilhemîdê 2. bi yekîneyeke Osmanî û Îngîlîzan re mişextî Mekkeyê hate kirin û heta ku mir li wê derê ma…
Êl û serokêlên ku li pey mayîn neketin nava tevgerê û serhildan bidawî bû (1883).
Serhildana Şêx Ûbeydûllah, li gora Serhildanên ku heta 1880’î pêk hatin, serhildaneke ku taybetmendiyên wê yên netewî herî zêde bûn. Armanceke wê ya diyar û ji bo bigihê vê armancê stratejiyeke wî ya hatî diyarkirin hebû û di vê navrastê de, hewil dabûn ku hevalbêndiyên xwe çêbikin. Bi saya xwestina lidarxistina têkiliyên bi Ereb, Ermenî, Asûrî û Nasûriyan re dê polîtîkayên ji hev qût bike û birêve bibe vala derkeve, hem jî hedefa esas ya were girtin dewleta Osmanî û Îran bûn û li hemberî van hevkariya gelan esas hatiye girtin. Lê ji bo serkeftinê ev tev ne bes bûn. Lewra, sedemên ku serhildan bidawî dikirin girantir dihat. Bi kurtasî em dikarin van sedeman bi vî rengî rêz bikin.
Dîtina Îngîlîstan û Rûsya ya ku Kurdistaneke serbixwe li hemberî berjewendiyên wan e û bi vê wateyê bi taybetî jî dijberiya Îngîlîzan, ya li hemberî Kurdan a leşkerî, siyasî û stratejîk.
Dewleta Osmanî û Îranî digel ku bi salan bû di qirika hev de bûn dema mijar dibûn Kurd, dihatin ba hev û bi hev re hevkarî dikirin.
Xwestina piştgiriya Ermenî, Asûrî-Nastûrî û Ereban ya kêm.
Yekbûyîna di navbera Kurdan de ya ku têrê nedikir; hê di serê serhildanê de ku gelek êlan xayîntî dikir. Hin êl jî di dema serkeftinê de digel ku li ba hev bûn jî, dema têkçûyîn xûya dikir, xayîntî dikirin heta derbasî aliyê din dibûn. Bi awayekî giran ên ku tevlî serhildanê dibûn mantiqê êlê bi wan re bû û ji bo vê jî rih û giyaneke hevpar çê nedibû. Îlankirina stratejiyên Şêx Ûbeydûllah ya destpêkê û ku vê jî dikir ku dijminên wan li gora wê amadekariyan bikin. Nebûna bîrdoziyeke xûrt û nexşerêya têkoşîna azadiyê bû.
Şêx Ûbeydûllah piştî mişextî Mekkeyê bû, Osmaniyan ji bo polîtîkayên wan bimeşîne Ethem Paşa bi taybetî peywirdar kir. Ethem Paşayê ku di 1884’an de dest bi peywira walîtiya Çolemêrgê kir, nakokiyên di navbera êlan de çareser dikirin û hewil dida ku Kurdan bi rêveberiya Osmaniyan ve girê bide. Di heman pêvajoyê de konsolosê li Erzirûmê peywirdar Dînîst, polîtîkaya Osmaniyan a nû wiha rapor dikir.“ Desthilatdariya Osmanî ferman daye rêvebirên xwe yên herêmî ku têkîliyên ji dil bi serokêlên Kurdan re çêbikin û bi gotinên xweş û helwestên baş wan bi xwe ve girê bidin. Bi vê armancê li Kurdistanê desthilatdarî bi taybetî vekirina medreseyên Olî plan kiriye, sedema van helwestan jî rênedana tevgereke azadiyê ya nû ye.

# UNÎTE 4.


**WANE 29.**
PIŞTÎ SERHILDANA ŞÊX ÛBEYDÛLLAH HEWLDANÊN KURDAN
**WANE 30.**
POLÎTÎKAYÊN OSMANIYAN ÊN ERMENIYAN Û XIRABÛNA TÊKILIYÊN ERMENÎ Û KURDAN
**WANE 31.**
DI DESTPÊKA 19OO'Î DE KURD
**WANE 32.**
DI SEDSALA 20. DE REWŞA KURDISTANÊ Û SERHILDANÊN GELÊ KURD YÊN LI DIJÎ DAGIRKERAN
**WANE 33.**
SERHILDANA DÊRSIMÊ (1907-1908-1909)
ÎTTÎHAT TERAKKÎ Û PÊVAJOYA MEŞRÛTIYETÊ YA 2.
**WANE 34.**
SERHILDANA HEMAWENDÊ (1908
SERHILDANA ÎBRAHÎM PAŞAYÊ MILANÎ (1908-1909)
SERHILDANA MILAN 1908'AN DESTPÊDIKE
**WANE 35.**
SERDEMA ÎTÎHAT TERAKÎ Û SERHILDAN
SERHILDANA ŞÊX ABDÛSELAM BARZANÎ YA 2. (1913)
SERHILDANA BEDLÎSÊ (XÎZAN) (1913_1914)
**WANE 36.**
A- DI ŞERÊ CÎHANÊ YÊ YEKEMÎN DE KURD
B- Piştî Şerê Cîhanê Yê Yekemîn Rewşa Kurdistanê
PEYMANA SYKES- PICOT
SERHILDANA ŞÊX MEHMÛDÊ BERZENCÎ
Hewildana Şêx Mehmûdê Berzencî Ya Dûwemîn
**WANE 37.**
2- SERHILDANA ÎSMAÎL AXA (SIMKOYÊ ŞIKAKÎ)
**WANE 38.**
3- SERHILDANA KOÇGIRÎ
**WANE 39.**
PEYMANA SEWRÊ (10'Ê TEBAXA 1920)
PEYMANA QAHÎRE
PEYMANA LOZAN (24'Ê TÎRMEHA 1923)
**WANE 40.**
4- SERHILDANA ŞÊX SEÎD
**WANE 41.**
5- Serhildana Agirî
A- DAMEZRANDINA XOYBÛN Û SERHILDANA AGIRÎ YA 1927'AN

WANE 29.

**Pirsên Amadekariyê**

1- Piştî serîhildana Şêx Ûbeydûlah bibinket Dewleta Îranê siyaseteke çawa li ser kurdan meşand?
2- Evdilhemîdê 11. Ji bo dewleta xwe ya Osmanî li ser lingan bigire kurd bi çi rêbazan bikar dianîn?
3- Osmaniyan çawa hewldana Bedirxaniyan dîsa têkbir û di vê de têkiliyên malbata Bedirxaniyan bi dewletê re risteke çawa dilîst?

## PIŞTÎ SERHILDANA ŞÊX ÛBEYDÛLLAH HEWLDANÊN KURDAN

### *SERHILDANA ÊLA GEVERÎKÎ Û DEŞTIYAN-1887*

Dewleta Îraniyan helwesta xwe ya dijminî ya li hemberî Kurdan piştî serhildana Şêx Ûbeydûllah jî domand. Îranê di xwest ku piştî serhildana Şêx Ûbeydûllah civaka Kurd di bin serweriya xwe de bigre ku Kurd ji bo serhildanaeke nû derfetan neafirînin. Ev polîtîka di asta jêrîn de li ser Kurdan di ziviriya zilmeke mezin. Di 1887'an de êla Deştiyan ku li derdora Ûrmiyê dima li hemberî vê polîtîkaya zilimkar serî hilda. Lê mixabin di destpêka serhildanê de serokê êla Deştiyan û di heman demê de rêberê serhildanê Hisên Beg ji hêla dewleta Îranî ve dîl hatin girtin û avêtin zîndanê. Di demeke kin de Hisên Beg di zindanê de hate kuştin. Piştî ku agahiya kuştina Hisên Beg li Êla Deştiyan belav bû êlê serî hilda. Kuştina Hisên beg bû sedema nerazîbûna êlên derdor jî. Li ser vê nerazîbûnê êlên derdor jî piştgirî dan Deştiyan. Bi vê piştgiriyê hêzek xûrt derket holê. Ev hêza ku derket holê gelek derbeyên mezin li hêza Îraniyan xistin. Piştî ku Êla Gewrîkiyan ku li derdora Mahabad dijiyan tevlî serhildanê bû serhildan gihişt qonaxeke girîng.

Di vê pêvajoyê de dewleta Îraniyan ji dewleta Osmaniyan xirabtir, lewaztir û di rewşeke nebaştir de bû. Îraniyan dit ku serhildan li herêmê fireh dibe dest bi amadekariyên leşkerî kir. Hêzeke xwe ya mezin herikand herêma Serdeştê û li wir bi cih kir. Lê hêza Îraniyan li hember Kurdan nekaribû li berxwe bida. Her roj derbeyên mezin ji Kurdan dixwarin. Serkeftin û destkeftiyên serhildanê bala êlên din jî dikişand û dibû sedema piştgiriyên nû. Her ku diçû eniya Kurdan firehtir dibû.

Şahê Îranê xetereya pêvajoyê baş fêmkiribû. Xwest bi Kurdan re têkilî deyne û hevdîtinan pêk bîne. Ji bo vê têkilî danînê jî waliyê Savûcbûlakê Seyfedîn Xan peywirdar kir. Di hevdîtinê de Kurdan nerazîbûna xwe ya li hemberî zilm û niheqiya rayedarên herêma Serdeşt û Ûrmiyê anîn ziman. Şahê Îranê xwesteka Kurdan erênî bersivand. Rêveberê vê herêmê tev ji peywir girt û li şûna wan serok û rêveberê Kurdan peywirdar kirin. Serhildana ku li hemberî bêedalietî û zilimkariya rêveberiyên herêmê dest pêkiribû herêmî ma. Lê bi encameke ku Kurdan dixwest bi dawî bû. Li gor armanca destpêkirinê mirov dikare bibêje bi serkeftinê bi dawî dibe.

### *JI BEDIRXANIYAN HEWLDANEK NÛ- 1889*

Dewleta Osmaniyan kurên Bedirxan Beg Emîn Elî Beg û Mithat Beg li Kurdistanê her tim di bin venêrînê de digirt. Ev venêrîn ne tenê ji bo Bedirxaniyan, ji bo tevahiya serok û rêberên Kurdan yên ku bîna Kurdewariyê jê dihat derbasdar bû. Ji van yek jî Bedirxanî bûn. Emîn Elî Beg û Mithat Beg ji bo serhildaneke nû di nav hewldanan de bûn. Amadekariyên xwe bi dizî dikirin. Bi êlan re hevdîtin pêk dianîn. Ji bo tedarikirina çekan û hwd. amadekarî

dikirin. Dewleta Osmaniyan ji malbata Bedirxaniyan hinek li Stenbolê bi cih kiribû û li vir dibin venêrina xwe de digirt.
Emîn Elî Beg û Mithat Beg bi hênceta ku dê herin Stenbolê cem malbata xwe yên din bi rê ketin. Wê demê çûna Stenbolê li ser pişta hespan di ser Trabzonê re heta deryaya reş ji wêrê jî bi keştiyan diçûn Stenbolê. Plansaziya Bedirxaniyan ew bû ku bê şik heta Trabzonê herin û ji wêrê agahî rêkin ji êlan re, êl bi hêzên xwe yên çekdar herin Trabzonê û ji Trabzonê dest bi serhildanê bikin. Ji bakurê Kurdistanê dest bi paqijkirina hêza Osmaniyan bikin û jor de werin. Tevahiya Kurdistanê ji hêza Osmaniyan xelas bikin û Kurdistanê azad bikin.
Bedirxanî gihiştin Trabzonê û agahî rêkirin ji êlan re ku şervanan ji wan re rê bikin. Amadekarî destpêdike. Êlên ku dê tevlî serhildanê bibana li hev kombûn. Êlan ji bo rêkirinê şervanê xwe diyar kirin. Êlên ne dixwestin tevlî serhildanê bibin jî hebûn. Wan xwe ji amadekariyan dûr digirt.
Ev tevger, liv û lebata Kurdan , bala dewleta Osmaniyan kişand û Osmanî ji vê plansaziyê agahdar bûn. Bi lezgînî êrîş birin ser hêzên kombûbûn û nehiştin hêzên çekdar û Bedirxanî bigihîjin hev. Li hemberî vê êrîşê herçiqas şervanên Kurdan li berxwe dan jî xwe ji têkçûyînê xelas nekirin û têkçûn. Emîn Elî Beg û Mithat Beg neçar man xwe bispêrin çiyayên Erxenî yên navçeya Amedê. Xwestek û hêviya Bedirxaniyan gelekî mezin û xûrt bû. Lê mixabin plansaziya wan gelekî qels û ji rêzê bû. Lewre ev hewldana Bedirxaniyan a dawî jî bê encam bi dawî bû.

## *PIŞTÎ 1880'Î PÊVAJOYEKE NÛ DEST PÊ DIKE*

Pêşveçûnên siyasî yên piştî 1880’î pêvajoyeke nû didin destpêkirin. Piştî 1880’î him li tevahiya cîhanê, him di binesaziya Dewleta Osmaniyan û polîtîkayên wan, him jî di rewşa giştî ya Kurdistanê de gûherînên girîng çêbûn. Dê van gûherînan li ber encamên girîng jî rê vebikirana. Gûherîna aborî li ser têkiliyên navneteweyî heta sedsala 19'an gelek diyarker bû. Ji ber neteweya ku şoreşa pîşesaziyê cara yekemîn pêk anî, îngilîzên ku bi vê yekê gelek derfet bi dest xistin, xwe spartin vê rewşa bi derfet û bazirganiya cîhanê kirin bin venêrîna xwe. Lê şoreşa pîşesaziyê tenê bi Îngilîstanê bi sînor nema. Pêşî li Ewrûpa pişt re jî li erdnîgariyên cûda yên cîhanê gelek netewe tevlî vî karwanî bûn. Li Ewrûpayê neteweyên weke Belçîka û Fransayê Îngilîstanê şopand. Pişt re jî Almanya û Îtalya şoreşa pîşesaziyê pêk anî, bi lez û bez dest bi ketina bazarên cîhanê kirin.
Îngilîstanê sedsala 18. di bin serweriya bûrjûvaziyê de weke sedsaleke ferah û îstîkrarê derbas kir. Vê ferahî û îstîkrarê xwe dispart pêşveçûnên aborî û serwetê. Çavkaniya herî girîng a serweta ku li Îngilîstanê berhev dibû, nêrîna cîhanê ya ku weke “ Sêgoşeya Zêr” dihat zanîn bû: Keştî diçûn Efrîkayê û ji mamûlên ku dikişandin hatineke mezin bi dest dixistin û bi koleyan digûherandin. Van koleyan li Emerîka û Ewrûpayê bi bidestxistina hatineke girîng dihatin firotin. Bi bidestxistina vî karî ji neteweyên paşdemayî ham made dihat kirîn û ev ham made cardin bi bidestxistina karekî mezin li Ewrûpayê dihat firotin. Vê vegera karê ya ku hat afirandin, di têketina sedsala 19. de bi kêr hat ku îngilîz bazirganiya cîhanê bikin bin venêrîna xwe. Aktorên “pîşesazîbûnê” yên ku me li jor diyar kiribûn jî nêrînên xwe afirandin û ji bo vebûna li cîhanê ya sedsala 19. bi ser ketin.
Di 1862’yan de Almanyaya ku Otto Van, Bismarek wekî serokwezîr hat ser, piştî manewrayên cûda yên polîtîk û leşkerî di 18'ê Rêbêndana sala 1871’an de bi tackirineke ya Prûsyayê ya Împaratoriya Almanyayê, yekîtiya neteweyî pêk anî. Almanyaya ku bi bidestxistina yekîtiya neteweyî bilez û bez bilind bû, di sala 1880’î de ji aliyê hilberîna pîşesaziyê ve Fransa derbas kir, di pey Îngîlîstanê de ket riya hêza herî girîng ya cîhanê ya dûyemîn.
Piştî sala 1830’î Îtalyaya ku şoreşa pîşesazîbûnê bi lez pêk anî, di sala 1860’î de, di pêşengiya Garîbaldî de yekîtiya xwe ya neteweyî bi dest xistibû. Pişt re bi tevlîbûna

Venedîk (1866) û Romayê (1870) ev dem hat temamkirin. Her çiqas Îtalya weke Almanyayê bi lez nebe jî bi lez noqî bazarên cîhanê bibû û bi qasî hêza xwe ketibû nav lêgerînan qefaltina para xwe. Amerîka û Rûsyayê jî ji rêyên hîn cûdatir di nav lêgerîna qefaltina parê ya di bazarên cîhanê de bûn. Ber bi 1900'î parvekirina mêtinên di cîhanê de ya di navbera dewletên mezin de hatibûn temamkirin. Axên mêtinî yên ku li Rojava ji aliyê Îngilîstan û Fransa, li Rojhilat jî ji aliyê Rûsyayê ve dihatin dewisandin, derdiket holê ku hewldanên dorfirehkirina serjimêra hêzên diyarkirî hebû. Ewqas hêzên cûda û ji van hêzan pêşvebirina polîtîkayên cûda gihîştina axên herî dewlemend û herî fireh û mêtingeriyan, riyên ku divê bikar bên di destê xwe de girtin, rasterast li ser dewletên Osmanî û Îranî yên qels bandor dikir. Dewletên Osmanî û Îranî di nav vê rewşa giştî de bûn ku gotin di cih de be weke di " Sofreya Gûran" de bûn. Van dewletên ku nikaribûn xwe li gorî divêtiyên cîhanê yên pêşveçûnê bi pergal bikin, ji bo ku xwe ji vê rewşa ku tê de ne xilas bikin, dê neçar bimînin ku bikevin nav lêgerînên cûda yên xelasiyê.



Komên gel ên wekî Ermenî, Rûm, Asûrî, Nestûrî, Ereb û Kurd jî dê pêşî di bin bandora polîtîkayên emperyalîst, dewletên Ewrûpayê yên mezin, pişt re jî di bin bandora polîtîkayên dewletên Îranî û Osmaniyan de bimana. Piştî sala 1890'î polîtîkayên îngilîz û fransizan ên sedsalî yên Osmaniyan gûherî. Van hêzên ku ev sed sal bû parçebûna Dewleta Osmaniyan û ketina vê dewletê ya destê Rûsan ji aliyê berjewendiyên xwe ve weke xeteriyeke jiyanî didîtin, dema ku dîtin Rûsya ji ber sedemên hûndûrîn û derve qels bû, dest ji polîtîkaya "Nehiştina Pelaştin û Parçekirina Osmaniyan" berdan; polîtîkaya parçekirina Dewleta Osmaniyan kirin meriyetê. Heman siyaset ji hêla hember, Rûsyayê jî sed sal bi rê ve biribû. Nehiştibû ku axên Osmanî û Îraniyan bikevin destên îngilîz û fransizan. Lê êdî qels bibû û hêza wê ya ku li hember polîtîkayên îngilîz û fransizan bibe asteng nemabû. Ku wisa be riya herî aqilane ew bû ku li gorî berjewendî û hêza xwe di nav parvekirinan de cih bigirta.

Alman di vê pêvajoyê de aktorên din ên girîng in. Piştî sala 1880'î têkiliyên Osmanî-Almanan dest bi sistbûnê kir. Bi taybetî di mijarên çêkirina riya hesinî û modernîzosyona leşkerî de Alman roleke girîng dilîstin. Ji Dewleta Osmaniyan îhaleyên cûr be cûr digirtin, mewdûatan digirtin. Dewleta Osmaniyan di serî de riya hesinî ya Bexdayê, projeyên ku dê ji bo venêrîna riyên bazirganiyê yên girîng bi kêr werin pêşkêşî venêrîna Almanan kir, dibû sedema valaderxistina projeyên ku îngilîz bi dehan sal hewl didan ku bi dest bixin. Armanca çêkirina riya hesinî ya pêşî leşkerî bû. Di wê serdemê de kirina bin venêrîna xwe ya gelperweriya Ereb û Kurdan , destwerdankirina rewşên ku derkevin, armanca Osmaniyan a bingehîn bû. Lê ji bo Almanan wateyên mezintir ên van riyan hebûn: Alman di nav Ewrûpayê de dewisîbûn û mabûn. Di deryayan an jî di ser Rûsyayê re sûda ku bigihîje axên mêtîniyê tûnebû. Riya tekane ya ku Alman bi Îngilîzan re bikevin pêşbaziyê, di vê xetê de xwedî gotin bû. Çêkirina riya hesinî ya Bexdayê ku ji aliyê Almanan ve bihata çêkirin ev derfet diafirand. Ji aliyê din ve ji bo ku xeta di navbera Berlîn û Basrayê de bikar were, diviyabû ku Dewleta Osmaniyan bihata parçekirin. Heke ku Dewleta Osmaniyan parçe bibûya û biketa destê Îngilîstan, Fransa û Rûsyayê, dê ev plan vala derketa, dê Alman jî di

nav Ewrûpayê de bi halê xwe bimana. Dê ev sedem bibin sedemên hewldana ji bo ku Dewleta Almanan Dewleta Osmaniyan li ser piyan bihêle û ber bi xwe ve bikişîne. Dê bi heman awayî hewl bide ku tû kes serê Dewleta Osmaniyan neêşîne. Ji bo îngilîzan, Fransa û Rûsya piştî sala 1890'î gelên balkan, nîvgirava Ereban, Îran, Anatolya û Efrîqaya Bakur ji bo ku bikin nav tevgerê dest bi hilberîna polîtîkayan kirin. Li Kurdistanê gelên ku piştgirî didan û wadan dikirin, Ermenî û Asûrî-Nestûrî bûn. Polîtîkaya bingehîn a derbarê Kurdan de jî; Kurd her tim bi riya lihevxistinê ya bi dewletên Osmanî û Îraniyan re qelskirina vê dewletê, lê bi awayê pêşîlêgirtina Kurdan a ku bi serkeftinê serbixwe bibin bû. Ango bi teşeyê bila bi qasî ku pirgirêkan derxin bi hêz be, lê ji bo ku xweser bibin an jî bibin desthilatdar hêza wan tûne be.

### *ABDÛLHAMÎT Û POLÎTÎKAYÊN ÎNGILÎSTAN Û FRANSAYÊ*

Siltanê Osmaniyan Abdûlhamîdê ll. Mirovekî kurnaz û siyaset-zana bû. Dek û dolabên siyasetê tevlê li hember gelên bindest bikar dianîn. Abdûlhamîdê ll. dikaribû him polîtîkayên Îngilîstan û Fransayê him jî polîtîkayên Almanyayê bide ber hev û fêm bike. Dema li derve hewl dida ku qadên pevçûnên îngilîz û Almanan ên polîtîk ku li ser Dewleta Osmaniyan valahî çêkiribûn jê berjewendiyan bigire û qada xwe ya manevrayê berfireh bike û dewletê li ser piyan bihêle; li hûndir di serî de gelê Kurd û Ermenî, komên gelan ên cûda polîtîkaya ku Abdûlhamîd pêk dianî dizanibûn û hewl didan ku li hember xeteriya "parçebûna hûndûrîn" bibin asteng. Mirov dikare bibêje ku vê polîtîkaya ku Abdûlhamîd bikar dianî, ji salên 1890'î dest pê kir û heta ku Îttîhat û Terakî derbasî desthilatdariyê bû bi awayekî serkeftî pêk dewm kir.

### *DEWLETA OSMANIYAN DIXWEST GELÊN BINDEST TÛNE BIKE*

Dewleta Osmaniyan polîtîkayên xwe li ser "tûnekirinê" ya ji bo Ermenî, Rûm û Nestûriyan damezirand. Û dê vê pêvajoya tûnekirinê di serdema navbera serdema Abdûlhamît û serdema 1924'an de bihata temamkirin. Polîtîkayên ku di derbarê Kurdan de dihatin pêşvebirin bêhtir naverok û astên cûda dihewîne. Û heta ku polîtîkayên Osmaniyan ên di derbarê Kurdan de neyên fêmkirin, tevî ku dê bingeha Osmanî û dewleta Tirkiyê neyê fêmkirin, dê serhildanên Kurdan jî baş neyên fêmkirin. Ji ber vê sedemê bi awayekî di ser re be jî di vekirina van polîtîkayan de sûd heye.

Dewleta Osmaniyan, piştî yek ji serhildanên herî girîng ên Kurdan a Şêx Ûbeydûllah ku Kurdan bi armanca damezirandina dewleteke serbixwe dabû destpêkirin û di wê serdemê de li ser her dû parçeyên Kurdistanê gelekî bandor kiribû tepisandin, polîtîkayên di derbarê Kurdan de ji nû ve di ber çav re derbas kirin. Ji aliyekî ve jî dixwest ku li hember Ermeniyên ku roj bi roj xwestekên xwe bi awayekî bi hêz dianîn zimên Kurdan bikar bîne, ji aliyê din ve xwestekên Kurdan ên neteweyî ku di nav Kurdan de pêşve diçûn, dixwest "Di navbera Kurdan de" bi pevçûnekê asteng bike. Ango Dewleta Osmaniyan bi hewldana ku herdû belayan ji serê xwe dûr bixe dixwest " bi awayekî çareser bike."

Ji bo ku bigihîje van hedefên xwe diviyabû ku bi Kurdan re têkiliyên xûrt bên damezirandin. Diviyabû ku ji bo dostaniya xwe ya bi Kurdan re nîşan bide, ji bo wan derfetên cûr be cûr ên maddî nîşan bide, nêzîkahiya Kurd û Tirkan pêk bîne. Dê Abdûlhamît di vê polîtîkaya xwe de serkeftî bûya û ji ber ku Kurdan polîtîkaya wî ya qirêj fêmnekiribûn dê jê re bigotana "Bavê Kurdan ."

## WANE 30.

**Pirsên Amadekariyê**

1- Çima Tirka biryara komkujiya Ermeniyan dan?
2- Kurd û Ermeniyan dîrokeke dirêj cîrantî kiribûn, Osmaniyan çawa karîn Alyên Hemîdiyê di komkujiya Ermeniyan de bikarbînîn?
3- Kurd çima her dem tên lîstika xelkê?

## POLÎTÎKAYÊN OSMANIYAN ÊN ERMENIYAN Û XIRABÛNA TÊKILIYÊN ERMENÎ Û KURDAN

Ermeniyan hema hema li hemû bajarên Kurdistanê û li gelek cihên Anatolyayê serjimêreke ciddî pêk dianîn. Dibe ku ne piranî bûna lê di asteke ku xatirê wan bê zanîn jî ji qeydên serjimêrê yên wê demê dihat fêmkirin. Ermeniyên ku herî zêde li qada çolter bi çandinî û ajaldariyê re mijûl bûn, li bajaran jî karên girîng ên weke zeneat û bazirganiyê bi rê ve dibirin. Ermeniyên ku ji dîrokê ve bi kêrhatî û berhevkirinên xwe yên di mijarên zenaat û bazirganiyê de derketibûn pêş, di pergalkirinên piştî tazmînatê (1830) de hîn dewlemendtir bûbûn. Hilanîna gûmrikên hûndûrîn, pêşveçûna bazirganiya azad, di serî de van bûrjûwaziyên dewletên îngilîz û fransizan, têkiliyên navneteweyî yên ku pêşve diçûn, hêzeke girîng da Ermeniyan û damezirîna pola bûrjûwayên Ermeniyan bi dest xistin.
Di sala 1828'an, bi peymana Tirkmen a çayê ya ku di navbera Rûs û Îraniyan de hatibû çêkirin, Ermenîstana Rojhilat ketibû bin serweriya Rûsan. Piştî vê dîrokê Ermeniyên ku bi Rûsan re têkiliyên xûrt pêşve birin, bi pejirandina serweriya Xanedaniya Êrîvanê ya sala 1848'an, têkiliyeke hîn xûrttir pêk anîn; Bi Rûsan ve zêdetir hatin girêdan. Lê di heman demê de bixwebaweriya wan jî pêşve çû. Ji ber ku di beşeke welatê xwe de serweriya xwe damezirandibûn. Di rêzê de li herêma ku weke Ermenîstana Rojava dihat pênasekirin û di nav de hinek bajarên Kurdistanê jî hebûn, pêşvebirina têkoşîneke neteweyî ya rizgariyê û xelaskirina wan hebû. Ji bo ku vê yekê bikin, dê Rûsan alîkariya ku diviyabû bikira! Di nav Dewleta Osmaniyan de hêzeke wan û di radeyeke girîng de sermayeyên wan hebûn. Bi xwespartina van tiştan têkoşîna rizgariyê ya neteweyî pêkan bû, Ermeniyan jî wisa kir.

Piştî sala 1850'î têkiliyên di navbera Osmanî û Ermeniyan de dest bi xirabûnê kirin. Ermenî ji bo bigihîjin hedefên ku dixwazin, him bi rêxistin dibûn him jî bi hêzên emperyalîst re diketin têkiliyê û hewl didan xwe ku ji wan alîkariyê bigirin. Osmanî jî ji bo ku xeterîyek dernekeve li gorî xwe hinek pêşîlêgirtin diafirandin. Di nav van tedbîran de a ku di serî de dihat, pêşîlêgirtina hevkariya Kurd û Ermeniyan, pişt re jî li hember Ermeniyan bikaranîna Kurdan bû. Osmaniyan di vê mijarê de di nav Kurdan de gelek xebatên girîng kirin. Ji sîxûrên ku xebatên propagandayê dikirin bigirin, heta rêbazên ku mele di derheqê Ermeniyan de fetwayan derxin, hat xwestin ku bi bikaranîna gelek rêbazan di navbera Kurdan de hestên dijberiya Ermeniyan pêşve bibin. Bi heman awayî bi bikaranîna têkiliyên Ermeniyan ên bi dewletên Ewropayê yên mezin re bi îddiayên weke; " Gawir Ermeniyan diparêzin, dê bi wan dewletê bidin avakirin û ji ber ku li ser heman axê dijîn dê Kurd jî bikevin bin serweriya Ermeniyan." Bi zanebûn di nav Kurdan de hat belavkirin. Ketina bin serweriya gelekî ne misilman ne tiştekî ku Kurd qebûl bikin bû. Osmaniyan jî bi vê yekê zanibû û xebatên xwe li gorî vê dikir.

Di kongreya Berlînê ya ku di sala 1878'an de hatibû çêkirin de pirsgirêka Ermeniyan bi awayekî fermî derbasî platforma navneteweyî bû. Hikumeta Osmaniyan li cihên ku Ermenî lê zêde dijîn, ji bo ku mercên jiyanê yên Ermeniyan bên sererastkirin, ewlehiya wan bê kirin, ji bo ku li hember êrîşên ku ji derdora bên werin parastin û hwd. çêkirina islahat û pergalkirinan pejirand. Di vê mijarê de li welatên Ewrûpayê û Rûsyayê misoger kir.
Ji bo fêmkirina polîtîkaya Osmaniyan ji ber ku pir girîng e, em dixwazin bala we bikişînim ser xalekê. Di metna peyman-danînê ya vê kongreyê de xaleke bi vî rengî hebû; "Parastina Ermeniyan a li hember Kurd û Çerkezan" ji bo ku vê îbareya "li hember Kurd û çerkezan" bikeve vê metna peyman-danînê, nûnerên Osmaniyan bi israr li ser sekinîn. Sedema israrkirina vê xwestekê, ji ber qetlîameke dibe ku bibe, ji serî de sûcdaran bi awayekî fermî derbasî belgeyên navneteweyî bikin bû. Her wiha dê di rewşeke wiha de Dewleta Osmaniyan weke sûcdar nehata dîtin. Di wê demê de zêde ne pêkan bû ku Kurd li ser kirina van hevokan a vê metnê bifikirin. Ji ber vê yekê jî him li hember peyman-dayînê him jî li hember Ermeniyan kîn girtin. Her wiha polîtîkaya Osmaniyan a di nav Kurdan de afirandina "Xeteriya Ermeniyan" bi awayekî serkeftî bi encam bû. Tevgera neteweyî ya ku Ermeniyan bilind kir, polîtîkayên dewletên mezin ên di derbarê Ermenîstan û gelê Ermenî de, propagandaya Antî-Ermenî ya ku Osmaniyan dixwest pêşve bibin, neyartiyên feodaliya Kurdan a ku Alayên Hamîdiyeyê serî dikişand a bi armanca olî yan jî ax û talanê, di nav Kurdan de tirseke kur û dijberiya Ermeniyan afirand. Wisa bû ku ev rewş xwe di helbestên helbestvanê navdar ê bi navê Hecî Qadirê Koyî de jî da der. Tevî ku dîroka nivîsandinê ne diyar e jî di helbesta ku bi texmînî di navbera salên 1880-1890'î de hatiye nivîsandin de wiha dibêje:

**"Xakî Cîzîr û Botan, yanî Wilatî Kurdan**
**"Sed heyf û sed mixabin deyken be Ermenistan**
**Hîç xiretek nemawo, sed car qesem be Qûran**
**Peydabe Ermenistan, namene yek le Kurdan**

Pêşveçûnên siyasî yên ku xwe di helbestên Kurdan de jî didin der, weke ku di vê mînakê de tê dîtin, rewşa rihê Kurdan baş diyar dike, tirsa wan mezin dike û dest bi pênasekirina "neyar" a Ermeniyan dike.
Vê "pênasekirinê" di nav demeke kin de bergîdana xwe ya maddî jî dît. Li Sasonê di sala 1894'an de, di bûyera qetilkirina bi hezaran Ermeniyan de Alayên Hamîdiyeyê risteke girîng dilîst. Di bûyerên ku piştî vê yekê qewimîn de gelek rewşên bi vî awayî hatin jiyîn. Êdî Kurd û Ermenî bibûn xwînneyar. Xwîn ketibû navberê û pirên navbera Kurd û Ermeniyan pelişîbûn. Yek ji serkeftinên polîtîkayên Abdûlhamît jî ev e. Piştî kirinên damezirandina Alayên Hamîdiyeyê, pêkanîna parçekirinê ya di navbera Kurdan û bi navbeynkariya Alayên Hamîdiyeyê kirina Kurdan a bin kontrola xwe, bi navbeynkariya Alayên Hamîdiyeyê neyartiya Kurd û Ermeniyan jî hatibû bidestxistin.

Dû komên gel ên ku Osmanî di pêvajoyên berê de ditirsiyan ku bigihîjin hev, ji hev re bibûn neyar û êdî ne pêkan bû ku car din bên cem hev. Serkeftina Abdûlhamît di vê derê de bû. Dê dozaja vê pêvajo û polîtîkayê bi awayekî berzkirî bê domandin û mixabin gelê Ermenî yê ku şaristanî afirandibûn û hevparê şaristaniya Mezopotamya û Kurdistanê bûn dê ji van axan bi tûnekirinê bê bi encamkirin.

## WANE 31.

**Pirsên Amadekariyê**

1- Çima di vê sedsalê de serhildanên Kurdan bê encam diman?
2- Tirk bi çi armancê Alayên Hemîdiyan avakirin?
3- Di xapandina Kudan de herî zêde çi hate bikardianîn?

## DI DESTPÊKA 19OO'Î DE KURD

Di destpêka sala 1900'î de mercên jiyanê yên li Kurdistanê di rewşeke ku gelek jan dida mirovan de bû. Xizanî, tûndiya dewletê, li ber bûyerên ku Alayên Hamîdiyeyê bûbûn sedem, pirsgirêkên ku bi gelê Ermenî re jî dihatin jiyîn, weke çavkaniyeke diltengiyê derketibû holê. Bi ewqas diltengiyê di rêbaza jiyanê ya Kurdan de jî pirsgirêk hebûn. Piştî tûnekirina begîtiyan, di serjimêra li Kurdistanê de beşeke girîng ji şêwazê jiyana koçberî derbasî jiyana niştecih bûn. Derbasbûna jiyana niştecihî, rê li ber vebûna avaniya êlî, pêşveçûna pergalên axatiyê yên girêdayî dewletê ku yek bi yek an jî li derdora çend gundan pêk dihat, vekir. Girseyên ku derbasî jiyana niştecih an jî nîvniştecihî bûbûn, bac didan axa ango bi awayekî giştî didan dewletê. Êlên weke Şîvezûrî, Pirêsanî, Rewandûzî, Şûrî, Herkî, Kure û Zerarî jî ji ber ku havînan li Kurdistana Îranê, zivistanan jî li Kurdistana Osmanî diman, neçar bûn ku bac bidin her dû dewletan jî.

## B-Encamên Serhildanên Kurdan Yên Sedsala XIX'an

Di sedsala **XIX'**an de dewleta Osmanî li hember pêşketinên kapîtalîzma Ewrûpa tengasiyên mezin jiyandikirin. Raman û rêgezên nû yên bi vê sazûmanê re derketîn holê, bandora xwe li tevayî cîhanê belavdikir. Peywendî û ramanên sazûmaniya kevin li hember ya nû derfetên jiyanê peyda nedikir. Ji ber vê çendê bandora xwe ya bi sedsalan hêdî hêdî winda dikir û cihê xwe ji ya nû re dihêla.
Dewleta Osmanî ku bi sedsalan weke împaratoriyeke mezin mora xwe li dîroka mirovahiyê xistibû û herêmên pir berfireh yên Rojhilata Navîn, bakurê Efrîqa û beşek ji parzemîna Ewrûpa dibin dagirkeriya xwe de digirt, bi Şoreşa Fransa re, bi carekê rûbirûyê serhildanên bi armanca azadiyê yên gelên dibin dagirkeriya xwe de ma. Serhildan û nerazîbûnên mijara gotinê, dewleta Osmanî ewqas tengav dikir ku ger di vê sedsalê de bi tevayî ne hilweşayî be, ev jî bi saya nakokiyên navxweyî yên di navbera dewletên Ewrûpî, derketîn holê de bûye.
Dewletên Ewrûpî piranî di parvekirina vê dewletê de li hev nedikirin. Ev jî dibû sedema dirêjbûna temenê dewleta Osmaniyan. Ji ber lewazî, bêkêrî û pirsgirêkên civakî û siyasî yên jiyandikirin, di vê pêvajoyê de dewleta Osmanî ji aliyê dewletên Ewrûpî ve weke **"mirovê nexweş"** dihat binavkirin.
Weke di mijarên derbazbûyî de hatî destnîşankirin, piraniya serhildanên li dijî deshilatdariya Osmaniyan yên di vê sedsalê de çêbûyîn, biserketibûn. Lê berovajiyê vê rewşê serhildanên mîrên
Kurd yên pêkhatin, ji girtina encamekê dûr mane û zêdetir jî bûne sedema şkestina hêviya gelê Kurd. Têkçûna her sehildanekê, bi xwe re bê bawerîtî afirandiye û rê li ber kuştina bi hezaran mirovên Kurd û talan û wêrankirina Kurdistanê vekiriye.
Sedemên têkçûna serhildanên Kurdan yên sedsala **XIX'**an, em ê di du xalan de bigrin dest.

**1-Sedemên Siyasî:** Ramana netewperestiyê yên bi şoreşa Fransa re despêkirî bi rêya dewletên Ewrûpî re zêdetir di nava gelên ne Mûsilman yên di bin dagirkeriya Osmaniyan de dihatin belavkirin. Hem mîsyonerên Ewrûpî û hem jî rayedarên van dewletan zêdetir di nava civakên hatin diyarkirin de xebatên xwe dimeşandin. Ji ber vê sedemê civakên ne Mûsilman li gorî yên din zûtir şiyar dibûn û di derbarê rewşa xwe de dibûn xwedî agahî. Civakên herêma Balkan, bi vî awayî serî hildan û bi alîkariya dewletên Ewrûpa serxwebûnên xwe bi destxistin.
Alîkariya dewletên Ewrûpî yên ji bo civakên xirîstyan û rola wan ya di serxwebûna van civakan de, ji bo civaka Kurd ya di heman rewşê de nayê dîtin. Berovajiyê wê, di têkbirin û perçiqandina serhildanên mîrên Kurdan de û di berdewamkirina vê pirsgirêkê ya heya roja îro de rol û cihekî eşkere yê dewletên Ewrûpî heye. Dîsa kêmbûna hestên welatparêzî û nebûna yekîtiyeke siyasî di navbera mîr û begên Kurdan de jî, weke sedemeke herî girîng derdikeve pêş.

**2- Sedemên Olî:** Yekîtiya olî ya di navbera civaka Kurd û dewleta Osmanî de ji bo gelê Kurd bandoreke neyînî derxistiye holê. Vê yekê di peywendiyên rêvebirên Kurd û rayedarên Ewrûpî de astengiyên berbiçav afirandine. Civaka Kurd û rêvebirên wan di van têkiliyan de zêdetirî xwe bi gûman nêzikî van kesan bûne. Ev jî bûye sedema dûrketina ji hevdû.
Li aliyê din dewleta Osmanî xwe weke berpirsyarê civakên îslam û xelifeyên Hz. Mihemed dida nasandin. Vê jî dagirkeriya Osmaniyan ya di welatê me de rewa dikir.
Siyaseta panîslamîst ya ji aliyê Siltanên Osmaniyan ve di welatê me de hatî meşandin û ji aliyê erkdarên olî û rayedarên civakê ve bûyîna pergal ji bo vê siyasetê, di pejirandina deshilatdariya Osmaniyan de xwedî cihekî girîng e. Beşekî girîng yê civaka Kurd, şerê li dijî hêzên Osmanî weke gunehekî mezin didîtin. Bi van hestan di pêvajoyên serhildanan de hejmareke zêde kesên Kurd, li dijî gelê xwe û berjewendiyên civakî, di nava artêşên Osmaniyan de cih girtine û di têkbirina van serhildanan de bûne pergal.
Di mijara Mîr Mihemedê Rewandûzî de hatibû diyarikirin di rewşeke ku dewleta Osmanî di hemû aliyan de ji hev ketibû de, berovajiyê vê hêzên Mîr Mihemed gelekî li pêşbûn, amojgariyên rayedarek olî dikarî bibe sedema teslîmbûna Mîr Mihemed û piştî demekê mirina wî jî.

## C- ALAYÊN HEMÎDIYÊ

Di dawiya sedsala **XIX'**an de, dewleta Osmanî piraniya xakên berfireh yên di destê xwe de windakiribûn. Li herêma Balkan û li bakurê Efrîqa serhildanên bi riya Ewrûpî ya **(Inglîz, Fransiz û Rûsya)** pêkhatin, biserdiketin. Sînorên împeretoriyê her ku diçû tengtir dibû. Vê rewşê rêveberiya Osmaniyan dixist nava fikaran. Di dema Evdilhemîdê 11. de ji bo derketina ji astingiyên ku heyîn, ramana panîslamîzmê zêdetir derxistin pêş. Bi vê çandê di xwestin li dijî êrîşên dewletên ne Mûsilman, yekîtiya civakên Mûsilman sazbikin. Bi taybet jî di xwestin pêşî li serhildanên Ermenî û Kurdan bigrin.
Di pêvajoya mijara gotinê de, civaka Ermenî ji aliyê dewletên înglîz û Rûsyayê ve li dijî Osmaniyan dihatin bikaranîn. Osmaniyan jî dixwestin Kurdan li dijî Ermeniyan bikarbînin. Ji bo vê jî hestên Mûsilmaniyê didan pêş û bi vî awayî Kurd dixapandin. Ji ber ku Osmanî weke nûnerên îslamê dihatin pejirandin, di nava Kurdan de bi bandor dibûn. Dûrxistina mîran ji Kurdistanê, rê li ber valahiya deshilatdariyê û aloziyên civakî vekiribûn.
Rêveberiya Osmaniyan ji bo dagirtina vê valahiyê, rêxistineke leşkerî ya bi navê **"Alayên Hemîdiyê"** di sala **1892'an û** wê de damezrand. Ji bo damezrandina van alayên ji Kurdan pêkdihatin, rêxistina Kazakan ya ji aliyê Rûsyayê ve hatî damezrandin mînak hat girtin. Ji ber ku di dema şerê bi Osmaniyan re, Rûsyayê ji vê rêxistina Kazakan gelekî sûd girtibû.

Osmaniyan jî, di bin navê Alayên Hemîdiyê de êlên Kurdan birêxistin kirin. Ev alayên mijara gotinê, ji 36 alayan pêkhatibûn. Fermandarên wan jî serokêlên Kurd bûn. Ev serokêl jî girêdayî rayedarên Osmanî bûn.

Di heman demê de, zarokên serokêlên Kurdan dibirin Stenbol û di Dibistanên Êlan de didan perwerdekirin. Yên ev perwerde di qedandin, di van Alayên Hemîdiyê de weke fermandar cihdigirtin.
Ev alayên han zêdetirînî xwe ji Kurdên sûnnî hatibûn pêkanîn. Ji ber vê çendê ye ku Kurdên Elewî di nava vê rêxistinê de cih nedigirtin. Jixwe yek ji sedemên damezrandina van alayan derxistina nakokiyan di navbera Kurdên Elewî û Sûnnî de bû. Bi vê yekê bêtifaqî dixistin navbera Kurdan . Alayên Hemîdiyê di çalekiyên xwe de xwediyê serbestiyên bêsînorbûn. Tû kesê/î nedikarî hesab ji wan bixwaze. Li ser navê dewletê bac distandin. Gelek caran Kurd, Ermenî û Asûrî rastî talanên van alayan dihatin.
Alayên Hemîdiyê, di welatê me de bibûn çav, gûh û çeka Osmaniyan. Li ser navê dewletê zilm û zordariyeke mezin dimeşandin. Ji bo rûniştandina sazûmaniya dewletê di welatê me de, dewleta Osmanî ji wan gelek sûd wergirtin. Osmaniyan tevger û serhildanên Kurd, Ermenî û civakên din bi destê van alayan didan çewisandin.
Alayên Hemîdiyê, di serhildana Ermeniyan a sala **1894'an** li Sasonê çêbûyî û paşê jî di komkujiya Ermeniyan a di pêvajoya Şerê Cîhanê Yê Yekemîn de jî hatiye bikaranîn. Di kiryarên xwe de ew qas serbest tevdigeriyan ku êdî dewlet jî ji ber wan ketibû nava tirsê. Piştî deshilatdariya Osmaniyan ket destê rêxistina Îttîhat û Terakî, navê van alayan gûhertin, kirin Alayên Siwarî.

Hem di pêvajoya Şerê Cîhanê Yê Yekemîn de û hem jî di damezrandina dewleta Tirkiyê de jî van alayan cih girtîne. Herî zede jî van alayan astengî li peşiya rexistinên Kurd çêkirine û di qirkirina Ermeniyan de herî zede hatine bi kar anîn.

**WANE 32.**

**Pirsên Amadekariyê**

1- Çimi serhildana Bişarê çeto têk çû?
2- Raperîna Erzirûmê li hemberr çi pêşket?
*3-* Çima gelê Amedê bi raperîneкê dest danîn ser birûskxaneyê, girîngiya wê çi bû?

## DI SEDSALA 20. DE REWŞA KURDISTANÊ Û SERHILDANÊN GELÊ KURD YÊN LI DIJÎ DAGIRKERAN

### *RAPERÎNA BIŞARÊ ÇETO (1905-1906)*

Di dawiya sala 1905'an de li Rojhilat ji bo ku bacê nede, Êla Pencar serî radike. Serekê êlê Çeto, yekîneya jendermeyan a ku di rêbêndana sala 1906'an de ji bo berhevkirina bacê hat gund, tevî sûbayê wan, 18 kesan dikuje. Hikumet, hêzên tenkîlê yên di fermandariya Alay Beg de dişîne. Lê hêzên Çeto, Alay Beg jî têk dibin û vê têkbirinê li Rojhilat di nav Kurdan de ji bo Çeto dibe peyameke mezin. Bi vê peyamê di dema xwe de li gorî raporên **entelîjans** ên ku ji Rûsyayê re tên şandin, tê fêmkirin ku Ermenî û Ereb jî tevlî hêzên Çeto dibin. Bişarê Çeto yê ku hinek êlên Ereban ên herêmê jî dide aliyê xwe, çend caran yekîneyên leşkeran ên ku Osmanî bi ser wan ve dişînin, têk dibe. Lê dema ku Osmanî rastiya rewşê dibînin û li wê gorê artêşê dişînin, Bişarê Çeto neçar dimîne ku xwe vekişîne çiyayan. Bişarê Çeto yê ku piştî vê pêvajoyê bi taktîka lêxe-bireve, bi ser yekîneyên Tirkan ve êrîş pêk anîn, heta Gûlana sala 1906'an di herêma navbera Sêrt û Amedê de bandoreke girîng afirand. Osmaniyan bi pêkanîna hêz û têkbirineke mezin, serhildanê bi dawî dikin. Di serhildana Bişarê Çeto de, Cemîlê Çeto lê xayîntî dike û dibe sedema têkçûna vê serhildanê. Dewleta Osmaniyan hinek tişt ji bo Cemîlê Çeto soz dane, lê piştî ku Bişarê Çeto têk diçe sozên ku dane wî pêknayînin.

### *RAPERÎNA ERZIRÛMÊ (ADAR –PÛŞPER 1907)*

Rêveberiya Abdûlhamîd, di bin navê "hayvanat-ı ehliye Rûsûmû" de baceke nû ya ajalan derxist. Pişt re jî pê re pê re bi armanca debara pêdiviyên artêşê, baca "Rûsûmû Şahisiye" derxist. Dewletê pêdiviya diravan hîs dikir û ji bo her pêdiviyê jî serî li gel dida. Gelê Erzirûmê di 20'ê Sibata 1906'an de bi daxwaznameyan serî li qeymeqamê wilayetê da û xwest ku baca ajalan bê rakirin. Walî bi gel re hevdîtin pêk anî, diyar kir ku dê di demeke kin de bac bên rakirin û bi vî awayî gel da sekinandin. Û xwest ku li benda bersiva ku dê ji Stenbolê were, bê sekinandin. Lê ji Stenbolê tû his û deng nehat. Li ser vê yekê di 12'ê Adara 1906'an de ji qesra li Stenbolê re birûsk hat nivîsandin. Ji qesrê li benda bersiveke erênî hat sekinandin, lê dîsa bersiv nehat. Û di 13'ê Adara 1906'an de raperînê rû da.
Gelê Erzirûmê êrîşî postexaneyê kir, ji qesrê re birûske şand da ku walî ji peywirê bê girtin. Dema ku bûyer gihîştin asta bandorkirina gelemperiya bajêr, rêveberiya Osmaniyan li bûyeran destwerdan kir, walî ji peywirê girt, ragihand ku dê êdî bacê negire. Ata Beg ê ku weke waliyê nû li Erzirûmê hat ser kar, serhildêrên 13'ê Adarê tespît kirin û dest bi girtinan kir. Çawa ku gelê Erzirûmê ji rewşê agahdar bû, girt ser qereqol û walîtiyê, serhildêrên girtî da berdan û walî jî qefaltin û di mizgeftê de dîl girtin. Rêveberiya Osmaniyan li hemberî pêkutiya gel paşve gav avêt, Ata Beg ji kar girt û Nûrî Beg weke waliyê nû anî ser peywirê.

Raperîn dîsa nesekinî. Lê dewlet li hemberî vê yekê weke paralel pêkutiya xwe zêde kir. Di 15'ê Gûlana 1907'an de 20 hezar kesan postexaneya Erzirûmê dorpêç kir û bi vê yekê bersiv da pêkutiyên Dewleta Osmaniyan.
Bûyer heta pûşperê domiyan. Di vê pêvajoyê de gelek bûyerên talanê hatin jiyandin. Hinek bazirgan bi lînçê hatin kuştin. Piştî ku Rêveberiya Osmaniyan bi rakirina bacê û bi diyarkirina li hember kesên ku ketine bûyeran derxistina efûyê paşve gav avêt, raperîn bi dawî bû.

## *RAPERÎNA AMEDÊ (1907)*

Piştî raperîna 1906'an Alayên Hamîdiyê pêkutiyên xwe yên ku kêm bûbûn, di sala 1907'an de car din zêde kirin. Hecî Mesûd Beg ê ku berê fermandariya Medîneyê jî kiribû, şexsiyêtên Amedê yên pêş li mala xwe berhev kirin û di mijara ku dê çawa bike de gûftogo kirin. Di dawiyê de biryara car din desteserkirina birûskexaneyê hat dayîn. Desteserkirina birûskexaneyê ne çalakiyeke hêsan bû. Birûskexaneya Amedê, di wê demê de girêdana birûskeyan a Hîndîstan, Çîn, Avûstûralya û Ewroûpayê pêk dianî. Heke ku birûskexane bihata desteserkirin, dibû ku dengê raperînê ji her aliyê cîhanê ve bihata bihîstin.
Amediyên ku biryara desteserkirina birûskexaneyê dan, bi vê yekê zanibûn û difikirîn ku dê hikumeta Stenbolê vê rîskê negire ber çav û xwestekên wan bipejirîne.
Hecî Mesûd Beg li cem Dewleta Osmaniyan şexsiyetekî girîng bû. Hecî Mesûd Begê ku vê sekna xwe bikar anî, di wê dîrokê de çû cem Hesen Fehmî yê ku waliyê Amedê bû, jê piştgirî xwest. Walî vê xwestekê nepejirand û nexweşiya xwe kir hincet û derket destûrê. Ji fermandarê alayê yê wê demê Albay Seyît re jî got; "bêdeng bimîne."
Hecî Mesûd, bi esnaf, eşraf û beşeke gel re di 14'ê Sermaweza 1907'an de birûskexaneyê desteser kir. Birûskexaneya ku yazdeh roj di bin desteseriyê de ma, hikumeta Stenbolê di rewşa destwerdanê de hişt. Xwesteka kesên ku serî rakiribûn ew bû ku Îbrahîm Paşa û mirovên wî ji herêmê bên şandin. Hikumeta Stenbolê di serî de xwest ku çalakvanan qanih bike lê dît ku nikare vê yekê bidest bixe, diyar kir ku dê Îbrahîm Paşa bişîne Helebê û dê lêpirsîna pêwîst bê kirin, raperîn bi dawî bû.

## SERHILDANA ŞÊX ABDÛSELAM BARZANÎ (1906-1908)

Berzanî yê peşî yê herî kevin û yê ku tê zanin Şex Tahire. Şex Tahîr xwe li Şex Ûbeydilahê Nehrî digire û gelekî dem direj li gel wan perwerde dibîne. Piştî mirina wî kurê wî Abdûlah di keve cîhê wî. Abdûlah bey ku ji Şex Ûbeydûlah destûr bigre xwe Şex dide diyar kirin. Bey ku destûra Şexê xwe bigre. Ev rewş ji di navbere wî û Şex Ûbeydûlahê Nehrida de rê li ber pirsgirekan vedike. Piştî ku Şêx Abdûllah mir, Abdûselamê ku derbasî ser Tekkeya Berzan bû, ji aliyê Mewlana Xalid ve weke xelîfe hat hilbijartin û di nav nexşîbêndiyan de cihekî girîng bi dest xist. Di sala 1872'an de Abdûselam mir û kurê wî Şêx Mihemed derbasî cihê wî bû. Di heman pêvajoyê de Şêx Ûbeydûllah jî li Mekkeyê jiyana xwe ji dest da. Her wiha Şêx Mihemedê ku hêza wî zedetir bibû, bi rêveberiya Osmaniyan re pirsgirêkên cûda dijiya. Gelê herêmê ji mêj ve ji Osmaniyan bi gazinc bû. Û pirsgirêkên ku dihatin jiyîn her wiha bi Şêx Mihemed ve bêhtir dihatin girêdan. Di pêvajoyên berê de her çiqas ne di asta ku Şêx Ûbeydûllah bi dest xistibû de be jî, Ji valahiya ku bi mirina Şêx Ûbeydûllah pêk hatibû sûd wergirtibû û asteke bandorê bi dest xistibû.
Şêx Mihemedê ku êlên mezin ên wekî Zibarî, Şîrwan û Mizûrî girt ber destê xwe, bi artêşeke bi hezaran kesî ve ket tevgerê. Armanca wî ew bû ku herêma ji Mûsilê heta Şamê desteser bikira. Tû sûda hêza leşkerî ya Osmaniyan a herêmê tûnebû ku li hember Kurdan bisekine. Ji ber vê yekê jî çawa ku tevgerê dest pê kir, herêmên wekî Akra û Rewandûzê ketin destê Kurdan . Şêx Mihemed bi ser Mûsilê ve çû. Di wê serdemê de Salih Zekî

Paşayê ku waliyê Mûsilê bû, agahî şand, xwest bi Şêx Mihemed re hevdîtin pêk bîne, di vê agahiya xwe de diyar kir ku ew bi xwe jî ji rêvebertiya Abdûlhamît  aciz e û heke ku bikaribin hêzên xwe bikin yek, dê bikaribin Abdûlhamît ji text bînin xwarê. Ragihand ku li Mûsilê li benda wî ne.
Şêx Mihemed û mirovên xwe yên ku li Mûsilê, li mala Salih Zekî Paşa bûn mêvan, li sê cihên cûda wekî mêvan hatin pêşwazîkîrin. Di derengiya şevê de hemû girtin û ew avêtin zindanê.
Rêveberiya Osmaniyan Şêx Mihemed sirgûnê Bedlîsê kir. Şêx Mihemedê ku li vir salekê di zîndanê de mabû vegeriya, di sala 1903'yan de jiyana xwe ji dest da. Şêx Mihemed li peyî xwe pênc kurên bi navên; Şêx Abdûselam, Şêx Ehmed, Mûhammed Sidiq, Babo û Mele hişt. Ji nav van kurên wî, Şêx Abdûselam derbasî ser Êla Berzanî bû.
Di serdema Şêx Abdûselam de jî nerazîbûn domiyan. Ne pêkan bû ku rêveberiya Osmaniyan xwe di nav çend salan de bigûheranda. Kurdan  jî li hember mercên ku dijiyan tehemmûl nedikir. Her wiha dê mercên li herêmê car din awarte bibûna.
Şêx Abdûselam di sala 1907'an de li gundê Brîfkanê, li mala serokê Terîqeta Kadirî Şêx Nûr Mihemed Brîfing, serokên êlên Kurdan  berhev kir û civîn pêk anîn. Di nîqaşên ku hatin kirin de li ser xwestekên ku derketin holê, biryar hat dayîn ku ev xwestek bi riya birûskeyê ji Stenbolê re bê ragihandin.
Xwestekên ku ji Stenbolê re hatin ragihandin ev bûn:
1-Li herêmên Kurdan , pejirandina fermiyeta zimanê zikmakî.
2-Dayîna perwerdehiyê ya bi Kurdî.
3-Qeymeqam, Gerînendeyên Navçeyan û karmendên din li ser kesên ku Kurdî di asteke baş de bizanibin bên hilbijartin.
4- Di dadgehan de hikmên ku bên dayîn, li gorî Şerîeta Îslamiyetê bên dayîn.
5-Bac weke berê di bergîdana xizmetên zordarî de bên girtin û ev bac di çêkirina rê û dibistanan de bên bikaranîn.
Birûskeya ku destnîşana kesên tevlî civînê bibûn li ser bû,  ji Stenbolê re hat rêkirin. Dema ku hikumeta Stenbolê vê birûskeyê girt, vê birûskeyê li hember dewletê weke serhildanekê nirxand û artêşeke di fermandariya Ferîk Mehmet Fazil Paşayê Dagistanî de bi ser Berzaniyan ve şand.  Pevçûnên ku di mehên dawîn ên sala 1907'an de dest pê kirin, nêzîkî dû mehan domiyan. Berzaniyên ku  êlên Şirwanî, Dolamerî, Mizûrî, Berojî, Gerdî, Herkî û Binecî piştgirî dan wan, li hember êrîşên artêşa Osmaniyan li ber xwe nedan û paşve vekişiyan. Paşayê Dagistanî ket Berzanê, her tiştî ser û binê hev kir û gelek kesên ku avêtin zîndanê. Şêx Abdûselamê ku li hember artêşa Osmaniyan nikaribû li ber xwe bide, Berzanê terikand û derbasî herêma Teyarî bû.  Li wê derê xwe bi serekê  Asûrî-Nestûriyan ê bi navê Mar Şemûn ve girt. Nestûriyan mînakeke mezin a hevgirtinê nîşan da, li Abdûselam xwedî derketin, ew kirin bin parastinê.
Di serê sala 1908'an de artêşa Osmaniyan paşve vekişiya. Şêx Abdûselamê ku vê agahiyê girt, vegeriya herêma xwe û ji nû ve dest bi amadekariya serhildanê kir.  Bi taybetî li herêma bi navê Welatê Jêr,  li hember yekîneyên Osmaniyan êrîşên gelekî girîng kirin. Dema ku yekîneyên Osmaniyan li herêmê ketin rewşeke ku nikaribin tevbigerin,  hikumeta Osmaniyan pêşniyara hevdîtinê kir.
Di dawiya hevdîtinên ku hatin kirin de hêsîr ji her dû aliyan ve hatin berdan. Osmanî zirarên ku bibûn sedem dan û piştî ku Mîrlîva Esat Paşayê ku bi nêzîkbûna xwe ya Kurdan  dihat nasîn weke rêveberê herêmê yê Osmaniyan anîn ser peywirê, serhildana Abdûselam Berzanî bi dawî bû.

**WANE 33.**

**Pirsên Amadekariyê**

1- Serhildana Dêrsimê di rewşeke çawa de destpêkir û bi çi sedeman têk çû?
2- Armanca avakirina Îtîhat û Terakî çi bû?
3- Neteweyên din bi çi armancê tevlî Îtîhat û Terakî bûn?

## SERHILDANA DÊRSIMÊ (1907-1908-1909)

Dêrsim ji berê ve herêmeke ku serxwebûna xwe diparast bû. Osmanî jî ji bo ku li Dêrsimê venêrîna dewletê pêk bînin her tim plan çêdikirin, êrîş pêk dianîn.
Di sala 1907'an de hêzeke ji 4000'î ya di fermandariya serokê Êla Kureyşan Elî Çawiş de bi ser Elezîzê ve çû. Êlên Koçan, Reşik û Şemkan jî bi ser Kemah û Çemîşgezekê ve çûn. Armanceke ber bi çav a van êrîşên ku hevdem pêk dihatin tûnebû. Ji ber vê yekê jî tevî ku tevgereke serkeftî bû jî tû encamek bi dest nexist. Piştî ku Kurdan yekîneyên Osmaniyan ên ku ji bo destwerdanê hatibûn şandin jî têk birin, car din paşve vekişiyan.

Di gelek tevgerên ku berê hatibûn kirin de Dêrsimiyên ku di artêşa Osmaniyan de wendahiyên giran dabûn, dest bi amadekariya raperînên mezintirîn kirin. Êlan di nav xwe de hevdîtin kirin, ji bo demekê be jî nelihevkirinên di nav xwe de dan sekinandin û di sala 1908'an de di serî de Hozat, li hemberî herêmên cûr be cûr dest bi êrîşan kirin. Hêzên Osmaniyan ên li Hozatê bi êrîşeke mezin têk çûn. Kurdan dest danîn ser erzaq û cebilxaneya leşkeran. Yekîneya Osmanî ya di herêma Şavakê de jî li hember heman aqûbetê rû bir û ma. Serokê Êla Keçelan ê bi navê Keko Axa jî Pûlûmûrê bi dest xist. Li gelek herêman tiştên bi vî rengî qewimîn. Kurdên ku li hember Artêşa Osmaniyan destkeftinên serkeftî bi dest xistin, karmendên Osmanî yên li herêmê ji peywirê girtin û di cihên wan de karmendên Kurd anîn ser kar. Dîsa xetên girîng ên derbasbûnê yên herêmê girtin dest, venêrîna ketin û derketina herêmê girtin bin destê xwe. Dema Rêveberiya Osmaniyan dît ku Dêrsim ji dest çû, bi hemû hêza xwe êrîş kir. Lê van êrîşan li ser Kurdên ku mercên xwezaya herêmê baş nas dikirin, zêde bandor nekir. Berovajî vê yekê Kurdên ku van avantaj baş bikaranîn, derbeyên cidî li Artêşa Osmaniyan xistin. Ji van êrîşan di yekê de leşkerekî ku got; "Ez dixwazim teslîm bibim." Keko Axayê ku ber pê ve çû kuşt. Keko Axa serokê serhildanê yê herî girîng bû û wendahiya Keko Axa di nav Kurdan de bû sedema xirabûneke cidî a moralê û belavbûyînan. Kurdên ku heta wê pêvajoyê şerekî serkeftî bi rê ve dibirin, payedariya xwe wendakirin û bi awayekî bela wela ber bi çiyayan ve vekişiyan. Osmaniyan pêşveçûn baş nirxandin, dest bi êrîşê kir û Hozat bi dest xistin.

Piştî vê bûyerê serokên êlên Kereban û Bahtiyaran teslîmî Osmaniyan bûn. Bidawîbûna serhildanê hat hesibandin, êlên Heyderan û Demenan ên li Rojhilatê Dêrsimê bûn, serî rakirin. Serhildan car din mezin bû. Û artêşa Osmaniyan neçar ma ku di qadeke gelek fireh de bibe mûxatabê êrîşan. Ji Trabzonê yekîneyên taqwiyeyê hatin xwestin. Lê Kurdên ku riyên çûyînê di bin venêrînê de digirtin, destûr nedan ku hêzên taqwiyeyê derbas bibin. Fermandarê Osmaniyan ê bi navê Neşet Paşa ji Kurdan re agahî şand û daxwaza lihevkirinê kir. Gelek serokên êlan bi vê lîstikê xapiyan, ev daxwaz pejirandin û çûn teslîm bûn. Seyît Riza û serokên Êla Ovaciqê ev daxwaz nepejirandin. Lê li pêşiya yên din jî nikaribûn bibin

asteng. Kurdên ku fêm kirin hatine lîstikê, car din dest bi pergalkirina êrîşan kirin. Artêşa Osmaniyan ji gelek herêman dest bi vekişandinê kir. Di heman pêvajoyê de bi bandora şoba tîfoyê jî Artêşa Osmaniyan neçar ma ku pêşî ji Hozatê pişt re ji Erzîncanê vekişe.

Di sala 1909'an de Rêveberiya Osmaniyan a ku ji bo Dêrsimê êrîşeke nû plan dikir, artêşeke ku bi hêzên leşkerî yên bi Kîgî, Amed û Elezîzê hatibûn xûrtkirin, şand ser Dêrsimê. Şervanên êlan ên ku ji êlên Aslan û Beytan pêk dihatin, êrîşî yekîneyên pêşeng ên Osmaniyan kirin, ew hêz ji binî ve îmha kirin. Û bi kêr hatin ku girêdana navbera hêzên Osmaniyan ên ku ji milên cûda ve pêşve diçûn qût bibe. Hêzên Osmaniyan ên mayî jî ji aliyê Kurdan ve hatin dorpêçkirin. Ger gotin di cih de be dê aloziyek bihata jiyîn. Piştî ku fermandarê Osmaniyan Îbrahîn Paşa ev yek dît, ji bavê Seyît Riza Seyît Îbrahîm û Seyît Kasim alîkarî xwest. Seyît Îbrahîm destwerdana vê rewşê kir û destûr da ku Osmanî vekişin Erzîncanê.
Ji xeynî serhildanên ku di serdema Abdûlhamîd de hatibûn jiyîn, raperînên biçûk ên herêmî jî çêbûne. Di sermawêza sala 1905 û 1908'an de li Bedlîs û Agiriyê li ser xwesteka dewletê ya berhevkirina bacên nû, raperîn çêbûbûn. Di sala 1907-1908'an de ji ber nerazîbûnên ku ji karmend û pêwendîdarên bertîlxwar dihatin jiyîn, li Erzirûm û Bedlîsê gel rabibû ser piyan. Van raperînan hemû raperînên ku di nav çend rojan de bibûn û qediyabûn in. Lê ne raperînên negirîng bûn. Ji aliyê fêmkirina gel a nerazîbûna ji rêveberiya Osmaniyan re, girîng bûn.

Di serhildanên ku di vê serdemê de pêk hatibûn de ji taybetmendiyên neteweyî zêdetir, taybetmendiyên herêmî cihê xwe digirtin. Di serhildanên Dêrsim û Şêx Abdûlselam de bandoreke "girîng ya hişmendiya Kurdîtiyê" hebû. Lê ev hişmendî ne di asta diyarkirina bingehîn de ye. Ji vê zêdetir pêkanîna berdewamiya rewşa xweser a dîmane hatibû armanckirin.

Dîsa di van serhildanan de şexsiyetekî ku bikeve pêşiya Kurdan , rê nîşanî wan bide û pêşengiyê bike derneketiye holê. Baxên têkiliyê yên civaka Kurdan wisa belav bûbûn ku ji bo anîna wan a cem hev hêzeke mezin a rêxistinî û stratejiyê diviyabû. Lê di tevgerên ku di vê serdemê de pêk dihatin û di pêşengên ku derketibûn pêş de dîtina taybetmendiyên bi van rengan ne zêde pêkan e.

## *ÎTTÎHAT TERAKKÎ Û PÊVAJOYA MEŞRÛTIYETÊ YA 2.*



Di sala 1895'an de cemiyeta " Îttîhat û Terakkî ya Osmaniyan" hat damezirandin. Di sala 1886'an de cemiyeta Îttîhat –ı Osmanî û piştre jî Cemiyeta Osmanî ya "Hûrriyetê" ya ku hinek sûbay û karmendên sivîl ên ku ji rêveberiya Abbdûlhamîd nerazîbûn, pêşengî dikir, hat damezirandin. Van cemiyetan hemû ji ber ku ji rêveberiya Abdûlhamîd re mûxalefet dikirin, di bin pêkutiya qesrê de bûn û bi awayekî veşartî çalakiyên xwe bi rê ve dibirin. Van cemiyetan di sala 1907'an de di bin navê "Cemiyeta Îttîhat û Terrakî" (CÎT) de gihîştin hev. Cemiyeta Îttîhat Terrakî (CÎT) di navbera salên

1908 û 1918’an de rêveberiya dewleta Osmaniyan di destê xwe de girtin. Damezirînerên Komara Tirkiyeyê yên ku navên weke Mûstafa Kemal, Îsmet Înonû, Kazim Kerebekir, Ali Fûat Cebesoy, Raûf Orbay, Celal Bayar… jî di nav de bûn, wekî endamên partiya Îttîhat û Terakkî tevlî bûn. Bi heman awayî rojnamevan-nivîskarên wekî Yûnûs Nadî, Hûseyîn Cahît Yalçin, Falîh Rifkî Atay jî endamên CÎT'ê bûn, lê di vê xalê de pêdivî bi vekirina kevanekekê heye; (Di nav kesên ku Cemiyeta Îttîhat û Terakkiyê damezirandine de Tirk tûne ne.) Kesên ku wekî damezirînerên yekemîn derbasî dîrokê bûn, mirovên ji gelên cûda yên di bin serweriya dewleta Osmaniyan de bûn. Îbrahîm Temo, (Arnavût) Mehmet Reşit Bey, (Çerkez) Hûseyînzade Ali, (Azeri) Îshak Sûkutî, (Ji sûkutzadeyên Amedî, Kurd) û Abdûllah Cevdet (Malatya, ji êlên Arpagir-Atma) Îttîhat û Terakkî damezirandine. Sedema ku tablo bi vî awayî ye ew e ku di wê serdemê de ala azadbûyînê di destê CÎT'ê bûye. Mirov bi hêviya “azadiyê” li dora CÎT'ê kom dibûn. Bi gotineke din, wisa bawer kirine ku dê CÎT ji bo azadiyê bi kêrî wan bê. Sedema tabloya ku derketiye holê, ev e.
Kongreya yekemîn a Îttîhat û Terakkiyê, di navbera 4 û 9'ê Sibata sala 1902’an de li Parîsê, li mala kurê Mahmût Paşayê zavayê Abdûlhamît ê bi navê Prens Sabahattîn hat çêkirin. Nûnerên komên gel ên cûda tevlî kongreyê bûbûn. Ev koman di wê baweriyê de bûn ku di bin banê Îttîhat û Terakkiyê de dê bikaribin pirsgirêkên xwe çareser bikin. Xwesteka wan a bingehîn jî ew bû ku Abdûlhamît biqelibe û Makezagona 1878’an bikeve meriyetê. (ev zagonê di sala 1876’an de hatibû îlankirin lê piştî salekê ji aliyê Abdûlhamît ve ji meriyetê hatibû hilanîn.)

Di kongreya yekemîn de bi biryareke hevpar, Prens Sabahattîn wekî “ serok” hat hilbijartin. Ji delegeyên Rûm Sathas û ji delegeyên Ermenî jî Sisê bûn alîkarên serok. Di vê kongreyê de kesên ku Kurd temsîl kiribûn; Abdûrahman Bedirxan Beg û Hîkmet Baban bûn.

Di axaftina vekirina kongreyê de Prens Sabahattîn wiha gotiye; “Divê ev der teqez bê diyarkirin ku Tirkên ku piraniya împaratoriyê pêk tînin, di nav xwe de mafên ku dixwazin, misliman be yan nebe, ji bo hemû hemwelatiyên din, bê şert û merc bên dayîn…” û nêzîkatiya Îttîhat û Terakkiyê diyar kiriye. Jixwe ji ber ku komên gel ên cûda bi vê yekê bawer bûne karibûne bên cem hev û din. Di nîqaşên ku di kongreyê de hatine kirin de derketiye holê ku her kes heman nêzîkatiyê li ser xwe nagire.
Weke encama kongreyê dû dilxwaziyên cûda yên bi navê merkezîbûna Ademî û Tirkitî dû xet derketine holê. Kongreya dûyemîn a Îttîhat û Terakkiyê, di navbera 27 û 29'ê Berfanbara sala 1907’an de li Parîsê hat kirin. Nûnerê Tirkitî alîgirê Ahmed Riza, nûnerê merkezîbûna Ademî Prens Sabahattîn û ji tevgera Taşnak a Ermenî, K. Mûahmyan di kongreyê de bi awayekî hevpar serokatî kirin.

Îttîhat û Terakkiya ku ji tevgera gel a ku di sala 1905’an de li Rûsyayê pêşve çû û di sala 1906’an de ji şoreşa Meşrûtiyetê ya ku li Îranê bandor bûbû, di dawiya kongreyê de, di belavoka ku hat nivîsîn de navên van şoreşan bi bîr anîne, li hemû gelên ku di bin serweriya Osmaniyan de bûn bangewaziya şerkirina li hember siltan kirine û di heman demê de ji hemû gelên di bin banê împaratoriyê de bûn re îlan kirine ku dê “mafên hevpar” bide wan. Di 23’ê tîrmeha sala 1908’an de bi îlankirina “Hûrriyetê”re Meşrûtiyeta 2. dest pê kir. Abdûlhamît neçar ma ku vê pêvajoyê îlan bike. Êdî pêvajoya serweriyê ya CÎT'ê dest pê kiribû. Di nav çend mehên ku CÎT hat ser desthilatdariyê de bi awayekî gelekî bi coş tevlî pêvajoyê bûn. Di heman demê de dest bi pêkanîna azadbûna xwe jî kirin. Hawirdoreke beş ya azadiyê pêk hatibû û vê hawirdorê di mijara karîna rêxistinbûyînê de bingeheke bikêrhatî diafirand. Kurdan jî ev yek baş nirxand û tevgerên cûda damezirandin. Li Amedê

“Cemiyeta Fûkra Perwer,” li Egilê “Cemiyeta Îttîhat û Terakkî,” li Erzîncanê “Cemiyeta Îttîhat û Terakkî ya Osmanî” hat damezirandin. Ev, rêxistinbûyînên di asta herêmî de bûn. Damezirînerên ku di asta neteweyî de hatibûn fikirîn û dixwestin ku çalakiyên xwe di asteke hemdem de bi rê ve bibin jî hebûn. Ji van damezirîneran hinek jê beriya derbasbûna CÎT'ê ya desthilatiyê, hinek jê jî çend sal piştî derbasbûna CÎT'ê hatine damezirandin. Em dikarin bi kurtayî pêşveçûnên di vê pêvajoyê de wiha rêz bikin.
Di sala 1898’an de kurê Bedirxan Beg, Mîthat Beg, li Kahîreyê dest bi derxistina rojnameya yekemîn a Kurdî ya bi navê “Kurdistan” kir. Di sala 1900’î de ji aliyê Fîkrî Efendiyê Amedî û Ehmed Ramîzê Liceyî li Stenbolê “Cemiyeta Kurdistan Azmî Kavî” hat damezirandin. Vê cemiyetê tevgera yekemîn a siyasî ya gelê Kurd a ku tê zanîn e. Kurdîzade Ehmed Ramîz Beg ê ku yek ji damezirînerê cemiyetê bû, li ser Kurdistanê gelek lêkolînên girîng kirine. Ji ber ku cemiyet di xeteke li hemberî Abdûlhamît de bû, bi pêkutiyan re rû bir û maye. Bi rastî jî Ehmed Ramîz di sala 1904’an de reviyaye Misirê û bi îttîhatiyên li wê derê re xebatên xwe domandine. Di 19 ê Îlona sala 1908’an de li Stenbolê “Cemiyeta Kurd Tevan û Terakkî” hat damezirandin. Vê cemiyetê li Erzirûm, Mûş, Mûsil, Bedlîs û Amedê şaxên xwe vekirin. Li gorî hinek çavkaniyan hejmara endamên cemiyetê di sala 1909’an de gihîştibû heştê hezarî. Heman cemiyet rojnameya Kurdî ya yekemîn a legal ku di nav sînorên Osmanî de bûn ya bi navê “ Kurd Tevaûn û Terakkî” jî derdixist. Rojnameyê mijarên weke mafê perwerdehiyê û hwd. dihewandin, di derbarê jiyana Kurdan a civakî de nîqaş bi rê ve dibirin. (Dê di pêvajoya piştî vê de ji aliyê CÎT'ê ve bê girtin.) Di 25 ê Îlûna sala 1908’an de li Stenbol, Veznecîler lokaleke Kurdan hat vekirin.

Di sala 1909’an de di rêvebertiya Ziya Gokalp de li Amedê Rojnameya Peyman a ku bi Kurdî û Tirkî dihat nivîsandin, dihat weşandin. Di sala 1910’an de Cemiyata Kurt teşkilat –ı îçtîmaye û Fikraya Kurd Mîllek hat damezirandin.
Di sala 1910’an de “Cemiyeta Kurd Neşr-î Melarî” hat damezirandin. Li Stenbolê Dîvanyolûyê dibistaneke Kurdan hat vekirin û navê vê dibistana ku rêvebertiya wê Abdûrrahman Bedirxan Beg dikir, “Dibistana Meşrûtiyetê” bû. Rêwşenbîrên Kurd ên ku ev xebat birêvedibirin, çapxaneyeke Kurdan a bi navê “Maba-î Amedî” jî vekirin.
Di sala 1912’yan de Cemiyeta bi navê “Mûûhîbên Kurdistanê” vebû ku Mala Xidirê ji malbata Sarî Saltik a Dêrsimî jê re pêşengî dikir, M. Nûrî Dêrsimî sekreteriya giştî dikir. Van komeleyan damezirînerên alîkariyê bûn. Herî zêde cemiyeteke ku ji Kurdên Dêrsimî û Elewî pêk dihat û xwedî giraniya hevgirtin û taybetmendiyên zêdetir bû. Piştî demeke kin a vekirina vê cemiyetê, di 27.07.1992’an de li Stenbolê ji aliyê xwendekarên Kurd ve “Civata Talebeyên Kurdan ” hat damezirandin. Vê cemiyeta ku weke “HÊVÎ” jî tê zanîn, heta sala 1921 ê jî xebatên xwe domandine û hinek xebatên girîng jî kirine. Vê cemiyeta ku serokatiya wê Cemîlzade Emer dikir û kesên wekî Fûat Temo, Abdûlazîz Baban, Cerahzade Selîm tê de cih digirtin, di nav Kurdên li Stenbolê de çalaktiya xwe bi awayekî bi lez zêde kirin. Di hezîrana sala 1913’yan de kovara Kurdan a ku bi Tirkî-Kurdî mehane çap dibû ya bi navê “Rojî Kurd” derxistin. Pişt re navê vê kovarê bû “Hetawî Kurd.” Di vê kovarê de herî zêde mijara “perwerdehiyê” hatiye destgirtin. Di vê kovarê de dihat diyarkirin ku pêdiviyên Kurdan ên perwerdehiyê hene, ji bo ku van pêdiviyan bên pêşwazîkirin jî divêtiya hewldanên di mijarên ku dê van hewldanan bi kîjan rêbazan bi rê ve bibin, fikir pêşve dibirin. Ji bo ku zimanê Kurdî û wêjeya Kurdî bibe pirtûk, ji bo ku pêşveçûna Kurdan a civakî û zanyarî pêk bê, kirina xebatên di nav xwendekarên Kurd de bi damezirînerên têkiliyên baş afirandina rihê hevpar… û di mijarên bi vî rengî de xebatên girîng û hewldan kirine. Tevgera “Hêvî” di sala 1918’an de navê “Partiya Kurdan a Neteweyî” pişt re jî navê “Komîteya Îstîklal a Kurdan ” girt.

Di sala 1819’an de li Amedê “Cemiyeta Kurd Tealî” hat damezirandin. Vê cemiyetê li Elezîz, Dêrsim û Bedlîsê şax vekirin. Gelek parlementerên ku endamên vê tevgerê bûn hebûn û serokatiya wê jî Seyît Abdûlkadîr dikir. Seyît Abdûlkadîrê ku kurê Şêx Ûbeydûllah Nehrî bû, di sala 1896’an de tevlî Îttîhat û Terakkiyê bûbû, piştî demekê ji bo komîteya navendî hatibû hilbijartin. Seyîd Abdûlkadîrê ku di qedemeyên dewleta Osmaniyan de, di gelek peywirên girîng de cih girtibûn, dixwestin ku bi dewleta Osmaniyan ve girêdayî “ Kurdistaneke Xweser” bê damezirandin. Armanca komeleyê ev bû. Lê piştî demekê, alîgirên “xweseriyê” yên ku di nav tevgerê de cih digirtin, di mijara xweseriyê de li hemberî Abdûlkadîr derketin, ji tevgerê qetiyan û “Cemiyeta Teşkîlat-i Îçtîmayeyê” damezirandin.

Bi Cemiyeta Kurdistan Tealî ve girêdayî di sala 1919’an de “Cemiyeta Kurd Taamîmî Maarîfe û bi Cemiyeta Neşriyat, “Cemiyeta Jinên Kurd” hat damezirandin. Di her dû saziyan de zêdetir xebatên çandî hatine kirine. Weke ku tê dîtin, bi îlankirina Meşrûtiyeta 2. re Kurd bûne xwedî derfeta liv û tevgerên hêsantir û sazîbûyînên xwe yên ku gelek xebatên xwe yên bi nirx ava bikin. Ji van saziyan hinek jê demdirêj, hinek jê demkurt bûne. Lê hemû jî ji hêla gelê Kurd ve xwediyê erkeke girîng a dîrokî ne.

Ji aliyê din ve tê dîtin ku rewşenbîrên Kurd ên ku ji van xebatan re pêşengî dikirin, piraniya xebatên xwe li Stenbolê kirine. Sedema vê yekê jî ew e ku di wê serdemê de beşa ku mirov bikaribe bibêje rewşenbîrên Kurd hema hema hemû li Stenbolê dijiyan. Piraniya van rewşenbiran zarokên Kurdên arîstokrat ên ku berê serî hildane û ji aliyê dewletê ve neçar hatine hiştin ku li Stenbolê bijîn bûn. Ji ber ku li Kurdistanê derfetên perwerdehiyê tûnebûn, têgehên wekî kapîtalîzm, rojavabûnî, nûjenbûn, netewebûn û hwd. zêde neketibûn Kurdistanê. Ji ber ku neketiyê fêmkirin jî rêxistinbûyînên nûjen ên Kurdan ne ji aliyê Kurdên li Kurdistanê ve; ji aliyê Kurdên ku li Stenbol û derdorên wê rûdiniştin, ên ku piraniya wan li Ewrûpayê perwerde dîtibûn ve hatin avakirin. Ji xeynî vê yekê piraniya van rewşenbiran an ji Îttîhat û Terakkiyê re sempatiyek hîs dikir an jî rast e rast bi Îttîhat û Terakkiyê ve girêdayî çêdikirin.
Me bi kurtayî qala rewşenbîr û rêxistinên ku wan afirandibûn kir. Lê gelê Kurd tenê ji van rêxistin û rewşenbiran pêk nedihat. Kurdên ku ji roja yekemîn a desthilatiya CÎT'ê nerazîbûn hîs kirine jî hebûn. Van kesan nerazîbûnên ku hîs dikirin bi çi awayî be, derbirîne. Hinekan jî li hember Cemiyeta Îttîhat û Terakkiyê serî hildane.

## WANE 34.

### Pirsên Amadekariyê

1- Kurd çima di bin pêşengiya êla Hemawendê de rabûn serhildanê?
2- Konfederesyona Milan xwedî çi taybetmendiyan e?
3- Çima Osmaniyan dixwest Konfederesyona Milan ji jiyana koçerî derbasî jiyana nişte cih bike?

### SERHILDANA HEMAWENDÊ (1908

Îttîhat Terakî bi darbeyekê Siltan Abdûlhemîd ji rêveberiyê dûr xist û desthilatdariya Împaratoriyê xiste destê xwe. Ji bo ku îtîfaqa Kurdan bi Abdûlhemîd re hebû, dûr xistina Abdûlhemîd bûbû sedema nerazîbûna Kurdan. Piştî Îtîhat Terakî bû desthilatdar rengê wê yê pêkutiyan jî derket holê. Van pêkutiyan nerazîbûna Kurdan gihand asta herî jor. Li ser vê nerazîbûyînê Kurdên derdora bajarê Silêmanî bi pêşengiya bavê Şex Mahmûdê Berzencî Şêx Saîd serî li rayedarên dewletê dan û nerazîbûna xwe anîn ziman. Di vê serlêdanê de ji dewletê xwestin ku ji bo çareseriya van nerazîbûyînan ji hêla dewletê ve hinek tevdîr bêne girtin.

Kurd piştî vê serîlêdanê demekê li benda hewldanên dewletê man, lê mixabin ji hêla dewleta Osmaniyan ve tu gavek nehat avêtin. Kurd neçar man ku di bin pêşengiya Êla Hemawend de dest bi serhildanê bikin. Êla Barzanî û Zebariyan jî piştgiriya vê serhildanê kirin. Lê disa jî ev serhildan zêde bandorker nebû. Di demeke kin de rêveberiya Osmaniyan Şêx Saîd û kurê wî Şêx Ehmed û yên ku di serîlêdanê de nerazîbûyîna xwe ya li hemberî Osmaniyan anîbûn ziman tev girtin. Ev kes bi lezgînî li Mûsil hatin darizîn û di demeke kinde hatin dardekirin.
Di destpêka serhildanê de dardekirina rêberên serhildanê bû sedema têkçûna serhildanê. Lê nerazîbûyîna van dardekirinan dibe sedem û bingeha gelek bûyeran.

### SERHILDANA ÎBRAHÎM PAŞAYÊ MILANÎ (1908-1909)

Konfederasyona Milan li Kurdistanê ji konfederasyonên êlan yên herî kevn û girîng bû. Di dîroka Kurdan de cihekî wê yê giring heye. Di mijara Împaratoriya Mîtaniyan de me gotibû ku ev împaratorî ji heft “milan”pêkdihat. Heft konfederasyonên (wê demê ji her yekê re digotin “mil”) êlên ku Împaratoriya Mîtaniyan ava kiribûn ji wan yek jî konfederasyona Milan bû. Navê xwe jî ji wir digre.

Herêma di navbera çiyayên Dêrezor, Halep, Riha,Mêrdin û Sincarê de wargeha jîna êlên girêdayî konfederasyona Milan e. Ev êl bi sed salan bi hev re jiyîn e û ji bo xwe ji êrîşên derve biparêzên di navbera xwe de konfederasyoneke êlan pêkanîne. Nêzikî sih êlan di vê konfederasyonê de cih digirtin.

Weke berê jî me behs kiribû di destpêka sedsala 19. de dewleta Osmaniyan ji bo ku êlên Kurd yên koçber derbasî jiyana niştecihî bike polîtîkayên cûr be cûr bikar dianîn û zext û zora xwe her roj zêde dikir. Dê bi derbasbûyîna niştecihî êl biketina bin venêrîna, bac û leşker dê bi hêsanî ji wan bihata girtin. Ji êlên endamên konfederasyona Mîlî hinek di 1707'an de li Mêrdînê, hinek jî 1711'an de li Rakkayê hatin bi cih kirin. Lê ev êl hînî wê

erdnigariyê nebûn û di demeke kin de tev reviyan erdnigariya xwe ya berê. Dewleta Osmaniyan ji bo çareserkirina pirgirêka niştecihî ya van êlan di 1779'an de ji bo serokê van êlan dest bi belavkirina payeya “Paşa”tiyê kir. Ji van yek ê ku rûtbeya paşatiyê girtibû serokê konfederasyona Milan Temîr Paşa bû. Temîr Paşa bi piştgiriya dewletê li navenda konfederasyona Milî Wêranşehrê bû xwediyê hêz û erkeke xurt bû. Dewletê dixwest bi destê Temîr paşa êlên girêdayî konfederasyona Milî derbasî jiyaneke niştecihî bike. Lê ji hêlekê ve jî ji ber ku desthilatiya Osmaniyan li herêmê kêm bû, ji bihêzbûna Temîr Paşa jî bifikarbûn. Demek şûn de ji bo ku Temîr Paşa nebe xwediyê hêzek mezin li hember wî ketin nava hewldanan û xwestin ku pêşî li bihêzbûna Temîr Paşa bigrin.

Artêşek a ku ji Tirkmen û Ereban pêk dihat bi ser Temîr Paşa ve rêkirin. Temîr paşa ev artêş têkbir û desthilatiya xwe ya herêma di navbera Heleb û Amedê de mîsoger kir. Ev pêşketina Temîr Paşa ji bo Osmaniyan gelekî xeter bû. Hewcedarî bi tevdîrên hîn cidî dîtin. Di 1791'an de ji herêma Bexda, Heleb, Meletî, Amedê artêşeke hîn mezin amade kirin û bi ser Temîr Paşa ve rêkirin. Temîr Paşa di vê êrîşê de têk çû û revî Helebê. Birayê Temîr Paşa Îbrahîm Paşa bû serokê konfederasyona Milan.

Di serdema Îbrahîm Paşa de êla Milan di bêdengiyê de ma. Di 1820'an de kurê Îbrahîm Paşa Eyûp Paşa bû serokê konfederasyonê. Di serdema Eyûp Paşa de konfederasyona Milan careke din bi hêz bû û serbixwe tevgeriyan. Osmaniyan careke din bi êrîşekê destwerdana serbxwebûna wan kir. Di vê êrîşê de Eyûp Paşa têkbirin û avêtin zîndana Amedê. Eyûp Paşa di zîndanê de ji qehra mir.
Kurê Eyûp Paşa Temo (Temîr) Paşa di şerê di navbera Kavalalî Mehmet Alî Paşa yê ji Misirê û Osmaniyan de piştgiriya Kavalalî Mehmet Alî Paşa dike û di qada şer de jiyana xwe ji dest dide. Di 1835'an de Kurê wî Mahmûd Paşa dibe serokê konfederasyona Milan. Serdema Mahmûd Paşa di bêdengiyê de derbas dibe. Piştî mirina Mehmûd Paşa di 1863'an de kurê wî Îbrahîm Paşayê Milî dibe serokê konfederasyona Millî.
Îbrahîm Paşa kesayeteke bihêz û bandorker bû. Di demeke kin de xwe bi êlên derdora xwe dide qebûl kirin. Her tim ji bo şer artêşeke wî ya amade hebû. Sê hezar artêşa wî ya siwarî hebû. Piştgiriya sih  êlî girtibû. Bi hêz û pêkutiyên xwe ji neçariyê be jî piştgiriya êlên derdora xwe yên ne girêdayî konfedarasyonê jî girtibû. Heleb, Riha û rêyên bazirganiyên ku di vê herêmê re derbasî Anatolyayê dibûn girtibûn bin venêrîna xwe.

Îbrahim Paşa, bi êlên herêma di navbera Wêranşehir û Rihayê de herêma Dûgerinan, herêma di navbera Haran û Rihayê de herêma Bêzikan  a di navbera Mêrdîn û Rakayê de Herêma Kîkan û di herêma di navbera Pirsûs û Kobanê de îtifaqek bi êla Berazan re pêk anîn. Tifaqa van êlan him ji hêla erdnîgariyê ve him jî ji hêla serjimarî ve gelekî girîng bû. Lihevkirina van êlan ji bo desthilatî û venêrînkirina herêmê gelekî girîng bû. Îbrahîm Paşa bi vê tifaqê ji Helebê hetanî Rûbarê Feratê herêm tev xist bin venêrîna xwe. Osmanî ji vê rewşê gelekî acizbûbûn. Biryara mişextkirina Îbrahîm Paşa ya Sêwasê dan. Îbrahîm Paşa ji bo ku di şer de hêza xwe winda neke neçar ma ku vê biryarê pêk bîne û here Sêwasê. Demekê şûnde vegeriya û desthilatiya xwe heta Erzirûm û Erzînganê dorfireh, xûrtir û bandorker kir.

Abdûlhemîdê ll. Di 1876'an de bû Siltanê Osmaniyan. Siyaseta Abdûlhemîdê ll. ji siyaseta Osmaniyan ya sedsala dawî cûdtir bû. Bi erênî nêzîkî hêzên herêmî dibû. Ji bo ku bikaribe pêşî li serhildanên Ermenî, Asûriyan û yên ne Mûsilman ên din bigre li ser navê Îslamiyetê dixwest bi Kurdan  re îtîfaqê çêke. Bi ser vê siyasetê têkilya îtîfaqa Kurd û Abdûlhemît pêş dikeve. Mîr û paşatiyê li Kurdan  belav dike û Alayên Hemîdiyê tên damezirandin. îtîfaqa

Îbrahîm Paşa û Abdûlhemîdê ll. ewqas germ dibe ku Abdûlhemît ll. ji Îbrahîm Paşa re dibêje kurê min û payeyê li ser payeyê dide Îbrahîm Paşa. Herî dawî di 1902'an de payeya Mirliva (Tûğgeneral) dide Îbrahîm Paşa. Îbrahîm Paşa li tevahiya Kurdistanê bû bandorker. Zext û pêkutiyên wî jî zêdetir bûn.

## SERHILDANA MILAN 1908'AN DESTPÊDIKE

Îtîhat Terakî di 23'ê Tîrmeha 1908'an de bi darbeyekê desthilatdarî xist destê xwe. Îtîhat Terakî dest bi tûne kirina Abdûlhemît kir. Ev dihat wê wateyê ku ji bo Îbrahîm Paşa pêvajoyeke gelek bixeter dest pê dike. Hîn dû meh ser 23'ê Tîrmehê re derbas nebûbûn Îbrahîm Paşa diyar kir ku desthilatdariya Osmaniyan a nû nas nake. Di herêma xwe de desthilatiya xwe tekuz kir. Rêberên Îtîhat Terakî bi hêza Îbrahîm Paşa dizaniyan, ji ber vê jî neçar bûn ku bi pîvan nêzîkî Îbrahîm Paşa bibin. Di serî de xwestin ku derdora Îbrahîm Paşa vala bikin û wî bi tenê bihêlin.

Êla ereban ya bi navê Şemîr (Şemmer) bi sed salan bû neyartiya Milaniyan dikir. Îtîhat Terakî xwest vê neyartiyê bikarbîne. Bi hinek bertîlan ev êl bi ser Îbrahîm Paşa ve rê kirin. Xeynî vê di bin fermandariya Neşet Paşa de 22 tabûr leşker jî bi ser Îbrahîm Paşa ve rêkirin. Îtîhat Terakî dît ku Îbrahîm Paşa li hember van hêzan dikare li berxwe bide artêşa xwe ya Mereş, Heleb û Rihayê jî amade kir û weke takwiye bi ser Îbrahîm Paşa ve rêkir û şerekî dijwar destpêkir. Bi destpêkirina vî şerê dijwar re êla Bedîliyan, Dûgerînan û Gêsanê hêzên xwe ji piştgiriya Îbrahîm Paşa vekişandin û piştgirî dan hêzên Osmaniyan. Piştî demeke hinek êlên endamên konfederasyona Milan jî xiyanet li Îbrahîm Paşa kirin û refê xwe gûherandin.

Di encamê de Îbrahîm Paşa bi van xiyanetan li hember vê hêza mezin nikaribû zêde li berxwe bide û têk çû. Ji bo ku pêşî li qirkirinan bigre bang li êlan kir ku her êl bila li çara serê xwe binêre û parastina xwe ya rewa bike. Îbrahîm Paşa û tevahiya malbata xwe ji bo derbasî Sîncarê bibin bi rêketin. Lê mixabin bi rê de bi nexweşiya dîzanteriyê ketin. Îbrahîm Paşa bi vê Nexweşiyê li Nisêbînê rehmet kir. Malbata wî jî dîl ket destê dewletê. Kurê wî yê bi navê Abdûlhemît hate dardekirin. Her pênc kurê wî yên din jî heryekî pênc sal cezayê zîndanê girtin.

Konfederasyona Milî ya piştî 1910'î hêdî hêdî bi serxwe ve dihat. Kurê Îbrahîm Paşa Mahmûd Paşa kesayeteke xûrt û bi hêz bû. Ji bo bi hêzbûyîna konfederasyonê roleke girîng dilîst. Çend sal derbas nebûn ku şerê Cîhanê yê yekemîn 1914'an de destpêkir. Dewleta Osmaniyan weke tevdîr di destpêka şer de Mahmûd Paşa xiste zîndanê. Piştî ku şer bi dawî bû Mahmûd Paşa ji zîndanê hate derxistin. Di 8'ê Hezîrana 1920'an de Miliyan careke din serî Hilda.18'ê Heziranê de ev serhildan jî hate perçiqandin. 24'ê Tebaxê de careke din serî hildan, lê di vê serhildanê de jî têk çûn û neçar man ku birevin Sûriyê. Bi vê têkçûyînê serhildana Miliyan jî bi dawî dibin.

Îtîhat Terakî, beriya ku bibe desthilatdar di şîrove û dûrişmeyên xwe de qala afirandina civakek nû dikir. Digotin dê di vê civaka nû de Papaz, Haham û Mele mil bidine hevdû. Ji bo yekbûyîna civakê rihê Osmanîtiyê derdixistin pêş. Li gor dîtina wan di nav vî rihê Osmanîtiyê de dê her netewek bi rengê xwe bijiya. Piştî ku Îtîhat Terakî desthilatdariya xwe mîsoger kir êdî hewcedariya wê bi van şîroveyan û peyvan nema. Tenê armancek wan ma ew jî tekuzkirina desthilatdariya nîjadperestiya Tirkîtiyê bû. Piştî 1912'an şûn de di Îtîhat Terakî de di şûna polîtîkaya “Osmanîtiyê” de polîtîkaya “Tirkîtiyê” pêşket. Teoriya

Tirkîtiyê jî ji hêla Ziya Gokalp û Yûsûf Akçûra ve hate nivîsandin. Di 1913'an de polîtîkaya Tirkîtiyê di teorî û pratikê de kete meriyetê.

Weke tê dîtin di 4-5 salan de di polîtîkayên Îtîhat Terakî de gelek gûhertinên mezin çêdibin. Ev gûhertin hinek bi sedemên hûndirîn ve, hinek jî bi sedemên derveyîn ve girêdayîne. Lê sedemên herî girîng di wê serdemê de li her derê windakirina erdê bû. Li gelek deveran gelên bindest dest bi serhildanan kiribû û tev jî biserdiketin. Her ku diçû dewleta Osmaniyan piçûktir dibû. Ev jî Îtîhat Terakî dixist nav fikaran. Polîtîkaya Tirkîtî û Tûraniyê ji bo xelasiyê weke çare dihat dîtin.

Îtîhat Terakî piştî ku armanca xwe ya “Tûranî”diyar kir ji bo ku bigêje vê armanca xwe dû polîtîka diyar kirin; yek tekuzkirina desthilatdariya Tirkan, dû afirandina bûrjîwaziya Tirk. Ji bo ku di bin sînorên Osmaniyan de serweriya Tirkan pêk were hewceye ku Tirkîtî di ser netewên din re bê ferzkirin. Bi vê polîtîkayê hêvîdarbûn ku neteweyên weke Kurd, Laz û Çerkez bi rihetî Tirkbûyînê bipejirînin. Lê gelên ku ji wan hêviya Tirkbûyînê nedikirin gelên weke Ermenî û Rûm jî hewcebû bihatina tûne kirin. Li gor wan encax bi vê rêbazê dê karîbûna serweriya Tirkan mîsoger bikin.

Polîtîkayên Tirkbûyînê ji hêla Îtîhat Terakî ve dihatin afirandin lê ji bo pêşketina vê siyasetê kesên ku bi eslê xwe Kurdbûn dihatin bikaranîn. Kurê Saît Paşayê Sêwêrekî Silêman Nazîf di dema Îtîhat Terakî û di dema komara nû de pêşangiya vê siyasetê dikir. Silêman Nazîf di nivîsa xwe ya 7'ê Avrêla 1912'an de dê bigota “zimanê Kurdî tûne ye”. Silêman Nazîf dixwest ku Kurd bibin Tirk. Li gor Silêman Nazîf “Tirkbûyîn ji bo Kurdan şerefek e”. Ev li ser gelên din jî dihat ferzkirin. Ji bo ku ew jî “bibin mirov” hewcebû ku bibûna Tirk.

Polîtîkaya Îtîhat Terakî ya girîng a din jî afirandina bûrjûwaya Tirk bû. Ji bo serkeftina vê polîtikayê jî li hember sermayeya Ermenî, Rûm, Ereb, Bûlgar û hwd. gelek tevdîr hatin girtin. Ji bo serkeftina vê polîtîkayê bi gelek provaksiyonan (bi taybetî jî li Stenbol) mal û milkê van gelan ji dest wan hate derxistin. Ji xeynî Tirkan maf û rêxistinbûyîna gelên din dihatin astengkirin. Ev herdû polîtîka ji bo Îtîhat Terakiyê mijara man û nemanê bûn.

Weke her polîtîkayê vê polîtîkayê jî alîgirê xwe jî, hemberî xwe jî afirand. Di tevahiya gelan de dûbêndiyek çêbû. Ev rewş ji bo Kurdan jî derbasdar bû. Di nav Kurdan de jî dûbêndiyek pêşket. Hinek Kurdan Tirkbûyîn pejirand, hinek Kurdan jî weke hergavê li hemberî vê polîtikayê li berxwe dan û dest bi serhildanan kirin.

**WANE 35.**

**Pirsên Amadekariyê**

1- Kurdên başûrê Kurdistanê li li hemberî kîjan polîtîkaya osmaniyan rabû serhildanê?
2- Gotinek heye dibêjin; ger baweriya te û ya dijminê te ne yek be, wê demê di destê te du sîlehên hene. Yek baweriye, yek jî ziman e. Lê ger baweriya te û ya dijminê te yek be, wê demê sîleha te dimîne yek, ew jî ziman e.Vê gotinê bi sedemên têkçûna serhildanan ve girêdayî binirxînin!
3- Dijmin çawa kariye bira li hemberî bira bide şerkirin?

## SERDEMA ÎTÎHAT TERAKÎ Û SERHILDAN SERHILDANA ŞÊX ABDÛSELAM BARZANÎ YA 2. (1913)

Piştî şer û pevçûnên 1908'an êlên başûrê Kurdistanê û dewleta Osmaniyan lihevkiribû. Li ser vê lihevkirinê bêdengiyek çêbûbû. Vê bêdengiya heta sala 1913'an dom kir. Di sala 1913'an de piştî ku Silêman Nazîf (bi eslê xwe Siwêrekî ye) bû waliyê Mûsilê careke din nakokiyên berê derketin holê. Sedema nakokiyan ya sereke polîtîkayên Îtîhat Terakî yên Tirkperest bûn. Silêman Nazîf jî parêzvaniya vê polîtîkayê dikir. Wê demê nêzîkî tevahiya Kurdistana başûr girêdayî walîtiya Mûsilê bûn. Kurdên başûr li hember Silêman Nazîf û polîtîkayên Tirkperestiyê nerazîbûna xwe anîn ziman. Lê ev nerazîbûyîna wan li ber çav nehat girtin. Kurd neçar man ku di bin pêşengiya Şêx Abdûlselam de serî hildin.

Silêman Nazîf ji bo dîl girtina Şêx Abdûlselam artêşek rê kir herêma Barzan. Hêzên Abdûlselam nekarîbûn li hemberî vê artêşê demeke dirêj li berxwe bidin û têk çûn. Şêx Abdûlselam neçar ma bireve herêma Kurdistana Rojhilat. Şêx Abdûlselam li rojhilat ketibû bin stara Seyid Tahayê nebiyê Şêx Ûbeydûllah. Li wir bi Sîmko re (Îsmaîl Axayê Şikakî re) têkilî danîn û wî ji bo têkilî danina bi Rûsan re alîkarî xwest. Bi alîkariya Sîmko bi Rûsan re têkilî hat danîn. Şêx Abdûlselam, Sîmko û hinek rayedarên Kurdên din ji bo hevdîtina bi temsîlkarên Çarê Rûs re çûn Tîflîs. Di vê hevdîtinê de Kurdan ji Rûsan alîkarî xwest. Şêx Abdûlselam dixwest ku bi hinek îtîfaqan eniyeke mezin çêke û serhildaneke xûrt bide destpêkirin. Serkeftina serhildanê bi tenê serê xwe pêkan nedidît. Lewre girîngî dida îtÎfaqan û bi taybetî jî piştgiriya Rûsan.
Piştî ku hevdîtin hatin kirin heyeta Kurd vegeriya. Di vegerê de li Salmasê Sîmko û Abdûlselam ji hev veqetiyan. Her yek dê derbasî herêma xwe bûbûya. Şêx Abdûlselam berdewama rêwîtiya xwe de wexta ku ji gundê Gençgeçînê herêma Somayê girêdayî bajarê Ûrmiyê derbas dibe xwediyê gund Sofî Abdûllah wî vexwenê mêvandariya xwe. Şêx Abdûlselam vexwena Sofî Evdila qebûl dike û dibe mêvanê wî. Di derengiya şevê de di xewa şîrîn de Şêx Abdûlselam û sê parazvanên wî ji hêla sofî Evdila ve dîl tên girtin û di herêma Sîro de radestî Tirkan tên kirin. Tirk Şêx Abdûlselam û sê Parazvanên wî dibin Mûsilê. Li Mûsil tên darazîn û di Çileya 1915'an de tên dardekirin. Bi vê dardekirinê serhildana Şêx Abdûlselam bi dawî bû.

## SERHILDANA BEDLÎSÊ (XÎZAN) (1913_1914)

Ji ber ku Siltanê Osmaniyan Abdilhemîdê 2. di heman demê de xelîfeyê Îslamiyetê bû, dûrxistin û mişextkirina wî bûbû sedema nerazîbûyîna gelek rêveberên Kurdan. Ji ber vê nasnameya xalîfetiya Îslamiyetê bû ku gelek Kurdan di serhildanan de nedixwestin li

hemberî artêşa xalîfe (Osmaniyan) şer bikin û dibû sedema têkçûyîna serhildanên Kurdan. Nasnameya xalîfetiyê ji hêla neteweyên bin banê Osmaniyan ve weke sîwan dihat dîtin. Lewra dûrxistina Abdûlhemîd weke destwerdana vê sîwanê dihate dîtin. Li hemberî vê destwerdanê bertekên herî hişk jî ji hêla Kurdan ve dihatin nîşandan. Dewleta Osmaniyan di şerên Balkanan de û şerên din de her-roj têk diçû. Van têkçûyînan bi xwe re pirsgirêkên hûndirîn mezintir dikirin û balavbûyîna Osmaniyan jî zûtirîn dikir. Lê ew hişmendî û zanebûyîneke dewleta Osmaniyan tûne bû ku ji van pêkhatinan dersan derxin û tevdîrên aqilanê bigrin. Bi mezinbûyîna pirsgirêkan re rayedarên dewletê jî serî li tevdîr û polîtîkayên hişk didan. Dewleta Osmaniyan çiqas têk diçû ewqas bi tevdîrên hişk qirika gel dişidand. Van polîtîkayên hişk jî her roj bertekên gel zêde dikirin. Qûtbûyîn û ji hev dûr ketina dewlet û gel her roj zêdetir dibû.
Acizbûyîna Kurdan tenê ji dewleta Osmaniyan tûnebû, di heman demê de ji birêxistinbûyîna Ermeniyan jî acizdibûn. Ermeniyan nêzikbûyîna şerê cihanê ya yekemîn didîtin û xwe li gor wî birêxistin dikirin û amade dikirin. Li gor polîtîkayên emperyalîstan Ermenî li Anatolyayê qozek herî girîngbûn. Emperyalîstan di xwest ji vê rewşê sûd wegrin, lewre gelek bi erênî û bi vaatan nêzîkî Ermeniyan dibûn. Ermeniyan jî baweriya xwe bi emperyalîstan dianî ku dê bi alikariya wan ya ji bin serweriya Osmaniyan xwe xelas bikin. Ji ber ku Ermenî bi piranî di erdnigariya Kurdistanê de û di nav Kurdan de dijiyan, ev hesab û plansaziyên Ermeniyan Kurd jî eleqedar dikirin. Lê ev eleqedarî bi hişmendiya pêşxistina îtîfaqê ya bi hişmendiya fikarê ku dê Ermenî Kurdistanê zeft bikin pêşket. Ev jî dibû sedema pêşketina bertekên Kurdan yên hişk. Her ku diçû bertekên herdû gelan li hemberî hevdû zêde dibûn. Xwesteka dewleta Osmaniyan ya herî sereke jî ew bû ku bi van bertekan pêkdihat. Herdû gelên ku bi hezaran sal cîran bûn û di nav aştiyê de jiya bûn bi polîtîkayên emperyalîst û dewleta Osmaniyan a dagirker dibûn neyarên hevdû.

Ev rewşa heyî û polîtîkayên Îtîhat Terakî yên nîjadperestiyê bûn sedema serhildana Kurdan ya Xîzanê. Serhildan bi pêşngiya Mela Selîm, Seyîd Alî û Şêx Şabedîn dest pêkir. Pêşengên serhildanê diyar kirin ku "rêbertiya Tirkan Kurdan diperçiqîne û welat difroşin biyaniyan"
Her sê rêberên serhildanê jî di herêmên xwe de xwediyê erkek mezin bûn. Di wê demê de Kurd bi xûrtî girêdayî rêberên olî bûn. Lewre bertekên van her sê oldaran yên li dijberî dewletê bandor li derûdor jî dikir. Lê ji xeynî nasnameya wan a olî nasnameyeke wan a din jî hebû. Bazil Nikîtîn, Mela Selîm û Seyîd Alî di heman demê de endamên rêxistina "Kurd Teovûn û Terakkî Cemiyetî"bûn. Ango di serhildanê de tenê nasnameya olî tûne bû bi giranî nasnameya Kurdîtî jî hebû.

Serhildana ku di 1913'an de li Xîzanê destpê kir di demeke kin de dorfireh bû. Potansiyela wê ya belavbûyîna tevahiya Kurdistanê hebû. Ku ev pêkbihata dê ev serhildan bûbaya kabûsa Osmaniyan. Rayedarên Osmaniyan jî ev xetere didîtin. Lewre wezîrê karê hûndirîn Talat Beg bi xwe mûdaxileyî vê karbû û fermaneke hişk rêkir ji waliyên herêmê re ku li hemberî vê serhildanê tevdîrên hişk bigrin û bi tûndî bi ser serhildanê ve biçin.

Almanan dizaniyan dê di demeke nêz de şerê cîhanê derkeve. Osmanî wê demê nêzîkî Almanan bûn, bi Almanan re di nav îtîfaqê de bûn. Lewre îhtîmala belavbûyîna vê raperînê Alman jî xistibûn nav fikaran. Ji bo şerê cîhanê hêviyên Almanan di Osmaniyan de hebûn. Li gor planên Almanan dê Osmaniyan parazvaniya eniya rojhilat bikirane û di heman demê de jî dê pêşî li Rûsan bigirta ku Rûs negêhêjin deryaya sipî. Raperîna Kurdan ev hêviyên Almanan dişikandin. Lewre Almanan li hemberî vê raperînê piştgiriya Osmaniyan kir. Konsolosê Erzerûm û yê Trabzonê ji bo perçiqandina raperinê bi Îtîhat Terakî re tevgeriyan.

Artêşeke xûrt bi ser Bedlîsê ve rêkirin. Şervanên Kurdan li hemberî vê artêşê berxwedanek xûrt pêkanîn û 3'ê Avrêla 1914'an de navenda Bedlîsê zeft kirin. Di vê berxwedanê de nêzîkî 8 hezar berxwedêrên Kurd hebûn. Bi destxistina bajêr tev li bajêr belav bûn. Di nav bajêr de teng man li derveyî bajêr xeteke parastinê ava nekirin. Ji bo parastina bajêr ji hêla taktîk ve ev kêmaniyeke mezin bû. Dewleta Osmaniyan ev kêmanî baş bikaranî. Di serî de çaraliyê bajêr girtin û bi pêşketina gav bi gav careke din bajar ji dest Kurdan derxistin. Raperîn bi berdêleke giranbûha hate perçiqandin. Yên ku dîl hatin girtin jî piraniya wan hatin dardekirin.

Rêveberê serhildanê Mele Selîm xwe spart bin stara konsolosê Rûsan. Konsolosê Rûsan Mele Selîm parast, radestî Tirkan nekir. Lê piştî ku di demeke kin de şerê cîhanê yê yekemîn destpê kir Rûsan Mele Selîm radestî Tirkan kir. Tirkan di demeke kin de Mele Selîm dardekirin.

Ji rêveberên serhildanê Seyîd Elî jî reviya gundê Îrşatê yê girêdayî Ercîşê. Artêşa Osmaniyan ji bo girtina Seyîd Elî bi ser gund de girt. Li gund Ermeniyek bi navê Kazo girtin û pê îşkence kirin ku cihê Seyîd Elî bibêje. Lê Kazo bi îşkencê hat kuştin jî cihê Seyîd Elî ne got. Seyîd Elî ji demekê şûn de hate girtin û ew jî hate dardekirin.
Di têkçûyîna raperîna Bedlîsê de tiliya Rûsan jî heye. Di destpêkê de Rûs soza alîkariyê didin Mela Selîm, lê mixabin piştî ku raperîn destpê dike tû alîkariyekê nadin Kurdan .

Di raperîna Bedlîsê de bandora xelîfetiyê û Şerîatê zêde heye lê bandora hestên netewî jî herî kêm bi qasî wan heye. Ji rêberin raperînê Mela Resûl wexta ku tê dardekirin dibêje “ez gelekî şad û bextewarim ku dê gelê Kurd di demeke gelekî nêzde ji bin zilm û zora Tirkan rizgar bibe.” Ev minak karektera raperinê bi me dide fêmkirin. Weke tê gotin raperîneke paşverû nîne. Hebûna hêla wê ya olî nayê wê wateyê ku raperîneke paşve rûye.

**Sedemên têkçûna raperînê mirov dikare wisa rêz bike;**

1- Bername, plansazî û stratejiyeke wê ya xurt tune bû.
2- Plansaziya ku hatibû çêkirin li gor alikariya Rûsan hatibû çêkirin. Nehatina alîkariya Rûsan plana heyî serûbinî kir.
3- Piştî bi destxistina Bedlîsê ji bo parastina bajêr tenê di nav bajêr de teng mayîna şervanan.
4- Xiyaneta Şêx Reşîd ê birayê Seyîd Elî. Şêx Reşîd di derheqê amadekariyên serhildanê de dewleta Osmaniyan agahdar kiribû. Lewre Osmaniyan jî li gor wan agahiyan amadekariyên xwe bi xurtî kiribûn û karîbûn bi lezgînî destwerdanan bikin.

## WANE 36.

**Pirsên Amadekariyê**

1- Şerê cîhanê yê yekemîn bandoreke çawa li ser jiyana kurdan kir?
2- Çima kurd her dem bûne leşkerê dijminê xwe?
3- Peymana SYKES- PICOT çi bi kurda da windakirin?

### A- DI ŞERÊ CÎHANÊ YÊ YEKEMÎN DE KURD

Di sedsala **XX'**an de bûyera herî girîng ya cîhana me jiyankirî, şerê cîhanê yê yekmîn e. Şerê Cîhanê Yê Yekemîn, di navbera hêzên mezin yên cîhanê de, bi armanca parvekirina cîhanê di nava xwe de hatiye destpêkirin.
Gelê Kurd yek ji qûrbanê pêvajoya Şerê Cîhanê Yê Yekemîne. Welatê Kurdan ji destpêka şer **(1914)** heya sala ku şer qediyayî **(1918)** bûye qada şerên giran yên di navbera Îngîlîz, Rûsya û Tirkan de. Di vê pêvajoyê de li Kurdistanê şer û cengên herî giran yên dîroka mirovahiyê jiyankirin hatin pêkanîn. Xwîna bi sedhezaran Kurdên ji her temenî hat rijandin. Ji derveyî kuştina mirovan, ji ber rewşa şer gelê Kurd bi talanên aborî û êş û nexweşiyên çareseriya wan neyên peydakirin re rûbirû man.

Hêzên tevlî şerê cîhanê bûyîn yên weke Tirk, Îngîlîz û Rûsya her yek dixwestin li gorî berjewendiyên xwe yên netewî, ji gelê Kurd sûdê werbigrin. Ji ber ku di vê demê de rêveberiyeke ku bi karibe berjewendiyên gelê Kurd bi parêze û tevayî hêza Kurdan di yek eniyê de bide komkirin tunebû, hêzên mijara gotinê da ku êlên Kurdan li gor berjewendiyên xwe bidin şerkirin, di nava xwe de diketin pêşbirkê.

Rêveberiya Osmaniyan ya nû **(Jon Tirk)** weke di salên borî de gelek caran bûyî, bi riya bikaranîna hestên Mûsilmantiyê Kurd li hemberî Rûsya, Îngîlîz û Fransayê di eniyên pêş de didan bikaranîn. Li aliyê din beşek ji êl û qebîleyên Kurd jî ji aliyê Rûs, Îngîlîz û Fransizan ve bi dayîna sozên ku di dawiya şer de wê Kurdistaneke serbixwe yan jî xweser ji wan re damezrînin, di van şeran de dihatin şerkirin. Di encamê de her du aliyên şer jî Kurd xapandine û bûne sedema kuştina mirovên Kurd. Dîsa di vê pêvajoyê de pirî caran Kurd neçar mane ku ji ber hêzên navê wan derbasbûyîn, gund û bajarên xwe vala bikin û li welatên dûr yên biyaniyan bibin penaber. Ev rewşa henê, ji destpêka şerê cîhanê heya dawiyê gelek caran hatiye dûbarekirin.

Bi pêşketina şer re hêzên Kurd yên bawerî bi piropoxandeyên-dîayetên herdû aliyan jî ne anîn û di çiya û herêmên xwe de xwestin xwe biparêzin jî hebûn. Hejmarekê ji van êlan bersiv nedan biryara serferberiya dewleta Osmanî û xwe ji şer dûr hiştin. Kurdên li herêma Dêrsimê û piraniya Kurdên li başûrê Kurdistanê, li dijî bangên tevlîbûna şer berxwedanên tund nîşandan.

### B- Piştî Şerê Cîhanê Yê Yekemîn Rewşa Kurdistanê

Gelê Kurd, bi bedelên gelekî mezin ve ji Şerê Cîhanê Yê Yekemîn derketibû. Di aliyê aborî de jî zorî û zehmetiyên giran jiyan dikir. Ji ber mercên şer çandinî nedihat kirin û danûstandinên bazirganî pêk nedihatin. Ev jî dibû sedema xelayê. Ji ber vê çendê jî koçberiya ber bi cih û herêmên cûda ve çêdibû.

Di sala 1917'an de li Rûsya şoreş pêk hat. Ji bo wê Rûsya xwe ji şer kişand. Xwe vekêşandina Rûsya ya ji Şerê Cîhanê Yê Yekemîn **(1917)**, di Kurdistanê de rewş hinekî ber bi aramiyê ve biribe jî, bandora salên şerê cihanê yên destpêkê, hêjî demeke dirêj wê xwe bidabûya nîşan kirin.
Di dawiya Şerê Cîhanê Yê Yekemîn de, dewleta Osmaniyan di navbera Hêzên Hevkar de hatibû parvekirin. Têkçûna Osmaniyan bi Peymana Mondros **(1918)** mîsoger bûbû. Rêvebirên dewletê Enwer, Telet û Osman Paşa revîbûn û çûbûn ji derveyî welat. Di paytexta Osmaniyan de hêzên Îngîlîz û Fransiz bi cih bibûn. Lewazbûna bandora rêveberiya Osmaniyan, rê li ber serbestiyê vedikir. Rewşenbîrên Kurd jî zêdetir dikarîn li ser rewşa Kurdistanê û pirsgirêka Kurd nîqaş û civîna lidarbixin. Bi vê armancê hejmarek rêxistin ji bo çareserkirina kêşaya Kurd hatibûn damezrandin. Rêxistinên mijara gotinê hem li Stenbolê û hem jî li bajar û navçeyên Kurdistanê xwe birêxistin dikirin û xebat dimeşandin.
Dema ku rêxistinên Kurd yên binavê Cemiyeta Tealî ya Kurdistan, Teşkîlat-i Îçtîmaiye ya Kurd û Firqa Netewî ya Kurd ji bo azadiya gelê Kurd xebatên xwe dimeşandin, bermayên artêşa Osmaniyan yên di bin fermandariya Mistefa Kemal de, ji bo zindîkirina deshilatdariyeke nû ketibû nava hewildanan. Mistefa Kemal xebatên xwe yên ji bo damezrandina dewleteke nû, di Kurdistanê de dida meşandin. Serkeftina Mistefa Kemal, girêdayî alîkariya axa û Şêxên Kurdan bû. Ji ber vê çendê bi rayedarên Kurdan re peywendî pêkdianîn. Di destpêkê de ev peywendî li ser navê Siltanê Osmaniyan pêk dihatin. Ji ber vê sedemê alîkariya Kurdan bi asayî bidestdixist.

Demekê şûnde niyeta Mistefa Kemal ya di bin rêbertiya xwe de damezrandina dewleteke Tirk hatibû têgihiştin. Ji vir pêde jî Mistefa Kemal serî li rêyên xapandinê da. Di axaftin û civînên xwe yên bi axa û Şêxên Kurdan re diyar dikir ku dewleta damezirîne wê dewleta hevbeş ya gelê Kurd û Tirk bûya. Di vê dewletê de wê ev herdû gel xwediyê heman mafan bûna.
Gotinên Mistefa Kemal di vê demê de bal dikişandin. Ji ber vê çendê gelê Kurd bi her awayî destek da tevgera Mistefa Kemal. Şerên li dijî Îngîlîz, Fransiz û Yewnaniyan hatin dayîn, bi alîkariya Kurdan biserkeftine.
Rewşa parçeyên din yên Kurdistanê ji yên Bakurê Kurdistanê ne gelek cêwazbû. Heman nêzîkatiyên xapandinê di aliyên Başûr û Rojhilatê Kurdistanê de jî têne dîtin. Di van parçeyan de hêzên Îngîlîz û yên Îranê da ku gelê Kurd ji tevayî mafên civakî û demokratîk bê par bihêlin, her cûre rêyên ku heyîn bikartanîn.
Ev xwesteka ji hemû mafên însanî bêpar hiştinê, rastî nerazîbûnên tûnd yên gelê Kurd dihatin. Gelê Kurd li bakur, başûr û Rojhilatê Kurdistanê li dijî zilm û zoriya dagirkeran dest bi serhildanan kir.


## PEYMANA SYKES- PICOT



Di serdema şerê cîhanê yê yekem de dewletên hevkar perçekirina dewleta Osmanî anîbûn rojevê. Di salên 1915'an de Bîrîtanya nîvgirava Erebistanê dagir kiribû. Li dijberî Osmaniyan Şerîf Hûseyînê Mekeyî têk vedida. Di vê rekê de dê erdingariya Iraq û Fîlîstîn xistibûya destên xwe. Wê wisa dewleteke Ereb di bin destê xwe de ava kiribûya. Ji bo ev pêk were Şerîf Hûseyînê Mekeyî û nûnerê Bîrîtanyayê serfermandarê desteya bilind ê Misrê McMahon de peymanek veşartî hate çêkirin. Firansa bi vê peymanê hesiya û xwest peymanek nû were çêkirin. Li ser vê bi erêkirina Rûsyayê jî di navbere Fransa, Bîrîtanya û Rûsyayê de peymanek nû hate çêkirin.

Ev peyman ji hêla nûnerê Fransayê General Ceorge Picot û nûnerê Bîrîrtanyayê Mark Sykes ve Gûlana 1916'an de li Kahîre hatibû imze kirin. Lê navê xwe yê resen peymana Asyaya biçûk e.
Li gorî vê peymanê
Trabzon, Erzerûm, Wan, Bedlîs û başûrê rojavayê Anatolyayê dê ji Rûsan re bimîne.
Herema Rojavayê Bahra Spî, Edene, Dîlok, Rûha, Amed, Mûsil û peravên Sûriyê wê ji Fransizan ra bimîne.
Kendavên Heyfa, Akka, Bexda û Başûrê Mezopotamya ji Bîrîtanya re bimîne.
Li ser Erdingariya ku Fransiz û Bîrîtanaya bi dest xistine an dê dewleteke konfederasyona Ereban an jî dewleteke Ereb were avakirin. Dê Îskenderûn bibe kendaveke serbest. Ji ber ku Filîstîn erdeke pîroze dê di bin rêveberiyeke nav netewî de bimîne. Ji ber ku di sala 1917'an de şoreşa Rûsya pêşket, Rûsya xwe ji vê peymanê vekişand û ev peymana vêşartî ji hêla Lenîn ve hate eşkere kirin.

Piştî ku Rûsya xwe ji vê peymanê kişan, di sala 1920'an de konferansa San Remo hate çêkirin. Sûriyê ji Fransayê re dima û Mûsil, Iraq jî ji Bîrîtanyayê re dima. Di Sewrê û Lozanê de jî ev rewş careke din hate rojevkirin. Kurê Şerîf Hûseyîn Faysal di sala 1920'an de padîşahê Ereban, Sûrî ava kir. Lê di Tîrmeha sala 1920'an de Fransız ketin Şamê û Padişah Faysal ji wê derê derxistin. Qiral Faysal çû Baexdayê û li wê derê ji hêla Bîrîtanyayê ve bû Qiralê Iraqê. ***Bi Peymana Sewrê, Lozan û Enqereyê sînorên KURDISTANÊ yên îro hatin xêzkirin.***




## C-Di Vê Sedsalê De Bi Armanca Jiyaneke Azad Serhildanên Gelê Kurd Yên Hatin Li Darxistin Ev in:

### SERHILDANA ŞÊX MEHMÛDÊ BERZENCÎ




Piştî Şerê Cîhanê Yê Yekemîn Şêx Mehmûdê Berzencî, ji aliyê Îngîlîzan ve 1'ê Mijdara **1918'an** weke qiralê Eyaleta Silêmaniyê hat ragihandin. Di vê dema mijara gotinê de Iraq ji aliyê Îngîlîzan ve hatibû dagirkirin. Serokêlên Kurdan yên vê herêmê da ku bi tevayî ji bin dagirkeriya Tirkan rizgar bibin, deshilatdariya Îngîlîzan dipejirandin. Şêx Mehmûd Berzencî nameyeke ku li ser navê çil rêberên Kurd hatî nivîsandin raberî berpirsyarên Îngîlîzan kir û di vê nameyê de daxwaza parastinê û Kurdistaneke otonom-XWESER dihatekirin.

Şêx Mehmûd, piştî ragihandina qiraliyetê, dixwest tevayî Eyaleta Mûsilê bi Kurdistana otonom ve bide girêdan. Bi rûniştandina deshilatdariya Îngîlîzan ya di herêmê de, qada xebatên Şêx Mehmûd hêdî hêdî ji aliyê Îngîlîzan ve dihatin bisînorkirin. Ji vir û pêde Îngîlîzan rêveberiya herêmê di destê xwe de kom dikirin. Girêdayî vê pêşkeftinê hinek deverên di destê Şêx Mehmûd de bi zorê jê hatin standin.
Di vê rewşa nû ya derketî holê de, şer û nakokiyên navxweyî yên di navbera êlên Kurdan de roleke girîng dileyîst. Îngîlîzan ji vê rewşê sûd diwerdigirtin û deshilatdariya Şêx Mehmûd her ku diçû didan tengkirin. Di vê pêvajoyê de bê baweriyeke eşkere di navbera Kurd û Îngîlîzan de hebû.
Di derketina vê rewşê de xebat û leyîstokên Tirkan yên rasterast an jî bi rêya hinek rayedarên Kurd pêkdihatin jî, bibandor dibûn. Pirsgirêka Mûsilê di holê de bû. Ji bo bidestxistina vî bajarî û dewlemendiyên wê, têkoşîneke dijwar di navbera Tirk û Îngîlîzan de berdewam dikir. Van hêzên mijara gotinê pir caran dixwestin Kurdan li gorî daxwaz û berjewendiyên xwe bixebitînin. Tirkan hewil didan da ku Şêx Mehmûd li dijî Îngîlîzan bidin şerkirin. Ji bo qezençkirina Kurdan , bi Şêx Mehmûd re peymanekê didin îmze kirin. Di vê peymanê de Kurdistaneke serbixwe ya di bin serokatiya Şêx Mehmûd de dihat pejirandin. Ji bo pêkanîna vê jî, her awayê alîkariyê wê bihatiba dayîn.
Hewildan û kiryarên rayedarên Îngîlîz yên li hember Kurdan , dibûn sedemên nerazîbûnan. Bi vê helwesta nerazîbûnê re, Îngîlîzan mafên herêma Silêmaniyê zêdetir bi sînor dikirin. Ji bo vê herêmê biryara pêkanîna sazûmaniya mêtîngehên din hat girtin. Ev jî dihat wateya paşve girtina mafên pêşiya demekê ji bo herêma Silêmaniyê hatin naskirin.
Di van mercan de li herêma Silêmaniyê rewşa aloz her ku diçû zêdetir dibû. Bêzariyên girseyên gel di bihara **1919''an** de vegeriya serhildanê. Di serê meha Nîsanê de li herêma Behdînan **(Zaxo)** û li Barzan jî êlên Kurd li dijî deshilatdariya Îngîlîzan dest bi serhildanê dikirin.
Rewşa li Başûrê Kurdistanê derketî holê, bi balkêşî ji aliyê Kurdên bakur û rojhilat ve jî dihat şopandin. Ji bo tevgera azadiyê li vê derê bigihe armanca xwe, peyamên alîkarî û piştgiriyê diweşandin. Bi armanca vê piştgiriyê serokê êla Aworman Mehmûd Xan, 20'ê Gûlana **1919'an** de êrîşeke ji nişka ve bir li ser hêzên Îngîlîz yên li Silêmaniyê. Ev êrîş bû destpêka şerê çekdarî yê li dijî hêzên Îngîlîz.

Şêx Mehmûd jî di aliyê xwe de **23'ê Gûlana 1919'an** bi hêzên çekdar yên Kurd ve, êrişî qesra fermandarê Îngîlîz yê Silêmaniyê kir. Ew û hemû alîkar û leşkerên Îngîlîz dîl girtin û xistin zindanê. Bi vê bûyerê re serxwebûna Başûrê Kurdistanê îlankir. Ala Îngîlîzan ya bi qesrê ve daliqandî anîn xwar. Li şûna wê ala Kurdistanê ya li ser zemîneke kesk nîv heyîveke sor heyî bicihkir.
Ev tevgera Şêx Mehmûd ji aliyê Kurdan ve dihat destek kirin. Şêx Mehmûd qada bandora xwe fireh kir. Xwe gihand heya nêzîkî Kerkukê. Li ser rêya Kerkuk êrîş bir ser hêzên Îngîlîz yên biçekên giran dihatin parastin. Hêzên mijara gotinê hatin belav kirin. Serkeftinên dihatin bidestxistin dibûn sedema mezinbûna artêşa Şêx Mehmûd. Piştî demeke kurt di herêma Çemçemal de jî serhildanekê rûda. Nerazîbûnên li dijî Îngîlîzan belavî herêmên din jî dibûn.
Roja **10'ê Hezîrana 1919'an** leşkerên Îngîlîz û hêzên Şêx Mehmûd li Derbêndê Baziya hatin hemberî hev. Di navbera wan de şerên dijwar pêk hatin. Di hêla pergalên teknîkî û hêjmara leşkeran ve cêwaziya Îngîlîzan û xiyaneta axayekî Kurd yê binavê Mûşîr Mihemed Silêman ku hêzên Îngîlîzan di rêyên zehmed re ji gelî derbaskirin û li paş hêzên Şêx Mehmûd dabû bicih kirin, rewşa şer ya heya wê demê serkeftî derbazbûyî, bi carekê da

gûhertin. Di vê navê de Şêx Mehmûd bi xwe jî birîndar bûbû. Artêşa Îngîlîz ya dibin fermandariya Doneîn de, ji şkestina hêzên Kurd sûd digre û bajarê Silêmaniyê dagir dike.

Şêx Mehmûd bi birîndarî ket destê Îngîlîzan de û ew xistin zindanê. Piştî demekê şandin Bexda yê. Berxwedana serhildêrên Kurd bi vî awayî dihat çewisandin.

## Hewildana Şêx Mehmûdê Berzencî Ya Dûwemîn

Sala **1920'an** li San Remo yê Dewletên Hevkar konferansek lidarxistin. Di vê konferansê de ji aliyê Îngîlîstan û Franseyê ve li Iraq, Sûrye, Lûbnan û Filistînê biryara damezrandina rêveberiyên mêtîngeh hatibû standin. Li gorî vê rewşê Kurdistan weke herêmeke girêdayî Iraqê dihat pejirandin. Vê çendê rê li ber nerazîbûnên Kurdan  yên tûnd vekir. Sala **1920'an** serhildanên ku ji ber vê çendê destpêkirîn, belavî Kerkuk, Silêmanî, Hewlêr û bajarên din yên Kurdan  bûn.

Îngîlîzan, **21'ê Tîrmeha 1921'an** de Emîr Feysel weke qiralê dewleta Iraqê ya nû dan ragihandin. Ev biryara di berjewendiyên ereban de, ji bo gelê Kurd rewşeke pir xirab di afirand. Di Kurdistanê de aloziyan careka din destpêkir.

Kurdên li ser sînorê başûr û Rojhilatê Kurdistanê û yên Şarezûr li dijî leşkerên Îngîlîz dest bi şerkirin. Ji rewşa ku derketî holê Tirkan jî dixwestin sûdekê jê bistînin. Ji bo dagirkirina Başûrê Kurdistanê hewildanên xwe derxistin asteke jor. Bajarê Koysencakê dagirkirin, Akrê dorpêçkirin û ber bi Amêdiyê ve meşiyan.

Di bihara sala **1922**'an de li herêma Çemçemal Kurdan  serî hildan. Di vê demê de niştecihên Silêmaniyê jî ji bo serbest berdana Şêx Mehmûd, çend caran serhildan lidarxistin. Di meha Êlûna vê salê de Îngîlîz neçarbûn bajarê Ranye vale bikin.

Di vê aramiya derketî holê de, Tirkan dixwestin rol bileyzin. Di herêmên başûr de pêşde çûn. Rewandûz dagirkirin. Li vê derê rêveberiya xwe damezrandin. Di heman demê de dest bi talana mal û mûlkên Kurdan  jî dikirin. Leşkerên Tirk di meha Êlûnê de heya nêzîkî Silê-maniyê jî hatin. Îngîlîzan çeperên xwe berdan û berbi Hewlêr û Kerkukê ve paşve çûn.

Rayedarên Îngîlîz di vê navê de gihiştin biryarê ku derketina ji aloziya heyî û rawestandina êrişên Tirkan yên li ser herêmê, tenê bi bandora Şêx Mehmûdê Berzencî wê pêşî lê bihatiba girtin. Li ser vê çendê gihiştin biryarê û Şêx Mehmûd ji sergûnê anîn.

Şêx Mehmûd ji Hindistanê anîn Kuweytê. Dema Şêx Mehmûd li ser rêya Silêmaniyê bû, li Bexda bi rayedarên hûkumetê re, bi qomîserê bilind yê Îngîlîzan re û bi Qiral Feysel re hevdîtin pêkanî. Herdû aliyan di van hevdîtinan de li ser pêkanîna sazûmaniyê di herêmê de û di mijara têkoşîna li dijî Tirkan de li hevkirin. Weke ku di berê de jî bûyî, dîsa soza damezrandina herêmekê otonom hat dayîn.

Şêx Mehmûd di hevdîtinên bi rayedarên Îngîlîz û Iraqê re pêkhatin de, temînata herêmeke otonom ya bi Silêmaniyê û derdora wê ve bi sînor girtibû. Piştî vê bi fermandarên Îngîlîz û komîserê siyasî yê bi navê Noel re hat Silêmaniyê. Li vê derê rêveberiyeke nû hat damezrandin û ew jî bûbû serokê herêma otonom.

Rêveberiya Başûrê Kurdistanê di destpêkê de ji bo perwerdeya gel dest bi xebatê kir. Zimanê Kurdî bûbû zimanê fermî. Pere û pûl hatibûn derxistin. Di vê navê de rojnameya **“Bangî Kurdistan”** hat weşandin. Piştî demekê rojnameyên **“Ûmîdî Îstîklal”** û **“Rojî Kurdistan”** jî hatin weşandin.

Şêx Mehmûd di dawiya sala **1922'an** de, da ku hevdîtinên otonomiyê bigrin dest, nûnerên xwe şandin Bexdayê. Di van hevdîtinan de encameke baş nedihat dîtin. Rayedarên Îngîlîz û Iraqê yên Ereb li şûna berfirehkirina mafên demokratîk di herêmê de, kêmkirina mafên heyîn dihizirîn.

Hizra Şêx Mehmûd ew bû ku wê Îngîlîz helwesteke weke ya sala **1919'an** bikar bînin. Ji ber vê çendê, li dijî wan dest bi hewildanê kir. Piştî demekê rayedarên Îngîlîz ji van hewildanan agehdar bûbûn. Ji bo danûstandinê di derbarê pêşketinan de Şêx Mehmûd vexwendin Bexdayê. Lê wê derê çûna Bexda red kir. Di van mercan de hêzên Îngîlîz yên bejayî û hewayî êrişî Kurdan kirin. Bajarê Silêmaniyê di **23'ê Adara 1923'**an de hat bombebarankirin. Şêx Mehmûd li dijî van êrîşan banga cîhadê kir.
Leşkerên Îngîlîz di dawiya Adara **1923'**an de li dijî Kurdan dest bi êrîşeke berfirehkirin. Beşekî mezin ji xaka Kurdistanê hat dagir kirin. Fermandariya leşkerî ya Îngîlîz 5'ê Gûlana heman salê ji bo êrîşeke mezin ferman derxistin. Hêzên çekdar yên Îngîlîz bi alîkariya xayînên herêmê di nîvê Gûlana **1923'**an de Silêmanî xistin destê xwe.
Di pêvajoya ku êrişên Îngîlîzan li ser navenda Silêmaniyê zêdebûyîn de Şêx Mehmûd ji bo alîkariyê ji rayedarên Yekîtiya Sovyetê re nameyan dinivîse. Di van nameyên ji aliyê Şêx Mehmûd ve ji bo rayedarên Yekîtiya Sovyetê hatin nivîsîn de, zilm û zoriya Îngîlîzan ya li ser gelê Kurd, talana li ser Kurdistanê pêkhatî û daxwaza piştgiriya leşkerî û siyasî tîne ziman. Rêveberiya Bolşewîk ji bo nameyên hatin şandin, bersiveke erênî nedan.
Serhildana Şêx Mehmûd di sala 1930'î de jî dema dewleta Iraqê fermî dibe, carekê din destpêdike. Vê carê jî bajarê Silêmaniyê weke ji berê de jî çend caran bûyî, ji aliyê balefiran ve hate bombebaran kirin. Di van êrişan de bajarê Silêmaniyê dîsa tê wêrankirin. Serhildana Başûrê Kurdistanê ya di bin rêbertiya Şêx Mehmûdê Berzencî de, bi vî awayî heya demekê bê deng dibe.
Şêx Mehmûdê Berzencî sala **1956'an** koça dawî dike.

## WANE 37.

### Pirsên Amadekariyê

1- Şêwazê serîhildana Simkoyê Şikakî çawa bû?
2- Çima gel li hemberî beşekî ji artêşa serhildanê li Mahabatê nerazûbûna xwe nîşanda?
3- Çima her carê serokên serhildanên kurda ji diminê xwe bawer dikin û têne xapandin?

## 2- SERHILDANA ÎSMAÎL AXA (SIMKOYÊ ŞIKAKÎ)




Di destpêka sedsala **19'**an de serokê êla Şikaka Cehfer Axa ji aliyê dewleta Îranê ve tê kuştin. Piştî vê bûyerê Îsmaîl Axa ku birayê Cehfer Axa ye, di şûna birayê xwe de dibe serokê êla Şikaka.
Êla Şikaka li Rojhilatê Kurdistanê di herêmên çiyayî yên Kotûr, Mergewer û Biradost de jiyana xwe domandine.
Simkoyê Şikakî, ji beriya şerê mezin herêma di bin destê xwe de, ji bandora Rûs, Tirk û Îraniyan parast. Bi têkiliyên xwe yên bi van hêzan re, ketina wan ya herêma girêdayî xwe, asteng dikir. Heya Şerê Cîhanê Yê Yekemîn rewş bi vî awayî berdewam kir.
Bi destpêkirina Şerê Cîhanê Yê Yekemîn re, hewildanên Rûs, Îngîlîz û Tirkan yên ji bo qezençkirina hêzên Kurd bi taybet jî ya Simkoyê Şikakî zêde bûbûn. Di vê pêvajoyê de weke li herêmên din yên Kurdistanê jî bûyîn, bi dayîna soz û qewlên damezrandina Kurdistaneke azad dixwestin Simkoyê Şikakî bikişînin aliyê xwe.
Di destpêka şerê cîhanê de Simkoyê Şikakî, li gel hêzên Rûsya li dijî leşkerên Tirk şer kir. Heya xwe ji şer vekişandina Rûsya, vê rewşê wiha berdewam kir. Piştî Rûsya bi mûnesebeta Şoreşa Cotmehê xwe ji şer vekişand, vê carê Tirk û Îngîlîz ji bo Simkoyê Şikakî bikişînin aliyê xwe xebatên xwe bilind kirin. Lê rûxmê van hewildan û hatin û çûnên bê navber jî, Simkoyê Şikakî dixwest siyaseteke ya bê alîtiyê bimeşîne. Di pêvajoya berdewamkirina şerê cîhanê de armanca dewletên Îngîlîz û Tirk bi awayekî eşkere hatibû têgihiştin. Armanca herdû aliyan jî yek bû. Dixwestin Kurdan  li hembeî dijminên xwe bidin bikaranîn.
Di dawiya Şerê Cîhanê Yê Yekemîn de, biryara damezrandina Kurdistaneke serbixwe ji aliyê Simko ve hatibû girtin. Di girtina vê biryarê de, yek ji Kurdên Bakurê Kurdistanê yê binavê Seyîd Taha û Evdilrezaqê ji malbata Bedirxaniyan rola xwe leyîstibûn. Evdilrezaq, di nava hemû Kurdan  de weke mirovekî Kurdperwer û têkoşer dihat naskirin. Ji berê her tiştî ew ji malbata Bedirxaniyan bû. Ji ber vê sedemê di nava êl û qebîleyên Kurd de cih û rûmetekî wî ya mezin hebû. Seyîd Taha jî her wiha ji malbateke Kurd ya serhildêr dihat. Neviyê Şêx Ûbeydûllahê Nehrî bû. Di heman demê de di sînorê bakur û Rojhilatê Kurdistanê de bandorake wî ya leşkerî û olî jî hebû. Hêj di saxiya Cehfer Axayê birayê Simko de jî li gel Evdilrezaqê Bedirxanî xebatên wan yên ji bo damezrandina Kurdistaneke azad hebû. Li ser vî bingehî, bi hev re li bajarê Ûrmiye rojnameyeke Kurdî derxistibûn. Piştî mirina Cehfer Axa ev rewşenbîrên Kurd yên navên wan derbazbûyîn, bi Simkoyê birayê Cehfer Axa re peywendiyên xwe doman dibûn.

Dema hêzên Rûsya xwe ji şerê mezin vekişandin, li şûna xwe hêjmareke çekên giran û sivik yên beketî hiştibûn. Ev çekên mijara gotinê di xwerêxistinkirina çekdarên Kurd de cihekî girîng digre. Simko di destpêka sala **1919'an** de ji bo ragihandina serxwebûnê xebatên xwe lezgîn dike. Sibata 1919'an bi serokêlên Rojhilatê Kurdistanê re bi armanca şerekî li dijî leşkerên Îranî û damezrandina Kurdistaneke azad civînekê lidardixin. Di vê civînê de biryara şerê li dijî deshilatdariya dagirkerên Îranê tê girtin. Lê ji bo vê jî xwesteka girtina alîkariya Îngîlîzan derdikeve pêş. Ji bo pêkanîna vê alîkariyê Seyîd Taha Gûlana **1919'an** diçe Bexda. Simko bi xwe jî di damezrandina Kurdistaneke serbixwe de, da ku piştgiriya Îngîlîzan bigre, ji komîserê siyasî yê Îngîlîzan re nameyan dinivîsîne. Lê ji van her dû hevdîtinan jî tû encam nayên bidestxistin.
Simko bi armanca derxistina hêzên Îranê ji Kurdistanê, sala **1919'an** dest bi êrîşan dikin. Bajarê Dîlman di demekê kurt de rizgar kir. Hêzên Îranê yên li Xoyê derxistin. Bajarê Ûrmiye dorpêçkir. Herêma Lakîstanê ku niştecihên wê Azerî bûn, ji ber ku deshilatdariya wî nasnedikirin û bac nedidanê talankir. Beşekê mezin ji herêma Ûrmiye di destê xwe de girt. Di vê demê de hêzên Îranî û yên Azeriyan bi hev re êrîş birin ser hêzên Kurd. Lê ev êrîş bê encam şûnde zivirîbûn.
Van serkeftinan baweriya bi Simkoyê Şikakî zêde dikir. Hejmareke zêde Kurd tevlî artêşa wî bûn. Di sala **1920'an** de li bajarên Ûrmiye, Salmas û Xoyê bandora xwe qewîn kir. Kesên ku xwestin, kir parêzgerê bajarê Ûrmiye. Hemû êrîşên Îraniyan yên di vê demê de pêkhatin, dihatin şikandin. Hêjmara leşkerên Simko ji deh hezaran derbaz dibû.
Sala **1920'an** di bin serokatiya Simkoyê Şikakî de çend caran civînên serokêlên Kurd pêkhatin. Di van civînan de êlên Herkî, Begzade, Heyderan, Şikakî koma êlên Ertûşiyan û hinek êlên din yên herêma Çolemêrgê dihatin cemhev.
Di nîvê sala **1921'an** de xakên di bin destê Simkoyê Şikakî de ji rojavayê Gola Ûrmiye heya bajarên Bane û Serdeştê û ji vir heya bakurê rojavayê Iraqê dirêj dibû. Li gel tevî êla Şikaka û Herkiyan, êlên Mamaş, Mangûr, Dehbokrî, Pîran, Zarza, Gewrik, Feyzûllahbegî, Pişdar û êlên biçûk yên herêma Bane jî tevlî hêzên Simko bûn. Di cotmeha sala **1921'an** de hêzên Simko ketin bajarê Mehabadê ku heya wê demê di destê hêzên Îranê de bû. Di vê serdegirtinê de beşek ji hêzên Simko yên ji venêrînê derketîn zirar û ziyan dabûn niştecihên bajarê Mehabadê yên Kurd. Vê bûyerê di nava têkoşerên Kurd de li dijî Simko bêzarî afirand.

Bajarê Mehabadê weke paytext hat ragihandin. Simko bi xwe li vê derê nerûnişt. Hemze Axayê serokê êla Mamaş weke parêzgerê Mehabadê da nîşakirin. Bajarên Azeriya Mîandoab, Marage û Bînap bi vî bajarî ve hatin girêdan.
Serkeftinên leşkerî yên hatin bidestxistin di nava Kurdan de Rûmeta Simko bilindkiribû. Aligirên wî jî li gorî vê rewşê her ku diçû zêde dibûn. Di sala **1922'an** de xakên di bin destê Simkoyê Şikakî de li rojhilat Şahîn Dez, li başûr jî heya bajarê Seqiz berfireh bûbûn. Li gel wê bi êlên başûr re jî Simko di nava peywendiyan de bû. Li Merîwan û Awrûmanê bi bandor bûbû. Êlên Loristanê jî li hember hêzên Îranê serî hildabûn. Di heman demê de gelek êlên bakur û başûrê Kurdistanê jî peywendiyên xwe pê re çêkiribûn.
Di vê navê de Riza Xan ku bûbû desthilatdarê dewleta Îranê tevayî hêza xwe ji bo damezrandina artêşeke hemdemî xerç dikir. Hêzên destpêka sala **1922'an** li dijî Simko hatin şandin pir xirab şikestibûn. Çekên xwe li meydana şer hiştibûn û paşde reviyabûn. Lê di tebaxa **1922'an** de êrîşekê mezin ya ji leşkerên hatin perwerdekirin li dijî hêzên Kurd pêkhat. Kurd û Ecema hejmareke mezin mirov ji hev kuştin. Di vî şerî de hêzên Simko derbeke giran xwaribûn. Simko bi hêzên xwe yên mayîn ve derbazî bakurê Kurdistanê bû. Lê li vê derê rastî êrîşa hêzên Tirk hat. Ji vir jî derbazî başûrê Kurdistanê bû.

Simko li başûr jî hewildanên xwe yên carekê din gûrkirina serhildanê domandin. Ji bo vê çendê bi serokêlên Kurd yên li vê herêmê û bi Şêx Mehmûdê Berzencî re hevdîtinan pêktîne. Lê ev hewildanên wî bê encam dimînin.
Sala **1923'an** da ku desteka Tirkan bigre diçe Tirkiyê. Lê ji vê derê jî deste vale dizivire. Sala **1924'an** derbasî rojhilat dibe. Carekê din dest bi amedekariyan dike. Sala **1926'an** dîsa li dijî hêzên Îranê serî hildide. Bi alîkariya êlên Herkî û Begzadeyan bajarê Dîlmanê dorpêçdike, lê serkeftin bidest nexist û derbasî başûr bû.
Hêviyên Simko yên ji bo Kurdistaneke serbixwe tu caran nedihatin şkandin. Her cihê ku diçûyê derfeta herî biçûk jî ji bo azadiya gelê Kurd û Kurdistaneke azad dixwest bikar bîne. Li ser vî bingihî hewildanên bê navber didomandin. Rayedarên Îranê jî têgihiştibûn ku bi rêyên şer wê nekaribin xebatên Simko bidin rawestandin. Vê carê li rêyên bêbextiyê geriyan. Sala **1929'an** ji bo hevdîtinê vexwedin bajarê Tebrîzê. Wî jî ji wan bawerkir û çû Tebrîzê. Di bêhna hevdîtinê de ew girtin û piştî demekê kuştin.

**WANE 38.**

**Pirsên Amadekariyê**

1- Siyaseta Mistefa Kemal a li hember Kurda çi bû?
2- Çima serhildanên Kurdan her dem pirsgirêkên serokatî û pêşengtiyê jiyan dikirin?
*3-* Çima Kurdan jî weke gelên din ên Rojhilata Navîn nekarîn siyaset û dîplomasiyê bimeşînin û sîstema xwe ava bikin**?**

## 3- SERHILDANA QOÇGIRÎ

Di Tebaxa sala **1920'an** de, di navbera bermayên dawî yên dewleta Osmanî û Hêzên Hevpeymanê de Peymana Sewrê hatibû Îmze kirin. Di vê peymanê de, hemû daxwazên Hêzên Hevpeyman hatibûn pejirandin. Li gorî vê peymanê biryara damezrandina Kurdistaneke otonom hatibû girtin. Peymana Sewrê di nava Kurdan de keyfxweşî û coşekê mezin afirandibû.
Li milê din Mistefa Kemal li ser navê Siltanê Osmaniyan Wahdettîn ku li Stenbol dibin çavdêriya Îngîlîzan de bû, derbasî Kurdistanê dibe û dixwaze li dijî Îngîlîz û hêzên din yên Ewrûpî alîkariya gelê Kurd bidest bixe.
Mistefa Kemal, bi alîkaraya axa û begên Kurdan kongreyên Erzir3ûm û Sêwasê kom dike. Di van kongreyan de biryara bi hev re karkirina gelê Kurd û Tirk ya li dijî hêzên dagirker tê girtin. Her di vê demê de Mistefa Kemal li dijî rêveberiya Stenbol, li Enkere dixwaze rêveberiyekê bide avakirin. Meclîsa ku li Enkere bihatiba damezrandin wê meclîsa hevbeş ya gelê Kurd û Tirk bûya. Heya demekê axa û begên Kurd yên wan dixwestin dibirin Enkere û weke endamên meclîsê pêşwazî dikirin. Bi vî awayî axa û begên Kurdan dixapandin.
Beşek ji van axa û begên Kurdan , di pêkanîna biryarên Sewrê de û damezrandina dewleta Kurd ya otonom de tû gûmanên wan nebûn. Ji demekê şûn de nêzîkatiyên Mistefa Kemal rê li ber gûmanên van kesan vekiribûn. Dema têgihiştin ku dixwaze wan li gorî berjewendiyên xwe bikar bîne û tû armancên wî yên dayîna mafê gelê Kurd nîne, vê carê li rêyên cûda digeriyan.
Di vê dema mijara gotinê de rêxistinên Cemiyeta Îstiklala Kurdistan **(azadî)** û cemiyeta Tealî ya Kurdistan li gel hinek serokêlên din yên Kurd, di herêma Qoçgirî û Dêrsimê de li dijî desthilatdariya Tirkan dest bi amedekariyên serhildanekê dikirin.
Di sala **1920'an** de li gundekî **(yelîce)** yê girêdayî navçeya Kangala Sêwasê, di Tekkeya ya Hisên Evdal de rayedarên Kurd civîneke girîng lidardixin. Serokêlên Canbegan, Kurmeşan û yên din beşdarî vê civînê dibin. Kesên tevlî vê civînê bûyîn, sond dixwin ku li herêma Amed, Wan, Elezîz, Qoçgirî û Dêrsimê ji bo damezrandina dewleteke serbixwe ya Kurd têkoşîneke çekdarî bidin destpêkirin.
Li gorî biryara civînê, serokêlên Kurd dest bi komkirina çekan dikin. Dîsa li gorî nûçeyên ku dihatin navenda têkoşînê, li rojhilatê Dêrsimê bi qasî 45.000 çekdarên Kurd, ji bo alîkariya Kurdên herêma Sêwasê amedebûn.
Di havîna **1920'an** de çekdarên Kurd di bin fermandariya Misto de êrîşek birin ser baregeha leşkerên Tirk yên li navçeya Zarayê. Di vê êrişê de hejmarek leşker û fermandarên Tirk hatibûn dîl girtin. Her di vê navê de serokêlekî bi navê Madan Paşa bi hêzeke mezin êrîşî

navçeya Refahiyê ya girêdayî Erzirûmê kir. Navçe bidest xist û xwe weke fermandarê hêzên netewî yên Kurd da ragihandin.
Rêveberiya Enkere li ser van pêşketinan dest bi sazkirina dadgehên îstiqlalê dike. Di van dadgehan de biryarên herî tûnd ji bo tevger û kesên li dijî rêveberiya Enkere derdiketin dihatin derxistin.

Mistefa Kemal ji bo lewazkirina tevgera Kurd, li gel tevdîrên ewlekarî yên cezakirinê, serî li rêbazên din jî dida. Da ku tevgera Kurd di herêma Qoçgirî de lewaz bike, her dû kurên Mistefa begê fermandarê Alayên Hemîdiyê Elî Şan û Heyder Beg dixwazin di karên bilind yên rêveberiyê de bicih bikin. Lê Elî Şan û birayê xwe ev vexwendina Tirkan nepejirandin û bi hinek serokêlên Kurd ve ber bi Dêrsimê ve dikevin rê. Li vê derê bi tevlîbûna rayedarên Kurd yên Hozat û Çemîşgezekê civîneke giştî lidardixin. Di vê civînê de ji bo qezençkirina mafên netewî, biryara yekîtiya tevayî hêzên Kurd tê standin.
**Di vê civînê de biryara şandina nameyekê ji bo rêveberiya Enqere hatiye dayîn. Di namê de xalên hatin diyarkirin ev bûn:**
**a-** Biryara Siltanên Osmaniyan a damezrandina Kurdistaneke otonom, wê ji aliyê rêveberiya Enkerê ve bi awayekî fermî bê pejirandin an na?
**b-** Di derbarê rêveberiya Kurdistaneke otonom de, rêveberiya Mistefa Kemal çi dihizire, di vê hêlê de bi awayekî lezgîn agehdarkirina gelê Dêrsimê.
**c-** Kurdên di zindanên Elezîz, Meletî, Sêwas û Erziromê de diman, di demeke zûtir de pêwîste serbest bêne berdan.
**d-** Herêmên ku piraniya niştecihên wan ji Kurdan pêkdihat de, pêwîste karbidestên Tirk nemînin.
**e-** Mûfrezeyên leşkerî yên hatin herêma Qoçgiriyê pêwîste di demeke kurt de bên kişandin.
Rêveberiya Enkere weke bersiv heyetekê ji Elezîzê dişîne Dêrsimê. Heyeta ku hatî şandin, daxwazên Kurdan di cih de û bimaf dibîne. Lê dîsa jî ji wan dixwaze dev ji tevgera xwe berdin. Rêveberên Kurd van kesan diqewitînin. Piştî demeke din bi rêya parêzgerê Elezîzê **25'ê Mijdara 1920'an** ji bo meclîsa Enkerê telgirafekê ku ji aliyê serokêlên Kurd ên Dêrsimê ve hatî îmze kirin, tê şandin. **Di vê telgirafê de wiha tê gotin:**
**"Li gorî peymana Sewrê pêwîste li bajarên Amed, Elezîz, Wan û Bedlîsê Kurdistaneke azad bihatiba damezrandin. Pêwîste ev biryara Sewrê demekê zû pêkwere. Berovajiyê wê em ê neçar bimînin ku vî mafî bi hêza çekê bidest bixin."**
Serhildêran bersiveke nivîskî ji vê telgirafê nestandin. Lê bi armanca qezençkirina demê, Mistefa Kemal bi rêya parêzgerê Elezîzê, ji bo serokêlên Kurd diyar dike ku xwestekên Kurdan pejirandine. Di heman demê de jî li hemberî herêma Sêwasê dest bi tevgereke leşkerî dikin.
Mistefa Kemal bi van hewildanên xwe re, rêyên bê layenkirina Kurdan jî dişopîne. Bi awayekî fermî bi rêya parêzgerên bajarên Kurdistanê dide ragihandin ku meclîsa Enkerê wê ji Kurd û Tirkanan pêkbê û her bajar wê nûnerên xwe yên hatin hilbijartin bişîne meclîsê. Di vê bêhnê de serokêl û kesayetiyên navdar yên weke Diyap Axa, Meçû, Hesen Xeyrî, Mistefa Zekî, Remîz û Ebdilheq Tewfîq ji bo meclîsa Enkerê têne vexwendin.
Ev kesên henê baweriyê bi Mistefa Kemal tînin û diçin Enkerê. Lê piştî demekê ev kesên mijara gotinê, wê di çewisandina tevgera Dêrsimê de ji aliyê Mistefa Kemal ve weke pergal bêne bikaranîn û hinek ji wan jî her dîsa li ser fermana Mistefa Kemal wê bêne kuştin.
Di serhildana Qoçgiriyê de li gel bandoreke mezin ya Seyîd Riza, rewşenbîrên Kurd yên weke Dr. Nûrî Dêrsimî, Elî Şêr, Elî Şan û birayê wî Heyder Beg jî di rêveberiya serhildanê de cih digirtin. Daxwazên rêveberên Kurd yên ji bo Kurdistaneke azad, her carê bi rêyên xapandinê dihatin rawestandin. Di bihara **1921'an** de êdî dest ji perdeya dostaniyê ya li ber

çavê xwe berdan û rasterast gef li serhildêrên Kurd xwarin. Di van gefan de diyar dikirin ku **“Ger çek neyên danîn û xwe radestî edaleta dewleta Tirk nekin, wê tevî gundên Kurdan ên li vê herêmê bihatibana şewitandin.”**
Li ser vê rewşê di **4'ê Adar a 1921'an** de li navçeya Ûmraniye çend navdarên Kurd ji aliyê leşkerên Tirk ve têne girtin. Di bin çavdêriya hejmareke mezin leşker de van kesan ber bi Zarayê ve rê dikin. Di rê de hêzeke ya Kurd êrişî leşkerên Tirk dikin û girtiyan ji destê wan rizgar dikin. Ev bûyera hatî diyarkirin, dibe destpêka şerê di navbera hêzên Kurd û leşkerên Tirk de.
Ev hêza leşkerî ya Tirk, ber bi Sêwasê ve rêya xwe domandibûn. **6'ê Adara 1921'an**, hêzên Kurd li navçeya Ûmraniye ev hêza Tirk dorpêçkir û ji wan xwest teslîm bibin. Fermandarê Tirk ev daxwaz nepejirandibû û di navbera her dû hêzan de şer derketibû. Di encamê de leşkerên mijara gotinê neçarî teslîmbûnê bûn. Piştî dadgehkirineke di cih de, fermandarê Tirk hatibû kuştin. Di encama vê bûyerê de, hejmareke berketî çek û kelûpelên leşkerî ketibûn destê hêzên Kurd de.
Vê serkeftinê bandor li navçeyên din ên Sêwas û Dêrsimê jî kiribû. Piştî Ûmranyê, Kurdên Qoçgiriyê jî dest bi serhildanê kirin. Hêzên Kurd ên herêma Ovaciqê herêmên xwe ji leşker û karbidestên Tirk paqijkirin. Hêzên Tirk yên li navçeya Kemahê belavkirin û fermandarên bajêr dîl girtin. Di dawiya vê tevgerê de hêzên Kurd navçeyên Dîwrîgî, Zara, Refahiye, Kurûçay û Kemah ji destê Tirkan derxistin.
Rêveberiya Enkere ketibû nava rewşeke zehmet de. Li milekî Kurdekî Bedlîsî ji bo peywendiyê û lewazkirina tevgera Kurd, li ser navê rêveberiya Enkere dişîne herêmê. Li aliyê din li dijî tevgera Kurd seferberiyê îlan dike û leşkeran ji bajarên dûr û nêzîk dide komkirin. Bi van pêşveçûnan re li bajarên Sêwas, Elezîz û Erzîncanê rewşa awerte didin ragihandin. Di vê demê de artêşa Tirk ewqas neçar dimîne ku beşek hêzên xwe yên li dijî Yewnaniyan şerdikirin jî, derbazî herêmê bikin. Dîsa da ku alîkariya bajarên din ên ji bo Kurdan asteng bikin, rê û pirên di navbera van bajaran de didin qûtkirin.
Li rûxmê sir û sermaya biharê jî, di navbera her dû aliyan de şerên dijwar dest pê kir. Ev şerên mijara gotinê bi taybet herêma di navbera Dêrsim, Sêwas û Erzîncanê de tûnd dibû. Di vî şerî de hemû baweriya bi rêveberiya Enkere şkestibû. Heyder Beg ku destpêkê bi wan bawer bûbû jî, li hember Tirkan dest bi şer kir. Kurdên herêma Sêwasê bi hemû derfetên xwe, mêr, jin, pîr û zarok li dijî êrîşên Tirkan herêmên xwe diparastin. Lê hevsengiyek di navbera her dû hêzan de nebû. Di bin êrîşa çekên giran de şervanên Kurd neçarî paşde vekişînê bûn. Beşeke mezin ji rêveberên Kurd di vî şerî de bi lehengî jiyana xwe ji destdan. Di rewşeke wiha de rêveberên serhildanê biryara ji şer dûrxistina jin û zarokan standin. Ev jin û zarok wê derbazî herêma Dêrsimê bihatiban kirin.

**24'ê Nîsana 1921’**an de bi 2000 leşkerên Kurd ve Heyder Beg da ku bi hêzên Dêrsimê re bibe yek, dikeve rê. Di herêma navbera Erzîncan û Pûlûmûrê de dikeve nava xaka êlên Qûreyşan û Balaban de. Ji vê derê Heyder Beg dixwest di nava geliyên Pûlûmûr û Mamaxatûnê de bikeve herêma Dêrsimê. Lê li şûna alîkariyê serokêlê Qûreyşiyan Paşayê Kor weke ku Tirkan dixwestin derdikeve pêşiya Heyder Beg û nahêle di herêma wan re derbaz bibe. Di van mercan de, hêzên Heyder Beg bi şer derbazî Qoçgiriyê dibe û şer û pevçûnên bi leşkerên Tirk re tê berdewamkirin.
Hêjayî gotinê ye ku di berdewamkirina şer de gund, jin û zarokên Kurdan rastî kiryarên dijî mirovahiyê yên Tirkan tên. Di bin fermandariya serok çeteyên bi navê Topal Osman de jin û zarokên Kurdan tên qetilkirin. Gundên wan tên şewitandin û dest datînin ser hemû derfetên wan yên aborî.

Fermandarê Tirk, da ku tevgera Qoçgiriyê têk bibe, tûnekirina rêberên serhildanê ji bo xwe kiribûn armanc. Bi rêya begên Sêwasê yên aligirên xwe bi Heyder Beg re peywendiyan pêktîne. Dixwazin wî bikişînin Sêwasê. Ew jî tê vê lîstokê û bi hezar leşkerên Kurd ve, ji bo hevdîtinan diçe Sêwasê. Li nêzîkî bajêr dikeve kemîna Tirkan. Di encam de bi 400 leşkeran ve tê dîl girtin.
Ev lewaziya Heyder Beg, di diyarkirina çarenûsa tevgera Kurd ya Qoçgiriyê de encamên pir xirab derxistine holê. Wî, hem serhildêr daye lewazkirin û hem jî di aliyê gêwil de jî rê li ber şkestinê vekiriye. Ji vir pêde kesayetiyên lewaz û dûdil yekbiyek xwe ji refên şoreşê dûrxistine yan jî radestî dijminên xwe bûne.

Hêzên Kurd yên di bin pêşengiya Elî Şêr, Dr. Nûrî Dêrsimî, Elî Şan û yên din de her ku diçû lewaz dibûn. Di rewşeke wiha de ji bo berxwedêran yek rê dima; bi şer derbazbûna çiyayên Dêrsimê û li vê derê xwe amedekirina ji bo serhildaneke din.

Di dawiya serhildanê de bi sedan kes ji aliyê dadgehên leşkerî ve hatin darizandin. Hejmareke mezin ji van kesan Heyder Beg jî di nav de hatin dardekirin. Yên mayîn jî xistin zindanê. Jin û zarokên van kesan jî mişextî bajarên dûr yên anatoliyê hatin kirin.

## WANE 39.

**Pirsên Amadekariyê**

1- peyman Sewre çi di jiyana kurda guherand?
2- Peymana Qahîrê li ser çi bingehî û di navbera kîjan hêzan de pêkatiye?
3- Piştî peymana Lozanê rewşa kurdan çawa bû?

## PEYMANA SEWRÊ (10'Ê TEBAXA 1920)

Dewletên hevpeyman yên ji Şerê Cîhanê Yê Yekemîn serkeftî derketin, di Konferansa Aştiyê ya Parîsê de kombûbûn û di vê kombûnê de xalên bingehîn yên di peymanên aştiyê ku wê bi hêzên hevkar re bihatibana îmze kirin, dabû destnîşankirin.

Ji derveyî dewleta Osmaniyan, xalên bingehên yên ji bo dewletên hevkar bihatibana destgirtin, hatibûn diyarkirin. Piştî demekê dewletên hevpeyman li Îtalyayê, di Konferansa San Remoyê de hatin cem hev û xalên bingehîn yên ji bo dewleta Osmaniyan bigrin dest dabûn diyarkirin. Nûnerê dewleta Osmaniyan ku weke çavdêr beşdarî vê konferansê bûbûn, bendên ji bo dewleta Osmaniyan vê giran dibîne û naxwaze îmze bike. Dema dewleta Osmanî jî di bicihanîna van bendan de ne ji dil û hêdî tevdigere, dewletên hevpeymanê li dijî Osmaniyan dest bi tevgerê dikin. Artêşa Yewnan li ser vî bingehî **22'ê Hezîrana 1920'an** de bajarên Balikesîr, Karamûrsel û Modanya dagirkir. **20'ê Tîrmeha 1920'an** de jî rojhilatê Trakye hat dagirkirin. Bajarên Edîrne, Kirklarelî û Tekîrdax ket destê Yewnaniyan. Li ser van pêşveçûnan li bajarê Sewrê yê nêzikî Parîsê, dewleta Osmanî bi Hêzên Hevpeyman re peymana Sewrê îmze dike **(10'ê Tebaxa 1920).**

### Hinek bendên girîng yên vê peymanê ku bi giştî ji 433 bendan pêkhatibû ev in:

- Rojhilatê Trakye û rojavayê anatoliyê wê bigihaba Yewnanîstanê.
- Bajarên Mêrdîn, Rûha, Dîlok û tevayê Sûryê wê bigihaba Franse.- Girava Rodos û Dûwazdehgirav wê bigihaba Îtalye. Giravên Derya Ege jî wê bigihaba Yewnanîstanê.
- Erebîstan, Mûsil û Iraq wê bigabûya Brîtanye.
- Wê başûrê rojavayê anatoliyê bigihabûya Îtalye.
-Wê di xaka Kurdistanê de dewletên Ermenîstan û Kurdistan bihatibana damezrandin.
- Tenê bajarê Stenbol û çend bajarên li derdora wê, ji bo Osmaniyan dihatin hiştin.

Rêxistina Kurd ya bi navê Cemiyeta Teali ya Kurdistan di vê pêvajoyê de xebatên xwe gihandibûn asteke bilind. Da ku ji bo gelê Kurd hinek mafên demokratîk û însanî bi dest bixe, şev û rojê xebatên xwe didomandin. Di vê navê de rêxistina Kurd ya navê wê derbazbûyî, rewşenbîrekî Kurd yê binavê Şerîf Paşa weke nûnerê gelê Kurd, ji bo Konferansa Aştiyê ya Sewrê dabû diyarkirin. Şerîf Paşa, heya wê demê li Ewrûpa di erkên bilind yên dewleta Osmanî de xebat dimeşand. Pêşiya demekê jî Şerîf Paşa weke nûnerê dewleta Osmanî beşdarî Kongreya Wersaîlles **(Wersay)** ê bûbû. Şerîf Paşa ku ji Kurdê Silêmaniyê bû dest ji xizmetên xwe yên ji bo Osmaniyan berdide û da ku berjewendiyên gelê Kurd di vê konferansê de biparêze, dikeve tevgerê. Şerîf Paşa, li gel nexşeya Kurdistana yekbûyî, du belgeyên ku daxwazên gelê Kurd tê de hatin destnîşankirin, raberî Konferansa Aştiyê kir. Di heman demê de bi nûnerên Ermeniyan re ku ji rêxistina Taşnaqê bûn, hevdîtinan pêktîne û bi awayekî hevbeş, di Konferansa Aştiyê de dîtinên xwe yên li ser dagirkeriya Tirk tînin ziman.

Di Konferansa Aştiyê ya Sewrê de sê **(62-63-64)** bendên ku ji bo mafê gelê Kurd hatin destnîşankirin ev in:

- Cihên ku hêjmara niştecihên wan piranî ji Kurdan pêkhatî de wê herêmeke otonom bihatiba damezrandin. Nûnerên dewletên Ingiltere, Franse û Îtalye ji bo pêkanîna vê çendê wê xebat bidaban meşandin **(benda 62)**.
- Dewleta Osmanî neçarbûn vê plana otonomiyê ya ji aliyê komîsyonê ve hatî pêşniyarkirin, di nava sê mihan de derbazî meriyetê bike **(benda 63)**.
- Ger netewa Kurd di nava salekê de biryara xwe cûdakirina ji dewleta Osmanî bigre û bixwaze dewleteke serbixwe damezrîne, pêwîste vê daxwazê bibe Koma Netewan. Koma Netewan jî biryar bide ku wê Kurd bikaribin xwe rêvebibin, wê demê pêwîste dewleta Osmanî hêzên xwe ji herêma Kurdan bide kişandin **(benda 64)**.

Biryarên Peymana Sewrê ji aliyê dewleta Osmanî û rêveberiya Enqerê ve nehat pêkanîn. Dewletên Hevpeyman jî, ji bo pêkanîna van biryaran zêde xwedî israr nebûn. Hêviyên civakên Kurd û Ermenî hatibûn binpêkirin. Dewletên hevpeyman di berdêla Mûsilê de bibûn sedema şkandina hêvî û baweriya Kurd û Ermeniyan.
Lê rexmê vê jî, ango her çiqas biryarên Peymana Sewrê li ser kaxezê mabin jî, di pêşketina pirsgirêka Kurd de xwedî cihekî girîng e. Di dîrokê de cara yekem bû ku di belgeyeke dîplomatîk de, bi giştî di herêmeke ku Kurd têde dijiyan de, gelê Kurd dibû xwediyê mafên otonomiyê.

## PEYMANA QAHÎRE



Peymana Mondrosê di 30.10.1918'an de hate îmze kirin. Di heman demê de Bîrîtanyayê nexşeyek amade dikir. Herêma bi navê Iraq-nîvgirav (Cezîre)-Kurdistan dê bûbûna para Bîrîtanyayê. Ev herêm ji kendava Basrayê dest pê dikir heta sinorê başûrê Dewleta Ermenistanê ya dihate plansazîkirin û li gel Mûsilê, Amedê jî dixist nava xwe.
Lê li gorî Osmaniyan divê Mûsil nehate dagirkirin. Ji ber ku li gorî wan di peymanê de xaleke wiha nebû. General Cassels xalên 7 û 16. şîrove dike. Li gorî vê sinorên mezopotamyayê pênase dike û Mûsilê ji Elî Îhsan paşa werdigre.Dema ku Îngîlîz ji konferansa Parîsê encamek negirt li şûna dewleta Kurd bîryara damezrandina dewleta Ereb girtin. Di 1.10.1920'an de bi navê "Konseya Dewletê" hikumeta Ereb hate damezrandin. Pîştî peymana Mondrose konferansa Kahîre hate li darxistin. Îngîlîz di konferansa Kahîreyê ya navbera 12.3.1921- 25.3.1921'an hate kirin de bîryara Faysal bikin qiral dan. Di konferansa Kahîreyê de her çendî ji avakirina Kurdistanek derbaz bûbûn jî lê li başûrê Kurdistanê pêwîste dewletek Kurdî were ava kirin. Îngîlîzan di sala 1925'an de pirsgirek bire cemiyeta neteweyên yekbûyî. Li vê derê Mûsil û Kerkuk ji Înglîzan re ma. Heta 25 salan dê hilberînên petrolê ji %10 bidin dewleta Tirk.
Weke ku birêz Ocalan jî diyar dike: "Ji ber ku Kurdên bakur bi Bîrîtanyayê re tevger nebûn û bi sedemên petrolê, parçe bûna Kurdistanê Bîrîtanya erê kir. Berdêla wê Tirk dikarin Kurda qirbikin û tûne bikin."

## PEYMANA LOZAN (24'Ê TÎRMEHA 1923)

Peymana Lozan, di navbera Hêzên Hevpeyman û rêveberiya Enqerê de, li bajarê Lozanê yê girêdayî Swîsre hatiye îmze kirin.

Di mijara derbazbûyî de hatibû diyarkirin ku meclîsa Enqere, Peymana Sewrê nepejirandibû. Ji ber vê sedemê, bajarên Tirkiye ji aliyê hêzên Yewnan û Îtalyayê ve, bajarên Kurdistanê yên weke Rûha, Dîlok û Mereş jî, ji aliyê hêzên Franseyê ve hatibûn dagirkirin. Di vê pêvajoyê de, hêzeke Tirkan ya ku bikaribe li hember dewletên mijara gotinê raweste tûnebû. Di bajarên anatoliyê yên niştecihên wan piranî ji Tirkan pêkhatî de, her cûrên aloziya dihatin dîtin. Rêveberiya nû ji aliyê gel ve nedihat pejirandin. Ji ber vê çendê, nakokiyên heyîn her roj zêdetir dibûn.



Mistefa Kemal, hem bi riya Mûsilmantiyê û hem bi sozên ji bo damezrandina dewleteke Kurd yên ji bo gelê Kurd dayîn, karîbû li dijî hêzên Ewrûpî ji hêza Kurdan sûd wergire. Tê zanîn ku hêzên Fransiz yên bajarên Kurdistanê dagirkirin, bêy ku hêzeke leşkerî ya Tirk beşdar bibe, tenê bi alîkariya axa û begên Kurd, ji herêmê hetibûn qewitandin. Herwiha, di şerê li dijî Yewnaniyan de jî, ku heya dawiya **1922'an** berdewam bûbû, leşkerên Kurd di eniyên pêş de cih girtibûn.

Piştî van serkeftinên li dijî Ewrûpiyan hatin bidestxistin, derfetên pêkanîna Peymana Sewrê ji aliyê Ewrûpiyan ve, ji holê hatibû rakirin û pêwîstî bi peymaneke din dihat dîtin. Di nava van mercan de, dema ku leşkerên Yewnan, Îtalye û Franse hatibûn qewitandin, Peymana Lozanê li Swîsre destpêdike.

Di Peymana Sewrê de Şerîf Paşa, weke nûnerê aliyê Kurd beşdar bûbû. Lê, di vê peymanê de kesekê/î ku berjewendiyên civaka Kurd biparêze cih nagre. Weke gelekî cara bûyî, vê carê jî ku ji bo gêlê Kurd û hîntûya wê rewşeke jiyanî bû, rayedarên Tirk yên di bin rêbertiya Îsmet Înonû de gelê Kurd dixapînin. Di rûniştandina yekemîn ya konferansê de Îsmet Înonû li gel Kurdekî ji Amedê yê binavê Fewzî Beg, yê dûwemîn de jî dîsa Kurdekî ji Amedê yê binavê Zûlfî Beg re beşdar bûbû.

Her carê, dema ku pirsgirêka gelê Kurd û rewşa Kurdan tê rojevê, nûnerê Tirk xwe weke nûnerê herdû gelan (Kurd û Tirk) dide nasandin û dibêje; **“Kurd û Tirk bi sedsalane bi hev re jiyane. Baweriya wan ya olî yek e. Tû pirsgirêk di navbera herdû civakan de nîne. Em naxwazin ji hev cûda bibin.”** Dema di heman mijarê de pirs ji nûnerên Kurd dikirin, wî jî gotinên Îsmet Înonû dûbare dikirin.
Her di wê demê de li parlemetoya Tirkan jî, heman nîqaş çêdibûn. Qaşo, li ser navê civaka Kurd hinek nûner di parlementoyê de cih girtibûn. Di konferansa Lozanê de pirsa **“Kurd dixwazin Kurdistanê ji Tirkiyê cûda bikin yan ne?”** tê kirin. Ji bo vê jî bersiva parlementoya Enqere tê xwestin. Bersiva ji parlementoya Enqere li ser navê nûnerên Kurd ji bo konferansê tê şandin wiha ye; **“Ev welat yê Kurd û Tirkan e. Li vê derê tenê mafê dû gelan yê axaftinê heye; yê gelê Kurd û yê gelê Tirk.”** Yê vê axaftinê dike nûnerê Erzirûmê Hisên Ewnî Beg e. Ji vir û pêde bendên hatin tesbîtkirin, di navbera Hêzên Hevpeyman û Tirkan de tê îmzekirin.

Di vê peymanê de dewleta Tirk, bêyî ku cewaziya ol, nîjad û ziman bike, bi awayekî bê kêmahî û temam, parastina jiyan û azadiya civakên li Tirkiye jiyandikin, li ser xwe digire. Herkesê ku li Tirkiyê jiyandike, wê pêwîstiyên bawerî, ol û mezhebên xwe, bêyî ku zirarê

bidin jiyana civakî, bixwazin eşkere û bixwazin taybet, wê bi awayekî serbest pêkbînin. **(benda 38)**

- Herkesê ku li Tirkiyê jiyan dike, di têkiliyên xwe yên Taybet, an jî bazirganiyê de, di civînên ji bo gel vekirî de, di xebatên çapemenî û weşanê de, kîjan zimanî ku bixawaze wê bikaribe bikarbîne. Herçiqas zimanê fermî yê dewletê hebe jî, ji bo kesên ne ji civaka Tirk, da ku di dadgehan de zimanê xwe yê dayîkê bikarbînin, wê hercûrê alikarî bê kirin.**( benda 39)**

- Di peymana Lozanê de mafên gelê Kurd hatibûn binpêkin. Di rastiyê de Hêzên Hevpeyman, rastiya dewleta Tirk û rewşa gelê Kurd baş dizane û ji nêzîk ve dişopîne. Lê, Kurd bi bûn qûrbana berjewendiyên Ewrûpiyan. Da ku pirsgirêka Mûsilê çareser bikin, Kurd dikirin qûrban. Hêzên Hevpeyman, pirsgirêka Gelê Kurd danîbû aliyekî. Li himber vê jî dewleta Tirk dest ji rika xwe ya ji bo bajarê Mûsilê berdabû.

Peyamana Lozanê, ji bo gelê Kurd rûpeleke reş e. Ji beriya vê peymanê, Kurdistan di navbera Osmanî û Safewiyan de bi Peymana Qesra Şîrîn sala **1639'an** bûbû dû parçe. Bi vê peymanê jî welatê me di navbera dewletên Tirkiye, Îran, Iraq û Sûryê de dibû çar parçe. Lê gelê Kurd ti caran ev peyman nasnekiribû. Nerazîbûnên li dijî vê peymanê di her derfeteke biçûk de xwe dida diyarkirin. Di her çar parçeyên welatê me de jî piştî vê peymanê û şûn de xwe rêxistinkirin û şerê li dijî dagirkeriyê gûr bûye. Têkoşîna jiyaneke azad û welatekî serbixwe heya roja îro jî berdewam dike.

## WANE 40.

### Pirsên Amadekariyê

1- Amadekariyên serhildana Şêx Seîd çawa hatin kirin?
2- Çima serhildanê bê xwext destpêkir?
3- Pirsgirêka bingehîn ya vê serhildanê çi ye?

## 4- SERHILDANA ŞÊX SEÎD

### *a- Amadekariyên Serhildanê*



Serhildana gelê Kurd ya di bin pêşengiya Şêx Seîd de destpêkirî, di dîroka gelê Kurd de xwediyê cihekî girîng e. Amedekariyên vê serhildanê hîn di destpêka sala **1920'**an de destpêkiribûn. Xebatên rêxistinên Kurdan di Bihara **1923'**an de di nava rêxistina bi navê **"Komîteya Îstîqlala Kurdistan"** de hatibûn komkirin. Vê rêxistinê xebatên xwe yên ji bo serhildanê pir veşartî dimeşandin.
Serokê komîteyê Xalid Begê Cibranî bû. Xalid Begê Cibranî, di dibistanên Êlan de xwendibû û piştre jî di nava Alayên Hemîdiyê de weke fermandar cih girtibû. Xalid Begê Cibranî, di nava demeke kurt de bi Hacî Mûsa Begê serokê êla Mûtkiya, bi serokê êla Hesenan Xalid Begê Hesenanî û bi serokêlên cûda re jî peywendî sazkiribûn. Vê komîtê di nava artêşê de jî xwe bi rêxistin kir û hinek fermandarên Kurd yên di nava artêşa Tirkan de kar dikirin, kişandin aliyê xwe. Di nava van femandaran de yên ji Iraqê jî hebûn. Bi rêya van kesan bi Bexda û Helebê re jî peywendî hatin çêkirin.
Komîta Azadiya Kurdistan, da ku kesayet, axa û Şêxên welatparêz bikşîne nava xwe xebat da meşandin. Di vê navê de Şêx Seîd, bi hezkirin û rêzdariya xwe ya di nava gel de bal dikişand. Yek ji rêveberê komîteyê Yûsûf Ziya, di dawiya havîna **1923'**an de ji bo bi Şêx Seîd re hevdîtinekê pêkbîne diçe Xinisê. Di vê hevdîtinê de Şêx Seîd di hemû alî de piştgiriya xwe ya ji bo tevgera Kurd û serhildanê dide diyarkirin.

Ji demekê şûnde Yûsûf Ziya bihara **1924'an** li Erzirûmê bi Xalid Begê Cibranî re hevdîtinekê pêktîne. Di vê hevdîtinê de biryara sazkîrina peywendiyên bi Şêx Mehmûdê Berzencî û Simkoyê Şikakî re tê standin. Dîsa li gorî encamên vê hevdîtinê, wê bi rêya Kurdên Sûrye peyamek ji bo Koma Netewan bihatiba şandin da ku alîkarî ji bo Kurdan bihatiba kirin. Piştî vê hevdîtinê Yûsûf Ziya navçeyên li derdora Mûş, Çewlîk û Amedê ziyaret dike û xebatên xwe yên ji bo destpêkirina serhildaneke li dijî dagirkeriya Tirk ji bo wan bide ragihandin.

Ev xebat û tevgerên pêşengên Kurd bala rêveberê Tirk dikişîne ser xwe. Li ser fermana Mistefa Kemal cotmeha **1924'an** Yûsûf Ziya û di Kanûna heman salê de jî, Xalid Begê Cibranî hatin girtin û ji bo darezandinê şandin Bedlîsê. Piştî vê bûyerê ji rêveberiya komîtê Hacî Mûsa Beg jî hat girtin û ji bo girtina xebatkarên din jî ferman hat derxistin.

Dema ev rêveberên Kurd têne girtin, hîn serhildanê destpênekirî, tevger bê serî dimîne. Li ser vê yekê bi pêşniyara Xalid Begê Cibranî, Şêx Seîd ji bo serokatiya Komîteya Îstîqlala Kurdistan tê hilbijartin.
Bi hilbijartina Şêx Seîd re, komîte biryara serhildaneke giştî û rizgarkirina girtiyan ji zindanên Tirkan distîne. Hîn Xalid Begê Cibranî nehatî girtin, kurê Şêx Seîd yê binavê Elî Riza ji bo rêxistinkirina serhildanê çûbû Helebê. Kongreya ku li Helebê kombûyî de, kesayetiyên Kurd yên ji Tirkiye, Sûrye û Iraqê beşdar bûbûn. Di kongrê de rewşa Bakurê Kurdistanê bi giştî hatibû destgirtin. Di kongrê de weke dîroka destpêkirina serhildanê jî 21'ê Adarê **(roja Newrozê)** hatibû destnîşankirin.

Şêx Seîd hewildanên xwe yên ji bo tevlî serhildanê kirina hejmareke mezin axa û begên Kurd zêde û fireh kir. Bi vê armancê bi Kurdên Elewî yên li herêma Dêrsimê re jî peywendî pêkanîbûn. Ev hevdîtinên ku bi Seyîd Riza û serokêlên Kurd re hatin pêkanîn ku rewşenbîrên weke Elî Şêr û Dr. Nûrî Dêrsimî jî beşdar bûbûn, encameke erênî dernaxe holê. Di vê de nakokiyên mezhebî yên di nava Kurdan de û xirabiyên Kurdên Sûnnî yên di pêvajoya Alayên Hemîdiyê de çêbûyîn, bandora xwe dabû nîşakirin. Kurdên herêma Dêrsimê soza ji paşve lênexistina serhildanê dabûn. Lê piştgiriyeke zêde ji serhildanê re çênekiribûn.

### *b- Destpêkirina Serhildanê*

Coş û xûrûşa amedekariyên serhildanekê berfireh, di nava navçe û bajarên Kurdan de her ku diçû zêde dibû. Şêx Seîd hîna jî ger û seredanên xwe didomandin. Li hemû gund û bajaran bi awayekî kêyfxweş û bi rêzdarî dihat pêşwazîkirin. Bi sedan şervanên Kurd beşdarî hêzên wî dibûn. Şêx Seîd dawiya çileya **1925'an** de bi alîkarên xwe ve navçeyên Dêra Hênê, Lice û Hanî ziyaret dike.
Şêx Seîd **5'ê Sibatê** bi komek serokêl û bi sedan leşkerên xwe ve hat gundê Pîrana ser bi navçeya Erxeniyê. Li vê derê li mala birayê xwe Şêx Evdirehîm bicihbû.
Di meşandina van amedekariyên serhildanê de, dewleta Tirk jî li gorî xwe tevdîrên xwe yên ewlekariyê girtibûn. Ji destpêka amedekariyên serhildanê heya wê demê, bi alîkariya sîxurekî bi navê Qasimê Cibranî dewleta Tirk rojane agahî digirtin. Qasim ji fermandarekî Alayên Hemîdiyê bû û hevalê Şêx Seîd e.

Hîn amedekarî temam nebûyîn, destwerdana amedekariyan hat kirin. Bi vê armancê komeke leşkerên Tirk heman şevê çûn mala birayê Şêx Seîd ku Şêx Seîd bi xwe jî li wê derê bû. Fermandarê leşkeran deh kesên Kurd ku li wî gundî bûn, ji wan xwestin. Lê Şêx Seîd ev daxwaza leşkerên Tirk red kir. Li ser vê çendê, di navbera wan de şer derket. Leşkerek hat kuştin yên din jî dîl hatin girtin. Ev bûyera ku **8'ê Sibata 1925'an** destpêkirî derbeyek li plana serhildanê dida.

Birayê Şêx Seîd, Şêx Tahir dema vê bûyera li Pîranê qewimiyî dibihîze, di **10'ê Sibatê** de li gundê Serdî, li ser postexaneya Lîceyê de digre û dest datîne ser tiştên heyî. Bi 200 leşkerên Kurd ve **11'ê Sibatê** tê cem Şêx Seîd û belge û pereyên bi destxistî radest dike. Ev bûyerên qewimîn, dibûn destpêka serhildaneke bêwext û nû li dijî dagirkerên Tirk.

Serhildan gav bi gav fereh dibû. Lê amadekariyên serhildanê hîn bi gîştî ne temam bûn. Ev rewş jî dihate wateya prevaksiyonekê. Tam ne amadebûyîna serhildanê di encamê de dibû sedema tekçûyînê. Gelek noker û sîxûrên înglîzan bandora xwe li ser vê rewşê kirin. Hejmara serhildêrên Kurd yên di bin pêşengtiya Şêx Seîd de, hîn destpêkê gihiştibû 10.000

kesî. Serhildêrên Kurd **15'ê Sibatê** bajarê Gêncê dagir kirin. Parêzger û karbidestên Tirk dîl hatin girtin. Li şûna parêzgerên Tirk yekî Kurd bicih kirin. Bi îmzeya Şêx Seîd zagoneke awarte hat derxistin. Li gorî vê zagonê bajarê Gêncê weke paytexta demî ya Kurdistanê hat ragihandin. Serhildêran bi vê re biryarek jî weşandin. Rakirina bacên giran ku girseyên gel pir pê diêşiyan hat ragihandin. Serhildan di demeke kurt de li herêmeke berfireh belavbibû. 14 bajarên Kurdistanê ketibûn bin pêla serhildanê. Di herêmê de hejmara gelê Kurd pir zêde bû. Li gel Kurdan civakên Ereb, Ermenî, Çerkez û yên din jî piranî tevlî serhildanê dibûn.

### *c- Pêşketina Serhildanê*

Serhildana Şêx Seîd ew qas bi lez pêşketibû ku dewleta Tirk matmayî hiştibû. Tevayî tevdîrên ewlekariyê vala derketibûn. Di Sibata **1925'an** de piraniya Kurdistaniyan coşeke bilind ya azadiyê jiyan dikir. Serokêlê Êla Hesenan Xalid Beg di cih de bajarê Mûşê zeftkir. Hesen Begê ji êla Cibraniyan Xinûs, Şêx Evdûla jî Warto bi destxistin. Piştî şerekî sivik Kîxi û Egil, Hênê, Lice, Pîran û Çepeqçûr hatibûn bidestxistin. Birayê Şex Seîd, Şêx Evdirehîm Maden bidestxist. Şêx Eyûb Çermûk dagirkir û hêzên xwe tevlî yên Şêx Evdirehîm kir. Bi hev re çûn ser Erxeniyê. Herêmên Sîlwan, Bişêrî ji Tirkan hatin standin. Piştî wê Melezgîrt û Bûlaniq hatin dagirkirin. Serhildan ber bi Meletî ve fireh bû. Pûtûrge hat bidestxistin.
**28'ê Sibatê** Şêx Seîd baregeha xwe ya leşkerî kişand Palûyê. Di vê demê de qasî 20.000 leşkerên Şêx Seîd amede bûn. Rewşa şer ji vê baregehê dihat şopandin. Meş û serkeftina leşkerên Kurd xwezayî çêdibû. Girseyên Kurd bi hêviya rizgarbûna ji dagirkerên Tirk bi hemû derfetên xwe ve tevlî serhildanê dibûn. Her cihê ku rizgar dibû, kom bi kom û bi coş tevlî hêzên Şêx Seîd dibûn. Ev meşên mijara gotinê ne bi awayekî sazûmanî pêkdihatin. Piranî hêzên girêdayî axa û Şêxên Kurd bûn. Bi vê boneyê her carê tevger û hewildanên dihatin hêvîkirin, pêknedihatin.

Piştî bajar û navçeyên li derdora Amedê hatin dagirkirin, Şêx Seîd berê hêza Kurd da Amedê. Amed ji aliyê leşkerên Tirk ve gelekî baş dihat parastin. Piştî şkandina berxwedana vî bajarê pîroz, wê serxwebûna Kurdistanê bihatiba ragihandin.
Şêx Seîd ji bo bajarê Amedê bê şer radestî hêzên Kurd bêkirin, peyamekê ji bo fermandarên bajêr yên Tirk dişîne. Ji ber ku ev peyam ji aliyê hêzên Tirk ve nehat pejirandin, Şêx Seîd di destpêka meha Adarê de biryara êrîşa ser Amedê stand. Li ser vê biryarê hêzên Kurd êrişî Amedê kirin. Hêzên Tirk bi çekên giran hemû riyên ketina bajêr girtibûn. Di destê leşkerên Kurd de mawzer, çifte û di destê hinekan de jî kopal hebûn. Êrîşa ku di **11'ê Adarê** de di Deriyê Mêrdînê re çêbûyî, rastî berxwedana hêzên Tirk hat. Di vî şerî de hejmareke zêde Kurd hatin kuştin. Yên din jî paşde vegeriyabûn. Destneketina bajarê Amedê bûbû sedema şkestina bawerî û gewilê leşkerên Kurd. Ji ber vê sedemê Şêx Seîd fermana paş ve zivirînê dabû. Vê şkestinê bandora xwe li ser pêvajoyên din jî çêdikir. Ji vir pêde rewşa serhildanê her roja wêdetir xirabtir dibû. Dema ku leşkerên Şex Saîd ketin Amedê wan noker û sîxûrên înglîzan destwerdana ser malê civakê kir. Ev rewş di nava gelê Amedê de bû sedema nerazî bûnan. Armanca van destwerdanan di nav civakê de reşkirina serhildanê bû.

### *d- Paşketin û Têkçûna Serhildanê*

Piştî vê şkestinê leşkerên Tirk yên ji piraniya bajarên Kurdistan û Tirkiyê hatin komkirin, di bin fermandariya Îsmet Înonû de ji dû milan ve hêzên Kurd dorpêç kirin. Di milê bakur de 40.000 di milê başûr de jî 30.000 leşker komkiribûn. Şêx Seîd di van mercan de hemû hewildanên xwe ji bo sazkirina peywendiyê di navbera rayedarên Kurd de û ji bo başkirina

rewşa derketî holê bikar tîne. Lê tevayî xebatên heyîn nekarîn hêzên Kurdan bi ser hev ve bînin.

Di vê navê de leşkerên Tirk yên ber bi Amedê ve di meşiyan, hêzên Kurdan ber bi geliyên Hênê ve dehf didan. Hêzên Şêx Evdirehîm yên li Erxeniyê der be xwarin jî, tevlî hêzên Şêx Seîd bûn. Hêzên serhildêr ber bi Dêra Hênê ve paşve kişiyan. Ji vir jî belavî gelek beşan bûn û di daristanên herêmê de xwe bi cihkirin. Şêx Seîd li gel serokol û Şêxên serhildêr ji Dêra Hênê derket. Roja 27'ê Adarê çû Çepeqçûrê. Li vê derê li benda hêzên din yên Kurd man.

Alozî û talanên li Elezîz û cihên din çêbûyîn, di navbera rêveberên Kurd de dibû sedema nêrînên cûda. Di heman demê de hinek serokêlên herêma Elezîzê xwe dabûn aliyê hêzên Tirk. Ev û hinek hêzên din yên hatin xapandin, paşve li hêzên Şêx Şerîf dabûn. Di encamê de **1'ê Nîsana 1925'an** hêzên Kurd ber bi Paloyê ve paşve kişiyan. Hêzên Tirk **6'ê Nîsanê** ketin Çepeqçûrê. Şêx Seîd li ser vê çendê bi 300 leşkeran ve ber bi bajarê Solxanê kete rê.

Xalid Begê Hesenanî, Elî Riza û birayên Xalid Begê Cibranî êrişek li ser Xinisê pêkanîn. Lê di vê êrişî de serneketin. Li ser vê bûyerê ber bi Îranê ve ketin rê. Di rê de rastî êrişa Êla Heyderan hatin. Xalid Begê Hesenanî û yên pê re, derbazî Îranê bûn. Di axa Îranê de vê carê rastî êrişa Îraniyan hatin. Di vî şerî de kurek yê Xalid Beg, yek yê Şêx Seîd û hinek din şehîd ketin. Xalid Beg û yên din çûn cem Simkoyê Şikakî.

Rêveberiya Enkerê ji bo bi destxistina rêveberên serhildanê û têkbirina serhildanê serî li hemû rêyan didan. Êlên tevlî şoreşê bûyîn bi pere, cezakirin û xapandinên din dikişandin aliyê xwe. Li milekî din di derbarê Şêx Seîd de nûçeyên derew yên weke “zilamê Îngîlîzan e” dida belavkirin. Bi vî awayî piraniya êlan xwe ji rexê şoreşê dabûn aliyekî.

Hêzên Franse yên li Sûrye jî di vî şerî de alîkariya Tirkan kirin. Leşkerên Tirk bi destûra fermandarên Fransiz bi xaka Sûrye re derbaz bûn û li paş serhildêran zivirîbûn. Bi vî awayî ew tengav kiribûn.
Di nava meha Nîsanê de, hêzên sereke yên serhildanê, di geliyên Gêncê de hatin dorpêçkirin û li wir derbeyeke giran xwarin. Rêveberên serhildanê bi xiyaneta Qasimê Cibranî li ser Pira Evdirehman ya li ser Çemê Mûradê ketin destê leşkerên Tirk. Bi vî awayî Şêx Seîd, Şêx Evdila, Şêx Elî, Şêx Xalip, Reşîd Axa, Mihemed Axa, Teymûr Axa û 26 serhildêrên din ketin destê hêzên Tirk. Komên serhildêr yên bêpêşeng mayîn di Çiyayê Şerefdînê de xwe bi cihkirin. Ev koma serhildêran jî li vê derê hatin dorpêçkirin û belav bûn.

Rayedarên Tirk piştî ku serhildan têkbirin, li dijî rêveber û rewşenbîrên Kurd dest bi girtinên giştî kirin. **13'ê Nîsana 1925'an** rêveberê Cemiyeta Îstîqlala Kurdistanê Seyîd Ebdûlqadir, kurê wî Seyîd Mihemed û çend kesên din girtin. **27'ê Gûlana 1925'an** Seyîd Ebdûlqadir, kurê wî, Kemal Fewzî û hinek kesên din ji ber ku beşdarî sehildanê bûne hatin dardekirin. Li ber sêdarê jî Seyîd Ebdûlqadir û hevalên xwe bi dirûşmên **“Bijî Azadiya Kurdistan, bijî Gelê Kurd û hwd...”** diçûn ser dilovaniya xwe.

Di **Gûlana 1925'an** de li dijî Şêx Seîd û hevalên wî darezandineke ku mehekê ajot destpêkir. Dadgehên Îstîqlal yên Amedê, **29'ê Hezîranê** di serî de Şêx Seîd li dijî 47 kesan cezayê dardekirinê birî. Cezayê dardekirinê roja paştir hat pêkanîn.

**Serokê serhildanê Şêx Seîd li ber sêdarê wiha digot: "Jiyana min ya xwezayî bi dawî dibe. Me jiyana xwe qûrbana jiyana gelê xwe kir. Ez ji vê tû caran ne poşmanim. Ji ber ku li hember dijminên me wê neviyên me ji xwe şerm nekin, ez gelekî bextewarim."**

Piştî serhildanê, dewleta Tirk dest bi girtina Kurdan  kir. Bi hezaran Kurd hatin kuştin. Bi deh hezaran hatin mişextkirin. Piraniya gundên li herêma serhildanê hatin şewitandin û heyînên wan hatin talankirin.

Bi têkçûna serhildanê re kiryarên dewleta Tirk yên di herêmê de pêkhatin, nivîskarê Rojavayî Armstrong bi vî awayî dinivîsand: "Kurdistan bi agir û Singoyan hat xirakirin. Zilam bi êşkenceyên giran re derbazbûn û hatin kuştin. Gund hatin şewitandin, zevî dan ber agir. Jin û zarok hatin revandin û kuştin. Tirkan dema Kurd dikuştin, di hêla tîbûna xwînê de û di xedariyê de ji bav û kalên xwe yên dema Sirp, Yewnan û Ermenî qetil dikirin, qet şûnde neman. Ji her temenî Kurd bi biryarên lezgînî yên dadgehên leşkerî dihatin dardekirin. Diçûn mişextê û dihatin zindankirin".

## WANE 41.

**Pirsên Amadekariyê**

1- Sazûmaniya serhildana Agirî li kû çêbû?
2- Teybetmendiyên serhildana agirî ji serhildanên din cuda çi ne?
3- Dewleta tirk di serhildana agirî de hovîtiyeke çawa meşand?

## 5- Serhildana Agirî

Dewleta Tirk, ji bo rûniştandina sazûmaniya dagirkeriyê di welatê me de û bêdengkirina gelê Kurd, serî li her rêyan dabû. Bi têkçûna serhildana Qoçgiriyê re tevkujiyên di welatê me de destpêkirin, di pêvajoya serhildana Şêx Seîd de gihiştibûn asteke herî jor. Kurdistan di nava êgir de hiştibûn. Bi deh hezaran Kurd hatibûn kuştin û di bajarên dûr yên Tirkiye de neçarî jiyaneke hejarî kiribûn. Lê tevayî van kiryaran têra dûrxistina gelê Kurd ji hêviyên welatekî azad û jiyaneke însanî, nedikir. Hemû riyên xapandinê û siyasetên gemar, rastî berxwedanên gelê Kurd dihatin û bê wate diman.

Serhildaneke din ku mora xwe li dîroka serhildanên gelê Kurd yên ji bo azadiyê dayîn, ango serhildana Agirî di van mercan de dest pê dikir. Rêxistinên Kurd yên binavê Cemiyetî Tealiya Kurdistan, Cemiyetî Îçtîmaiyeyî Teşkîlati Kurd û Cemiyeta Îstîklala Kurdistan sala **1927'an** li Lûbnanê li bajarê Bîhemdûnê kongreyekê lidardixe. Ji derveyî rêveberên van rêxistinan, hinek serokêl û kesayetên welatparêz jî beşdarî vê civînê bûbûn. Kongreyê 45 rojan berdewam kiribû. Ev kongre di heman demê de dibû bingehê damezrandina partiya neteweyî ya binavê **“Xoybûn”**. Bi vî awayî rêxistineke neteweyî ya yekbûyî hatibû damezrandin. Di vê rêxistine da kesên ku cih digrin ev in; Memdûh Selim, Mehmet Şükrü Sekban, Mevlanazade Rifat, Îhsan Nûrî, Süreya Bedirxan, Xalil Ramî Bedirxan, Celadet Bedirxan û Kamran Bedirxan.




Di vê kongreyê de biryara destpêkirina serhildaneke liderdora Agirî û herêmên din yên Kurdistanê tê standin. Dîsa di vê civînê de ji bo pêşengiya serhildanê du kesayetiyên girîng têne hilbijartin. Ev kesayetiyên girîng Birahîmê Hûsikê Têlî û fermandarê navdar Îhsan Nûrî paşa bûn. Ji derveyî van Zîlan Beg jî di vê serhildanê de cihekî girîng digirt. Birahîmê Hûsikê Têlî bi kar û barên rêxistinê yên siyasî ve, Îhsan Nûrî Paşa jî bi xebatên leşkerî ve mijûl dibû.

Rêxistina Xoybûn weke armanca xebatê xwe lî ser regezên ku Wîlson ji bo neteweyan diyar kiriyê esas digrin û di vê çerçovê de hewldanên xwe peşdixin. Di avakirina Xoybûn de ji Fransiza û ji ermeniyên taşnak jî alîkarî distînin. Di xwazin li ser vê bingehê Kurdîstanekê ava bikin. Bingeha van rewşanbîran ji tevgera jon-Tirk û Îtîhat û Terakî tê.

Bi belavbûna serhildana Şêx Seîd re hinek komên biçûk yên çekdarên Kurd, di çiyayên Çepeqçûr, Farqîn, Sason û Agiriyê de li dijî dagirkerên Tirk têkoşîn didan domandin. Xoybûn, piştî ku tê damezrandin, da ku van komên çekdar yên belav, di bin bernameyekê de bike yek û ji bo berjewendiyên netewî bide şer kirin, xebat dida meşandin. Di vê navê de rojnameyeke bi navê **“Agirî”** ku bi Kurdî weşan dikir dihat derxistin.

### *a- DAMEZRANDINA XOYBÛN Û SERHILDANA AGIRÎ YA 1927'AN*

Rêxistina Xoybûn, li Agirî û li derdora wê dest bi xebatên li darxistina serhildaneke li dijî dagirkeriyê kiribû. Ji bo vê armancê komikên biçûk yên piştî serhildana Şêx Seîd xwe di çiyayên Kurdistanê yên derdora Amed, Çewlik û Mûşê de parastin anîn rexhev û di perwerdeyeke leşkerî û siyasî re derbaz kir. Van komên biçûk yên çekdar, di xebatên hişyarkirina girseyên gel li dijî dagirkeriyê de cih digirtin. Di heman demê de li dijî baregehên leşkerî yên di herêmê de çalakî lidar dixistin û kesayetên Kurd yên hevkarî bi dijmin re dikirin, seza dikirin. Çalakiyên çekdarên Kurd yên li herêmên Kurdistanê çêbûyîn, rêveberiya Enkerê dixist nava fikaran. Rêveberiya Enqere ji ber vê çendê dest bi amadekariyên êrîşeke leşkerî ya li dijî çiyayên Agirî dike.
Serhildana Agirî di havîna **1927'an** de bi êrîşa leşkerên Tirk destpê dike. Leşkerên Tirk ji Îdir û Bazîdê ji du milan ve û bi hev re êrîş anîn ser çiyayê Agirî. Şer û pevçûnên dijwar pêkhatin. Hejmara kuştiyên herdû aliyan jî pir zêde bû. Bê navber mehekê şerên giran domandin. Leşkerên Tirk qasî 2000 kuştî dan. Ji derveyî kuştiyan, gelek cûrên çekan û kelûpelên din yên leşkerî ketin destê hêzên Kurd. Leşkerên Tirk piştî vê şkestinê hêzên xwe paş ve kişandin. Di vekişandinê de tola xwe ji gundên Kurdan hiltanîn. Gund di şewitandin, sewalên wan bi xwe re dibirin. Girseyên gel di îşkenceyan re derbaz dikirin.
Di payîza **1927'an** de êrîşên Kurdan yên li ser baregehên leşkerên Tirk didoman. Serhildanê bandora xwe li bajarên Wan, Melezgirt, Mûş, Bedlîs û Sêrtê da belavkirin. Kuştî û dîlên leşkerên Tirk gihiştîbûn hejmarên mezin.
Fermandariya Tirk piştî vê bûyerê di herêmê de hejmareke zêde leşker da komkirin. Bi temamkirina amadekariyan re êrîşî hêzên Kurd yên li herêma Agiriyê kirin. Êrîşa leşkerî ji aliyê balefirên şer ve dihatin piştgirî kirin. Di encama êrîşên ji bejayî û hewayî yên li ser çekdarên Kurd çêbûyîn de, di dawiya payîza sala **1927'an** de hêzên Kurd şkestin û ber bi rojhilat ve paşve kişiyan. Serhildana çekdarên Kurd ya **1927'an** de bi vî awayî bidawî bû.

### *b- Serhildana Agirî Ya 1930'an*
Serhildana Agirî ya **1927'an** hatibû şkandin. Serhildêran careke din xwe komî serhevkirin û biryara li darxistina serhildaneke nû girtin. Amadekariyên rêxistina Xoybûn, hem li welat û hem ji derveyî welat berdewam dikirin. Her dû aliyan jî sala **1928 û 1929** bi amadekariyan derbaz kiribûn.
Komara Tirk li jorên Agirî leşker û çek kom dikirin. Ji bo derbazbûna leşkerên xwe rê û ji bo mayîna wan jî baregeh ava dikirin. Rêveberiya Enkerê tevayî hêza xwe dabû lêgerînên alîkariyê yên ji der ve. Rayedarên Tirk di vê demê de gelek caran di navbera Îran û Yekîtiya Sowyetê de çûn û hatin pêkanîn. Piştî hejmareke zêde hevdîtinên di navbera her dû aliyan de, piştgiriya Îranê bi destxistin. Li beramberî vê piştgiriyê, beşek ji xaka xwe dida dewleta Îranê. Di navbera herdû dewletan de, ji Peymana Qesrî Şirîn ya **1639'ê** cara yekemîn bû ku sînorên wan dihatin gûhertin. Piştî piştgiriya Îranê, di heman demê de ya Yekîtiya Sowyetê jî dihat bi destxistin.
Li gel riyên dîplomasiyê yên di navabera dewletên cîran de serî li riyên din jî dihat dayîn. Parlamentoya Tirkiyê di nîvê Gulana **1928'an** de komisyoneke lihevanînê sazkir. Vê komisyonê piştî demekê daxwaza hevdîtinê ji Îhsan Nûrî Paşa kir. Pêşniyar ji aliyê Kurd ve hat pejirandin û her dû alî hatin rexhev. Di vê hevdîtinê de ji bo serhildêran pêşniyara lêborînê û ji bo Îhsan Nûrî Paşa jî, di karê dewletê de cihekî bilind dihat pêşniyar kirin.
Aliyê Kurd pêşniyara komisyona li hevhatinê redkir. Weke din diyarkir ku ji bo rawestandina têkoşînê yekemîn mercên wan naskirina mafên netewî yên gelê Kurd e.
Li aliyê din rêxistina Xoybûn jî amadekariyên xwe didomandin. Hejmareke zêde çekdar ji bo serhildanê hatibûn komkirin. Di derbarê armancên serhildanê de di perwerdeyekê re hatibûn derbazkirin. Ji bo şervanan cil hatibûn amadekirin. Li pêşiya kumên leşkeran weke

sembola Agiriya mezin û ya biçûk nîşanek hatibû bicihkirin. Li ser yê fermandaran jî nîşana Xoybûn ya asta fermandariya wan diyar dikir hebû. Nîşana Xoybûnê xencer, guliya genimî, pênûs û roj bû.
Xoybûnê, ji bo rêxistinkirina girseyên gel, komên biçûk yên ji fedayiyan pêkhatî derbarî hûndirê welat dikirin. Ev komên çekdar yên derbasî herêmên hûndir yên Kurdistanê bûyîn, li ser riya xwe de êrîş dibirin ser leşkerên Tirk û di hişyarbûna gel de xebat dimeşandin.
Di destpêka sala **1930'an** de piraniya herêmên Agirî û derdora wê di destê serhildêran de bû. Sazûmaniyeke rûniştî ya dewleta Tirk di herêmê de nedihat dîtin. Tirk, hêzeke biyanîbûn û bi zorê Kurdistan dagirkiribûn. Ji ber vê çendê di herêmê de hêzeke ku li ber xwe bide ne dixwest.
Li dijî baregehên leşkerên Tirk, di bihara **1930'an** de êrîşên hêzên Kurd di piraniya herêma Agiriyê de destpêdikir. Êrîşên pêkdihatin, nehatin rawestandin. Leşkerên Tirk bi rijandina xwînê û bi belavkirina tirsê dikarî di Kurdistanê de xwe li ser piyan bigre. Cardin serî li vê rêyê dida û gund û bajarên Kurdistanê di şewitandin.
Artêşên Tirk **6'ê Nîsana 1930'an** li dijî hêzên çekdar dest bi êrîşan kirin. Êrîşên pêkhatî, rastî berxwedanên tûnd hat û vala derketin. Di şerên qewimîn de hejmareke leşker hat kuştin. Bi şkestina vê êrîşê re pêla serhildanê belavî herêmên dûr yên Kurdistanê jî dibû. Rêveberiya Enkerê hewildida ku êlên Kurd li dijî serhildêran bide xebitandin. Lê di vê hewildana xwe de bi ser neket. Tirsa dewleta Tirk ji vir pêde zêdetir mezin bû. Dîsa serî li riyên komkirina leşkeran ji herêmên Tirkiyê dan. Şerê ku heya Gulanê berdewamkirî de, ji derveyê kuştiyan 2000 leşkerên Tirk dîl ketin destê hêzên Kurd û 12 balefirên cengê hatin êxistin. Ji derveyî kuştî û dîlan hejmareke mezin çekên giran û sivik ketin destê serhildêran.
Leşkerên Tirk di meha Hezîranê de bi alîkariya balefirên şer, leşkerên Kurd, di geliyên sînorên di navbera Îran û Tirkiye de tengav kirin. Lê, Kurdên herêma Makoyê hatin alîkariya Kurdan . Fermandariya Tirk, di vê rewşê de neçarbû hêzên xwe paş de vekişîne. Di vê navê de di herêmên di navbera Başkale, Seray, Ercîş, Patnos, Wan û Zîlanê de serhildan gur bûbû. Rêveberiya Tirk da ku navenda serhildanê dorpêç bike, hêzên xwe li herêmê kom dikirin. Di herêma mijara gotinê de biqasî 10.000 çekdarên Kurd serî hildabûn. Ev pêla serhildanê ya dişibiya serhildana **1925'an**, rêveberiya Enkerê pir tirsand. Hejmareke mezin leşker anîn herêmê. Şerê di navbera herdû aliyan de heya dawiya **Gulana 1930'an** berdewamkir.
Di vê demê de berxwedana aliyê Kurd hatibû şkandin. Rêxistina Xoybûn jî da ku bala dijmin bikişîne ser xwe di vê pêvajoyê de hejmareke leşkerên Kurd ji Iraq û Sûryê derbasî herêmên Mêrdîn, Midyad û Sirûcê kir. Lê bandoreke ya vê hêzê li ser leşkerên Tirk çênebûbû. Piştî şerekî di navbera vê hêzê û leşkerên Tirk de paş de vegeriyabûn.

### *c- Têkçûna Serhildanê û Komkujiya Geliyê Zîlan*

Êrîşa giştî ya li dijî serhildêrên Agiriyê, di destpêka meha **Êlûna 1930'an** de destpêkir. Dewleta Tirk ji ber têkçûna êrîşên derbazbûyî, vê carê li herêmê qasî 60.000 leşker dabû komkirin. Da ku serhildanê bidin şkandin, hemû derfetên xwe bikartanî. Ji **2'ê Êlûnê heya 15'ê Êlûnê** şerê kozikan domand. Di jor de jî balefiran çeperên serhildêran bombebaran dikirin. Di vê rewşê de heya nîvê Êlûnê şer berdewamkir.
Bê hevsengiya hejmara leşkeran, kêmbûna çek û cebilxane, pirsgirêka xwarinê, sir û sermaya çiyayê Agirî û di herêmên şer de hebûna bi hezaran jin û zarokên ne dikarîn şer bikin, ji bo serhildêrên Kurd bandoreke neyînî dida afirandin.
Bi taybet rewşa jin û zarokan di vê demê de bargiranî çêdikir. Ji ber vê çendê da ku ji komkujiyeke leşkerên Tirk bêne parastin, biryara derbazkirina xaka Îranê ya van jin û

zarokan hat dayîn. Bi vê biryarê ve li gel jin û zarokan hejmareke şervan di bin fermandariya Îhsan Nûrî Paşa de derbasî Îranê bûn û xwe radestî rayedarên Îranê kirin.
Yekîneyên Kurd yên din jî derbasî Zîlan, Abaga û Bûlaniqê bûn û şerê bi hêzên Tirk re heya demekê berdewamkirin. Birahîmê Hûsikê Têlî û hevalên xwe yên din heya meha cotmehê xwe di çiyayê Agirî de parastin. Piştî demeke din di herêmên derdor de xwe diparêzin û ew jî derbasî Îranê dibin.
Dewleta Tirk dema serhildan dihatin şkandin, derfetên mezin bidest dixistin. Ji ber ku şkandina her serhildanekê dibû bingehê xwe di Kurdistanê de bicihkirina sazûmaniya dewleta Tirk. Êrîşên li ser girseyên gel û şewitandina gund û bajarên Kurdan piştî serhildan dihat şkandin, destpêdikir. Li gorî daxwiyaniyên rêxistina Xoybûn leşkerên Tirk 660 gundên Kurdan yên di herêma serhildanê de dibûn ber agir. 15260 xaniyan xira dike û bi deh hezaran Kurd, di bajarên Tirkiyê yên dûr de dide bicihkirin.
Di vê pêvajoyê de tevkujiya herî mezin li Geliyê Zîlan rûdaye. Di pêvajoya şer de pîr, jin û zarok di Geliyê Zîlan de ku gelekî asê bû hatibûn bicihkirin. Dema berxwedana şervanên Kurd hat şkandin, leşkerên Tirk xwestin tola xwe ji van kesên bê gûneh bistînin. Di dawiya payîza 1930'an de leşkerên Tirk xwe berdan gelî û hemû kesên vê derê yek bi yek kuştin. Ev bûyer weke tevkujiya Geliyê Zîlan derbasî rûpelên dîrokê dibe.
Li gorî rojnameya Cûmhûryetê ku weke weşaneke fermî ya dewleta Tirk dihat naskirin, di dawiya sala **1930'an** de 15.000 Kurd hatibûn kuştin. Hejmara kuştiyên Geliyê Zîlan ku diket di navbera Bazîd û Ercîş ê de ji hezaran derbaz dikir. Piştî serhildana Agirî ku li gorî demê serhildana herî zêde berdewam kiriye tê şkandin, li herêma şer tirbeke ji çîmentoyê tê çêkirin. Li ser tirbê jî dinivîsin **" Kurdistana xeyalî li vê derê veşartiye".**

# UNÎTE 5.

**WANE 42.**

**5-SERHILDANA DÊRSIMÊ**

**B- TÊKÇÛNA SERHILDANA DÊRSIMÊ**

**C- ENCAMÊN GIŞTÎ YÊN SERHILDANÊN SEDSALA 20. AN DE SEDEMÊN SERNEKETINÊN SERHILDANÊN GELÊ KURD**

**WANE 43.**

**BÛYERA 33 GULEYAN**

**WANE 44.**

**DI PÊVAJOYA ŞERÊ CÎHANÊ YÊ DÛYEMÎN Û PIŞTÎ ŞER PIRSGIRÊKA KURD**

**B-BAŞÛRÊ KURDISTANÊ**

**1- SERHILDANA MELE MISTEFA BARZANÎ**

**WANE 45.**

**B- KOMARA MEHABAD (22.01.1946 – 17.12.1946)**

**WANE 46.**

**A-DI SALA 1960 Û NÎVÊ DESTPÊKÊ YÊ 1970’AN DE TÊKOŞÎNA RIZGARIYA NETEWEYA KURD**

**WANE 47.**

**3-PEYMANA CEZAYÎR**

**4-Piştî Têkçûna Komara Mehabad Li Rojhilatê Kurdistanê Tevgera Kurd**

**WANE 48.**

**5-LI BAŞÛRÊ ROJAVAYÊ KURDISTANÊ TEVGERA KURD**

**KEMBERA ERABAN**

## WANE 42.


### Pirsên Amadekariyê

1- Çima Kurdên Dêrsimê tevlî serhikdanên herêmên din nebûn?
2- Serhildana Dêrsimê di kîjan şert û mercan de destpêkir?
3- Têkoşîn û berxwedana Jinên Kurd di serhildana Dêrsimê de xwedî girîngiyeke çawa ye?

## 5-SERHILDANA DÊRSIMÊ

Ji têkbirina serhildana Agirî heya nîvê **1930'**an civaka Kurd bi giştî bi mirovên xwe ve, bi gund û bajarên xwe ve û bi çiyayên xwe ve di nava birîn û êgir de hatibû hiştin. Endamên welatê birîndar weke roja piştî mehşerê ji bo careke din bighên hev li her derê şopên hevdû digeriyan. Malbat hatibûn parçekirin. Hatibûn qetilkirin û piraniya wan li ber deriyên xelkên biyanî bibûn penaber. Di pêvajoya serhildanên Şêx Seîd û Agiriyê de rayedarên Tirk da ku herêma Dêrsimê alîkariya serhildanan neke, siyaseteke zirav û serkeftî dabûn meşandin.

**6'ê Hezîrana sala 1936'an** meclîsa Tirk bi biryarekê navê Dêrsimê guhert û kir Tûncelî. Di heman demê de biryara "her kesê ku di xaka mîsaqî Millî de dijî Tirke û li Tikiyê ji derveyî civaka Tirk keseke/î din jiyan nake" girtin. Ev dihat wateya êrîşeke berfireh li ser herêma Dêrsimê. Weke serfermandarê vê tevgerê General Abdûllah ALPDOĞAN hatibû hilbijartin. Abdûllah ALPDOĞAN weke destpêk li herêma Dêrsim, Elezîz û Çewlikê rewşa awarte da ragihandin. Piştî vê, ji gelên li vê herêmê radestkirina 20.000 çekan xwestibû.
Seyîd Riza li dijî biryarê, nameyekê ji Abdûllah ALPDOĞAN re dişîne û rawestandina vê biryarê û naskirina mafê gelê Dêrsimê dixwaze.
General ALPDOĞAN li dijî vê hejmareke zêde leşker dişîne herêmê. Li ser Dêrsim û herêmên din jî her roj balafiran radike. Amadekariyên êrîşeke berfireh dike. Lê baran û berfa ku di vê demê de barî da rawestandin. Ji ber vê sedemê leşkerên Tirk neçarman ku hêzên xwe yên leşkerî paşve bikişînin.
Seyîd Riza di destpêka **1937'**an de ji bo rawestandina tevgera leşkerî û hevdîtina bi fermandarê Tirk Abdûlla ALPDOĞAN re kurê xwe derdixe rê.



Seyîd Riza Şêx Seîd

Fermandarê Tirk weke bersiva vê helwestê kurê Seyîd Riza Bira Îbrahîm li gundê Deştê dikuje. Li ser vê bûyerê Seyîd Riza ji bo tevgereke li dijî leşkerên Tirk, banga kombûna serok êlên herêmê dike. Êlên Hesenan, Yûsûfan û hinek din vê bangê dipejirînin û li Xalbûriyê komdibin. Ji vir pê de amadekariyên serhildanê destpêdikin.
Serhildan, di demeke kurt de belavî herêmên berfireh dibe. Hejmara şervanan gihiştibû 30.000 kesî. Êrîşên li dijî leşkerên Tirk, di tevayî herêmê de zêde bûbûn. Pir û rê dihatin xirakirin. Xetên telgirafan dihatin birîn. Li ser vê rewşê serok wezîrê demê Îsmet Înonû jî hatibû herêma şer. Di pêvajoya şer de, êlên herêma Ebasên desthilatdar, Kerebal, Kureyşan, Ferhadan, Demenan û Bextyarî jî tevlî şer bûbûn. Van êlan êrîşên dijmin bi berxwedanên mezin pêşwazî dikirin.
Di **Tebaxa 1937'an** de leşkerên Tirk ji bejayî û ji hewayî ve êrîşî Dêrsimê dikirin. Ji çend milan ve daristanên herêma şer dişewitandin. Bi vî awayî dixwestin berxwedana serhildêran

têkbibin. Di heman demê de serî li rêyên din jî didan. Da ku serokên serhildanê bidin qetilkirin, kesayetiyên xwefiroş bikartanîn. Çend serok êlên berxwedêr bi vî awayî hatibûn şehîdkirin. Yek ji wan kesayetiyên girîng jî Elî Şêr bû.
Seyîd Riza destpêka serhildanê ji bo girtina alîkariya Yekîtiya Sowyetê Elî Şêr amade dike. Elî Şêr rojekê ji beriya ku bikeve rê, ji aliyê biraziyê Seyîd Riza yê binavê Rêber ve tê şehîd kirin. Di vê bûyerê de hevjîna Elî Şêr Zarîfe jî hatibû şehîd kirin. Her di wê demê de Nûrî Dêrsimî jî da ku di derbarê êrîşên li ser Dêrsimê de çêdibûn raya giştî ya cîhanê agahdar bike çûbû Lûbnanê.

## B- TÊKÇÛNA SERHILDANA DÊRSIMÊ

Di payîza **1937'ê** de Dêrsim ji serî heya dawî di nava agir de bû. Bi hezaran jin û zarok hatibûn qetilkirin. Dewleta Tirk da ku vê keleya berxwedanê ya dawî têkbibe, hemû rêgezên şer bin pê dikirin. Bi vê re jî rastiya xwe derdixist ber çavê cîhanê. Di nava şehîdan de 47 kesên ji malbata Seyîd Riza jî hebûn. Hinek serok êlan xwe dabûn aliyê dijmin. Piraniya wan jî bi lehengî şehîd ketin. Berxwedana Dêrsimê ewqas tûnd bû ku, dewleta Tirk neçar mabû serî li riyên xapandinê bide. Di demeke ku di hemû aliyan de berxwedanên lehengî pêkdihatin de, parêzgerê Erzincanê daxwaza hevdîtin û aştiyê ji Seyîd Riza dikir. Ev daxwaz piştî bi serok êlan re tê nirxandin, tê pejirandin. Seyîd Riza **10'ê îlûna 1937'an** ji bo hevdîtinê diçe Erzîncanê. Lê li şûna hevdîtinê dest datînin ser û wî dixin zîndanê.
Ev rewş bandoreke mezin li ser Seyîd Riza çêdike. Bi bawerkirina Tirkan û hatina vê hevdîtinê gelek poşman dibe. Li gorî şahidên wê demê dema Seyîd Riza tê digehe ku ew xapandine dibêje; **"hûkumeta bê şeref û derewker"**. Ji derveyê vê hevokê tiştekî din ji bo wan nabêje.
Piştî demekê Seyîd Riza ji Erzîncanê dişînin Elezîzê. Li Elezîzê bi lez dadgehekê sazdikin. **18'ê Mijdara 1937'an** Seyîd Riza, kurê wî û heft kesên din têne dardakirin. Piştî dardakirinan, cenazeyên wana çend rojan li Elezîzê li ber çavên gel dihêlin û paşê divêşêrin.
Li ber dardakirinê Seyîd Riza van axaftinan dike **" Temenê min 75 sale. Ez şehîd dikevim û tevlî şehîdên Kurdistanê dibim. Dêrsimê winda kir, lê wê Kurdayetî û Kurdistan biserbikeve. Ciwanên Kurd wê tola me hilînin. Bila bimirin kesên zalim. Bila bimirin qehp û derewker".**
Di pêvajoya şerê Dêrsimê de bûyerên girîng yên tû caran neyên jibîr kirin, diqewimin. Yek ji vana bûyeran hevjîna Seyîd Riza Besê û bi dehan jinên Kurd in. Besê di pêvajoya herî giran a şer de li rex Seyîd Riza şer dike. Lê leşkerên Tirk dixwazin wê sax bi dest bixin. Besê, vî awayê teslîmbûnê napejirîne. Da ku sax nekeve destê leşkerên Tirk xwe ji serê lateke bilind tavêje xwar û weke Seyîd Riza û bi hezaran Dêrsimiyan tevlî şehîdên Kurdistanê dibe.
Leşkerên Tirk her carê dema serhildanên Kurdan têk diçûn, serî li tevkujiyên mezin didan. Lê tevkujiya Dêrsimê kombûna hemû tevkujiyên Kurdistanê ye. Hejmara kuştiyan bi dehhezaran dihat pîvan. Bi hezaran ji van jin û zarok bûn. Yên xwe ji latên bilind davêtin xwar û parçe dibûn, zû rizgar dibûn. Ji ber ku leşkerên Tirk di vê navê de rê û rêbazên di dîroka mirovahiyê de nehatî dîtin bikartanîn.
Jin, zarok û pîrên xwe di şkeftên Dêrsimê de veşartin, di dawiya şer de di şkeftan de dihatin komkirin. Hejmara van şkeftan ewqas zêdebû ku ji aliyê leşkeran ve hatibûn bireqem kirin. Paşê di hinek ji van şkeftên mezin de agir dadabûn. Yên ji nava agir rizgar dibûn, ji aliyê leşkerên ji der ve dihatin gûlebaran kirin. Deriyê hinek ji van şkeftan jî ji derve ve dû didan. Bi vî awayî kesên di şkefê de bi mirineke demdirêj û xerîb re rû bi rû diman. Ev kesên henê çawa jiyana xwe ji dest didan, heya niha jî kesek nizane. Di vê dema mijara gotinê de, ne tenê yên li berxwedayîn, yên teslîmbûyîn jî dihatin kuştin.

Azarkirina herêma Dêrsimê heya 1940'î jî berdewam kir. Hejmareke mezin êlên serhildêr yên ji kuştinê rizgarbûyîn mişextî jora Anatoliyê dikirin. Li gel van êlan hinek yên teslîmbûyîn jî, rastî heman helwestê dihatin. Ji vir şûn de, di herêma serhildanê de dibistanên yekem yên bi zimanê Tirkî perwerde didan, hatin vekirin. Ya balkêş ew bû ku di van dibistanên taybet de zarokên bê xwedî yên dê û bavên wan ji aliyê dewletê ve hatin şehîd kirin, di van dibistanan de bi ramanên PanTirkîzmê dihatin perwerdekirin. Bi demê re ev zarokên mijara gotinê dibûn kesayetiyên ji Tirkekî zêdetir neteweperest û li dijî gelê Kurd û tevgera azadiya Kurdistanê dihatin xebitandin.

Rayedarên Tirk piştî tevkujiya Dêrsimê ji parlamentoyê biryarekê derdixe. Li gorî vê biryarê **“herkesê ku di hûndirê mîsaqî Millî de jiyan dike Tirke û ji derveyî civaka Tirk tû keseke/î din di vî welatî de jiyan nake. Yek zimanê vê dewletê heye, ew jî zimanê Tirkî ye”**. Bi vî awayî jî heyîna civaka Kurd dihat înkarkirin û axaftina bi zimanê Kurdî jî dihat qedexekirin.

## C- ENCAMÊN GIŞTÎ YÊN SERHILDANÊN SEDSALA 20. AN DE

Di sedsala **20.** an de yek ji Împeretoriya herî mezin ya cîhanê, Împeretoriya Osmanî ji holê hatibû rakirin. Li ser xakên berfireh yên vê împeretoriyê bi dehan dewletên nû hatibûn damezrandin. Gelên ku bi sedsalan bi awayekî bindest jiyandikirin, di Şerê Cîhanê Yê Yekemîn de derfeteke mezin bidestxistibûn. Bi bandora şoreşa Fransa li hemû welatan serdema netew dewlet bela bûbû, di encama vê şoreşê de dewletên kapîtalîst weke ku di xwest di bin navê her netewê de dikare mafê xwe bi dest bixîne, her netewek wek dewletekê xwe bi rexistin bike.
Gelê Kurd jî, yek ji wan gelan bû ku demeke pir dirêj dibin dagirkeriya Osmaniyan de dijiya. Lê derfeta ku derketî holê nekarîbû bikarbîne. Gelek berdêl dan. Li dijî êrîşan gelek caran serî hildan. Kurdistan seranser hat şewitandin. Dewlemendiyên wê hatin talankirin. Bi deh hezaran Kurd jin, mêr, biçûk û mezin hatin qetilkirin. Êş û elemên kesekê/î jiyan nekirin, jiyan kirin. Hatin mişext kirin. Di îşkenceyên giran re derbazbûn û bi salan li zîndanan jiyana xwe borandin. Lê rûxmê van hemû hewildan û xwesteka damezrandina welatekî azad, nekarîbûn xwe bigihînin vê armancê.

### *SEDEMÊN SERNEKETINÊN SERHILDANÊN GELÊ KURD EV IN:*

**a-** Nebûna serokatiyeke ku bikaribe pêşengiyê ji serhildanên gelê Kurd yên li dijî dagirkeriyê bike, herdem di vê demê de xwe dida pêş. Kesayetiyên bi vê armancê derketin holê jî nexwediyê van taybetmendiyên serokatiyê bûn ku bikaribin pirsgirêkan çareser bikin. Ji ber vê çendê dibûn sedema jan û êşên mezin.
**b-** Kurdistanê di mercên feodalîzmê yên tûnd de dijiya. Gelê Kurd belavî bi dehan êlan bûbû. Di nava êlan de nakokiyên kur dihatin jiyankirin. Vê rewşê di nava wan de li hember hev şik û goman di afirand. Ev jî dibû sedem ku baweriyê bihev neynin û nebin yek.
**c-** Di nava civaka Kurd de hestên neteweperestiyê ku ji bo xwe rizgarkirina ji bindestiyê û bûyîna xwedî mafên jiyanî pir girîngbû, pir lewaz bû. Ji ber vê jî gelekî asayî êlekê dikarî biryara xwe bigûherîne û li cem dijminê xwe cih bigre.
**d-** Di şkandina serhildanên gelê Kurd de ol yan jî hebûna mezhebên cûda rolekê mezin leyîstiye. Rêveberiya Mûstefa Kemal gelek caran gelê Kurd û rêveberên wê, bi karanîna vê hestê xapandiye û weke ku di xwestin daye xebitandin. Gotinek heye dibêje; zimanê te û baeweriya ya dijiminê te be wê demê dû sîlhên te hene tû dikarî şer bike, lê ger baweriya te û ya dijminê te yek be wê demê dimîne yek sîleha te û ew jî ziman e. Êdî li vir ya ku herîzê de bandor li xiyaneta hûndirîn ya kurdan kirî baweriye.

Sedemên herî bingehîn Kesên ku ji serhildanan re serkêşî dikin ne di zanabûna demê de bûn. Serdema ku di hat jiyankirin serdema Netewe Dewlata bû. Lê serokên serhildanan hêjî weke serdema împaratoriyan li otonomî digeriyan. Nerîneke cîdî ya demî tinebû. Serdemên Tarikîqet, Mîr, Beg û Axayan derbaz bûbûn. Şoreşên Neteweyî pêşketibûn lê serkeşên serhildanan ji vê rewşe dûrbûn, her çendî Bedirxaniyan di vî milîde hewildanek dabe destpê kirin jî, lê vê serhildanê jî encam negirtîye. Dîsa di armac û hedefên serhildanan de ne zelal bûnek heye. Gelek caran hevî kirinê ji derve bûye sebeba ku hêza xwe ya hûndirîn baş rêxistin nekin. Ji ber van sebeban jî gelek caran bûne lîstokên dîplomasiyê û di encamê de têk çûne.
Li aliyê din dema serhildanek ji aliyê Kurdên Elewî ve dihat destpêkirin, Kurdên sûnnî alîkarî nedidan tevgerên wan, an jî li dijî wan alîkarî didan dijminên xwe. Berovajiyê vê rewşê dema Kurdên Sûnnî jî li dijî dagirkeriya Tirk di herêmekê de serhildan didan destpêkirin, Kurdên Elewî yên wê herêmê, ev serhildan piştgirî nedikirin. Gelek caran jî li dijî wan alîkariya leşkerên Tirk dikirin.

## WANE 43.

**Pirsên Amadekariyê**

1- We qet bûyara 33 guleyan bihîsti bû?
2- Bûyera 33 guleyan encama çi ye?
3- Dewleta tirk çi ji berpirsê bûyera 33 guleyan kir?

## BÛYERA 33 GULEYAN

Qeymekamê Özalpê ji bo sînorê ser Îranê çeta amade dike û di rêken van çeten de pezên eşîretên wî milî di dize. Her êvar çetan nêzîkî 2000 pez ji aliyê Rojhilat di dizîn û qayîmekamê Özalpê Hilmî Tûncel van pezan nazivirîne. Kesekî bi navê Mihmedê Misto ku ji milê rojhilate û serok eşîre te vî aliyê 500 pezî dibe. Qeymekam Hîlmî Tûncel ji bo sûçê xwe veşêre ji Ankarê re dibêje; leşkerên Rûs derbaz bûne. Ankara ji serfermandar Mûstafa mûxlalî ji bo lêkolîne di şîne. Kesên gundî ku hatine tewnbarkirin ji hêla dade ve be sûç tên dîtîn û serbest tenê berdan. Lê serfermandar mûstafa mûxlalî di civîneke ku waliye Wanê Hîlmî Onat, qaymakamê Özalpê Hîlmî Tûncel, dadger Bakî Yekîn û serfermandarê tabûra Özalpê ku Şûkrî Tûter jî tê de amadeye fermana kuştûna van kesan tê girtin. Di temûza sala 1943 da ev kes ji hêla polêsan ve tên binçavkirin, piştî ku van kesan tên binçav dikin teslîmî serfermandarê tabûrê Şûkrî Tûter têne kirin. Dibin herema çemê zûwa (kurû dere) û li wê derê be dad têne darizandin. Destê wan ji piştê ve tê giredan û lingên wan tên giredan ji hêla serfermandaran ve dû koman Nejdet Bilgez û Bilal Bali ve têne gûlebaran kirin. Dadgeh kirina van kesan 6 salan di didome, herv carê ev doz ne bi şewazekî rast tê bi encam kirin. Li gorî mahkemê hinek kesan kaçîtî kirine û dema hatine ji aliyê leşkerên Îranê ve hatine gûlebarkirin û leşkerên Tirk ji ku van biparezin gûle avêtine. Di encamp de di nava gûlebarana her dû aliyan de mane û hatine kuştûn. Bi vê derewê şeş salan rastî tê veşartin. kesekî bi navê Îsmail Özay ku di zîndana Wanê de bû û birayekî wî di vê qirkirinê de hatibû kuştûn, careke din doz vekir. Di salên 1951 de rastî derdikeve hole, lê vê carê jî dibêjin ji bo ku demeke direj di ser darizandinê re derbas bûye, wateya dadê nemaye. Lê dad careke din tê lidarxistin û Mûxlalî bi biryara sêdarê tê darizandin. Mûxlalî ji Akademiya Gûlhanê ya Tipê rapora ku akilê xwe ne li cihe di gire, di encama vê raporê de careke din serbest tê berdan.

Di 01-12-1951 de dimire.

Navê Mûstafa Mûxlalî di sala 2004 de ji aliyê Partiya AKP ve li barageha leşkerî ya Wanê tê kirin.
Ahmed Arîf li ser vê bûyerê helbestekê nivsîne. Ew jî kurdiya wê ev e.

| | |
|---|---|
| **Ev çiya çiyayê mengeneyê ye**<br>**dema li wanê roj davê**<br>**ev çiya zarokê**<br>**nemrûde dema li hember nemrûd roj davê**<br>**aliyekî te berf digre, bergeha**<br>**qetqase aliyekî le siccade, milkê eceme**<br>**li ser gûsiyên cemedê**<br>**li ser avan kevokên revok**<br>**keriyê xezalan.**<br>**û refên kewên gozel...**<br>**mêrxasî nayê înkarkirin**<br>**di serê yeke-yek de ew qet ne**<br>**ketin bin ji hezar salan vir ve zilamên vê derê**<br>**agahdariyên hatinê em ji ku der-hi bidin**<br>**ne refê qûlingane, ev**<br>**ne koma stêrane li ezman**<br>**dilê bi si û sê gule**<br>**sî û sê kaniyên xwinê**<br>**ne herikiye**<br>**bûye gol li vî çiyayî**<br><br>**Ji bin kas kivroskek rabû**<br>**pist belek**<br>**zik çil-sipi**<br>**belengaz, dûcanî kivroskeke çiyê**<br>**dil di dev de wisa reben**<br>**mirov tîne tobê**<br>**tenha, tenha bûn dem**<br>**bê qisûr. berbangeke tazî bû**<br>**nihêrî ji sî û sisiyan yek**<br>**di zik de valahiya giran ya birçitiyê**<br>**por û rih bûne bostek**<br>**di pêsirê de sipih.**<br>**mil qeydkirî niherî bi milên qeydkirî**<br>**mêrxasekî kezeb pola. nihêrhî**<br>**carekê li kîvroşka belengaz**<br>**carekê li pist xwe**<br>**filînta wî ya delal hate bîra wî ku di bin balgiya wî de xeyidye,**<br>**hate bira wî, caniya ku ji deşta heranê anîbû**<br>**enî bi moriyên sîn û bes**<br>**sim sipi**<br>**beza, tolaz û reqsok,**<br>**mehîna wî ya qemer û seklawî**<br><br>***çawa firîbûn ber xozatê*** | *Ez hatime kustin*<br>*li gelîkî xalî yê çiyê di dema nimêja sibê de radikevim*<br>*di nav xwinê de bi dirêjayî...*<br><br>*ez hatime kustin*<br>*xewnên min ji şevan tarîtir*<br>*kes napirse rewşa min*<br>*canê min distînin, bê ecel*<br>*nikarim têxim tû pirtûkan*<br><br>*Paşakî Sifrê daye*<br>*hatime kustin bê mahkeme. bê pirs*<br><br>*kirîvo, halê min eynî wiha binîvîse*<br>*dibe ku bêjin riwayete*<br>*ev ne memikên gûline*<br>*gûleyen domdomê*<br>*di devê min de wesle wesle*<br><br>*fermana kustinê bi cih anîn.*<br>*mija hêsin ya çiya*<br>*û bayê sibê ye hînik û sivik*<br>*pase li wê derê tifing daçikandin*<br><br>*li pasilên me hûr nêrîn nihêrtin*<br>*lê geriyan.*<br>*pista min ya sor. Male kermenşahê*<br>*tizbî û qotiya min birin û çûn*<br>*hemû jî diyarî bûn ji ecemistanê*<br>*em kirîvin merivên hevin û bi*<br>*xwîn giridayî hevin*<br>*bi gund û zeviyên hember ve*<br>*xinamiyê hevin,*<br>*ji sedsalan vir ve,*<br>*cîranê hevin mil bi mil ve*<br>*miriskên me tevî hev dibin*<br>*ne ji nezanîyê*<br>*lê ji xizanîyê*<br>*em ji pasportê dilsar bûne*<br>*ew e cûrme sebeba qatla me*<br>*de lêxin lawo,*<br>*lêxin*<br>*ez bi hesanî nayêm kustin*<br>*di kuçikê min de, hîn agir venemiriye*<br>*û çend gotinên min hene*<br>*ji keser, faman re*<br>*bavê min çavên xwe dan ber*<br>*rûhayê*<br>*û sê birayên xwe ji*<br>*sê darên spehî,*<br>*weke sê çiyayên emrê xwe têrnebûyî* |

| | |
|---|---|
| ***Eger niha wiha bê çare û girêdayî<br>wiha li pist wî lûleke sarya hendefan bêçare,<br>ew dê bihata kustin<br>ferman bêhêvû bû,<br>êdî bila çavên wî, marzerikên kor<br>dilê wî, teyrên berata bixwara<br>êdî navê me dê derkeve bi kaleşiyê,<br>îsatvan<br>rêbir<br>xayîniyê<br><br>kirîvo halê min eynî wiha binivîse<br>dibe ku bêjin riwayete<br>ev ne memikên gûline<br>gûleya domdomê<br>di devê min de wesle wesle*** | *bûn<br>ji bircan. ji giran ji minaran<br>dema kirîv pismam kurên êsiran<br>li hember gûleyên fransiz ser dikirin<br>xalê min yê biçûk, nezîf<br>simbêlên wî nû derketibûn<br>delal<br>siwarekî bas<br>gotiye lêxin birano<br>roja namûsê ye<br>û hespa xwe rakiriye ser piyan<br><br>kirîvo halê min wiha binivîse<br>dibe ku we<br>sivikî riwayetî were fehmkirin<br><br>em ne memikên gûline<br>gûleya domdomê<br>di devê min de wesle wesle* |

## WANE 44.

**Pirsên Amadekariyê**

1- Rewşa kurdan ya piştî şerê cîhanê yê yekemîn çawa bû?
2- Serhildana başûrê kurdistanê ya di pêşengiya Mele Mistefa Berzanî de di kîjan şert û mercan de destpêkir?
3- Polîtîkayên dewleta Iraqê yên li ser gelê kurd çi bûn?

## DI PÊVAJOYA ŞERÊ CÎHANÊ YÊ DÛYEMÎN Û PIŞTÎ ŞER PIRSGIRÊKA KURD

### A-Di Pêvajoya Şer De Rewşa Kurdistanê

Gelê Kurd di Şerê Cîhanê yê Yekemîn de berdelên herî giran dabûn. Welatê Kurdan bandora vî şerî ji nêzîk ve jiyan kiribûn. Bi sedhezaran Kurdan di şer de jiyana xwe ji dest dabûn. Gund û bajarên Kurdistanê hatibûn wêrankirin. Ji derveyî van rastiyên hatin diyarkirin, gelê Kurd rastî bêdadiyeke ku di dîroka mirovahiyê de nehatî dîtin hatibû. Di dawiya şer de bi peymanên di navbera dewletên dagirker de hatin îmze kirin, xaka Kurdistanê bûbû çar parçe. Ji ber rewşa ku piştî şer derketî holê, gelê Kurd di hemû beşan de li dijî dagirkeriyê nerazîbûnên bênavber dida nîşandan.

Bakurê Kurdistanê: Ji serhildana Qoçgirî heya serhildana Dêrsimê, ango ji sala 1920'an heya sala **1938'an** gelê Kurd ê vî beşê Kurdistanê, ji ku di herêma xwe de bibe deshilatdar, li dijî dagirkeriya Tirk şer daye meşandin.  Ev şer û cengên bi armanca rizgarkirina xaka Kurdistanê bi bandora dagirkeran pêkhatin, her carê rastî her cûre êrîşên hovane yên dagirkerên Tirk hatiye.

Di pêvajoya Şerê Cîhanê yê Dûyemîn de, serhildanên gelê Kurd bi rê û rêbazên ji derveyî mirovahiyê hatibûn çewisandin. Wekî din tepeserkirina serhildana Dêrsimê rastî vê pêvajoyê hatibû. Vê jî, ji bo dewleta Tirk derfetên mezin  didan afirandin.

Dema ku piraniya cîhanê bi amedekariyên şerekî mezin ve xerîk dibûn, dewleta Tirk jî bi hemû hêza xwe di welatê me de xwe bi sazûman dikir. Hemû hêviyên jiyaneke azad bi zorê û bi tevkujiyan hatibûn bêdengkirin. Li bajar, navçe û piraniya gundên Kurdistanê baregehên leşkerî hatibûn sazkirin. Di bajar û navçeyan de dibistan dihatin vekirin. Di van dibistanan de perwerde bi zimanê Tirkî dihat dayîn. Di perwerdeyan de neteweperestiya Tirk didan fêrkirin. Navên herêm, bajar, gund û kesan yên di berê de bi Kurdî bûn, dikirin Tirkî. Axaftina bi zimanê Kurdî hatibû qedexekirin. Yên daxîvin, bi sezayên cûrbicûr re rûbirû diman.

Ji ber sedemên li jor hatin destnîşankirin, di pêvajoya şerê cîhanê yê dûyemîn de gelê Kurd bi mercên gelekî zor û zehmet yên dagirkeriya Tirk re li hember hevbûn. Ji ber vê sedemê di vî beşê welatê me de, di vê pêvajoyê de tû tevgerên siyasî nayên dîtin.




### B-BAŞÛRÊ KURDISTANÊ

### 1- SERHILDANA MELE MISTEFA BARZANÎ

Dema serhildana Şêx Mehmûdê Berzencî ji aliyê hêzên leşkerî yên Îngîlîz ve tê têkbirin, li başûrê Kurdistanê giyana serhildanê ji aliyê Barzaniyan ve tê berdewamkirin.

Mele Mistefa Barzanî sala **1943'an** ji bo serhildaneke li dijî desthilatdariya Iraqê dikeve tevgerê. Heyeta Iraqê Kanûna **1943'an** li herêma Mêrgesorê bi Mele Mistefa Barzanî re

hevdîtinekê pêktîne. Peymanên hatin îmze kirin bi herêma Barzan re bi sînor bûn.

**Di navbera rêveberên serhildanê û rayedarên hûkumetê de peymaneke dawî hat îmze kirin. Bendên vê peymanê wiha ne:**

**1-** Xakên ku ji aliyê serhildêran ve hatin destxistin, wê di destê wan de bimana.

**2-** Kesên ji ber bûyerên bakurê herêmê **(Kurdistan)** hatin girtin wê serbest bihatibane berdan.

**3-** Çekên serhildêran yên ku di şer de destxistîbûn, wê di destê wan de bimana.

**4-** Wê li Kurdistanê tiştên xwarinê û pergalên pîşesaziyê, li gorî herêmên din li ser bingeha wekheviyê bihatibane belavkirin.

**5-** Wê rêvebirina herêmên Kurdan , radestî rayedarên Kurd bihatibane kirin.

**6-** Rêveberiya Iraqê wê di qadên çand û perwerdeyê de **(çêkirina dibistanan û nexweş-xanan)** ji bo Kurdistanê pergalên pêwîst avakiribûna.

Rêveberiya Iraqê, ji bo herêma Kurdistanê di serî de hinek gav avêtibin jî, piştî demekê bi şûnde standin. Di Sibata **1944'an** de M. Mistefa Barzanî ji ber gûmana girtinê ji Bexda derket.

Aliyê Kurd êdî têgihabûn ku çareseriyên aştiyane bi Iraqê re ne gengaze. Di **Sibata 1945'an** de, M. Mistefa Barzanî û hinek fermandarên Kurd yên demek ji berê di nava artêşa Iraqê de cih digirtin, komîteya azadiyê damezrandin. Vê komîteyê di herêma serhildanê de rêxistinên xwe yên jêr sazkirin. Komîtê, amadekariyên damezrandina artêşeke bi rêkupêk dan destpêkirin. Rêxistinên **"Hîwa"** û **"Şoreş"** ji bo alîkariyê dest bi xebatan kirin.

Tevî van qewmînan di derdora fermî de bêzarî çêdikir. Ev bêzariya heyî, di vê navê de Rojhilatê Kurdistanê tevgera demoqratîk ji ber ku bilind dibû, hîn zêde bibû.

Rêveberiya Iraqê dixwest bi rêyên leşkerî pirsgirêkê çareser bike. Bi alîkariya dagirkerên Îngîlîz di dawiya Şerê Cîhanê yê Dûyemîn de **(Tîrmeha 1945)** 25000 leşker rêkirin herêmên Zaxo, Amêdiyê, Akrê û Rewandûzê. Ev hêz dibû nîvê hêzên giştî yên Iraqê.

Fermandarê 25000 leşkerî li dijî herêmên Kurd dest bi tevgerê kirin. Generalê Îngîlîz bi navê Renton bû. Tevgera leşkerî ji aliyê balafirên Îngîlîzan ve dihatin piştgirî kirin. Ji derveyî van bi qasî 5000 hêzên cerdevanan jî tevlî êrîşê bûbûn.

Êrîşa artêşa Iraqê di **7'ê Tebaxa 1945'an** de destpêkir. Êrîş zêdetir li ser herêma Rewandûzê pêk dihat. Di navbera herdû aliyan de şerên dijwar rûdan. Hêzên Iraqê li Akrê û Rewandûzê derbên giran xwarin. Hêzên Kurdan  amadekariya êrîşekê li ser Hewlêrê dan destpêkirin. Yekîneyên leşkerî yên Iraqê rewşeke xirab jiyan dikirin.

Serkeftinên Kurdan , dibûn sedemên zêdebûna tevlîbûnên mezin. Hêzên Kurd ber bi Kerkukê ve dimeşiyan. Di vê rewşê de leşkerên Îngîlîz û yên Iraqê **18'ê Îlûna 1945'an** de êrîşeke mezin dan destpêkirin. Di êrîşê de hêzên cerdevan rolekê mezin girtin ser xwe. **25'ê Îlûna 1945'an** li nêzîkî Barzan şerekî bi xwîn rûda. Hêzên dagirker herêmên Bile, Geliyê Balinda, Erqûş û Zêbar di destpêka meha Cotmehê de bi destxistin. **6'ê Cotmehê** jî herêma Barzan ket destê hêzên dagirker de.

Dema hêzên Îngîlîz û Iraqê ketin herêma Barzan, êdî li herêmê derfetên xwe parastinê ji holê radibûn. Di vê rewşê de M. Mistefa Barzanî û rayedarên din yên serhildanê biryara derbazbûna Rojhilatê Kurdistanê distînin. Di nava wan de jin, zarok û pîr bi qasî 10000 kes di mercên zivistanê yên zor û zehmet de ber bi Rojhilatê Kurdistanê ve derdikevin rê. Di rê de hejmareke mezin mirov ji serma û ji birçîbanan jiyana xwe ji dest didin.

**WANE 45.**

**Pirsên Amadekariyê**

1- Şoreşa Mahabadê li hemberî çi destpêkir?
2- Di dema şoreşa Mahabadê de kurda sîsemeke çawa avakiribûn?
3- Sedema têkçûna vê şoreşê çi bû?

## B- KOMARA MEHABAD (22.01.1946 – 17.12.1946)

Di pêvajoya Şerê Cîhanê yê Dûyemîn de Îran ji aliyê Elmanyayê ve hatibû dagirkirin. Artêşa Elman li ser vexwestina Şahê Îranê, çûbûn Îranê. Hêzên Hevpeyman di Tîrmeha sala **1941'an** de leşkerên Elman ji Îranê derxistin. Di Îranê de leşkerên Yekîtiya Sowyetê û Îngîlîz bi cih bûbûn.



Şehid Qazi Muhammed — General Mustafa Barzani


Di Kurdistanê de gûherîna rewşa siyasî û şkestina bandora dagirkeriya Îranê, rê li ber xwe bi rêxistinkirina hêz û kesayetiyên welatparêz vedikir. Li ser rastiya Kurdistanê zêdetir danûstandin û nîqaş dihatin pêşxistin.

Xebat û lêgerînên rewşenbîrên Kurd yên ji bo xwe bi rêxistin kirinê, di sala **1942**'an de gihişt encamê. Di vê salê de siyasetmedarên Kurd yên di nava **TÛDEH ê** de kardikirin cûdabûn. Piştî demeke kurt rêxistineke bi navê **"Jiyanewey Kurdistan"** damezrandin. Endamên vê rêxistinê di tevayî herêmên Kurdistanê de xebat dan meşandin. Partiya Jiyanewey Kurdistan heya sala **1944**'an ji aliyê hejmarek mezin kes ve hatibû pejiyarandin. Vê partiyê li Mehabadê kovereke bi navê **"Niştîman"** di weşand.

Rêxistina îstixbarata Îranê, ji xebatên vê partiyê bêzar dibûn. Ji ber vê çendê di nava rêveberiya partiyê de dûbêndî dan afirandin. Di sala **1945'an** de jî ev rêxistin belavbû.

Xebatên damezrandina rêxistineke ku mafê netewa Kurd bi parêze berdewam dikir. Bi bandora Tevgera Demoqratîk a Netewî ya li Azerbaycanê derketî holê, di dawiya sala **1945'an** de li Mehabadê Partiya Demoqrat a Kurdistana Îranê hat damezrandin. Damezrêner û rêveberê vê partiyê Qazî Mihemed bû. Qazî Mihemed di vê demê de serokê şaredariya Mehabadê bû.

Qazî Mihemed ji ber bandora xwe ya olî û xebatên Qazîtiyê di nava gelê Mehabadê û derdora vî bajarî de dihat heskirin. Ji ber vê sedemê xebatên rêxistinê zû pêşdiketin û ji aliyê êl û girseyên Kurd ve dihatin piştgirî kirin. Armanca Partiya Demoqrat a Kurdistana Îranê di nava sînorên Îranê de çareserkirina pirsgirêkên gelê Kurd yên siyasî, civakî û aborî bû.



Piştî demekê bi alikariya rewşa siyasî ya destdayî, li ser pêşniyara hejmarek ji endamên Partiya Demoqrat a Kurdistana Îranê, di herêmên Îranê yên niştecihên wan ji Kurdan pêkhatî de, biryara damezrandina herêmeke azad hat girtin. Piştî demeke din, navê herêma azad dê bûbûya komara Mehabad. Di rastiyê de ji bo bi destxistina rêveberiyê di herêmê de pêwîstî bi têkoşînekê tûnebû. Ji ber ku li vir rêveberî ji xwe ew demek bû di destê Kurdan de bû. Piştî herêm ji aliyê hêzên yekitiya Sovyetê ve hati dagirkirin,

rêveberên Îranê yên dagirker, ji herêmê xwe vekişan dibûn. Di encamê de herêmên Kurdan yên bakurê rojavayê Îranê di pratîkê de ketibûn destê hêzên Kurd.

Di pêvajoya mijara gotinê de Kurdên başûrê Kurdistanê yên dibin serokatiya Şêx Ehmed û Mele Mistafa Barzanî de hatibûn Rojhilatê Kurdistanê. Ev hêzên henê li gundên Şino, Soldoz, Mehabad û Bûkanê de hatibûn bi cihkirin. Şêx Ehmed û Mele Mistefa li Mehabadê cihwar bûbûn. Paşê jî Mele Mistefa û çekdarên Barzaniyan di nava arteşa neteweyî " pêşmerge" de cih digirtin.

## 1- DAMEZRANDINA KOMARA MEHABADÊ

Roja **22'ê Çileya 1946**'an de li bajarê Mehabadê bi armanca damezrandina komarê mîtingeke girseyî hat lidarxistin. Ji hemû deverên Kurdistanê mirov û kesayetiyên welatparêz beşdarî vê mîtingê bûbûn. Di vê mîtingê de damezrandina Komara Mehabad ya Kurd hat ragihandin. Herêma bajarên Mehabad, Şino, Mîandeap, Serdeşt, Bane, Seqiz û Senendeç di ketin nava sînorên vê komarê de.
Piştî damezrandina Komarê rayedarên Kurd dest bi rêkupêkkirina xebatên rêveberiyê kirin. Xebatên çandî pêşketin. Zimanê fermî Kurdî bû. Dibistan li herêmên Kurdan hatin vekirin. Demekê şûnde seferberiya xwendin û nivîsandinê destpêkir. Hejmarek pirtûk vegerandin zimanê Kurdî û hatin weşandin. Di heman demê de rojnameya **"Kurdistan"** weke lebeta çapemeniya Partiya Demoqrat a Kurdistana Îranê hat derxistin.



Jinên Kurd di vê demê de di jiyana civakî û polîtîk ya Rojhilatê Kurdistanê de cara yekem cih digirtin. Beşek ji wan tevlî xebatên baskê jinan yên Partî Demoqrat a Kurdisana Îranê bûbûn. Ciwan jî, di nava baskê ciwanan yê partiyê de xwe bi rêxistinkirin.
Sazûmaniya bacê ku ew demek bû ne dixebitî ji nû ve hat rêkupêk kirin. Parvekirina xakê li ser kesên bê xak pêk nehat. Di vê hêlê de xebatên ber biçav hatibin dayîn jî, serkeftin ne hatibû bi destxistin.
Di meha **Nîsana 1946'an** de pirsgirêka sînor yên di navbera Kurd û Azeriyan de hatin çareserkirin. Ji bo vê armancê hinek pirsgirêkên din yên di navbera herdû civakan de di bin rêveberiya Qazi Mihemed de heyetek çûbûn Tebrîzê. Di encama vê hevdîtinê de peymanên ku herdû aliyan eleqedar dikin hatibûn îmze kirin.

## 2- Paşvekişandina Artêşa Sovyetê û Rûxandina Komara Mehabad

Şerê Cîhanê yê duyemîn di sala **1945**'an de bi dawî bûbû. Li gorî peymanên di navbera hêzên bi awayekî serkeftî ji vî şerî derketî, de pêwîst bû dewletên ku hêzên wan yên leşkêrî ji derve heyîn, bi zivirîbûna welatê xwe. Heman rewş ji bo hêzên yekitiya Sovyetê jî derbaz dibû. Li gorî Peymana Tehranê di bihara **1946'an** de rêveberiya Sovyetê artêşa xwe ya li Bakurê Rojhilatê Kurdistanê vekişandin welatê xwe. Xwe vekişandina hêzên artêşa Sor ji Kudistanê û Azarbaycanê, ji bo herdû civakan jî rewşeke neyînî afirandibû. Hebûna artêşa Sor di herêmê de alîkariyeke rewanî ya mezin bû. Herdû Komar jî bi piştgiriya artêşa Sovyetê hatibûn damezrandin.

Derketina Artêşa Sor ji herêmê ji bo xwe careke din bi cih kirina Kurdistanê derfetekî mezin ji bo Îraniyan derxistibû holê. Piştî derketina hêzên Sovyetê rêveberiya Îranî hewildanên xwe zêdekirin. Di sala **1946**'an de çar caran li dijî şoreşê êrîş pêkhatin. Lê her çar caran jî ev êrîş bi berxwedana Kurdan di hatin vale derxistin.
Di vê navberê de rêveberiya Îranê da ku dijayetiyê bêxe navbera Kurd û Azeriyan de serî li gelek rê û rêbazên zirav û qirêj dan. Demekê şûnde dagirkerên Îranî bi armanca ji holê rakirina deskeftiyên Kurd û Azeriyan leşker şandin Azerbeycanê. Di van mercan de hinek ji serok êlên Kurdan eniya xwe gûhertin. Li cem dijmin cihê xwe girtin.
Artêşa Îranê di demeke kurt de komara Azerbaycanê rûxandin. Vê carê berê artêşa xwe dabûn Kurdistanê. Dema artêşa Îranê ber bi Kurdistanê ve dimeşiya rastî berxwedaneke tûnd ya Kurdan nehat. Ev helwest ya Qazî Mihemed bû. Wî dixwest bi rêkên siyasî û diyaloqan pirsgirêkê çareser bike. Pêşniyara Mele Mistefa ya berxwedanê ji aliyê Qazî Mihemed û hinek serok êlan ve ne hatibû pejirandin.
Li ser vê rewşê Mele Mistefa Barzanî û hejmareke din ya Barzaniyan derketin çiyan. Ji çiya xwestin rêyên hevdîtinê ji bo çareserkirina pirsgirêka Kurd peyda bikin. Lê rayedarên Îranî tû maf ji bo Kurdan ne dipejirandin. Ji ber vê sedemê di navbera wan de çend caran şer derketibû. Piştî demeke din pêşmergeyên Barzaniyan bi meşa dirêj, bi zor û zehmetiyên mezin derbazî xaka Sovyetê bûbûn.
Artêşa Îranê di **17.12.1946**'an de ketine bajarê Mehabadê. Dema artêşên Îranê di ketin Mehabadê de ji aliyê Qazî Mihemed ve hatibûn pêşwazî kirin. Qazî Mihemed da ku gelê herêmê ji tevkujiyên leşkerên Îranê bi parêze, serî li vê riyê dabû.
Artêşa Îranê di vê rewşê de hejmareke welatparêzên ku ketin destê wan kuştin. Qazî Mihemed birayê wî Sedrî Qazî û pismamê wî Seyfî Qazî **30'ê Adara 1947'an** li bajarê Mehabadê li Meydana Çarçira hatin dardekirin.





**WANE 46.**

**Pirsên Amadekariyê**

1- Bi hatina Evdilkerîm Qasim a ser desthilatiya Iraqê re di rewşa kurdan de guherîneke çawa çêkir?
2- Otonomî ango sîstema federe ji bo kurdan çareseriye an na?
3- Kurdên Başûrê Kurdistanê de her dem pişta xwe dane hêzên derve, vê çi bi kurdên me yên vê derê daye wendakirin?

## A-DI SALA 1960 Û NÎVÊ DESTPÊKÊ YÊ 1970'AN DE TÊKOŞÎNA RIZGARIYA NETEWEYA KURD

### *1- Li Başûrê Kurdistanê Têkoşîna Otonomiyê*

Rêveberiya Haşimiyan ya li Iraqê, di dawiya sala **1950'î** de bi aloziyên giran re rû bi rû bû. Rêveberiya xirab a xwe dispart zilm û zordariyê, rastî mûxalefeta rêxistin û girseyên gel dihat. Hemû beşên civakê nerazîbûnên xwe bi gelek awayan dan diyar kirin.
Di encama xebatên bi rik yên partiya komînîsta Iraqê de, di Sibata sala **1957'an** Eniya Yekîtiya Netewî hat damezrandin. Ev Eniya henê, ji aliyê Partiya Demoqrat a Kurdistanê ve jî dihat piştgirî kirin.
Tevger û helwestên rêveberiya qiraltiyê ya xwe dispart Îngîltere, her ku diçû di nava gel de dibû sedemên nerazîbûnan. Van bêzariyan di **14'ê Tîrmeha 1958'an** de rê li ber şoreşekê da vekirin. Di dîroka hatî diyarkirin de, rêveberiya zilimkar hat rûxandin. Yekîneyên artêşa şoreşger ketin bajarê Bexda.

Rêveberiya nû ya di bin serokatiya Evdilkerîm Qasim de, di rêveberiyê de cih dida dû wezîrên Kurd. Bi vî awayî nêzîkatiyên erênî yên rêveberiyê dihatin nîşakirin. Helwesta rêveberiya Evdilkerîm Qasim her ku diçû zêdetir di çareserkirina pirsgirêka Kurd de bawerî dida. Peywendiyên bi Îngîlîzan re hatibûn kêm kirin. Dijberiya emperyalîzmê hêviyên gelê Kurd û Ereb bilind dikir. Yekîtiya Sovyetê di heman salê de piştgiriya xwe ya ji bo rêveberiya Evdilkerîm Qasim dida eşkerekirin.
Heyeteke di bin serokatiya sekreterê giştî yê Partiya Demoqrat a Kurdistan Îbrahîm Ehmed de, di **17'ê Tîrmehê** de bi serok komarê Iraqê Evdilkerîm Qasim re hevdîtin pêkanî. Di vê hevdîtinê de mafên gelê Kurd û riyên çareseriyê dihatin gotûbêj kirin.

Di **26'ê Tîrmeha 1958'an** de zagona bingehîn ya Iraqê hat ragihandin. Di vê belgeyê de cara yekem bû ku li pêşberî zagonan wekhevbûna gelê Kurd û Ereb dihat destnîşankirin. Pêwîstiya naskirina mafên otonomiyê ji bo Kurdan , piştî demekê li bernameya Eniya Yekîtiya Netewî de dihat diyarkirin.

Kovar û rojnameyên Kurdî di tevayî Iraqê de dest bi weşanê kirin. Di dibistanên Kurdistanê de perwerde wê bi zimanê Kurdî bihatiba dayîn.
Rêveberiya Evdilkerîm Qasim, di vê demê de tevlîbûna civînên Pakêta Bexda red kir. Pakêta Bexda ji aliyê dewletên dagirker ve zêdetirîn ji bo tepeserkirina gelê Kurd hatibû damezrandin. Di vê Pakêtê de Tirkiye, Îran, Iraq, Pakistan û Ingîltere cih digirtin. Iraqê di **Adara 1959'an** de xwe ji vê peymanê vekişand. Xwe vekişandina Iraqê ya ji vê yekîtiyê, rastî keyf-

xweşiya gelê Kurd dihat. Hem derketina Iraqê ya ji vê yekîtiyê û hem daxwiyaniyên rêveberiya nû ya ji bo çareserkirina pirsgirêka Kurd, dewletên Îran û Tirkiyê gelekî ditirsand. Ji ber vê çendê li dijî Iraqê ketin nava helwesteke hevbeş. Di heman demê de Emerîka û Ingîltere jî hewildanên xwe yên li dijî Iraqê pêş dixistin.
Evdilkerîm Qasim, bi alîkariya hêzên demoqratîk yên Ereb û Kurd, di demên destpêkê de hinek gavên girîng yên şoreşgerî avêtin. Evdilkerîm Qasim li ser daxwaza Partiya Komînîst a Iraqê û Partiya Demoqrata Kurdistanê, ji bo pêkanîna yekîneyên berxwedanê yên gel biryar dan derxistin. Hejmara van yekîneyên berxwedanê, di payîza sala **1958'an** de gihiştibû 30000 kesî. Yekîneyên gel yên berxwedanê, di parastina welatê Kurd û Ereban ji êrîşên emperyalîzmê rolekê girîng leyîstin. Di heman demê de di berterefkirina êrîşên hêzên hûndir yên paşverû de jî, xebat didan meşandin.

Dîsan di mehên destpêkê yên şoreşê de hemû çîn, komên gel û partiyan derfetên xwe birêxistinkirinê didîtin. Di vê mijarê de, di Iraq û Kurdistanê de rêxistinên siyasî yên weke yekîneyên gundiyan yên alîgirên aşitiyê, komîteyên parastina komarê, yekîtiya giştî ya xwendevanên zanko û yekîtiya ciwanên demoqratîk hatin sazkirin.
Gûherînên di Iraqê de pêkdihatin hem di cîhanê de û hem ji aliyê gelê Kurd yê li parçeyên din ve bi balkêşî dihatin şopandin.
2-Vegera Barzaniyan Ji Sowyetê û Gûherîna Helwesta Evdilkerîm Qasim
Rêveberiya Evdilkerîm Qasim weke gava destpêkê di Iraqê de ji bo girtiyên siyasî efûya giştî dabû derxistin. M. Mistefa Barzanî û hejmarek kesên li gel, di sala **1945'an** de derbazî rojhilatê Kurdistanê bibûn. Ji vir jî bi têkçûna komara Mehabadê re li gel leşkerên Barzaniyan, di sala 1947'an de çûbûn Azerbaycana Sowyetê. Piştî 11 salan li vê derê dimînin, bi şoreşa Evdilkerîm Qasim re zivirîbûn başûrê Kurdistanê.

Evdilkerîm Qasim, di **7'ê Cotmeha 1958'an** de bi M. Mistefa Barzanî û hinek din rêveberên Kurd re ku ji mişextê zivirîbûn, hevdîtin pêkanîn. Di heman rojê de di navbera M. Mistefa û endamên meclîsa dewleta Iraqê ya bilind de jî hevdîtinek pêkhat.
Tevî van karan di pejirandina otonomiya Kurdan de bawerî çêdikir û Kurd zêdetir nêzîkî rêveberiyê dikirin.

Bi bandora hêzên emperyalîst û dewletên dagirker yên cîranê Iraqê, di hûndirê Iraqê de hêzên hemberî şoreşê derketin holê. Êdî, di rêveberiya Evdilkerîm Qasim de dû kom derketibûn holê. Koma yekê lîberal û nerm ya di bin rêbertiya Evdilkerîm Qasim de, ya din jî koma kevneperest, statûkovan û rastgir ya di bin rêbertiya Evdilselam Arif de bû. Di vê demê de koma ku Evdilselam Arif rêbertiya wê dikir bi awayekî erênî bi otonomiya Kurdistanê meyze nedikir. Evdilselam Arif, daxwazên Îbrahîm Ehmed û rêberên din yên Partiya Demoqrata Kurdistanê yên ji bo fermîkirina Newrozê nepejirand.

Nakokiyên di navbera rêveberiya Qasim ya ji aliyê Partiya Komînîsta Iraqê, Partiya Demoqrata Kurdistan û Partiya Demoqrata Netewî û koma Evdilselam Arif ya ji aliyê Partiya Baas, Yekitî û Partiya Îstîklal de, di gihişt asteke bilind. Rêveberiyê, bi alîkariya hêzên çepgir dikarîbû pêşî li komployên koma Evdilselam Arif bigre. Di vê navberê de partiya Baas û partiya Îstîklal xwe ji eniya netewî vekişandin.
Li Kurdistanê jî, divê demê de ji bo afirandina bê îtîfaqiyê di navbera Partiya Demoqrata Kurdistan û Evdilkerîm Qasim de, hinek ceribandin pêkhatin. Îstixbaratên Tirkiye û Îranê jî, ji bo vê çendê ketibûn tevgerê.

Mûstafa Barzanî û Şêx Ehmed Barzanî, di sala **1959**'an de bi Evdilkerîm Qasim re hevdîtinek pêk anîn. Di vê hevdîtinê de aliyê Kurd piştgiriya xwe ya ji bo rêveberiyê didan diyarkirin.

Hewildanên rêveberiya Qasim ya demoqratîk û hinek gavên erênî yên ji bo çareserkirina pirgirêka Kurd,  di rewşeke tûnd a siyaseta hûndirîn de hatin pêkanîn. Bi van gavên demoqratîk re gavên dijber yên partiya Baas û partiya Îstîklal ku mûxalîfê şoreşê bûn dihatin pêşxistin.

Di adara **1959**'an de li bajarê Mûsilê ji aliyê hemberîn şoreşê ve komployeke mezin hat li darxistin. Di vê bûyerê de komplovanan gelek kesên demoqratîk yên Kurd û Ereb kuştin. Di vê êrîşê de hestên neteweperestiya Ereban bilind dikirin. Ev komplo, ji aliyê hinek dewletên Ereb yên alîgirê emperyalîstan ve jî dihatin piştgirî kirin.

Serhildana Mûsilê ya di bin pêşengiya fermandarekî neteweperestê Ereb de, rewşeke xeter afirandibû. Rêvebiriya Iraqê bi arikariya partiya komînîst û alîgirên partiya Demoqrata Kurdistanê ev serhildan tepeser kiribûn.

Her çiqas  êrişên paşverûtiya hûndir û ji derve di vê navê de bandora xwe bi zêdahî dabe nîşakirin jî, jiyana siyasî ya di Iraqê de bandora hêzên demoqrat, bi lez mezin dikir. Lê li her derê zêdebûna Rûmeta partiya Komînîst û di Kurdistanê de pêşveçûna tevgera demoqratîka netewî, rêveberiya Qasim û bûrjûwaziya netewî ditirsand. Hêzên hûndir yên paşverû jî di rewşeke wiha de dijminahiyeke eşkere pêş dixistin. Hêzên Kurdistan dagirkirin, kampanya reşkirinê didan berdewamkirin. Rêveberê **CIA** yê, yê wê demê jî rewşa Iraqê weke rewşa herî bi xeter ya cîhanê dinirxand. Ev û bûyerên din polîtika Evdilkerîm Qasim bandor dikir.

Evdilkerîm Qasim bêyî ku peywendiyên xwe ji eniya çepgir biqetîne, dest bi meşandina tektîka hevkariya bi hêzên rastgir re kir. Bi ketina bin bandora hêzên rasgir re, di derbarê pirsgirêka Kurd de zimanê rêveberiya Iraqê jî dihat gûhertin. Êdî zêdetir di axaftinên xwe de **“yekitiya netewiya Iraqê”** û **“Komara Ereb”** dianîn ziman.

Rêveberiya Iraqê siyaseta dijber ya ji bo pirgirêka Kurd, di dawiya sala **1960'î** de bi awayekî vekirî didan meşandin. Rewşenbirên Kurd li her cihekî dibûn hedefa êrişên rêxistinên ewlekariyê. Di vê rewşê de rêveberên partiya demaqrata Kurdistanê di Kanûna **1960**'î de Bexda terk kirin û derbazî Kurdistanê bûn. Di **Gulana 1961'an** de weşana rojnameya Xebat hat qedexekirin. Piştî vê, weşanên din yên Kurd jî di hatin qedexekirin.

Di sala **1961'an** de dû caran daxwaza hevdîtinê li ser mijara otonomiya Kurd ji rêveberiya Iraqê hat kirin. Rêveberiya Iraqê weke bersiv leşker şandin Kurdistanê. Di Meha îlûnê de herêma Barzan hat bombebaran kirin. Çend roj piştî vê bûyerê tevayî başûrê Kurdistanê ji aliyê balafirên şer ve hatin bombe barankirin. Li hember van êrîşên dewletê berxwedanên gelê Kurd jî zêdetirîn li herêmên çiyayî pêşdiketin. Rêveberiya Qasim, her ku çû ji gel dûrket û di **Sibata 1963'an** de hat rûxandin. Di rûxandina rêveberiya Qasim de partiya Baas hevkarên wan koma leşkerî ya Evdilselam Arif, tevgerên Erebên neteweperest û Tevgera Yekitîxwazên sosyalîst rola pêşvantiyê leyîstin.
Rêveberiya nû ya Iraqê, her çiqas di daxûyaniyên xwe yên çapemeniyê de, xwe weke aligirên demoqrasiyê dabin xûya kirin jî, dema rêveberî baş bidest xistin, li Iraqê li hember

hêzên demoqratîk bi taybet jî li dijî partiya Komînîsta Iraqê dest bi kiryarên hovane dikirin. Ereb û Kurd, gelek çalekvanên bijartî di demeke Kurt de hatin darde kirin.

Rewşa aloz heya **1966**'an hat berdewamkirin. Di vê salê de li herêma Rewandûzê di navbera artêşên Ereb û hêzên Kurd de, şerekî mezin pêk hat. Di vî şerî de hêzên Kurd dikarin rewşa xwe biparêzin. Ji derveyî vê, derbên giran li artêşa Ereban xistin.
Piştî şerê Rewandûzê, di nava rêveberiyê de baweriya bi şer çareserkirina pirsgirêka Kurd şikestibû. Komeke li dijî şer derketibû holê. Vê komê hinek mafên xwe bi rêxistinkirinê ji bo Kurdan daxwaz dikirin.

Her dû aliyan jî, di vê salê de heyet rêkirin Kurdistanê û Bexda. Hevdîtin hatin pêkanîn. Di encama van hevdîtinan de, di Hezîrana **1966'an** de peymanek hat îmze kirin.
Li gorî vê peymanê; rêveberiya Iraqê ji bo di herêmên Kurdistanê de rakirina rewşa awarte, naskirina netewa Kurd û mafên gelê Kurd, li cihên piraniya niştecihên wê Kurd de, li gel zimanê Erebî, fermîbûna zimanê Kurdî, di parlementoyê de ji bo nûnerên Kurd veqetandina kursiya xwe amade didît. Peymana Hezîrana **1966'an** di dîroka têkoşîna otonomiya Kurd de, deskeftiyeke pir girîng bû.

Gavên ji bo çareseriya pirgirêka Kurd hatin avêtin, rastî nerazîbûna paşverûtiya Ereban hat. Di heman mehê de li dijî rêveberiyê plana derbeyeke leşkerî hat eşkere kirin. Serok komar Evdirehman Arif, di rêveberiyê de hinek gûhertin pêk anîn. Lê piştî demekê rêveberiyê diyar dikir ku tû xwestekên wan ji bo pêkanîna vê peymanê nîne.
Bûyerên ku di sala **1967'an** de li Rojhilata Navîn rû dayîn, weke li welatên din de jî bûn pirgirêkên hûndirîn yên Iraqê jî, diavêt plana dûyemîn. Serkeftinên îsraîlê yên li dijî dewletên Ereb bi destxistî, dibû sedemên lêgerînên nû yên neteweperestiya Ereban. Neteweperestiya Ereb, li her derê bilind dibû.

Hinek fermandarên ji **"Tevgera Şoreşa Ereb"** bi fermandarên partiya Baas re **Tîrmeha 1968'an** derbeya leşkerî lidardixistin. General Ehmed Hesen El-Bekir weke serok komar hat destnîşankirin. Piştî çend rojekê kesayetiyên ne ji partiya Baas ji rêveberiyê hatin dûrxistin. Bi vî awayî rêveberî kete destê partiya Baas de.

Partiya Baas jî, di **11'ê Adara 1970'î** de di derbarê çareserkirina pirgirêka Kurd de peymanek weşand, ev peyman jî weke peymanên derbazbûyî mafê gelê Kurd yê otonomiyê garantî dikir. Li aliyê din hêza pêşmerge ya ji 13 hezar kesî pêk dihat wê di parastina hûndirîn de cih bigirtiba. Di herêmê de rewşekd erênî ya aşitiyê desthilat bûbû. Ev rewş heya **1975'an** bi vî awayî berdewam kir.
Tevgera Kurd di van salan de, di hemû hêlan de bi Îranê ve hatibû girêdan. Pêdiviyên aborî û bi taybet jî çek ji aliyê Îranê ve dihatin dayîn. Ev jî, ji bo tegera Kurd ya başûr rewşeke pir xirab bû. Ev rewşa xirab bi demê re xwe pir vekirî dida diyarkirin.

## WANE 47.

### Pirsên Amadekariyê

1- Peymana Cezayîrê kenî û di navbera kîjan dewletan de hate îmzekirin?
2- Peymana Cezayîrê badoreke çawa li kurdan kir?
3- Piştî rûxandina Komara mahabadê rewşa kurdên Rojhilatê Kurdistanê?

## 3-PEYMANA CEZAYÎR

Rewşa li Iraqê derketî holê ne li gorî berjewendiyên Amerîka û Îngilîstanê bûn. Van dewletan ne dixwastin statûya piştî şerê cihanê yê yekemîn derketî holê, bê gûhertin. Ji ber vê çendê, bi gûman nêzîkî pêşveçûnên li Iraq û Kurdistanê dibûn. Bi taybet Îngilîstan ji bo hemû pêşveçûnên di pirsgirêka Kurd de çêbûyîn, bi awayekî eşkere astengî çêdikirin.
Heman rewş ji bo dewletên Kurdistan di nava xwe de parçekirî jî derbaz dibe. Di nava wan de Tirkiye her demê serkêşiyê dike. Li kîjan beşê gavek erênî bê avêtin Tirkiye xwe diavêje holê û dibe kelema herî mezin.
Tirkiye heman rola sereke, di amadekirina peymana cezayirê de jî dilîze.
Di sala **1970'î** de Îranê, ji ber pirgirêka Şetûl-Ereb ya di navbera wan û Iraqê de alîkariyeke mezin dida partiya Demoqrata Kurdistanê. Partiya Demoqrata Kurdistan, di hemû aliyan de xwe sipartibû Îranê, alîkariya maddî û bi taybet jî çek û cebilxaneyê wan ji Îranê dihat. Ewqas îradeya xwe radestî wan kiribûn ku dema Îran alîkariya xwe qût dike, di heman demê aliyê Kurd jî têkçûna xwe dide ragihandin.



Di sala **1975'an** de, di civîna dewletên petrola îhraç dikin de **(OPEC)** bi navbeynkariya serok komarê Cezayirê Bomedan, rayedarên Îran û Iraqê dest bi hevdîtinan dikin. Di van hevdîtinan de dewleta Iraqê bi şertê ku Îran alîkariya xwe ya ji bo Kurdan bide rawestandin, wê dest ji mafên xwe yên li ser Şetûl-Ereb berdabane.
Di dawiya hevdîtinên mijara gotinê de û li ser zextên dewletên ku ne dixwestin di pirsgirêka Kurd de pêşkeftin çêbibe, **6'ê Adara 1975'an** Peymana Cezayirê hat îmze kirin.
Peymana Cezayirê, di şikestina şoreşa başûrê Kurdistanê ya li dijî dagirkiriyê de, roleke mezin lîstiye. Peymana Cezayirê demeke dirêj derfetên jiyanê nedîtiye. Di sala **1979**'an de li Îranê desthilatdariya Şah tê rûxandin. Bi desthilatdariya Hûmeynî re, komara îslama Îranê tê damezrandin. Têkiliyên herdû dewletan jî li ser van pêşketinan xira dibin. Di Îlûna sala **1980**'î de jî di navbera Îran û Iraqê de şerekî dem dirêj yê rê li ber kuştina sed hezeran mirovî vedike destpêkir.

## 4-Piştî Têkçûna Komara Mehabad Li Rojhilatê Kurdistanê Tevgera Kurd

Piraniya endam û layingirên partiya demoqrata Kurdistana Îranê piştî rûxandina komara Mehabad, dikevin ber lêpirsînê. Hinek ji wan jî derketibûn derveyî welat, partiyê rêveberên xwe winda kiribûn. Xebatên rêxistinê hatibûn belavkirin. Kesên ji girtinê rizgar bûyîn bi awayekî veşartî dixebitin. Di encama van xebatan de kovareke bi navê **"Rêga"** derxistin. Bi demê re di herêmên Kurdistanê de xebatên Partiya Demoqrata Kurdistana Îranê zêde bûbûn. Lê, bi sûîqasta ne serkeftî ya li dijî şah Mihemed Riza Pehlewî re ku sala **1949'an** de pêkhatî bû, li tevayî Îranê terora dewletê carekê din zêde bûbû. Bi vê re hejmareke zêde endam û alîgirên partiya demoqrata Kurdisatana Îranê, bi cezayên mezin hatin cezakirin.

Bi arikariya partiya gel ya Îranê **(TÛDEH)**, partiya demoqrata Kurdistana Îranê xwe ji nû de bi ser hev ve anîbû, xebatên xwe yên di nava gel de didomandin.
Dewleta Îranê di van salan de siyaseteke dû alî li hember gelê Kurd
dida meşandin. Li aliyekî li ser gelê Kurd yê di bin dagirkeriya xwe de her cûrê zilm û zordarî dimeşand, li aliyê din ji bo tevgera Kurd ya başûrê Kurdistanê piştgiriyeke bêdawî dida nîşakirin.
Nakokiyên di navbera rayadarên şah û Kurdên Rojhilat de tûnd dibûn. Di encamê de bû sedema derketina serhildanekê. Endamên desteya rêvebir ya partiya demoqrata Kurdistana Îranê ku ji welatên cîran zivirîbûn, serokatiya serhildanê dikirin. Piştî vê serhildanê herêma di navbera Mehabad, Bane û Serdeştê de şerê gerîla destpê dikir. Ev şerê li dijî rêvberiya şah hejdeh mehan berdewamkir.

Ji bo têkçûna serhildanê rêvebiriya Îranê, her riya ku heyî diceriband. Zilma li dijî Kurdan li her cihî belav bûbû.
Partî Demoqrata Kurdistana Iraqê, di têkbirina vê serhildanê de roleke pir qirêj digirt ser milê xwe. Li ser daxwaza rayedarên Îranê, êrîşî hêzên Kurd yên Rojhilatê Kurdistanê dikirin. Di van êrîşan de di serî de yek ji rêveberê serhildanê Silêman Mûînî, Mele Aware û hejmareke zêde şervanên Kurd dihatin şehîd kirin. Bi vî awayî tevgera Kurd ya li Rojhilatê Kurdistanê derbeyeke giran dixwar.
Hewildan û tevgerên Kurdên Rojhilatên Kurdistana Îranê, piştî vê bûyerê jî berdewam dike. Daxwaza jiyaneke azad û serbilind di nava hemû beşên civakê de, di her derfetê de xwe dida xûyakirin. Bandora xebatên li dijî dagirkeriyê, car car bilind dibe. Carna jî bandora wê ya di nava gel de lewazî jiyan dikir.

Di salên navbera **1974** û **1978'**an de bandora tevgera demoqratîk a netewa Kurd, lewaz dibe. Weke sedemên lewazbûnê tenê reformên rêveberiya Şah **(şoreşa Spî)** yên di van salan de hatin bicihanîn yan jî bi zilm û zoriya li ser gel hatî meşandin, nayê diyarkirin. Hinek sedemên siyasî yên ji der ve jî, di vê de rol dileyîstin. Peywendiyên Iraq û Îranê, di derketina vê rewşê de diyarkerin. Siyaseta Şah ya li hember Kurdan tûnd bû.

Sala **1975'an** bi Peymana Cezayirê re êrîşên li ser Kurdên başûr zêde bûbûn. Bi vê re, êrîşên li ser Kurdên rojhilat jî gihiştîbûn asteke bilind. Rêveberiya Şah demên destpêkê Kurdên ji ber zordariya rêveberiya Iraqê direvin di nava xwe de dipejirandin. Piştî peymana Cezayîrê Kurdên başûr paş de hatin zîvirandin. Weke din li ser pêşveçûnên çandî qedexeyan destpê dikir. Zimanê Kurdî hatibû qedexekirin. Li xwe kirina cil û bergên Kurdî rastî êrîşên hêzên ewlekariyê dihatin.
Di encama van zordarî û çewisandinan de Kurdên rojhilat di nîvê sala **1970'**î de, di destê Şahê Îranê de mîna herêmeke ku ji nû ve hatî dagirkirin lê hatibû.

WANE 48.

**Pirsên Amadekariyê**

1- Tabetmendiyên Tevgera Kurd ya li Rojavayê Kurdistanê çi ne?
2- Siyaseta Kembera Erebî ya dewleta Sûrî li ser Kurdan meşandî çawa bû?
*3*- Çima li Rojavayê Kurdistanê serhildan çênebûn ne?

## 5-LI BAŞÛRÊ ROJAVAYÊ KURDISTANÊ TEVGERA KURD

Li gorî peymana Lozanê Rojavayê Kurdistanê gihiştîbû Fransayê. Di Îlûna 1921'an de li gorî peymana Franklin- Boûillon Kurd di navbera bakur û rojava de ji hevdû hatin cûda kirin. Ev beşê welatê me bi Sûrye ve hatibû girêdan û li vê derê dewleteke Ereb hatibû damezrandin.
Herçiqas li gorî parçeyên din yên Kurdistanê hejmara Kurdên vî beşî kêm jî be Kurd li Sûrye weke gelê dûyemîn piştî Ereban cih digrin.
Kurdên rojava di tevayî serhildanên Kurdan yên beşên din de, roleke girîng dileyîzin. Ji bo Kurdên parçeyên din cih vekiriye û bi her awayî alîkariya xwe daye nîşa kirin. Di têkçûna serhildanan de rewşenbîr û têkoşerên Kurd li vî beşê welatê me bi cih bûbûn. Gelek kesayetiyên navdar yên weke Bedirxaniyan, Osman Sebrî, Ihsan Nûrî Paşa, Dr. Nûrî Dêrsimî, Cigerxwîn û navdarên din yên Kurd, di vê herêmê de demên dirêj jiyana xwe domandine. Bi bandora van kesan û kesayetiyên din yên herêmê, asta welatparêziyê hertim bilind bûye.




Di pêvajoya ku hêzên Franse li Sûriyê bûn, Kurdan dikarin xebatên çandî bidin meşandin. Di vê demê de ji aliyê hinek rewşenbîrên Kurd ve, bi armanca şiyarkirina gel, di derbarê pirsgirêka Kurd û pêşveçûnên cîhanê de kovara **"Çiyayê Kurmênc"** dihat weşandin.
Di salên 1920 heta salên 1940 li Efrînê li herêma çiyayê kurmancan li pêşberî dagirkeriya Fransa berxwedaniyek hate pêşxistın. Ev berxwedanî ji bo serbixwebûna vê heremê tê kirin. Kesekî ku navê wî Seyîd Ebû Nûredîn an jî Îbrahim Xelîl Û sîlsîlsa xwe gûrcî û ji îzmîtê bû. Hatibû nav Kurdên Efrîne û dest bi rexistina neqşîbendiyan kiribû, dibin rêvebertiya vî kesî de serhildan hatibû destpêkirin. Vî kesî li heremê bi navê Ahmed kemal Paşa hereket dikir. Bi navekî din jî ji vê tevgerera di gotin tevgera MÛRİİTA. Ji bo vê hin kes dibêjin ku di nava dewleta Tirkan de fermandarek bûye û ji hêla M. Kemal ve hatiye şandin. Bajarê Hatayê di nav Tirk û dewleta Sûrî de weke pirsgirêkekê mabû, di salên 1939 da bi li hevdû hatinekê Hatay dane Tirkan. Piştî ku Tirkan Hatayê girtin destê xwe ji alîgiriya vê tevgerê kişandin û tevger têk çû. Piştî ku tevger têkçû gelek gundên ve heremê ji hêla Fransizayan ve hatin wêrankirin. Piştî têkçûnê gelek Kurdên ve heremê hatin koçber kirin. Tevî Îbrahîm Xelîl ve li Manîsayê hatin bi cih kirin. Sala 1952 Îbrahîm Xelîl bi şêwayekî faîlê wî nediyar li Manîsayê hate kuştın.

Dema desthilatdariya Sûriyê dikeve destê neteweperestên Ereb, rewşa Kurdên vê herêmê jî, bi carekê de tê gûhertin. Rayedarên Ereb, bi bandora dagirkerên din yên Kurdistanê,

helwesteke xirab didin nîşakirin. Zimanê Kurdî tê qedexe kirin. Navê bajar, navçe û gundên Kurdan bûn Erebî. Li gel vê tevayî kar û xebatên girêdayî çanda Kurd, rastî astengên dewleta Sûriyê hatin. Di sala **1957'an** de xebatên Partiya Demoqrata Kurdistana Sûriyê yên bi awayekî dimeşiyan, rastî êrîşên îstîxbarata Sûriyê hatin. Di encama van êrîş û destavêtinan de Partiya Demoqrata Kurdistana Sûriyê di sala **1966'an** de bû dû parçe.



Piştî ku yekîtiya misrê û sûriyê belav dibe, Di salên 1961 de serfermandarê îstîqbareta herama cizirê mihamed Talîp Xalîl bi navê xebatên li kurdîstanê pêşnûmeyek amade kir û pêşkêşî hûkumeta Sûrî kir. Ev pêşnûme ji dewlata Tirk hatibû girtin. Di 27 gûlan 1960 an de darbeya ku li Tirkye hatibû çekirin û pêşnûneya ku ji hêla komîteya milî ve li ser navê xebatên Tirkirina Kurdan weke vê xebatê ji hêla vî serbazî de ji bo Kurdên Rojava jî hatibû amadekirin. Dewleta Sûrî û Tirkî ji bo Kurdan bi hev re tevgerê de bûn.
Weke siyaseteke hevbêş ku Tirk û Sûrî bi hev dûra didan meşandin yek ji wê siyasetê jî 12 Mijdara sala 1960 an de şewtandina sînema Amûde ye. Di ve Sînemayê de bi şêwazekî bi plan kîrî tê pêkanîn û di vê derê de 292 zarok bi şewazekî hovane têne şewtandin.

Di sala **1962'an** de, di çerçowa Kembera Ereb de nasnameyên hejmareke biqasî 120 hazaran Kurd, ji wan hatin standin. Di heman demê de ev kiryar dihat wateya astengkirina hilbijartin û hatina hilbijartina wan kesan. Ev kesên weke Mektûm, ango bê nasname îro gîhaye biqasî 300.000'î ye. Armanc ji vê helwestê, pişaftin û kêm nîşakirina hejmara girseya Kurd e. Dîsa, di çerçoveya Ereb kirina herêmên Kurd de, hejmarên mezin Ereb ji bajar û navçeyên Sûriyê tanîn Kurdistanê. Yên vê herêmê jî di encama siyasetên aborî de, ji ber ku hejarî dihat pêşxistin, ji bo derbazbûna jiyaneke baştir di hêla aborî de diçûn bajarên din yên Sûryê.

Bi vê siyaseta Ereb kirinê re êrîş û çewisandinên rêxistinên ewlekariyê jî, li ser gelê Kurd dihat meşandin. Nerazîbûnên gel yên li dijî rêveberiyê bi rêya îşkence û girtinan dihatin rawestandin. Di salên 1963 da Rêveberiya Awarte hate îlankirin û ev biryar di vê serdemê de kete meryetê.

## KEMBERA ERABAN

### Ev destûrname ji van xalan pêk ten:




- Kurd ji sînor dûrxistin û ber bi nava Sûriyê ve koçber kirin.
- Lezdayîna qirkirina çandî û ji bo vê di heremên kurdan de çêkirina dibistanên arabî.
- Bi piranî Kurdên ku li CIZÎRÊ rûdinên di serdemên serhildanan de ji deverên din hatine, diyarkirina van kesan û cihê ku jê hatine, radestkirina wan a wan dewletan.
- Ji destên wan derxisitina îmkananên kar, erdên wanî ku ji bo cot û çandiniyê bi kêrtan ji wan sitendin û bi

şêwayekî ku van erdan ne bênê îcar kirin ne jî karibin bistînin. Sitendin û îcar kirin ji wan re bê qedexe kirin.

- Dinav civaka Eraban agahiyen ne baş di derheqê Kurdan de bên belav kirin û di nav civaka Eraban de dijminatiya Kurdan bê pêşxistin. Xeter bûna Kurdan ji bo Eraban di warê çendî de bê belav kirin ku Erab nehêlin Kurd di van Erdanda bi cîh bibin.
- Cîhên Kurdan ku hestyariya neteweyî û olî ya wan heremane bên vala kirin. Di cîhê wan de Erab bêne bi cîh kirin.
- Fitne û fesadî xistina nav êlen Kurdan û wan bi hevdû re dana şer kirin.
- Di xeta sînor de Erabên herî belengaz bên bi cîh kirin. Bi teybet êlen ŞAMAR ev ji bo dewleta Sûrî gelekî girîng e.
- Di xeta sînorê Cizîre de weke qadeke leşkerî diyar kirin, ji ber ku Erabên ku li van deran bêne bi cîh kirin, bêne paristin.
- Ev êlen Ereb ku li vê heremê bêne bi cîh kirin erdên fereh ji bo wan bên dayîn û wan êlan bêne bi çek kirin, perwerdeya leşkerî dayîna wan.
- Kesên ku bi zimanê Erabî ne axife mafê dengdanê û hibijartina jê bê sitendin. Kesen ku li van herêman dimînin pêwîste mafê hemwelatiye jî ji wan re neyê dayîn û nasname jê wan re çêne be.

Armanca van xalan di pêşeroje de pêşî lêgirtina serhildanan bû. Dîsa armanc bi tevayî ji demekê û şûn de tine kirina Kurdên Rojava bû.

Di çerçoveya vê destûrê de di sala 1973 de li Eyaleta Raqayê li ser ava firat bendavek hate çêkirin. Navê vê bendavê kirn şoreşa Eraban. Bi navê reforma erdê ji Serekaniye heta Cizîrê di heman demê de ji 15 heta 20 km di xeta sinor de Erab bi cih kirin. Erden herî bi berhem dest danîn ser. Kurda bê kar û hiştin û kurd ji ber ku nikaribin debara xwe bikin, bi vî halê ku koçberî bajarên Eraban bibin û di wan deran de di pijaftina çandî re bêne derbaz kirin. Ev siyaseta ku dihat meşandin bi hevkariya dewleta tirk di hate kirin. Bi teybetî jî ew ji xeta sînor dûrxistin û Erab tê de bi cih kirn, armanc ji hev kirina kurdên bakur û rojava bû. Tirkan jî ji milê xwe ve li sînor mayin didanîn. Dûrketina Kurdan ji erdingariya wan polîtîkayên bişaftinê jî ji bo wan hêsanî dikir. Ji hela neteweyî û pîskolojî ve jî lewaz bûnek bi wan re didan çêkirin. Her çendîn di nav hinek Kurdan de dijbertiya vê siyasetê hatibe kirin ji, lê zêde encam negirtiye. Sîyaseta qirkirin û tine kirinê ku li Sûrî dihat meşandin ti cûdabûyina xwe ji perçên din tine bû. Di heman demê de bi şêwazekî hevbeş di meşandin. Cûnta salên 1960 î li tirkan çi be, derxistina qanûna li Sûrî di salên 1961 de derketî bi şêwazekî şêwazî ye. Kurd di encamên van polîtîkayan de koçberî Halepê, Şam û Latkiyê bûn. Li van deran jî li der û dora bajaran bi cih bûn. Di karên herî giran û herî erzan dan dihatin bikaranîn.

Di sala **1971'an** de pêvajoya desthilatdariya Hafiz Esed li Sûriyê destpê dike. Di vê pêvajoya Partiya Baas de jî, helwesta înkarê ya li dijî gelê Kurd didome. Lê ji ber ku rêveberiya Hafiz Esed xwe dispart Erebên Şîe û Şîe jî li Sûriyê li gorî Sûnniyan di hejmareke kêm de bûn, siyaseta hevsengiyê li hember Kurdan dide meşandin. Ji ber vê sedemê di dema Hafiz Esed de, naxwazin bi Kurdan re bêne hemberî hev.

Demekê rexistina Xoybûn xwe li vê der bi rexistin dike û gelek çaran li van deran civînan li dardixe. Dîsa kesên wek Osman Sabrî, Nûrî Dersîmî, Cîgerxwîn û Hemîdê Hecî Derweş PDK rojava çêdikin. Lê ji demekê şûde ev partî dibe dû-sê perçe. Piştî salên 90 partîya Tecemik tê avakirin û dikevin hilbijartinan 6 parlementeran dixin parlementoya Sûrî. Di salên 1999 de piştî ku Abdûlah Ocalan ji Sûrî derdikeve. Ev rexistin di Şexsê Merwan Zîrkî de di keve bin bandora dewlete. Piştî ku dikeve bin bandora dewletê, PKK alîkariya xwe jê dikşîne ev rexistin bi vî ewayî belav dibe.

# UNÎTE 6.

**WANE 49.**
**DÎROKA KURDEN KAFKASYA Û KURDÎSTANA SOR**
**WANE 50.**
**DERBASBÛNA RÊBER APO YA ROJAVAYÊ KURDISTANÊ**
**PKK Û MEYÎLA AZADIYA GEL**
**WANE 51.**
**TAYBETMENDIYA  KU TEVGERA PKK' ê JI HEMÛ TEVGERÊN DIN CUDA KIR NÊÎKATIYA JI JINÊ RE YE**
**WANE 52.**
**DI KURDAN  DE TÊGEHA TARÎQET Û MEZHEB**
**WANE 53.**
**DERKETINA BINGEHA FELSEFEYA TARÎQETAN.**
**Qonaxên Nakşîbêndiyan**
**Di Nakşibendî De Nasnameyek Nû; Xalidî**
**WANE 54.**
**DI SEDSALA 20. DE LI SER JIYANA KURDAN  A SIYASÎ DESTWERDANA NAKŞÎBENDIYAN Û PDK'Ê**
**Di Hemeza  Haham de  Nakşîbendî.**

**NAVÊ BAJARA Û NAVÇEYAN BI KURDÎ Û TIRKÎ**

## WANE 49.

**Pirsên Amedekariyê**

1- Çima Kurda berê xwedane Kefkasya-Rûsya?
2- Dewleta Şedadiyan çiqasî li wan deran hokum kiriye?
3- Kurd li van deran bi polîtîkayeke çawa re rû bi rû mane?

## DÎROKA KURDEN KAFKASYA Û KURDÎSTANA SOR

Kurd perçeyek jî dîroka Kafkasya ne. Di dîrokeke pir kevin de Kurda dewarên xwe didan pêşiya xwe û diketin rêkan. Li ku derê ji bo dewarên xwe cih bidîtina berê xwe didan wê derê. Kurdên kafkasya jî bi vî şêwazî derbazî çîyayên kafkasya bûne. Ev dîroka Kurdên Kafkasan heta Medan jî direj dibe. Hinik kevirên kevnar yên ku li vê derê têne dîtin ev kêviran nîşaneya ol û bawerîyen Kurdan ê kevinin. Ev rewş ji hêla dirokzanên Ermenî ve jî tê piştrastkirin. Bi taybetî ev tîmsalan B.Z bi 300 hatine çêkirin. Di serdema fetha İslamiyetê de jî bi taybet di 640 an da dema ku arteşa îslamiyetê di çê çiyayên Kafkasya bi berxweda hinik elên Kurdan re rû bi rû dimînin. Ev rewş ji hêla hinik dîroknasên Arap ve jî hatîye nivîsandin. Dîsa di sed sala 10. de dema ku di serdema Çarê Rûsan ê yekem de çiyayê kafê derbaz dikin û derbazî Başûrê Kafkasiya di bin, di bêjin ku li wê derê rastî êlên Kurdan hatine û bi wan re ketine nav pevçûnan. Ev rewş hem ji hêla dîroknasên Ermenî, hem jî ji hêla dîroknasên Rûsan ve jî tê ziman û di nivîsên xwe de cih didin vê rastiyê.




Kurd ne bes bi tenê weke koçeran li wê derê cihh girtin, di heman demê de li wan erdan dewlet jî ava kirine. Yek ji wan dewletan di salên 951 de tê jiyankirin, Begîtiya Şedadiyan e. Mihamed Şedadî ji atûrbatakan (li bakure Îranê ye) heta bakurê kafkasan di roja me ya îro de ev herêm di Ermenîstanê de weke dîvîn tê naz kirin. Li vê derê bajarê dîbîl jî dikin destê xwe û begîtiya vê derê dikin. Ev herêm ji 951 heta 1130 di destê begîtiya şedadiyan de dimîne. Dîsa milekî êla Şedadiyan derbazi bakure Kurdîstanê **Anî** dibin, ev der heta sala 1199 dibin destê berpirsekî bi **navê Manûçî** de dimîne**.** Dayika manûçî keça kiralê Ermeniyan Aştûnûne. Nehçivan û hinek bajarên Azerbeycan jî di dest wan de bûn.

Di vê serdemê de hinik kevnariyên ku hatine çêkirin, mînakek ji van jî pira bi navê xwûdaxerî ku li ser çemê Arasê hatiye çêkirine ye. Ev pir hata roja me ya îro jî dimîne. Di serdema Moxûlan de jî, Malbata ku li herêmê

bi nav û denge malbata Çêpildirejaye. Ev nav ji ber ku gelek heram kirine bindestê xwe li wan hatiye kirin.
Hem di nivîsên şerefxanê Betlîsî de, hem jî ji hêla dîroknasên Ermenî ve jî li herêma karabaxê ku wê demê jê re digotin herêma 24 an re dihate gotin. Ev nav ji yekîtiya 24 êlên Kurdan dihat. Di wê serdemê de 24 êlên kurdan li vê herêmê jiyan dikirin. Di sedsala 17 de Şah Abas ji ber şervantiya vî gelî bi armanca paristina xaka xwe vî gelî li xoresanê bi cih dike. Lê di serdema Sovyet Rûsya de koçberî Tûrkmenîstanê bûn.
Di sedsal 18. de Rûs dest bi çûna Başûre Kafkasya dikin û li vê derê bi Kurdan re di xwazin têkîliyên baş deyînin. Ji bo wê di akademîya zimanên cîhanê de ferhengên bi kurdi jî çêdikin. Rûs gelek hesabên ne baş li ser Kurdan dikin û bi tayebet zilam3en kurd ji bo xwe didin şer kirin.
Pîştî ku Rûs başûrê kafkasya dikin destê xwe, ji hela çar Romanov di sala 1912 hata laçîner diçin. Di sedesala 19. de di navbera Osmanî û Rûsan de şer destpêdike. Ev şerê han piranî li ser erdingariya Kurdan tê kirin û herî zêde Kurd û erdingariya Kurdîstanê jê zirar dibîne. Her dû dewlet jî, ji bo xwe kurdan li hemberî hev didin şer kirin. Di encama van şeran de gelek kurd jiyana xwe ji dest didin. Her dû dewlet jî ji bo kurda siyasetêke weke hev pêkditanîn. Osmaniyan çewa ji bo serok êlên Kurdan û zarokên wan dibistanên taybet çêdikirin û ew di wan dibistanan de ji bo berjewendiyên xwe perwerde dikirin. Rûsan jî heman sîyaset ji bo kurdan pêkdianîn. Rûsan jî Kurda li der û dora serok êla bi navê Caf Axa kom kiribûn û ji bo xwe di rêka vî serok eşîrî de didan şerkirin.
Di şerê kirimê de Rûsan nêzî 20 hezar kurd dîl girtibûn. Ev dîl bi piranî jî jin bûn. Ji bo ku Kurd zêde nebin ev jinên Kurd ên ku dîl hatine girtin bi zilamê Rûs re dihatin zewicandin. Li vê derê bi piranî Kurdên dimilî jîyan dikirin. Rûs ji bo ku karibin Îranê, têkîliyên xwe bi dimiliyan re xweş digirtin.
Rûsan begîtiya Gûrcîstanê xistin destê xwe û paşe jî êrîş birin ser Îranê û Ermenîstan, piştî ku bi serket ev der tevl3ı xaka xwe kirin. Di heman demê de gelek gund û bajarên Kurdan jî di nav vê herêmê de kete destê Rûsan.
Di serdema salên 1828 de li herêma Ermenîstanê hijmara Kurda ji hijmara Ermenîyan pirtir bû. Ji bo wê Rûs û ÎraniyaN di nav xwe da peyman çêkirin û Ermeniyên ku li Îranê mabûn derbazî Ermenîstanê kirin. Ji ber rewşa Osamaniyan û dest hilatdariya ku li ser Kurdan dihate pêkanîn, ji ber wê gelek êlên Kurdan derbazî milê Rûsya bûn. Bi taybet Kurdên ezdayî û hinek jî êlên mûsûlman derbaz bûbûn. Weke êla Stûrkan, Şerkiyan, Celalî, Bûrkî, Herkî û Şêxbiziyan.
Di salên 1877-78 di şerê Rûs û Osmanliyan de gelek gund û bajarokên kurdan weke hinek herêmên kars û Ardihanê ketin destê Rûsan. Piştî van şeran ew bajarok di nav sînorên Rûsan de man.
Piştî şerê cîhanê yê yekem Osmaniyan li gel Almanan cih girt. Ji ber wê Rûsan di ser Serhêdê re dest bi êrîşên li ser Osmaniyan kirin. Osmanî di rêka Alayên Hamdiyê de dest bi qetilkirina di serî de Ermeniyan û paşê jî kurdên Ezdayî kirin. Ji ber van êrîşan gelek gelê Ezdayî koçî milê Rûsya bûn. Bi alîkariya Rûsan parlementoya Ermeniyan hatê avakirin. Kurdên li vê herêmê weke kêm netew hatin pejrandin. Hin kes weke parlementerên kurdan jî di parlementoya Ermeniyan cihê xwe girtin.
Di vê serdemê de li Rûsya şoreşa 17 cotmehê pêşketi bû. Di 3 adara sala 1918 de peymanek hatibû morkirin û li gorî vê peymanê sînorên kafkasan hatibûn diyarkirin. Ruxmê ku şoreş

çêbûbû jî, lê ne di xwestin kurdan weke neteweke bibînin. Ji bo wê jî hijmara kurda di rastiyê de 500 hezar bû, lê di fermiyata dewletê de weke 25 hezar hati bû nîşandan. piştî van şeran di 1920 de Ermenisatan jî tevlî sînorên Rûsan bû. Ji bo kurdan jî hinek ji warê mafên çandî ve pêşketin dahatin çêkirin.
1925 partiya komonîst ji bo kurdan alikarî da destpêkirin. Hinek erd li wan hat belav kirin û ji hêla çotkarî de ew perwerde dikirin. Di vê serdemê de kolhozor jî (komûn) hatin avakirin û kurdan di van kolhozoran de bikaranîn. Vê rewşê di jîyana kurdan de gelek guhartin çêkirin.
Di sala 1930 de li bakurê kurdîstanê serhildana Çiyayê Agirî hebû, piştî ku ev serhildan têkçû, gelek kurd ji ber qatliyama tirka reviyan û berê xwe dan Rûsya.
Di salên 1961 de çêwa ku Irak, Sûriye û Tirkan ji bo kurdan zagonsaziyeke taybet dexistin Rûsan jî di vê dîrokê de desthilatdariya xwe li ser Kurdan zêde kir. Bi taybet dixwestin kurdan ji çotkarî û haywanan xwedîkirinê dûr bixînin. Çendî hewildan çêkirin jî lê dîsa jî biserneketin.
Pîştî şoreşa 17 cotmehê ji bo gelê Asya Navîn û Kafkasya hêviyên azadiyê zêde bûn. Gelek gelan komar avakirirn, ên kêm netew jî otonom avakirin. Kurd jî ji van gelên kêm Netew bûn. Kurdên ku di nav sînorên Azerbeycan de jîyan dikirin, otonomî bi destxistin. Bi kurtayî kurdistana sor di sala 1923 de li laçîna ku di nav sînorên Azerbeycanê de cih digirt de weke paytexta kurdîstana sor hate avkirin. Lê temenê kurdîstana Sor zêde berdewam nekir. Di sala 1929 de dawî lê hat. Lenîn di wê serdemê de ji bo kurdîstana Sor 40 mîlyon rûble cûda kir. Piştî mirina Lenîn ew pereyên ku ji bo perwerde, karsazî û tendûrûstî hatibûn cudakirin, ji hela Sitalîn ve ji bo Ermenîstanê hatin mezxandin.
Kurdîstana sor ji hêla Sitalîn ve ji bo pirsgireka di navbera Ermenî û Azeriyan de ji bo hinek berjêwendiyên wan hate kurbankirin. Her çendî Kurdîstana Sor hilweşiya be jî, lê dîsa jî kurdan têkoşîna xwe berdewam dikir. Di sala 1937 de rojnameya bi navê “Raya Teze” hate derxistin.
Dewleta Rûsan ji bo şerê cîhanê yên II. amadekariyên xwe dikirin. Baweriya wan bi kurda nedihat, ji bo wê bi fermana Josef Stalîn wezîrê karê hundir Layrenty Berya gelê kurd 200 km ji sînor dûr xistin. Ji bo kurdan careke din koçberiyê dest pêkiribû. Bi vê koçberiye kurd ji kafkasya ber bi Asya Navîn hatin şandin. Di salên 1940 de di serî de kurd paşê jî bi tevahî kêm Neteweyên din di nav şer de di çêperên pêşîn de dikirin şer. Ji ber vê rewşê gelek windahî çêbûn. Lê di sala 1957 de Stalîn mir, kurd piştî mirina sitalîn careke din Hatin cihê xwe yê berê. Li Êrîvanê radyoya kurdî hate vekirin, li gel vê ensûtiyên zimanê kurdî jî hatin vekirin.
Li ser karabaxê di navbera Ermeniyan û Azariyan de şer destpêkir. Herdû milan jî dixwestin ku kurdan li gel xwe têxin nav şer, her çendîn herdû milan jî kêmek ji Kurdan li gel xwe dabin şerkirin jî, lê bi piranî kurd dûrî şer sekinîn. Piştî ku Ermenî bi ser ketin. Berê xwe dan kurd û dest bi kuştina kurda kirin. Kurd careke din bi koçberiyê re rû bi rû man.

Kurdên rûsya piştî salên 1990 hinik hêviyên wan ên azadiyê çêbûn. Ji bo wê gelek hewildanenên rewşanbîrên kurd çêbûn, lê mirov dikare bibêjê pir zêde encam negirt.

**WANE 50.**

**Pirsên Amadekariyê**

1- Piştî Rêberê Gelê Kurd Abdûlah Ocelan derbasî Rojavayê Kurdistanê bû bandoreke çawa li gelê Rojava kir?
2- Bi derketina PKK' ê re çi guhertin li Kurdistanê çêbûn?
3- Taybetmendiya bingehîn ya ku serhildana PKK' ji serhildanên din cuda dike çi ye?

## DERBASBÛNA RÊBER APO YA ROJAVAYÊ KURDISTANÊ



Di sala **1979'an** de Serok APO derbazî başûrê rojavayê Kurdistanê dibe. Ji vê dîrokê û şûn de xebatên Serok APO yên di nava gel de destpê dikin. Gelê vê herêmê ji nêzîk ve Serok APO dişopîne û di asteeke jor de jê bandor dibe. Bi vê bandora Serok APO gelê Kurd yê Başûrê Rojavayê Kurdistanê, di hemû aliyan de tevgera rizgariya neteweya Kurd ya dibin pêşengtiya Partiya Karkerên Kurdistanê de hatî destpê kirin, piştgirî dike.

Di salên 1999 da piştî ku Abdûlah Ocalan ji Sûrî derket Beşar Esad bi Dewleta tirkan re peymana Adanê çêkir. Li ser bingeha vê peymanê dîsa dest bi qirkirina kurdan kir. Careke din girtin û çewsandin dan dest pêkirin. Di 12 Adara 2004 de di takimên bi navê Cîhat û El Fetwa di leyizin. Kurd El Cîhat erap jî  El Fetwa pişgirî dikin. Di encamê de di  leystokeke ku ji hêla dewletê ve hatiye amadekirin dest pêdike. Di navbera Kurd û Eraban de pevçûn çêdibe. Ereb berê ji hêla dewletê ve hatine amadekirin. Dewlet bi çekan êrîş birin ser gel, gel li herderî wan sekinî û bersiv da dewletê. Heta 3 rojan xwe da milekî pîştî 3 rojan şûn de careke din êrişî ser gel kir. Di encamê de  36 kes ji gel hatin qatilkirin.

Di salên 2009 de li Sûrî li pêşberî rejîme ne razîbûn zêde bûn kurd jî tevlî vê nerazîbûnê bûn. Di encamê de ji bo wan kurdên ku weke hemwelatî neditin pejirandin têkoşînekê destpêkir. Di 19  Tirmeha sala 2012 de di serî de li Kobanê, pişt re li Efrînê, Dêrik, Amûdê, Serêkaniyê, Tirbespiyê, Dirbêsiyê û Tiltemir hatin ji aliyê gelê Kurd ve hatin desteserkirin û dest danîn ser sazî û dezgehên dewletê. Bi vî awayî dewlet neçar ma ku hemwelatîbûna wan Kabûl jî bi pejirîne. Kurd di navbera Tevgerên bi navê Artêşen Azad ku dijberi rêveberiya sûrî tevger dibûn û dewlata sûrî de weke xeteke sêemîn xwe bi cih kirin û li ser vê bingehê dest bi têkoşînek dijberî her dû aliyan jî kirin. Di encama vê têkoşînê de ji nû ve rêveberiyeke demokratik a bi navê Meclîsa gel hate avakirin. (TEV-DEM). Ji bo paristina gel jî Yekîneyen Paristina Gel avakirin.(YPG YPJ) û têkoşîna xwe dan berdewam kirin.
Di herêmên Kurdan de bi navê sê Kantonan Herêmên Xweser hatin avakirin.  Kantonek li Cizîrê, yek li Herêma Kobanê û Yek jî li Herêma Efrîne hate avakirin. Rêveberiya Barzanî bi hinek partiyên ku ava kirî xwest vê rewşa ku Kurdan  bi dest xistiye xera bike. Hinek

zarar jî da vê şoreşê lê bi vîn û hêza gelê kurd û rêveberiya bi rêgez ev lîstok jî hatin vala derxsitin.

## PKK Û MEYÎLA AZADIYA GEL

Meyîla azadiya gelê Kurd bingeha xwe ji wekhevî û azadiya serdema dayîksalarî digre. Wate dayîna azadiyê û weke heviyê bi teybetî jî ji êlen çiyayî û malbatên gundîtî tê. Di herêmên çiyayî de ev daxwaz bêhtir e. Di serdema yekem û navîn de ji derveyî beşê hevkar, daxwaza azadiyê di nava civakê de cihekî girîng digre. Xûlamtî û koletî pirtirîn karê çîna desthilatdar e, di gel de meyîla azadiya xwezayî pirtir bi peşketiye. Lê ruxmê hemû xirabî û xirakirina kapîtalîzmê, lê hîna jî di nava gel de wekheviya xwezayî, wekhevî, biratî û jiyaneke hevbeş zîndî bûna xwe diparêze. Ji bo vê di nava gelê Rojhilata Navîn de gelê herî azadîxwaz gelê Kurd e. Ev rewşa Kurdan girêdana xwe bi dîroka Kurdan re heye.
Hejarbûna Kurdan weke meyîleke dîrokî derdikeve pêşiya me. Ev pêvajo bi serdema Babîlan, Sûmeran û Asûran destpêdike û heta roja me ya îro didome, her dem Kurdan li derûdora bajaran cih girtiye. Ev rewş hîna di serdema navîn de destpêdike. Di pêşketina bajarên mezin û kapîtalîzîmê de jî berdewam dike û heta roja me ya îro heman rewş tê jiyîn. Hîna jî Kurd li derûdora bajaran jiyan dikin. Ev rewş weke koçberî û xizantiyê berdewam dike. Li cihê ku serdestiya çînîtiya xwe jiyan bikin, bi piranî bi çînên biyanî yên serdest re jiyan kirine. Jiyanek nîv ketkar, vala, bê tendûristî û bê perwerde jiyan kirine. Di heman demê de hem ji hêla çîna serdest a biyanî, hem jî ji hêla çîna navxweyî ve hatinê perçiqandin. Li hemberî vê rewşê gelekî bi hersin, weke bêbextiyek li wan hatibe kirine di hêsbînîn. Li hemberî vê jiyanê hêrsbûyîneke xwezayî jiyan dikin. Lê ji milekî din ve jî xwe bê hêz dibînîn. Ev rewş di jiyana wan de dibe bingeha gelek aloziyan.



Bi pêşketina têkiliyên hilberîna kapîtalîzmê re di cihê xizantiya Kevin de, kedkarên demî û kêmek jî kedkarên sanayî çêbûne. Bêkarî behtirîn di cîwanan de pêşketiye, ev jî bûye bingeha ku cîwan berê xwe bidin bajarên mezin an jî Avrûpa. Her çendîn bi salan Kurdîstan bûbe kada şer û hatibe talan kirin jî lê ti carî evqas koçberî pêş neketiye. Tiştekî ku ji vê xaraptir were serê gel tineye. Ev rewş, rewşa herî xerabe ji bo gelekî.

Ev gûhartinên civakî ku di nîvê sedsala 20. de çêbûne, bingeha madî ya meyîla tevgera azadiyê ava kiriye. Di vê demê de bilindbûna meyîla netew-dewlet û têkoşîna çînayetî bandoreke mezin li ser vê tevgerê kiriye. Dîsa bi pêşketinên di warê ragahandinî, fikir û nêrînên zanebûnê de jî pêşketin çêkiriye. Dîsa di vê serdemê de pêşketinên bîrdozî û sosyalîzma pêkhatî, bandoreke mezin li ser tevgera azadiya gelê kurd kiriye. Pêşketin û tevgerên ku di salên 1970 de di cîhanê de çêbûn bandora xwe li Rojhelata Navîn, Cîwanên Tûrkiyê û li ser rewşanbîr û xwendevanên Kurd jî kir. Ev rewş her çendî kêm û kurtiyên xwe jî hebin, lê li ser navê Kurd û Kurdîstanê bernameyek hate pêşxistin. Mirov dikare ji vê

re bibêjê **meyîla Tevgera Azadiyê** jî. Tevgera Kurdan ya herî balkêş di vê serdema PKK' ê de ye.

Ruxmê ku PKK di salên 1970 de ji tevgerên cîhanê yên sosyalîst- kapîtalîst, şerê li herêmê weke Filistîn û Îsraîl, bandor bûne jî, lê weke tevgereke serbixwe derkete holê. Piştî lêkolîn û têkoşîna 6-7 salan şûn de, di 27 Mijdara 1978 de li navçeya Lîcê Gunde Fîsê kongreya xwe ya yekem lidarxwist û xwe weke PKK' da diyarkirin. Têkoşîna xwe ya yekem li navçeya Hîlvan û Sîverekê li hemberî hevkarê dewletê sîxweran, axa û began kir.
Her ku diçû dewlet li hemberî pirsgirêkên civakê astengî jiyan dikirin, ji neçarî pergala awarte da destpêkirin. Berî cûnta 12 Îlûnê Rêberê PKK Abdûlah Ocalan di 2 ê tîrmeha sala 1979 de di rêka Etem Akçam de derbazî Sûriyê dibe û ji wê derê jî derbazî saha Fîlîstîniyan wargeha Lûblanê dibe. Piştî kongreya 2. di 15 tebaxa 1984 de bi şewazekî çekdarî, bi ser kerekolên ERÛH û ŞEMZÎNANÊ ve digrin. Êdî serhildana Kurdan a 29 an destpêkirî bû.
Şerê têkoşîna çekdarî di salên 1990 î de derdikeve asteke bilind. Di çiyan de şerê çekdarî bilind dibe û li bajaran jî serhildanên gel dest pê dikin. NATO li ser van pêşketinan di salên 1985 de civînekê lidardixe û di çerçoveya xala 5. de biryara li hemberî PKK' ê şer bike digre. Ev erk Almanya li ser navê NATO yê digire ser mile xwe. Hem ji hêla GLADYO yaya NATO ve, hem jî ji hêla dewleta Tirk ve hemû rêbazên qirej bikartanîn. Bi sed hêzaran cerdevan têne çêkirin, Hizbil Kontra tê ava kirin, disa weke tîmên teybet û rêxistinên reş ên weke kontûr-gêrîla, JÎTEM têne avakirin. Di salên 1990 de VARŞOVA di şexsê Dewleta Sovyet Rûsya de tê rûxandin û Sosyalizma pêkhatî hildiweşe. Ev rewş hezên kapîtalîst pirtirîn kêfxweş dike. Di salên 1992 de dewletên navnetewî yên desthilatdar, dewleta Tirk, KDP û bi hevkariya YNK li hemberî PKK' ê dest bi Şerekî berfereh dikin. Ev şer 45 rojan dom dike, lê her dû mil jî hêviyên ku ji vî şerî dikin bi dest naxînîn. Dewleta Tirk di sala 1993 de ji hêla serok komarê wê demê Tûrgût Ozal ve ji PKK'ê di çerçoveya Federasyonê de ku wê pirsgirêka Kurd çareser bike daxwaza agirbesteke yek alî dike. Rêberê PKK'ê Abdûlah Ocalan li ser daxwaza serok komarê Tirkiyê di 31 Adara sala 1993 de agirbesteke yekalî radigihîne. Dewleta Brîtanî ji vê rewşa agirbestê ne raziye û naxwozê pirsgireka Kurd çareser bibe. Ji bo dewletên deshiladar çareser kirina pirsgiraka Kurd, ne li gor berjewendiyên wan e. Bi erêkirina Birîtanya Serok Komarê tirk bi şewazekî reşkujî tê kuştin. Dîsa serfermandarê artêşê Eşref Bîdlîsî bi şewazeki sergirtî balafira wî ya şer tê xistin û ew jî tê de dimre, gelek kesên ku di payeya bilind de cihê xwe digrin û alîgirên aştiyê ne, bi şewazekî kujerê wan ne diyar ji holê têne rakirin. Ji ber vê sedemê agirbest bi dawî bû û ji nû ve şer destpêkir. Di vê serdemê de 4000 gundên Kurdan tên şewtandin û 17000 welatparezên Kurd bi şewazekî kujerên wan ne diyar têne kuştûn. Lê disa jî dewleta Tirk nikare PKK' ê têk bibe.
Gelek caran hewildanên agirbestan çêbûbin jî, lê encam ji van agirbestan nayê girtin. Di 6 ê Gulana 1998 de li şamê bi destê hevkarên Kurd, sîxwûrên sûrî, Îsraîl û Tirkan li hemberî Rêberê PKK'ê çalekiyeke bombayî pêşdixin, lê ev çalekî jî encam nagire. Li hemberî vê çalekiyê weke bersivdayînekê di 30 Hezîrana 1996 de ji hêla jina Kurd a azad Zeynep Kinacî ve li bajarê Dêrsimê çalekiyeke fedayî tê pêkanîn. Bi vê çalekiyê PKK' e li hemberî dewleta Tirk dikeve rewşeke nû. Şêwazê pêkanîna vê çalekiyê dibe weke şewazekî çalekiya pêşîvekirina sere gêrîla û pêşiya textîk tê vekirin.
Ruxme hemû hewildanên Tirkan PKK'e bibin neketiye. Ji bo vê bi tevayî di qada nav neteweyî û di nav Kurdên hevkar de têkoşînek li hemberî Rêberê PKK'ê tê destpêkirin. Serkêşiya vê di serî de DYE, Britanya, Îsrail, Almanya û hevkarên van dewletan, Kurdên Xayîn û Dewleta Tirk dike. Bêbextiya Nav Netewî tê destpêkirin. Di encamê de di 8 cotmeha sala 1998 de Rêberê PKK' e ji sûrî derdikeve û berê xwe dide Yûnanîstanê. Lê

sozên ku dewleta Yûnan û Rûs dayinê pêk nayînin, ji ber ku ew jî perçeyek ji vê bêbextiya Nav-Neteweyî ne. Nêzîkî 65 rojan li Îtalya dimîne, li ser sozên xayînên Kurd, Yûnan û Rûsya ji Îtalya derdikeve bi destê Yûnanan dibin sefareta Yûnanan a Kenya Narobî û li vê derê radestî Tirkan dikin. Di 25 Sibata 1999 de Rêberê PKK' dîl tê girtin û tînin Tirkyê. Lê di vê dîlgirtinê de tu erkeke Tirkan tine ye. Piştî ku Rêbirê PKK'e tînin Tirkiyê, dibin girava Îmraliyê û heta niha li wê der girtiye.

Di 29 hezîranê de tê darizandin û cezayê sêdarê lê tê birîn. Di serdema girtinê de li Tirkiyê sezayê dardekirinê heye. Dema ku Rêberê PKK'e dîl tê girtin li tevayî perçên Kurdistanê û qadên Avrûpa çalekiyên gelekî mezin têne lidarxistin, di encama van çalekiyan de sezayê dardekirinê ji zagonênên tirkan tê derxistin. Piştî ku cezayê dardekirinê tê rakirin, di cihê wê de bi cezayê mûebetê tê cezakirin.
Bi vê rewşê hêvî dikin ku PKK' e tine bibe. Lê ruxmê hemû hewildanan PKK'e tine nabe. Dewletên serdest dest direjiya nava PKK' ê dikin û dixwazin PKK' ji hindir ve tine bikin. Kesên bê bawer ji wan bandor dibin û di kevin rewşeke teslîmkariye. Lê PKK'e xwe ji nû de ava dike û têkoşîna xwe ya azadiyê bilindtir dike. Di 1' ê hezîrana salên 2004 de careke din şer dide destpêkirin. Di 2005 de KCK îlan dike. Ev têkoşîn heta vê demê didome. Sîstema KCK' ê di pêşengiya PKK' de hate avakirin îro gihaye qonaxeke ku bibe bedîl ji sîstema desthilatdariyê re.



**WANE 51.**

**pirsên Amadekariyê**

1- Çima azadiya civakê di azadiya jinê re derbas dibe?
2- Hûn bîrdoziya rizgariya jinê çawa pênase dikin?
3- Jineolojî çi ye?

## TAYBETMENDIYA KU TEVGERA PKK' ê JI HEMÛ TEVGERÊN DIN CUDA KIR NÊZÎKATIYA JI JINÊ RE YE

Tevgera PKK' ê ya ku di pêşngiya Rêberî Gelê Kurd Abdûlah Ocelan de dest bi şoreş û serhildaneke nû kir; hemû serhildanên beriya xwe û sedema têkçûna wan baş dahûrdin û wisa sazûmaniya xwe ya bîrdozî, rêxistinî û stratejîk çêkir? Lewre di van serhildanan de yek ji pirsgirêka bingehîn ya têkçûnê pêşengtî, ya duyem jî nebûna bîrdoziyeke ku hemû civakê û serdemê temsîl bike bû. Ji ber van sedeman şoreş û serhildanên li Kurdistanê çêbûyîn hem heremî man e, hem jî nebûne malê hemû civakê. Lewre civakê hemûyê siberoja xwe di van serhildanan de nedîtiye û lê xwedî derneketine. Ji ber di bingehê nêzîkatiyê de ne demokratîkirina civakê, desthiladarî armanc kirine. Ji ber vê nêzîkatiyê li Kurdistanê di hemû şer û serhildanan de yên herî zêde fedekarî kirin û zirar dîtin jinên kurdin, lê yên ku ji tiştekî nehatine hesibandin jî dîsa jinên kurdin. Lewre ruxmê ku di gelek serhildanan berxwedaniyên mezin jî kirine, lê navê tu jinên kurd weke seroka serhildanê nayê gotin. Berovajî wê ked û fedakariya wan hemû ji zilaman re bûye mal.



Weke em dizanin di dema seferên li ser Kurdistanê de bi sed hezaran jinên kurd ji aliyê Yûnanî, Ebbasî û Osmaniyan ve weke ganîmeta şere hatine birin û ji xwe re kirine heramî. Her wiha li beramberî van êrîşên li ser jina kurd, jinên kurd di tevahî serdem û serhildanên kurdan de risteke mezin lîstine û berxwedaniyên bê hempa kirine. Hin caran ji bo nekevin destê dijmin û bi rûmeta wan neyê lîstin xwe avêtine çeman, hin caran jî keziyên xwe bi hev ve girêdane û xwe ji zinaran werkirine. Mînakên vê yên herî berbiçav jî dema serhildana Dêrsimê û komkujiyên di demên berê de li ser Şengalê hatin çêkirine. Di van komkujî û serhildanan de bi sedan jinên kurd ji bo nekevin destê dijmin an xwe avêtine avan an jî xwe ji zinaran werkirine. Jinên kurd di hin deman de serhildan jî birêvebirine. Li kurdistanê jinên weke Besê, Zarîfe, Leyla Qasim, Mestûre Kurdistanî, Meryem Xan, Peyrûza Deywanî û hîn gelek jinên bi vî awayî hene. Lê belê ew her dem di siya bav, bira, mêr û xizmên xwe de mane.

Ruxmê van hemû fedakariyên jinên kurd ên ji destpêka avakirina civakê û şoreşa ziman a yekemîn ve jî, nirx û berxwedaniya jina kurd di tarîtiyê de maye. Ji ber ev dîrok hemû ji aliyê desthilatdaran ve hatine nivîsandin. Dîroka jinên azadîxwaz û gelan nehatiye nivîsandin, berovajiyê wê dîroka desthilatdaran û dîroka şeran hatiye nivîsandin. Lewre

felsefeya APO yî û tevgera PKK'ê bû qada ji nû ve komkirina van nirxên jin û civakê û nivîsandina dîroka rastî. Tevgera PKK'ê ji roja hatî damezirandin bi aramanca azadikirin û avakirina civakê û giyaneke neteweyî xwe sazûman kir. Ji ber vê jî Rêberê Gelê Kurd Abdûlah Ocelan got azadiya civakê di azadiya jinê re derbas dibe. Heta ku jin azad nebe civak jî azad nabe. Bi vê hevokê şereşeke demokratîk a ku bû qada azadiya jin û hemû civakê destpêkir. Lewre di roja yekemîn a koma PKK'ê ya damezirîner de Rêberê Gelê Kurd Abdûlah Ocelan cih daye jinan û rêveberiya tevgerê bi hevaltî bi wan re parvekiriye. Bi vê fesefeyê ve jina kurd Sakîne Cansiz a ku beriya du salan li Parîsê bi kompoyekê hate qetilkirin tevlî 1. kongreya PKK' ê ya demezirîner bûye.
Di vê kongreya mijara gotinê de komîteyeke rêveber a navendî ya PKK'ê tê hilbijartin û di nava wan de jinek bi navê fatma heye. Piştî vê êdî di rêgezên xwe gihandina civakê de ya yekemîn birêxistinkirina jinan bû. Ji ber koma damezirîner hemû xwendevan bûn, rêxistinkirina destpêkê jî di nava xwendevanan de çêbû. Lewre jinên destpêkê tevlî PKK'ê bûne ji zanîngeh û dibistanên mamostetî tevlîbûne. Ew jî ji Dêrsim, Pezarcik û wan derûdaoran e. Piştî salên 1990 î jî ji Mêrdîn, Botan, Amade û Rojavayê Kurdistanê tevlîbûn zêde dibin. Bêgoman li kurdistaneke ku di bin taybetmendiyên zayendîparêziya feodaliya mîrkî, axatî û şêxîtiya îslamî de hatî perçiqandin de tevlîbûna şereşeke azadiyê ya ku van tevahî qaliban dişikîne nehêsan bû. Gelek malbat hebûn dema destpêkê keçên wan tevlî dibûn bi mehan serê xwe ji mala xwe dernedixistin û digotin namûsa me çûye. Lê di rastiyê de ew kurdên ku axa wan, welatê wan hemû ji destê wan çûbû, lê wan namûs di bedena jinê de didît. Li hemberî wê nedikarîn wê jinê jî ji destavêtina dagirkeran biparêzin. Lê jinên kurd di tevgera PKK'ê de îspatkirin ku ew dikarin ne tenê xwe, ax xwe, welat û civaka xwe jî biparêzin û bibin hêza pêşeng a guherîn û veguherîna civaka zayendîparêz.

Di vê çarçoveyê de jinên kurd hîn di komên destpêkê yên gêrîla de cî digirin. Di 1982 an de dema derbeya 12 îlûnê li tirkiyê pêk hat gelek jinên pêşeng ên weke Sakîne Cansiz jî hatin girtin û di zîndanê de berxwedaniyeke bêhempa kirin. Vê berxwedaniyê asta evîna jin a ji azadiyê re baş nîşanî dost û dijiminan da. çalakiya Zakiye Aklan a 1990 î li Amed a xwe şewitana li beramberî êrîşên dijimin ên bêrûmetkirinê û çalakiya Rehşen Demiral a 1992 a li Îzmîrê ya li beramberî mişextikirina kurdan a bajarên tirkan û ew di nava sefaletê de hiştinê, dîsa çalakiya Ronahî û Bêrîvan a li Almanya ya li hemberî zextên dewleta Alman a li ser kurdan hemû bi me didine zanîn ku jina kurd hebûn û azadiya xwe di vê şereşê de dîtiye û dikarê ji bo wê canê xwe jî feda bike. Jixwe gotina Rêberê Gelê Kurd ya dibêje; 'ger azadî hêsanbûna Ronahî û Bêrîvan xwe nedişewitand' jî vê rastiyê pişte rast dike.


Bi vî awayî hetanî salên 1990 her çiqas hejmara jinên kurd ên di nava gêrîlayên azadiya kurdistanê de kêm be jî, lê risteke mezin pêşngiya şoreşê di berxwedanî, rêxistinkirin, gêrîlatî û serhildanên li kurdistanê de lîstin. Di sala 1987 de yekemîn rêxistina jinên PKK' yî ya bi navê YWJK' ê li Ewrûpa hate avakirin û kovara wê ya bi navê Jina Serbilind jî dest bi weşanê kir.

Piştî salên 1990 bi pêla serhildanên li Nisêbîn, Cizîra Botan, Şirnex û Amadê jinên kurd bûn lehî û herikîn çiyayên kurdistanê yên azad. Bi vê pêla tevlîbûna bê sînor re amadekariyên artêşbûna jinê a di nava gêrîla de hate kirin. Di şerê 1992 an yê ku Tirk, Amerîka, Bêrîtaniya , KDP û YNK'ê ve li hember PKK' ê destpêkirî de jin- keça Dêrsimî ya gêrîla Bêrîtan Lêlkan piştî berxedaniyeke demdirêj ji bo nekeve destê pêşmegeyan xwe ji zinarên herî bilind yên xakurkê Lêlikanê de avêt û şehîd ket. Bêrîtan bi vê çalakiya xwe hem

peyama pêwîst da pêşmergeyan ku ew şerê birakujî dikin, hem jî bû xeta berxwedaniya jina kurd ya ku wê tu carî teslîm nebe.

Artêşa jinên gêrîla li ser vê çanda berxwedana Bêrîtanan di meha 10 1993 an de hate îlankirin. Bi vê gavê ve jî jinên kurd mora xwe li avakirina artêşeke jin a ku cara yekem bû di cîhana me de dihate avakirin dida. Êdî jinên PKK' yî ji vê demê û şûn ve bûne hêza pêşeng a berxwedaniya gêrîla û avakirina jiyaneke nû ya li kurdistanê. Bi vê jî îspat kirin ku ew ne artêşeke weke artêşên bi armanca kuştin, talankirinê û desthilatdariyê hatiye avakirin, berovajî artêşeke avakirina jiyanê ye û wê şer bike şerê parastina rewa. Piştî van pêşketinan tevan di 8 adara 1995 an de jî jinên gêrîla kongerya xwe ya 1. çêkirin û navê artêşa xwe kirin YAJK- **Yekîneyên Azadiya Jinên Kurdistan. Niha jî ev** artêş bi navê YJA Star bûye artêşeke ji 30 hezaran.

Di 30 hezîrana 1996 an de gêrîlaya jin a ji meletî a bi navê Zîlan-Zeyeneb Kinecî li hemberî êrîşên dewleta tirk ên li ser Rêberê Gelê Kurd Abdûlah Ocelan xwe bi bombeyan pêça û xwe li Dêrsimê bi merasimeke leşekerî ya dijmin de teqand. Ev çalakiyeke fedayî bû.
Zîlan di nameyên xwe de dibêje; ji ber **Ez Pir Ji Jiyanê Hez Dikim Çalakiyeke Wiha Pêk Tînim**. Û dewam dike, **Ez Dixwezim Bibim Xwedî Çalakiyeke Mezin û Jiyaneke Bi Rûmet.**



Di sala 1998 an de jî bîrdoziya rizgariya jin ku ji 5 rêgezan pêk dihat hate ragihandin.
Ev rêgez wiha ne.

1- Welatparêzî- li ser axa xwe jiyankirin
2- Fikrê azad vîna azad
3- Rêxistinkirin
4- Têkoşîn dayîn
5- Estetîk- xweşkbûna dil, ruh û mejî

Jinên kurd ên azadîxwaz êdî têkoşîna xwe ya azadiyê di çarçoveya van 5 rêgezan de domandin. Jinên gêrîla êdî di 2. kongerya xwe ya di 13 adara 1999 an pêkhatî de xwe kirin partî. Û îro partî, artêş û beşê rêxistinkirina civakê di bin banê KJK' ê-**Komeleya Jinên Kurdistan** de xwe gihandiye sîstemeke jin a ku ji tevahî sîstema zayendîparêz re bibe bedîl. Vê sîstemê jî xwe bi zanista jin jineolojî gihandiye asoyeke gelekî mezin. Bêgoman ev pêşketinên jina kurd bi hevaltiya Rêberê Gelê Kurd Abdûlah Ocelan pêk hat. îro jî jina kurd bi vê şêwazê rêxistinkirinê bûye hêza guherîn û veguherîna hemû paverûtiyên civakî û hêza pêşeng a pêşvebirina şoreşê. Lewre îro bi deh hezaran şehîdên leheng ên vê tevgera jin ên ku ger îro hebûna wê her yekê ji wan welatek birêvebiribûna hene. Lê wan xwe ji bo azadiya jin, civakê û vî welatî fedakirin û ji bo xwe tiştek nexwestin. Ev mezinbûna tevgera jin jî cudahiya tevgera APO yî ya ji hemû tevgerên din bi awayekî baş radixe ber çavê me.

WANE 52.

**Pirsên Amadekariyê**

1- Çima kurd heqîqeta xwe bi rêka mezheb ango tarîqatan parastine?
2- Di dema Abbasiyan de nêzîkatiya ji zanistê re çi bû?
3- Tişta ku her çû hişt îslamyet mûhefezekar bibe çi ye?

## DI KURDAN DE TÊGEHA TARÎQET Û MEZHEB

Kurd weke gelên herêmê yên herî kevnarin, li hemberî bandora Îslamiyetê dixwestin kevneşopiya xwe bi parezin. Dema ku Îslamiyet derket Kurd di bin bandora ola Zerdeş de civakbûyîneke pêşketî jiyandikirin. Li hemberî Îslamiyetê li gel berxwedana bêhempa, berxwedana fîkrî jî dikirin. Berî Îslamiyetê jî tarîqeta Batînî û sofîtî hebûn. Tarîqet û Zerdeştîbûyîn ji hinik Milan wan ên dişbin hev hene. Kurdan di cihê ku hemû tiştên Îslamiyetê fermî bipejrînin, bi şêwazê tarîqetê pejrandine. Ji ber ku şewazê tarîqeta nêzî rêbazê Zerdeştî ye. Di nezîkatiyên Kurdan ên ji Îslamiyetê re mile wê yê sofîtî zêdetir e.

Kurdan girêdayîna xwe bi rêgezên ola Zerdeşt ve çêkirine û xurtkirine, li ser vê bingehê Îslamiyet li gorî xwe şîrove kirine û pejrandine. Di şerên di navberî Ahûramazda û Ehrîman de Maxiyan ji bawermendan re rêvebertî dikir, di Îslamiyetê de jî cihê Maxiyan şêx û pîr digirin.

Di serdema Emaewiyan de hem ji hêla hizir, hem jî ji hêla leşkerî ve serî dikşandin û ev li tevahiya herêmê belav bû, di encamê de Emewî têkçûn û serdema Abasiyan dest pê kir. Di serdema Abasiyan de Îslamiyet li herêmê gelekî bi bandor bû. Di vê serdemê de di nava Îslamiyetê de gelek nîqaş pêşdiketin. Van nîqaş jî dewlemendiyek bi xwe re dianîn. Ji vê serdemê re dibêjin serdema pêşketina akima akil jî. Di vê serdemê de li ser îslamiyetê bandora felsefeya yûgstan û Hînd jî hatiye dîtin. Nîrxandina herî balkêş di vê serdemê de çêbûne. Mezheba Mûtezil di vê serdemê de weke 150 sal ola fermî hatiye pejrandin. Di vê serdemê de di ol de çêbûyîna reforumbûyînê bandora xwe li ser pêşketinên di nava Îslamiyetê de kiriye, mirov dikare vê serdemê di Îslamiyetê de weke ronakbîrî jî bi nav bike. Îslamiyeta ku xwe di çerçoveya feodalî de bi rexistin kiriye, bi pêşketina tarîqetan hat lêpirsînkirin. Hizirmendê herî mezin di nava Îslamiyetê de di van serdeman de derketine. Di serdema dawî ya desthilatdariya Abbasiyan de (serdema Xelîfan) qedexe kirina şîrovekirin û nîqaşkirina Îslamiyetê bûye sedem ku tarîqat xwe bi rebazekî veşartî birexistin bikin û kar û barên xwe bimeşînin. Ji vê serdemê û vir de êdî tarîqat bi şewazekî veşartî xwe didin meşandin.

Tevgerên Batînî di destpêkê de hem bîrdozî, hem jî bi çalekî, bi Îslamiyetê re di nav têkoşîneke de bûn, wekî Harîcî, Hûremî, Babekî, Karmatî, Haşîşî, Îsmaîliyan.
Di serdema 7 û 10'an de Emewî dixwazin li ser Kurdan bi zorê bandora xwe çêbikin, Kurd jî bi bandora ola Zerdeş gelek berxwedaniyên mezin pêşdixin. Di sedsalên 11 û 12'an, lê ev berxwedanî kêm dibin. Di sistbûna berxwedanan de bandora nermbûna Abbasiyan jî heye. Di sedsala 12 û 13'an de dewleta feodal derketiye asta herî bilind. Kurd jî di vê serdemê de

gelek begitî û mîritiyan ava dikin. Heta sedsala 16. mîrîtî û begîtiyên ku ava bûne bi piranî jî ji mezhebê sûnî ne.

Di serdema Navîn de dîsa yên ku herî pir li hemberî teqezbûna Îslamiyetê disekinin gelê Kurd e. Zerdeştî, Manî, Elewî û tarîqetên sofî herî pir ên ku li hemberî feodalîzma koledariyê derdikevine. Di vê serdemê de tişta herî nebaş feodalîzma sûnî biyanîbûyîna wê ye, ji civakbûyînê û taybetmendiyên wê yên bi desthilatdaran re hevkar e. Serdema tarîqetên ku bi serdestan re dibin yek, dest pê kiriye. Mirov dikare bibêje ji vê serdemê û wir de êdî terîqat erkekî nebaş girtine û di nav civakê de erkeke neyînî dileyîzin. Serdema rizandina tarîqetan e.

**WANE 53.**

**Pirsên Amadekariyê**

1- Girîngiya Neqşîbendiyê di berdewamkirina îslamê de çi ye?
2- Sedema tevlîbûna kurdan ya ji Neqşîbendiyê re çi ye?
3- Bi rêka Neqşîbendiyê kurd çawa hatin perçekirin û sîxurkirin?

## DERKETINA BINGEHA FELSEFEYA TARÎQETAN.

Tarîqeta Nakşîbêndiyan di dawiya sedsala 14. an de ava bûye. Li Bûhra ji hêla Bahaûddin Nakşibend (1318-1389) ve tê ava kirin. Nêrînên vê tarîqetê ji hêla Abdûlhalik Gondjûwanî ku di sedsala 11'an de jiyan dike ve tê pêşxistin. Di dema Abdûlhalik Gondjûwanî de heta Harizmê belav bû. Ji hêla Bahaûddin Nakşibêndî ve weke kaîda hate bi rêz kirin. Bûhra ji bo xwe kire Navend û Li gelek deran belav bû.

Nakşibêndî li ser bingeha tasavvûf hatiye bi rêxistinkirin. Weke tevahiya tarîqeta neqşîbendî jî xwedî rêgezan e. Rêgeza wî ya bingehîn " her mirov pêwîste bi mûrşîdekî (Şêx) ve giredayî be". Ev mûrşîd şêxê tarîqetê ye. Kesa/ê ku şêxê xwe tinebe rêberê wî şeytane. Dibin çavderiya şêx de perwerdeya ku ji sê qonaxan ava dibe de derbaz dibin. Ji vê perwerdê re dibêjin Seyr-û Sûlûk. Kesê/a ku di vê perwerdê re derbaz bibe dikare bibe endamê tarîqeta Nakşîbendiyan.

### Qonaxên Nakşîbêndiyan

**1-Biat;**Tê wateya Mûrîd ji şêxê xwe bawer bike ku Şêx di navbera wî û xwedê de dikare navbenkarî bike.
**2-Kelimat-ı Semaniye;** şewazê sererastkirina mûrîdan e. Ev ji 11 gotinên ku bi watedanên Taybet tên, bi watekirin ve ava dibin;
**1-Hûş Der Dem:** Kes pêwîste li ser Nefesa xwe xwedî bandor be û bikaribe bi tevayî nêrîna xwe li nokteyekê kom bike.
**2-Nazar Ber Kadem:** Ji bo ku karibe Konsantrasyona xwe berdewam bike pêwîste li ti milan nenêre, çavên xwe herdem li pêşiya xwe be.
**3-Sefer Der Vatan:** Bedena xwe ji daxwazan cûda bike**.**
**4-Halvet Der Encûmen:** Di nav gel û tevlîheviyan de herdem ezdan bibîr bîne.
**5-Yad Kerd:** Di hizrê xwe de herdem ezdan bibîranîn.
**6-Baz Geşt:** Tevayî hebûna ji çavên xwe derxe, di cewherê xwe de zivrandina ezdan û herdem ji fermanê wî re amade bûyîn.
**7-Nîgah Daşt:** Dilê xwe ji bandora şeytan rizgarkirin.
**8-Yad Daşt:** Herdem xwe bigotinên ezdan re mijûl kirin.
**9-Vûkuf-i Zamanî:** Mûrîd ku bikaribe di heman demê de xwe bighîne hêza dema îbadedan û herdem xwe ji îbadetan re amede kirine.
**10-Vûkuf-î Adedî:** Piştî ku hinek zikir bike karibe di navberê de bisekne.
**11-Vûkuf-î Kalbî:** Dilê xwe karibe herdem ji yezdan re şiyar bihêle.

**Zikir;** Di hizrê xwe de navê ezdan dûbare kirin, ji kuranê xwendina ayetan, rûyê şêxê xwe di hizrê xwe de bibîranîn û jê alîkarî xwestin. Ji wî re rabita tê gotin û di nakşîbendî de ji tevahî zikîran re zêdetir rûmet jê re tê dayîn.

Tarîqeta Nakşibendî di erdingariya Kurdistanê de di sedsala 19'an de zêdetir tê diyar kirin. Di derketina xwe de Taybetmendiyeke Kurdî ya vê tarîqatê hebe, an jî tine be, baş nayê zanîn. Lê di erdingariya Kurdistanê de pêşketiye.
Li Rojhilatê Osmaniyan li hemperî pêşketina dewleta Safewiyan dewleta Osmaniyan bi tarîqetên sûnnî re kete nav têkîliyan. Osmanî dîsa bi tarîqeta Geylanî re kete nav têkîliyan. Ji milekî din ve jî vê tarîqetê di nav Kurdan de pêşxistin. Piştî şerê Çaldiranê pêşî li pêşketina tarîqeta nakşîbendiyan vebû. Di sedsala 16. an de li nav tevayî beg û mîritiyên Kurdan de tarîqeta Geylanî û Nakşîbendî pêşxistin. Dewletê di rêka van Şêxan de têkiliyên xwe hem di nav Mîran hem jî di nav beganda pêşxistin. Ku mirov minakekê bide; Şêx Îdrîsê Bedlîsî yek ji wan e, Bedlîsî jî ji tarîqeta Nekşîbendiyan e. Her çendîn bandora şêxan hebe jî, lê heta sedsala 19. an di Kurdistanê de Mîr û Beg bibandorbûn.
Di vê serdemê de her ku diçû dewleta Osmanî li rojava erdingariya xwe winda dikir û ji her alî ve lewaz dibû. Di encama vê lewazbûnê de daxwazên xwe ji mîr û begên Kurdan zêdetir dibûn. Ev rewş jî di nav Kurdan de nerazîbûneke çêdikir û di encamê de bû sedema serhildanan. Lê ev serhildan bi piranî têkçûn. Têkçûna mîr û begên Kurdan di nav Kurdan de valahiyek avadikir, ev valahî ji aliyê Şêxan ve dihate dagirtin. Her ku diçû bandora şêxan di Kurdistanê de zêdetir dibû. Şêxan biqasî bandora olî, bandora siyasî û leşkerî di herêman de ava kiribûn. Ê ku herî zêdetir ev valahî dagirt şêxên tarîqeta Nakşîbendî milê Xalîdî bûn. Li gel vê tarîqêtê Geylanî jî pêşdiket, lê yê ku herî zêde bandora xwe dikir milê nakşîbendî yê Xalîdî bû.

## Di Nakşibendî De Nasnameyek Nû; Xalidî

Xalidî li başûrê Kurdistanê li Silêmaniyê ji hêla endamê êla caf Diyaeddîn Xalid Bexdayî (1778-1826) ve hatiye ava kirin. Piştî mirina Ahmedê Xanî 72'an û şûnde , Xalid li çiyayê reş hatiye cîhanê. Di serdema têkçûna mîr û begên Kurdan de jiyan kiriye. Hem ji Ehmedê Xanî hem jî ji sedemên têkçûyîna serhildanan ên Kurdan gelek ders derxistine. Li gel gelek kesan (Seyîd Abdûrrahîm Berzencî, Seyîd Abdûlkerîm Berzencî, Melle Salih Necmar, Şêx Mihemed Qasim Senandec) di medresan de perwerde dîtiye. Li gel gelek tarîqetan ( sûhrevî, nakşîbendî, geylanî, kubrevî ) jiyan kiriye. Li gel şêxê herî navdar Şêx Abdûllah Dehlevî perwerde dîtiye. Demekê şûn de tê Silêmaniyê, lê ji ber ku li vê derê tarîqeta Qadîrî pêşketiye bi nerazîbûnê re rû bi rû dimîne û di Encamê de diçe Bexdayê gel Dawûd Paşa. Dawûd paşa bi navê El-Hassasiyê dibistanekê jê re vedike. Li ser bangawaziya Mehmûd Paşa (Paşayê Babanan) careke din difetile Silêmaniyê. Lê ji ber ku hîna jî neyartiya Kadîriyan berdewam dike, careke din difetile Bexdayê. Şêx Neûdeyûm careke din bangawazî li M.Xalid dike Xalid difetile Silêmaniyê, demekê dimîne û pişt re diçe Şamê û li vê derê bi cih dibe. Bandoreke mezin li Iraq, Sûrî, Misir û Anatoliya Navîn dike. Xalid li vê derê dibistanên Xalîdî vedike û vê derê dike weke navendek. M. Xalid di demeke kurt de navdar dibe. Di nav Kurdan de gelek xelîfeyên xwe erkdar dike. Gelek serhildanan di rêkên wan re pêşdixe.

## 1925-1950

Li hemberî komara cihê cîwan, şêxên Nakşîbendiyên kal.
Mêzîna ku di nav Ewrûpa de hebû di şerê cîhanê yê yekemîn de ku dewleta Osmanî hevalbendê Elmanya bû û bi têkçûna Elmanya dema ku bi encam bû, perçebûna Osmaniyan kete rojevê. Kurdan bi soza hevparbûnê bi Tirkan re li gel têkoşîna Tirkan cih girt. Di serî de her çendîn weke komara Tirk û Kurdan jî hatibe binav kirin, lê piştî sala 1924'an Kurd dan aliyekî. Ev jî bû sedemeke ku Tirk û Kurd werin hemberî hevdû. Kurd ji rewşa nû nerazîbûn, hêviyên wan di nav vî welatî de bi rêbazekî xweserî jiyan kirin bû. Di vê rewşê

de Kurd hatin înkar kirin. Desthilatdarên Kurdistanê bi piranî şêx bûn. Şêxan di encamê de serhildan pêşxistin. Lê serhildan ne di asta zanabûna pêvajo û serdemê de bûn. Ji bo wê ev serhildan têkçûn. Piştî ku serhidan têkçûn, ên ku ji serhildanan jî mabûn mişext kirin. Nebiyên van şêxên Neqşîbêndiyan kirin hevkar û nokerên xwe û di rêkên wan de dewletê desthilatdariya xwe li ser Kurdan da meşandin.

Li Îranê **Simko Îsmaîl**, li Iraqê **Mehmûd Berzencî** li Tirkiyê jî **Şêx Saîd** rêvebertiya van serhildanan kirin. Piştî têkçûna van serhildanan, malbat û hevalbendên wan ji cihwar hatin kirin. Malbatên ku ji cih û war hati kirin bi demê re ji tevahiya Milan ve lewaz bûn. Bikaranîna kesên lewaz siyaseteke bi giştî ye. Dewlet piştî ku ev malbat lewaz xist, dest avêt wan û wan ji bo xwe bikaranî. Di şexsên Şêxên nakşîbendî de hêviyên gelê Kurd jî têk çûbûn.

Mirov dikare bibêje herî dawî têkçûna serhildana Şêx Saîd serhildana Şêxên nekşîbendî ya herî dawî bû. Hêzên Şêxên Nakşîbendî ketibû rewşeke herî lewaz.

## 1945-1980

Siyaseta Moderin û Nakşibendî

Partiya Fikara Gel a komarê weke partiya avakerê komarê 25 salan li ser siyaseta Tirkan bandora xwe kir. Saltanat û Xelîfe hate rakirin, gelek teke, tarîqet hatin qedexe kirin. Her çendîn nerazîbûn derketin jî lê ev nerazîbûn hatin têkbirin. Ên ku herî pir ji vê rewşa nû nerazîbûn şêxên Nakşîbendî bûn.

Li dijberî partiya kemalîst partiya Demokrat (DP) hate avakirin. Şêx, axa û serokêl bi piranî derbazî vê partiyê bûn, her çendîn di serhildanan de têkçûnek hebe jî, lê dîsa jî di nav gel de bandora Şêxan û hevalbendên wan hebû. Ev jî ji bo partiyan girîngiya wan çêdikir. Li Tirkan ji yek partiyê derbaz bûyîna pir partîbûyînê ji nû de girîngiya Şêxên Nexşîbendiyan derkete holê. Di hilbijartinên sala 1950'î de partiya Demokrat (DP) biserket. Êdî Şêxên Nakşîbendî di siyaseta Tirkan de cihekî girîng girt. Tirkan careke din di rêkan van Şêxên Nakşîbendî de Kurd dikirin bin desthilatdariya xwe. Mînak; Ruxmê ku temenê Abdûlmelîk Firat nedigirt, lê dîsa jî ew kirin parlementer. Gelek Şêxên Nakşibendî di rexistinên herî zêde ku dijberî Kurdan de cih girtin kesên weke Şêx Mihemed Reşîd, Erol Ûzûn , Kamûran Înan. Di Tirkan de her ku diçû karmendên îslamî pêş diketin, şêxên tarîqetan jî cîhên xwe di nav wan de digirtin. Bedelên vê karmendiyê di nav Kurdan de tevgerên ku li ser navê Kurdînî derkevin ji hêla van şêxan ve li pêşberî van tevgeran seknandine. Herdem berjewendiyên gelê Kurd bi berjewendiyên malbatî firotine. Ev rewşa van Şêxên Nakşîbendî heta roja me didome. Li hemberî têkoşînên azadîxwaz, ji dewletên deshilatdar re nokerî û sîxûrî kirine.

**WANE 54.**

**pirsên Amadekariyê**

1- Polîtîkaya îsraîl ya bi rêka mala Berzanî li Kurdistanê tê meşandin zirareke çawa dide yekîtiya neteweyî?
2- Îsraîl bi vê siyaseta xwe gav bi gav axa Kurdistanê dikire, ev siberoja kurdan dixe xeteriyeke çawa?
3- îro li Kurdistanê siyaseta neqşîbendî bi kîjan rêbazan tê meşandin?

## DI SEDSALA 20. DE LI SER JIYANA KURDAN A SIYASÎ DESTWERDANA NAKŞÎBENDIYAN Û PDK'Ê

Di serdema netewdewlet a kapîtalîzmê de weke tevahiya gelan, gelê Kurd jî ketê rewşeke nû. Tevgerên gelê Kurd di vê serdemê de hinek rengên nû digrin. PDK'ê di vê serdemê de erkekî netewperest girtiye û wisa rist lîstiye û ji gelek nebaşiyan re rêvekiriye. PDK'ê di çiyan de bû cerdevan û di bajaran de jî bû hîzbûlah. Serokê hîzbûlaha başûr Ethem Barzanî ye. PDK'ê di sedsala 20. de li ser bingeha Nexşîbendîtî pêşket û bandor li ser têkoşîna Kurdan kir.

Di sedsala 20. an de kîjan tevgera azadîxwaz derketibe, bi êrîşan re rû bi rû maye, li pişt van tevahî êrîşan PDK'ê hebûye. Bi destên PDK'ê rexistina KOMALA ya Îranê tine kirine, bi deste PDK'e ya Tirkiyê tunekirina Saît Kirmizi Toprak û Saît Elçî hatiye çêkirin. Di 1965'an de dema ku PDK' a Tirkiyê ava bû nameya ku ji hêla rêveberê vê partiyê Faîk Bûcak ve hatibû amade kirin, PDK'a Barzanî bi destê xwe ev name da MÎT ê Tirkan, ev jî bû sedem ku PDK'a Tirkiyê têkeve bin şopandina MÎT ê. Piştî vê nameyê Faîk Bûcak bi sûîkastekê hate kuştin. Berê ji rêvebirên vê tevgerê weke SAÎT Kirmizi Toprak û Saît Elçî jî hatibûn tunekirin. PDK'Ê li bakurê Kurdistanê bi xwe ve giredayî rêxistinên weke Stêrka Sor û KUK ava kiribûn. Di rêka wan re bi MÎT'ê Tirkan re tevger dibûn û li hemberî tevgerên azadiyê şer dikirin. Şahdeta Hakî Karer bi destê Stêrka Sor hatibû kirin. Di rêka Pêşeng û KUK de li Batman, Mêrdîn û Botanê ji bo ku PKK'Ê nekeve van cihan astengî derdixistin. Di sala 1983'an de ji bo seknandina şerê di navbera PDK'ê û YNK'ê de Mehmet Karasûngûr û Îbrahîm Bîlgîn weke navbeyînkar dikevin navbera wan, lê ji hêla van rexistinan ve bi rebanzeke xayintî tên qetil kirin. Piştî ku PKK'e derdikeve Rojhilata Navîn her dem PDK'e dixwaze PKK'ê bixe bin venêrîna xwe. Di sala 1985'an de Mesûd Barzanî dixwest ku PKK'e dev ji şerê çekdarî berde, lê dema ku PKK'ê ev xwesteka Barzanî pêknanî di qada navnetewî de PKK'e weke teror bi nav kir. Di şerê dijberî PKK'ê yê 1992'an de li gel Tirk, Îsraîl, Emerîka û Biritaniya cih girt. Dîsa di dîlgirtina Abdûlah Ocalan de erkekî mezin leyîst. Di Rojavayê Kurdistanê de Kurdên ku li ser bingeha azadiyê xwe bi rexistin kirin û dest danîn ser saziyên dewleta Sûrî li dijberî wan rêxistinên bi xwe ve giredayî avakirin (Azadî, Elpartî, Ketîbe Selahadîn ) û li dijberî Kurdên azadîxwaz şer kirin. Aligîriya Ereb û Tirkan kir. Weke berdewama tarîqeta Nakşîbendiyan PDK'ê erkê xwe yê ne erenî heta roja me di nav Kurdan dileyîze.

## Di Hemeza  Haham de  Nakşîbendî.

Îsraîla ku di sala 1948'an de avabû li ser hinik xalên stratejîk bilind dibe. Yek ji wan di perçeyek Tewrattê  yê Tekvîn de cih digre, ev diyarkirina êzdane; ji rûbarê Nîlê heta ava mezin û heta Feradê min da Zûriyeta te. Îsraîla ku vê erdingariya ku weke êzdan daye wan îro jî strarejiya xwe li ser vê ayeta ku di tewratê de cih digre ava dikin.  Lê îsraîl jî baş dizane ku ev erdingarî rasterast bi dest xistin nehêsane û rewşa niha ji vê re dest nade.  Ji bo wê îsraîl hîn  zêdetir di rêka kesên girêdayî wan de dixwazin bidest bixînin. PDK'e û Malabata Barzanî jî yek ji wan e. Têkîliyên PDK'ê û Îsraîl hîn di avakirina Îsraîl de dest pê dikin. Dema  di sala 1950'î de Kurdên ku bûne Yahûdî dibirin Îsraîl ve têkiliyên Barzanî û Îsraîl dighê asta herî bilind. Di sala 1963'an Îsraîl pêşmergeyan dibe gel xwe û li vê derê perwerde dike. Dîsa her meh 500 hezar dolar didin Mela Mistefa Barzanî. Sîxûrên Îsraîl li ser navê PDK'ê li hemberî rejîma Iraqê sûkastan pêşdixînin. Di Îlûna sala 1967'an de Mela Mistefa Barzanî fermî serlêdana Îsraîl dike. Piştî serhildana Şêx Saît Nekşîbendîtî erkekî erenî zêdetir, erkekî neyînî di Kurdistanê de leyiystiye. Bi Taybetî jî bi destê PDK'ê.

# NAVÊ BAJARA Û NAVÇEYAN BI KURDÎ Û TIRKÎ

| | |
|---|---|
| ADIYAMAN/SEMSÛR | DİYARBAKIR/AMED (AMÎDADIYARBEKIR) |
| Gerger/Alduş | Bismil/Bismil |
| Çelikhan/Çîlikan | Çermik/Çermûg(Çêrmûge) |
| Kahla/Kalik | Çınar/Çinar |
| Gölbaşý/SerêGolan | Çüngüş/Şankuş |
| Besni/Bêhiştî | Dicle/Pîran |
| Somsat/Şemîzînan | Eğil/Gêl |
| MALATYA/MELETÎ | Ergani/Erxenî |
| Arapkir/Erebgir | Hani/Hêne(Hênî) |
| Ağın/Axên | Hazro/Hezro |
| Hekimhan/Hekîmxan | Kocaköy/Karaz |
| Arguvan/Erxevan | Kulp/Pasûr |
| Darende/Arende | Lice/Licê |
| Akçadağ/Argan | Silvan/Farqîn(Silîvan) |
| Yeşilyurt/Çermîk | MARDİN/MÊRDÎN |
| Pötürge/Şîro | İdil/Hezex |
| Doğanşehîr/Wêranşar | Nusaybin/Nisêbîn |
| MARAŞ/GUMGUM | Midyat/Midyad |
| Pazarcık/Pazarcix | Gerçüş/Gercews |
| Andirin/Andirîn | Ömerli/Mehsert |
| Göksun/Goksun | Savur/Stewr |
| Afşin/Avşîn | Mazıdağı/Şemrex |
| Elbistan/Elbîstan | Derik/Dêrika Çiyayê Mazî |
| Turkoğlu/Kurdoxolî | Kızıltepe/Qoser |
| ANTEP/DÎLOK | SİİRT/SÊRT |
| Kilis/Kîlîs | Aydinlar/Tillo |
| Nizip/Belkîs | Baykan/Hawêl |
| Oğuzeli/Tîlbîşar | Eruh/Dih |
| Islahiye/Îslahiye | Garzan/Zok |
| Yavuzeli/Çînçîn | Kurtalan/Misirc |
| Araban/Ereban | Pervarî/Berwarî Xezxêr |
| URFA/RIHA | Şirvan/Xizxêr-Kufra |
| Ceylanpınar/SerêKanî | BATMAN/ÊLÎH |
| Viranşehir/Wêranşar | Sason/Qabilcewz |
| Akçakale/Kahniya Xezalan | Kozluk/Hezo |
| Suruç/Pirsus | Baykan/Xana Hewêl |
| Birecik/Bêrecûk | Beşiri/Qûbîn BİTLİS/BEDLÎS |
| Halfetî/Xelfetî | Hizan/Xîzan |
| Bozova/Heweng | Mutki/Matkî |
| Hilvan/CurnêReş | Tatvan/Tûx |
| Siverek/GirêSor | Ahlat/Xêlat |
| ELAZIĞ/XARPÊT | Adilcevaz/Elcewaz Cizre/CÎZÎRA BOTAN |
| Ağın/Axîn | Uludere / Qilaban |
| Alacakaya/Xulaman | MUŞ/MÛŞ |
| Arıcak/Mîyaran | Varto/Gimgim Malazgir Milazgir |
| Baskil/Baskîl | Bulanık/Kop |
| Karakoçan/DepDepe | BİNGÖL/ÇEWLÎG |
| Keban/Keban | Adaklı/Azarpêrt |

Kovancılar/Qovanciyan
Maden/Maden
Palu/Palî
Sivrice/Sîvrîce
ERZURUM/ERZERÛM
Karayazı/Gogsî
Hınıs/Xinûs
Tekman/Tatos
Çat/Çad
Aşkale/Aşkeleh
Pasinler/Hesenkeleh
Horasan/Xoresan
Narman/Îd
Tortum/Tortûm
İspir/Îspîr
Oltu/Oltî
Şenkaya/Olîlî
Olur/Olûr
KARS/QERS
Aralık/Başan
Iğdır/Îdir
Susuz/Cilawûz
Göle/Golan
Arpaçay/Zarûşad
Ardahan/Erdexan
Çıldır/Zûrzûnan
Hanak/Xenêk
Posof/Duxurr
AĞRI/AGIRÎ (GRÎDAX)
Patnos/Patnos
Diyadin/Giyadîn
Hamur/Xemûr
Tutak/Tutax
Eleşkirt/Zêdkan
Taşlıçay/Avkevir
Doğubeyazıt/Bazîd
VAN/WAN
Çatak/Şax
Gevaş/Westan
Gürpınar/Payîzava
Başkale/Elbak
Özalp/Qelqeliya
Muradiye/Bêgir
Erciş/Erdîş
Edremit/Artemêtan
Genç/Dara Hênê-Dara Hênî-Gînc
Kığı/Gêxî
Karlıova/Kanîreş
Solhan/Bongilan Bongilane
Yayladere/ Xorxol
Yedisu/Çêrme
TUNCELİ/DÊRSIM
Çemişgezek/Çemişgezek
Hozat/Xozat
Mazgirt/Mazgêrd
Nazimiye/Qisle
Ovacık/Pulur
Pertek/Pêrtag Pêrtage
Pülümür/Pilemûrîye
SÎVAS/SÊWAZ
Koyulhisar/Koyûlhîsar
Suşehri/Sûşehrî
Zara/Koçgirî
İmranlı/Kamîlava
Hafik/Hafîk
Yıldızeli/Yildizelî
Şarkişla/Şarkişla
Gemerek/Gemerek
Kangal/Kangal
Gürün/Gurun
Divriği/Dîvrîxî
ERZİNCAN/ERZÎNGAN
Tercan/Tercan
Çayırlı/Mansî
Refahiye/Gêrcanis
Kemah/Kemah
İliç/Îlîç
Kemaliye/Egîn Tuzluca/Tozan
Kağızman/Qaqizman
Sarıkamış/Qamuşan
Digor/Têkor(Dugor)
Selim/Selîm ŞIRNAK/ŞIRNEX
Kumçatı/Dêrgûl
Beytuşşebab/Bêşebab
Idil/Hezex
Güçlükonak/Basan
Silopi/GirgêAmo
HAKKARİ/COLEMERG
Şemdinli/Şemzînan
Çukurca/Çelê
Yüksekova/Gever
Esendere/Bajêrgan

## ÇAVKANÎYEN KU SÛD JÊ HATIYE WERGIRTIN.

❖ Di amadekirina vê pirtûkê de ji gelek çavkaniyan sût hatiye wergirtin.
❖ Pariznameyên Abdûlah Ocalan bi gîştî
❖ Dîroka Kurdistanê M. Zekî
❖ Pirtûkên Maxmûr
❖ Belge-nivîsên Qada bîrdozî
❖ Hinik Şexsiyetin Dîroknas
❖ Şerefname.
❖ Zivrandina deh Hezaran
❖ Dîrok ji Sûmeran Destpêdike û hwd.